



T.C.

Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü

Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Doktora Tezi

**ÇÎROKNÛSÎYA EMERÎKÊ SERDAR
DI EDEBÎYATA KURDÎ DE**

Sinan ÇAKAR

15940304

Şêwirmend

Doç. Dr. Osman ASLANOĞLU

Diyarbakır 2023

T.C.
Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü
Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Doktora Tezi

**KÜRT EDEBİYATINDA EMERİKÊ SERDAR'IN
ÖYKÜCÜLÜĞÜ**

Sinan ÇAKAR
15940304

Danışman
Doç. Dr. Osman ASLANOĞLU

Diyarbakır 2023

TAAHHÜTNAME

SOSYAL BİLİMLERİ ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Dicle Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum “Çîroknûsîya Emerîkê Serdar di Edebîyata Kurdî de” adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin/projemin kağıt ve elektronik kopyalarının Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimleri Enstitüsü arşivlerinde saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

21/09/2023

Sinan ÇAKAR

PÊŞGOTIN

Vegêran, vegotin, yan jî çîrokkirin bi qasî dîroka mirovan kevin e. Mirovan serpêhatîyên xwe cara ewil bi wêneyan dane der, piştî jî ji şûna wêneyan nivîsê cih girtîye û vegêrana serpêhatîyan hem bi awayê devkî û hem jî bi awayekî nivîskî dom kirîye. Çîroka modern jî paşxaneyê xwe ji vê ezmûnê hilgirtîye. Çîrok, bi vî awayî di edebîyatê de cihe xwe girtîye û weku cureyeke serbixwe derketîye holê. Di edebîyatê de piştî romanê, cureya herî zêde tê nivîsîn û nirxandin jî çîrok e. Çîrok êdî ne tenê weku cureyeke serbixwe, di nava xwe de jî ji hêla hecm û naveroka xwe ve dabeş dibe. Ji ber ku paşxaneyê xwe ji vegêrana jîyana mirovan wergirtîye; bi jîyana mirovan ya rojane ve jî têkildar e. Ji ber vê yekê jî bûye mijara xebatan. Çeşna çîrokê her wiha di edebîyata kurdî de jî xwedîyê paşxaneyê dîrokî berhemên hêja ye.

Ev xebat; destpêk, sê beşên sereke û bi encamê ve hatîye amadekirin. Di beşa destpêkê ya lêkolînê de, armanc, sînor, rêbaz û çavkanîyên lêkolînê û pirsgerêkên ku ji hêla hin têgeh û têgînên ku lêkolînê pêk tînin ve hatine vegotin. Di vê beşê de, mijarên sereke yê paşxaneyê lêkolînê dê bînin ronîkirin. Bi taybetî di edebîyata kurdî de têgeha çîrokê, dîroka çîroka kurdî, çîroknivîs û berhemên wan, li gorî erdnîgarî û serdeman, bi berfirehî hatin lêkolînkirin.

Di beşa yekem a lêkolînê de; li ser taybetmendîyên bingeîn ên edebîyata kurdî ya qonaxa Sovyetê û çîroknûsîya kurdî ya li qonaxa Sovyetê agahî hatin dayîn. Bi vî awayî jî şert û mercên paşxaneyê dîrokî ya çîroknûsîya Emerîkê Serdar û têgihiştina wî ya çîrokê derket holê.

Di beşa duyem de jîyan û berhemên; rojnamevan, rexnegir, wergêr û çîroknûsê edebîyata kurdî Emerîkê Serdar hatin danasîn. Di vê beşê de taybetmendîyên berhemên Emerîkê Serdar û taybetîyên bingeîn ên çîroknûsîya nivîskarî hatin eşkerekirin. Pênc pirtûkên çîrokan, ên ku nivîskar bi edebîyata kurdî, çanda kurdî û bîranîyên ji zarokatîya xwe ve hilberandine, hem bi mijarên xwe û hem jî bi hêmanên teknîkî ve hatine lêkolînkirin. Ziman û hêmanên din ên vegotinê; bi mînakên ji metnên çîrokan ve hatin nirxandin.

Di beşa sêyem de, analîza berhemên Emerike Serdar yê *Destê Dê, Êdî Dereng Bû, Dengê Dil, Gundê Me û Hisreta Emir* bi hêmanên xwe yê tematîk ve hatine lêkolînkirin. Mijarên ku di pirtûkên çîrokan de hatine destnîşankirin di sê sernavên sereke yê civakî, polîtîk û takekesî de hatine dabeşkirin. Ravekirin û dîyarkirina temayan de, me ji metnên çîrokan gelek jêgirtin bi kar anîn. Hate fêmkirin ku nivîskar bi taybetî bi bîranînên xwe yê zarokatîyê ve li derdora hêmanên çanda kurdî û erdnîgarîya ku lê ji dayik bûye û lê mezin bûye cîhaneke çîrokan ava kirîye. Hêza çavdêrîyê û vegotina realîst a nivîskar girîngtirîn alîyên wî ne ku wî di çîroknûsîya kurdî de dike nivîskarekî hêja. Mijarên ku Emerike Serdar di metnên çîrokên xwe de bi kar anîye li ber çavan bê girtin, dîyar dibe ku bi taybetî, bi hêza xwe ya çavdêrîyê û vegotina realîst a di nivîsan de dikare di çîroknûsîya kurdî de weku nivîskarekî serketî cih digire.

Di amadekirina vê xebatê de hevkarî û piştgirîya gelek kesan çêbû. Ewîl divê navê Dr. Remezan ALAN bîr bînim. Mijara vê tezê ji alîyê mamoste ve hate peşnîyazkirin. Mamoste di nava hemû şert û mercan de xwe ji xebatên kurdolojîyê neda alî û bi pêşnîyarên xwe ve alîkarîya min kir. Her wiha keça nivîskar Emerîkê SERDAR birêz Nûrê SERDARYAN (Nûra Emerîk) û ji zanîngeha Yerevanê Dr. Tereza I. AMRYAN jî gelek alîkarî dane vê xabetê. Ji bona rênîşandayîn û alîkarîya şewirmendê tezê Doç. Dr. Osman ASLANOĞLU spas dikim. Ji bo pêşnîyaz, rexne, serastkirin û tevkarîyên wan spas ji bo endamên jurîya tezê Prof. Dr. Hayreddin KIZIL, Doç. Dr. Hacı ÖNEN, Doç. Dr. Mustafa ASLAN, Dr. Öğr. Ü. İlyas SUVAĞCI.

Amadekirina tezê de bi nêrîn û tevkarîya xwe, Prof. Dr. Seyit Battal UĞURLU, Dr. Öğr. Ü. Bilal DEMİR, Dr. Öğr. Ü. Yakup AYKAÇ, Dr. Ümran ALTINKILIÇ gelek alîkarî dane min. Spasîya wan dikim.

Sinan ÇAKAR
Wan, 2023

KURTE

Çîrok, di edebîyatê de yek ji metnên honakî ye û di edebîyata cîhanê de xwedîyê paşxaneyêke dîrokî ye. Ji alîyê gelek nivîskaran ve hatîye nivîsîn û bi vî awayî jî edebîyata cîhanê de bi cureyên xwe ve deng vedaye. Her wiha çîrok weku çeşneke edebî bûye cîyê vekolînan. Di edebîyata kurdî de jî çeşna çîrokê, di destpêkê de her çiqas bi gumreh destpênekiribe jî; di deverên ji hev cihê de hatîye afirandin û bi vî awayî jî pêş ketîye. Çîroka kurdî di deverên weku Tirkîye, Sûrîye, Lubnan, Iraq, Sovyet û Ewropayê belav bûye. Lêkoler, di berhemên çîrokî de hêmanên teknîkî, mijar û temayan wê nîrxandine. Em ê jî di teza xwe de jîyan û çîroknûsîya nivîskar Emerîkê Serdar binîrxînin. Emerîkê Serdar yek ji çîroknûsên edebîyata kurdî ya serdema Sovyetê ye. Me di vê tezê de berhemên Emerîkê Serdar yên çîrokî, *Destê Dê* (1974/2015), *Êdî Dereng Bû* (1979/2015), *Dengê Dil* (1985/2015), *Gundê Me* (2006) û *Hisreta Emir* (2018) nîrxandin û analîz kirin. Me çîrokên Emerîkê Serdar li gorî pîvanên tematîk dabeş kirin û temayên wan yên sereke dîyar kirin û her wiha jî ev tema li gorî hin taybetmendîyên wan şîrove kirin û çîrokên nivîskar di pêwendîya jîyana nivîskar de dîyar kirin.

Peyvên Sereke: Çîrok, Çîroka Kurdî, Edebîyata Kurdî ya Sovyetê, Emerîkê Serdar, Temayên Çîrokan.

ÖZET

Edebiyatın kurgusal türlerinden biri de öyküdür. Dünya edebiyatında öykü tarihsel bir geçmişe sahiptir. Dünya edebiyatında çokça yazar tarafından yazılmış ve kendine has türlere sahiptir. Bu yönüyle de bir edebi tür olarak öykü, çalışmalara konu olmuştur. Kürt edebiyatında başlangıçta her ne kadar güçlü bir şekilde ortaya çıkmamışsa bile; birbirinden farklı coğrafyalarda serpilmiş, gelişmiştir. Kürt öykücülüğü Türkiye, Suriye, Irak, eski Sovyetler Birliği ve Avrupa'ya yayılım göstermiştir. Araştırmacılar öykü metinlerini konu, tema ve teknik unsurlar yönünden incelemişlerdir. Biz de bu çalışmamızda Emerîkê Serdar'ın yaşamı ve öykülerini inceleyeceğiz. Emerîkê Serdar Sovyet sahası Kürt öykücülerinden biridir. Bu çalışmamızda Emerîkê Serdar'ın öykü kitapları; *Destê Dê* (1974/2015), *Êdî Dereng Bû* (1979/2015), *Dengê Dil* (1985/2015), *Gundê Me* (2006) û *Hisreta Emir* (2018) analiz edilip incelenmiştir. Çalışmamızda Emerîkê Serdar'ın öyküleri tematik açıdan incelenmiştir. Çalışmamızda Emerîkê Serdar'ın öyküleri tematik ölçülere göre sınıflandırılmış ve özelliklerine göre analiz edilmiştir. Tematik incelemenin yanı sıra Emerîkê Serdar'ın öyküleri teknik unsurlar bakımından da incelenmiştir. Öyküler yazarın yaşam öyküsü paralelinde de değerlendirilmeye tabi tutulmuştur.

Anahtar Kelimeler: Öykü, Kürt Öykücülüğü, Sovyet Dönemi Kürt Edebiyatı, Emerîkê Serdar, Öykülerde Tema.

ABSTRACT

One of the fictional genres of literature is the story. The story has a historical background in world literature. It has been written by many authors in world literature and has its own unique genres. In this respect, the short story as a literary genre has been the subject of studies. Even though it did not emerge strongly in Kurdish literature at the beginning, it has flourished and developed in different geographies. Kurdish storytelling has spread to Turkey, Syria, Iraq, the former Soviet Union and Europe. Researchers have analysed the story texts in terms of subject, theme and technical elements. In this study, we will analyse the life and stories of Emerikê Serdar. Emerikê Serdar is one of the Kurdish storytellers of the Soviet field. In this study, Emerikê Serdar's story books; *Destê Dê* (1974/2015), *Êdî Dereng Bû* (1979/2015), *Dengê Dil* (1985/2015), *Gundê Me* (2006) û *Hisreta Emir* (2018) were analysed and examined. In our study, Emerikê Serdar's stories were analysed thematically. In our study, Emerikê Serdar's stories were classified according to thematic criteria and analysed according to their characteristics. In addition to thematic analysis, Emerikê Serdar's stories were also analysed in terms of technical elements. The stories were also analysed in parallel with the author's life story.

Keywords: Story, Kurdish Short Story, Kurdish Literature of the Soviet Period, Emerikê Serdar, Theme of Short Story.

NAVEROK

Rûpel

PÊŞGOTIN	I
KURTE	III
ÖZET	IV
ABSTRACT	V
NAVEROK	VI
KURTEBÊJE	IX
DESTPÊK	1
1. MIJAR Û SÎNORÊN TEZÊ	1
2. ARMANC Û GIRINGÎYA TEZÊ	1
3. RÊBAZA TEZÊ	2
4. ASTENGÎYÊN TEZÊ	3
5. ÇARÇOVEYEKE TÊGIHÎ LI SER ÇÎROKÊ	4
5.1. Çîrok	4
5.2. Astengîyên li Pêşîya Nîvîskar û Çîroknûsiya Kurdî	9
5.3. Pênasekirin û Gengeşîyên li ser Navlêkirina Çîroka Kurdî ya Modern	11
5.4. Bandora Kovar û Rojnameyan li ser Çîroka Kurdî	15
5.5. Kurtenêrîneke Giştî li Çîroka Kurdî	23

BEŞA YEKEM

1.1 EDEBÎYATA KURDÎ YA QONAXA SOVYETÊ	37
1.1.1 Perwerdeya bi Kurdî li Ermenistana Sovyetê	37
1.1.2 Danasîneke Giştî li ser Edebîyata Kurdî ya Sovyetê	40
1.1.3 Qonaxên Edebîyata Kurdî li Sovyetê	44
1.1.3.1 Qonaxa Yekem: Destpêk (1920-1937)	46
1.1.3.2 Qonaxa Duyem: Rawestan (1937-1955)	48

1.1.3.3 Qonaxa Sêyem: Zêrîn (1955-1991).....	49
--	----

BEŞA DUYEM

2.1 EMERÎKÊ SERDAR Û ÇÎROKNÛSÎYA WÎ.....	55
2.1. Jîyana Emerîkê Serdar.....	55
2.2 Berhemên Emerîkê Serdar.....	59
2.3 Nêrînên Emerîkê Serdar Der barê Edebîyat û Çîrokê de	61
2.3.1 Rexne di Nivîskarîya Emerîkê Serdar de	64
2.4 Çîroknûsîya Emerîkê Serdar	68
2.5 Şopên Jînenîgarîya Emerîkê Serdar di Çîroknûsîya Wî de	75
2.2 HÊMANÊN TEKNÎKÎ DI ÇÎROKÊN EMERÎKÊ SERDAR DE	87
2.2.1 Ziman	87
2.2.2 Qadroya Lehengan	91
2.2.3 Mekan.....	96
2.2.4 Dem.....	101

BEŞA SÊYEM

3.1 TEMA DI ÇÎROKÊN EMERÎKÊ SERDAR DE.....	104
3.1.1 Temayên Civakî.....	104
3.1.1.1 Çand û Jîyana Kurdan	104
3.1.1.2 Berawirdkirina Jîyana Berî Şoreşa Cotmehê û Piştî Wê.....	113
3.1.1.3 Rexneya Baviksalarîyê.....	118
3.1.1.4 Jin	122
3.1.1.5 Feqîrî	127
3.1.1.6 Dîn.....	130
3.2 TEMAYÊN POLÎTÎK.....	134
3.2.1 Şer	134
3.2.2 Netewperwerî	151
3.2.3 Têkilîyên Kurd û Ermenan.....	158
3.2.4 Kolxoz	163

3.3	TEMAYËN TAKEKESÎ.....	167
3.3.1	Dayîk.....	167
3.3.2	Bav	179
3.3.3	Evîn	184
	ENCAM.....	189
	ÇAVKANÎ.....	194
	PÊVEK.....	203
	GENİŞLETİLMİŞ TÜRKÇE ÖZET	208



KURTEBÊJE

Bnr.	Binêre
H.	Hejmar
Hwd.	Her weku din
R.	Rûpel
Vgz.	Veguhêzer
YKSS	Yekîtiya Komarên Sovyeta Sosyalîst
Amd.	Amedekar
Çev.	Çeviren
Ed.	Editor
Wer.	Werger

DESTPÊK

1. MIJAR Û SÎNORÊN TEZÊ

Em ê di destpêka lêkolîna xwe de bi awayekî giştî pênaseya çîrokê bikin û pêşengên vê çeşna edebî dîyar bikin. Di vê çarçoveyê de gengeşî û arîşeyên pênasekirina çîroka kurdî jî dê bên dîyarkirin. Di peydabûna çîroka kurdî de rol û karîgerîya kovargerî û rojnamegerîyê û astengîyên li pêşîya çîroknûsîya kurdî jî dê bên nirxandin. Di edebîyata kurdî de metnên ewil û çîroknûsên pêşeng ên serdema ewil dê di lêkolînê de bên danasîn. Di vê çarçoveyê de bingeha teza me jî dê li ser jîyan û çîroknûsîya Emerîkê Serdar be. Xebata me dê her wiha bi dîrokçeya çîroka kurdî û jîyan û çîroknûsîya Emerîkê Serdar ve sînardarkirî be.

Ev xebat li ser çar pirtûkên nivîskar (*Destê Dê (2015)*, *Êdî Dereng Bû (2015)*, *Dengê Dil (2015)*, *Hisreta Emir (2018)* ên li tirkîyeyê hatine weşandin de hatîye kirin. Ji bilî van berheman, me berhema bi sernavê *Gundê Me (2006)* jî weku word di lêkolînê de bi cih kir û bi tevahî 135 çîrok hatine analîzkirin.

2. ARMANC Û GIRINGÎYA TEZÊ

Çîroka kurdî ji ber ku di erdnîgarîyeke berfireh de belav bûye, berhemên tîn afirandin hin caran nagihjin deverên din. Ev yek jî di geşedana çîroka kurdî de dibe astengîyek. Lewra nivîskar ji tecrûbe û şewazên hev bêpar dimînin. Ev yek heman demê, li pêşîya xebatkaran jî dibe astengîyek. Ji ber vê çendê jî çîroka kurdî li her deverê ji hev cihê hatîye pênasekirin. Di vê xebata xwe de jî em ê van gengeşîyên pênasekirinê di çorçeveyeke edebî de binirxînin û pênaseyên ji hev cihê jî destnîşan bikin. Ji xeynî vê yekê jî weku çîroknûsekî serdema qonaxa Sovyetê, cihê Emerîkê Serdar dê bê destnîşan kirin.

Emerîkê Serdar bi pênc berhemên xwe yên çîrokî û bi cîyawazîya şeweya xwe ve di çîroknûsîya kurdî de; nemaze di qonaxa Sovyetê de bi nav û deng e. Lê ji ber hin sedemên ku me li jor destnîşan kirin, Emerîkê Serdar û çîroknûsîya wî têra xwe nehatîye vekolîn. Ji bilî gotareke Zülküf Ergün hema bibêje qet nebûye mijara lêkolînekê. Bi vî awayî jî lêkolîna me di vî warî de bi angaştî dagirtina vê valahîyê hatîye amadekirin. Armanca vê xebatê aşkerekirina çîroknûsîya Emerîkê Serdar e. Di warê Kurdolojîyê de jî li ser mijara çîrok û temayên çîroknûsîya Emerîkê Serdar, mîna keke lêkolîne pêşkeş dike. Di vê çarçoveyê de, danasîna têgeha çîrokê jî armanc dike û di edebîyata kurdî de geşedana çîrokê dinirxîne. Armanca sereke jî ew e ku Emerîkê Serdar, weku çîroknûsekî kurd, bi nasnameya wî ya çîroknûsîyê hem di warê Kurdolojîyê de hem jî ji derdorên edebîyata kurdî re bide nasîn.

3. RÊBAZA TEZÊ

Me di vê xebatê de analîzkirina metnan weku metod hilbijart. Ji bona vê yekê jî me ji metnên çîrokan sûd wergirt û çîrok li gorî teknîkên edebî ve hem ji hêla hêmanên teknîkî hem jî ji hêla temayan ve nirxandin. Ji bona analîzkirina metnan; terma çîrokê, dîroka çîroka kurdî, çîroka kurdî ya Sovyetê û jîyana nivîskar a di pêwendîya hev de hatine nirxandin. Di xebatê de pêşîyê li ser çîroka kurdî nirxandinên dîrokî û metnî hatine kirin. Pişt re jî geşedana çîroka kurdî ya qada Sovyetê hate nirxandin. Cihê Emerîkê Serdar di çarçoveya qonaxa çîroka Sovyetê de weku çîroknûs hate dîyarkirin. Metnên çîrokî di serî de ji hêla analîzkirina metnan û hêmanên teknîkî ve û pişt re jî, em li ser ziman, leheng, mekan û demê rawestîyan. Di çîrokan de bi rêya tema û hêmanên teknîkî, şopên jînenîgarîya nivîskar di pêwendîya metnên çîrokan, hatine kifşkirin. Her wiha her berhem û çîrok ji hêla taybetmendîyên xwe ve hatine nirxandin û metn jî li gorî van dîyardayan hatine analîzkirin. Divê bê gotin ku di analîzkirina çîrokan de metnên dirêj û metnên kurt bi hev re hatine nirxandin, di ravekirina metnan de gelek jêgirtin hatine kirin. Her wiha li ser rêbazên bingeîn ên dîrok, civaknasî û psîkolojîyê jî nirxandin hatine kirin. Lewra jî me di xebatê de metoda navdîsîplînî şopand.

4. ASTENGÎYÊN TEZÊ

Dema me lêkolîna xwe kir, me dît ku di qada çîroknûsîya kurdî de ji hêla lîteratûrê ve kêmasîyên mezin hene. Di serî de mirov dikare bibêje di vê qade de hîn jî arîşeya pênasekirinê berdewam e, ya din, hîn jî bi rêkûpêk dîroka çîroka kurdî hemû awayan ve nehatîye dîyarkirin. Lewra jî di çareserkirina xebatê de dabînkirina çavkanî û berhemên zehmetîyek bû. Çîroka kurdî li erdnîgarîyeke mezin berbelav bûye û li her herêmê li gorî taybetmendîyên xwe hatîye afirandin, loma vê yekê nehiştîye ku yekrengîyek pêk were. Sedemeke vê yekê jî alfabe û zaravayên cuda ye. Lewra çîroka kurdî heta vê dawîyê bi sê alfabeyên cuda û bi sê zaravayan ve dihate nivîsîn. Niha alfabeya kîrîlî hêz û karîgerîya xwe ya berê ji desr daye; lê belê hîna jî berhemên çîrokî bi alfabeya aramî û latînî tên nivîsîn. Ji ber van sedeman jî destxistina berhem û xebatên zarava û alfabeyên cuda weku zehmeteke mezin kete pêşîya me. Hin berhemên çîrokî di çavkanîyan de weku nav derbas dibin lê mixabin tu derê çapa wan nehate peyda kirin. Tunebûna sazî yan jî pirtûkxaneyeyeke giştî jî ev arîşe zehmettir kir.

Dîsa di peywenda jîyana Emerîkê Serdar û metnên wî de me dît ku li ser nivîskar kêr xebat hatine kirin û bi xwe jî der barê vê yekê de zêde hûrgilîyan nade der. Ev yek jî di nirxandina metnan de zehmetîyeke din bû. Di hin çavkanîyan de berhemên nivîskar ji hev cihê hatine kifşkirin. Ev jî di xebatê de weku arîşeyeke din bû ku em lê rast hatin. Lewra di gelek çavkanîyan de berhemên nivîskar yên werger jî; weku berhemeke cuda hatibûn dîyarkirin. Ev yek jî di destpêka xebatê de alozîyeke sereke bû. Zehmetîyeke lêkolîna me jî bidestxistina hin berhemên nivîskar bû. Berhema nivîskar ya bi navê *Gundê Me* di sala 2006an li Erîvanê bi kurdî û tîpên latînî hatîye çapkirin. Lê mixabin her çiqas me hewl da jî me çapa vê berhemê peyda nekir û ji ber vê yekê jî me forma wê ya li ser rûpela nivîskar ya înternetê wergirt û berhem bi vî awayî di xebata xwe de bi cih kir.

5. ÇARÇOVEYEKE TÊGIHÎ LI SER ÇÎROKÊ

5.1. Çîrok

Her çiqas li ser pênasekirina çîrokê pênaseyeke hevpar nebe jî weku çeşneke edebî xalên wê yên bingeîn hatine kifşkirin. Bo nimûne çîroknûsê Amerîkayî Edgar Allan Poe (1809-1849), kurtbûn û dirêjbûna metna çîrokê, bi maweya xwendina wê ve girê dide. Li gorî Edgar Allan Poe divê metna çîrokê kurt be û di maweya nîv saetê, saetekê yan jî herî zêde du saeten de bê xwendin. Ji peyvên nepêwîst paqijkirî û sivik, di honandina wê de jî bandoreke yekane hebe. Li gorî Poe, divê di metna çîrokê de yek peyveke zêde neyê bikaranîn (Poe, 2009: 15-17). Poe her hiwa di nivîsîna metna çîrokê de rêyeke bipergal derdixe pêş. Ev pênasekirin jî dişibe pênasekirina Anton Çehov (1860-1904). Li gorî Çehov: “Heke di çîrokekê de tivingek bi dardekirî be, berî çîrok biqede, divê ew tiving biteqe.” (vgz. Cewerî, 2018: 32). Li gorî van nêrînên Poe û Çehov; çeşna çîrokê bi sadebûn û vegotineke têr û tijî ve ji çeşnên din yên edebî cihê dibe.

Mirovahîyê di seranserî dîrokê de xwestîye ku serpêhatîya jîyana xwe vebêje. Mirovan bi vê yekê xwestine nêrîn û tecrûbeyên xwe yên jîyanê ji bo nifşên paşerojê veguhêzin. Em pê haydar nînin ka gelo çîroka yekem kîngê ji alîyê kî ve hatîye vegotin, yan jî neqilkirin. Lê tiştê em pê agahdar in ew e ku çîrok bi qasî dîroka mirovahîyê temen dirêj e (Boynukara: 2000: 187). Der barê çêbûna çîroka ewil a mirovan de gengeşî pir in. Li gel vê em dizanin ku çîroka pêşî ya hatîye veguhastin çîroka xuliqandina ademîzadan e. Her wiha çîrçîrok, çîrokên gelêrî, destan, efsane û metelok bi arezûya mirovan ya neqilkirina jîyana wan a takekesî û civakî dest pê kirîye. Çîroka modern jî bingeha xwe ji vê tecrûbeyê digire û bi mebesteke edebî û şiklekî sêwirandî derketîye holê.

Emin Özdemir, di berhema xwe ya bi navê *Yazinsal Türler*’ê de dibeje ku “nivîseke kurt a ku bi bûyerên pêkhatî yan jî pêkhatina wan pêkan be” mirov dikare weku çîrok biwesfîne (Özdemir, 1999: 221). Fethi Bolayir, qewimîna bûyerê, leheng, cih û mekanê bûyerê û kurtbûna metnê weku taybetmendîyên çîrokê destnîşan dike (Bolayir, 1998: 195). Li gorî nivîskar û çîroknûsê Amerîkayî H. E. Bates (1905-

1974) dîroka çîrokê bi qasî dîroka mirovahîyê dirêj e. Bates, her wiha gotinê tîne li ser mijara birayên Habîl û Kabîl û van her du birayan weku du lehengên çîrokê dide naskirin. Lê li hemberî vê yekê li gori Bates dîroka çîroka modern hewqas jî ne dirêj e (Bates, 2013: 7). A.J.J. Ratcliff jî di heman qenaetê de ye. Li gorî Ratcliff jî destpêka dîroka çîroka modern, zêde dirêj nîne. Li ser pênasekirina çîrokê jî Ratcliff wiha dibêje; “çîrok birêkûpêkkirina hin bûyerên bêserûber wêdetir e. Çîrok vegotîneke hunerî dihevwîne”. Li ser mijarê Elizabeth Bowen gaveke pêşdetir diavejê û angaşt dike ku çîrok aîdê vê sedsalê ye û çîrok, “zaroka vê sed salê ye” (vgz. Bates, 2013: 7).

Mîna ku hat gotin di pênasekirina çîrokê de nêrînên ji hev cihê derketine holê. Li ser mijarê her nivîskar û lêkolerek li gorî nêrîna xwe ya edebî nêzikatî lê kirîye û nirxandîye. Wells dibêje “çîrok, cureyeke sêwirandîye û di maweyeke niv saetê de bê xwendin.” Li gorî Poe, divê di nava sêwirandina kompozîsyona çîrokê de peyveke zêde û nelazim tune be. Çîrok metneke sêwirandina demê ye, ya ku mirov şahidîya wê dike. Di nivîskarîya Çexov de jî çîrok metneke bê ser û bê bin e (Bates, 2013: 9-10). Necîp Tosun jî çîrokê li ser şopa Çexov pênase dike û li gorî wî; sînoren çîrokê ne dîyar in (Tosun, 2018: 7).

Çîrok di şaristanîyên rojhilat û rojava de hem bi awayê devkî û hem jî bi awayê nivîskî pir berbelav bûye û heta roja îro hatîye. Tê angaştîkirin ku di çanda rojava de mîtolojîya Yewnan, Tewrat û Încîl; di çanda rojhilatê de çanda Hînd û Ereban li ser geşedana çîrokê bibandor bûne (Kolcu, 2015: 16). Çîrok her wiha paşxaneyê xwe jî dîroka mirovahîyê wergirtîye. Metnên dîni li alîyekî û li alîyê din jî metnên mîtolojîk di rûdana çîrokê de xwedîyê cihekî taybet in. Mirov dikare bibêje çîrok encama ezmûna mirovan a serborîya jîyanê ye.

Hin kesan serpehatîyên nêçîrê, kesên oldar jî meseleya xuliqandinê vegêrane. Ev vegêran bi vî şiklî heta Serdema Ronesans û Şoreşa Pîşesazîyê dom kirîye lê piştî wan vegêrana çîrokan, şiklekî hunerî wergirtîye û bi demê re her çûye belav bûye, pêşketîye (Mustefa, 2004: 73). Her wiha, cureyê çîrokê jî aliyê paşxaneyê xwe ve jî çavkanîyên cihê pêk hatîye û bi demê re jî geşedanên mirovan û teknîkî sûd wergirtîye, heta îro jî dom kirîye.

Çîroka modern bi demê re, li erdnîgarîyên cuda cuda, bi şêweyên cihê pêşketîye, dewlemendtir bûye, xwe nû kirîye û herî dawî di edebîyatê de bi serê xwe weku cureyeke edebî xwe îspat kirîye. Bi van taybetmendîyên xwe ve çîrokê weku janrekî serbixwe di edebîyatê de cihê xwe qayîm kirîye (Tosun, 2018: 7).

Her wiha di meseleya pênasekirina çîrokê de rêyeke dîtir a ku pir zêde tê bikaranîn ev e: Ji bo sînoren çîrokê bîn diyarkirin û taybetiyên wê bîn destnîşankirin tim bi cureyê romanê re hatiye berawirdkirin. Ev her du celeb nivîs jî li ser hîmê vegotinê tîn honandin. Di vê pênasekirinê de çîrok ji hûrgilîyên romanê tê paqijkirin. Nîrxandinên bi vî awayî dibin sedema hin xetereyan. Her çend çîrokê di nava demeke dirêj de teşe girtibe jî, çîrok ji romanê kevintir e. Ji bilî vê, çîrok jî mîna hemû cureyên edebî xwedî hin taybetmendîyan e. Çîrok, di nava formata xwe ya sînordarkirî de, li gorî şîyana nivîskar, dihêle ku nivîskar gelek tiştên nûjen biafirîne. Dîsa mirov dikare bibêje çîrok ji ber binyada xwe vegotineke hosteyane ferz dike. Ji ber vê taybetmendîya xwe jî çîrok, di nava xwe de, nikare xeletîyan bihewîne. Ji aliyê din ve jî hem ji ber hevşêwebûna vegotinê û hem jî di çarçoveya honandina bûyerê de çîrok û roman xwedî hin tiştên hevpar in. Cîwayazîya wan a di vê derê de bi hin xalên sereke derdikeve pêş. Di romanê de ji yekê zêdetir bûyer, kes û rewş tîn vegotin. Lê berovajî romanê di çîrokê de ev taybetmendî sînordarkirî ye. Bi vî awayî mirov dikare bibêje; “ger roman xanûmaneke pir tebeqe be, çîrok xanîyekî musteqîl e.” (Karataş, 2004: 202). Li ser cudahî û wekhevîya çîrok û romanê pênaseya Stendhal jî nêzikê pênaseya Karataş e. Li gorî Stendhal “Roman neynîkek e ku rê bi rê li caddeyê (jîyanê) tê gerandin.” Stendhal; çîrokê jî wiha pênase dike: “çîrok jî pencereyek e ku em di wê pencereyê de li jîyanê temaşe dikin.” (vgz. Gevêrî, 2012: 15)

Dema ku taybetmendîyên çeşna çîrokê bîn diyarkirin, weku tê dîtin; piranî bi romanê re tê berawirdkirin. Çîrok ji romanê kurttir e ji hêla hûrgilîyan ve jî ji romanê kêmtir kitekitan dihewîne. Bi vî awayî cudahîya roman û çîrokê derdikeve holê. Lê belê di cihêbûna roman û çîrokê de hin hêmanên din jî hene: Berîya her tiştî çîrok ji romanê qedîmtir e. Jêderka çîrokê digihîje metnên mîtolojîk (Boynukara, 2005: 132).

Li gorî Ferîdûn Andaç, jêderka çîrokê çîrçîrok û metelok in; jêderka romanê jî vegotinên geşt û dîrokî ne (Andaç, 2008: 111). Piştî ku çîrok weku metneke modern pêş ket, zêdetir jî ev piştî sedsala 20an pêk hat, ji hêla vegotin û zimanê ve dişibînin helbestê (Gümüş, 2003: 44). Ji ber taybetmendîya xwendina metnê ve jî bi sinemayê re tê pêwendîdarkirin (Taylor, 2009: 42). Çîrok ji alîyê hecmê ve her çiqas kurt be jî dinyayeke fireh radixîne pêşîya xwîneran. Li gorî hin nêrînan jî ne hewce ye ku mirov metnên edebî dabeş bike. Çîrok, xwesteka şayesandina bûyerekê an jî demekê, ji jîyana mirovan e. Ji ber vê yekê jî nivîskar li gorî arezûya dilê xwe vê yekê tîne ziman (Akbal, 1996: 4).

Li gorî Necip Tosun (2023: 13) di cîhanê de her tişt li ser “çîrokê” hatîye avakirin. Her wiha mirov jî ji çîrokan pêk tên û bi ciwandina çîrokan, cîhan saz dibe. Mirov ji bo bikaribe di derdora xwe de bibe xwedîyê kesayet xwe dispêre çîrokan û jîyanê jî weku çîrokekê şirove dike. Mirov, di her temenekî xwe de xwedîyê çîrokeke cihê ye. Di nava keftûlefa jîyanê de têkilîyên mirovan jî li gorî çîroka wan ya takekesî teşe digirin. Danûstandina mirovan a bi jîyanê re jî dîsa li gorî çîroka wan ava dibe. Çîrokên hevterîb, mirovan çêtir nêzîkî hev dike û ev yek jî di jîyanê de dibe sedema têkilîyên xurt û germ. Lê dijberî vê yekê; çîroka mirovan çî qasî ji hev dûr û ji hev cihê be, mirov jî ew qasî ji hev dûr û ji hev cihê dibin. Bi vî awayî em dikarin bibêjin çîrok ji jîyana mirovan ve têkildar e û jîyanê jî, ji xwe re dike palpişt. Her wiha metneke honandî ya çîrokê hewce ye xwedî peyamekê be û diyardeyên zanistî yê vê çeşna jî di hundirê xwe de bihewîne.

Nivîskar Will Storr pêwendîya mirov û çîrokan gaveke pêşdetir dibe û dibêje; “Mirov ji bona çîrokan hatine afirandin.” Lewra divê mirov di jîyanê de li ser vê armancê bimeşe da ku bikaribe armanca xulikandina xwe ya eslî pêk bîne (Storr, 2020: 226). Li gorî Ömer Lekesiz jî, mirov di nava çîrokekê de tîne dinyayê û bi vegotina çîrokên derdora xwe ve mezin dibin û dûv re jî dibin xwedîyê çîrok(ên)a xwe (Şakar, 2018: 15).

Li gorî nêrînên giştî çeşna çîrokê, weku “çîroka rewşî” û “çîroka bûyerî” tê dabeşkirin. Çîroka bûyerî bi Maupassantê frensî ve tê naskirin û di nava demekê xwezayî de diherike, li cem xwenedevan meraqê pêk tîne û xwedîyê formateke cuda

ye. Di vê şêwazê de çîrok li gorî beşên raxistin, girêk û çareserîyê tên honandin. Di şêwaza Maupassant de xîmê çîrokê ji “bûyerê” pêk tê. Şêwaza Maupassant di dinyayê de weku “çîroka klasîk” jî nav daye. Çîroka rewşî jî bi şêwaza Çexovê rûsî ve tê pênasekirin. Di şêwaza Çexovî de hin rewşên mirovan tên pêşkêşkirin. Lê li gorî şêwaza Maupassant, di şêwaza Çexov de bûyer cîyekî taybet nagire (Ozdemîr, 1999: 232-246).

Di edebîyata cîhanê de nimûneyên ewil yên çîroka modern çîrokên Boccacîo tên qebûl kirin. Boccacîo berhema xwe ya çîrokî *Decameron* di sedsala 14an de nivîsîye. Ev metnên bi vî celebî ji hêla binyad û ziman ve li gorî serdema xwe metnên pêşketî ne. Piştî Boccacîo li Frensayê Margaret de Navarre bi navê *Heptameron* û li Îngilistanê Chaucer bi navê *Canterbury Tales* li ser heman şêwazê nivîsandine. Çîrokên *Hezar û Yek Şev* jî nimûneyên pêşî yên çeşna çîrokê tên pejirandin. Di navbeyna sedsalên şazdeh û hejdehan de ev celeb nivîs zêde nayê dîtîn. Di vê serdemê de belkî mirov dikare metnên Cervantes li ser vê celebê pênase bike. Çîrok, li rojava di sedsala 18an de di nava geşedanekî mezin de bûye. Ev sedsal di heman demê de destpêbûna çeşna romanê ye jî (Boynukara, 2000: 189).

Lê qenaeta giştî ew e ku çeşna çîrokê di sedsala 19an de weku cureyeke serbixwe di qada edebîyatê de xwe daye qebûl kirin. Di vî warî de jî Edgar Alan Poe (1890-1849) weku damezrînêrê çîroka modern tê pejirandin. Ji bilî Poe, Guy de Maupassant (1850-1893) û Anton Çexov (1860-1904) weku du pêşengên din yên çeşna çîrokê ne (Şakar, 2018:9). Ji xeynî van her sê pêşengên çîrokê di sedsala 19an de li hêla Rûsyayê Aleksander Puşkîn (1799-1857) û Maksîm Gorkî (1868-1938) pirtûkên xwe yên çîrokan didin weşandin. Di vê sedsalê de li Amerîkayê Mark Twain (1835-1910), O. Henry (1862-1850), Somerset Maugham (1874-1965) Jack London (1876-1916) Katherîna Mansfield (1888-1923) û Ernest Hemîngway bi berhemên xwe ve pêşengîya çîrokê dikin. Li Îngîlîstanê James Joyce (1882-1941) û di edebîyata Çekyayê de jî Yaroslav Hašek (1883-1923) weku pêşengên çîrokê tên naskirin (Kolcu, 2015: 17).

Di edebîyata tirkî de jî nimûneyên ewil yên çeşna çîrokê di dawîya sedsala 19an de tên weşandin. “Letaîfî Rîvayat” di sala 1870an de ji alîyê Ahmed Mîthat

Efendî (1844-1912) û *Küçük Şeyler* ji alîyê Şemsedîn Samî (1850-1904) ve di sala 1891an tîn nivîsîn (Şakar, 2018:9).

5.2. Astengîyên li Pêşîya Nîvîskar û Çîroknûsîya Kurdî

Rewşa kurdan ya sosyo-polîtîk bandoreke neyînî li edebîyata kurdî jî kirîye. Bi parçebûna kurdan û nebûna sazîyeke serbixwe re, ev neyînî her ku çûye kûrtir bûye. Yek jî sedemên derengmayîna çîroknûsîya kurdî jî bi bajarvanîyê ve girêdayî ye. Têkilîyeke xwezayî di navbeyna bajarvanî û edebîyata nivîskî de heye. Bi gotina Ergün: “Bajar, dewlet, şaristanî û nivîs çar unsûrên yekgirtî ne ku her yek ji bo yê din sedem û encamêkî siruştî ye.” Bajar di dîroka mirovahîyê de çavkanîya sereke ye ji bo şaristanî û pêşdeçûyînê. Li bajarvanî ji bo karên bazirganî û revebirina dezgehên dewletê hewcetîya nivîsê derketîye holê (Ergün, 2014: 51-52).

Di hêla edebîyata bajarvanîyê de kurd li gorî cînarên xwe dereng mane. Li gor Maruf Xeznedar li hêla edebîyatê berhema ewil ya kurdan Zembîlfiroş e û ev berhem jî di sed sala hevdehan de hatîye nivîsîn. Lê di nava ereban de sedsala dehan, li nav farisan de jî di sedsala yanzdehan de numûneyên ewil peyda bûne (vgz. Ergün, 2014: 68).

Bajar bi kozmopolîtîbûna xwe û hebûna derfetên weku matbaa, mekteb, kovar û rojnameyan ve cîyê şaristanîyê yê serekî ne (Alan, 2019: 19). Bi van derfetên xwe ve bajar ji bo edebîyatekê kamil navendên herî giring in. Dema ku em bipirsin gelo çima cara ewil numûneyên edebîyata kurdî ya modern li Stenbolê peyda bûne? Bersiva me wê demildest ev be ku; Stenbol weku paytexta Osmanîyan bi derfetên xwe yê bajarvanîyê ve ji bo kurdan jî navendek bûye.

Li ser astengîyên neserketina edebîyata kurdî ya sed sala bîstan ku Stenbolê peyda bûye, Remezan Alan (2019: 23-24) wiha dibêje; “ew rojname û kovarên wê serdemê ji ber derfetên aborî û hin meseleyên sîyasî emirkin in. Ser de jî di warê xwendinê de girseyeke mezin a kurdan di vê serdemê de nîne ku xebat û çalakîyên van kovar û rojnameyan bigihîje miraz û meqseda xwe.” Li hêla din jî her çi qas li Stenbolê rewşenbîrên kurd hebin û di warê hilberînîyê de çalak bin jî, di encamê de Stenbol ne bajarekî kurdan e û ji tiştên ku Stenbolê pêk tînin nagihin ber destê

girseyeke mezin a xwende. Ev jî dibe sedemeke din ku ev kovar û rojnameyên vê serdemê rola xwe ya sereke nikarin bi cî bînin.

Her çiqaş di peydabûna çîroka kurdî de derfetên baş hebin jî di geşbûn û pêşketina wê de jî gelek astengî derketine holê. Derçûna kovar û rojnameyên kurdî yên li Stenbolê ji bo metnên modern yên kurdî derfeteke gelek giring bû. Lê hem nêrîna sazîyên dewletê ya li hemberî kurdan hem jî destpêka Şerê Cîhanê yê Yekemîn mixabin ev derfet ji holê rakirin. Di destpêka vî şerî de rojname û kovarên kurdan hatin girtin gelek rewşenbîr û çalakvanan kurdan mecbûr man beşdarî şer bibin. Piştî komara nû hat damezirandin ev xebat sekinîn (Laleş, 2012: 369). Kurdên Stenbolê yên ku pêşengîya hizra kurdîtiyê û çapemenîya kurdî dikirin mecbûr man ji Stenbolê derbikevin. Vê jî karên ku salan e li Stenbolê pêk dihat nivco hişt û her wiha çîroknûsîya kurdî jî ji vê yekê para xwe girt û navbereke mecbûrî kete navê. Dîlawer Zeraq peydabûna çîroka kurdî ya li Stenbolê rengvedayî, ji bona çîroka kurdî weku xaleke neyînî dibîne. Ji ber ku ew ji rehên xwe yên geşedan û vejandinê dûr e (Zeraq, 2012: 483).

Dezavantajeke edebîyata kurdî ya din jî ew e ku ji xwe ra navendeke edebî peyda nekirîye. Ger em behsa edebîyata tirkî bikin Stenbol di modernîzebûna edebîyata tirkî de navendeke giring e. Lê belê mixabin ev tişt ji bona edebîyata kurdî pêk nehatîye. Ji ber nebûna navendeke edebî li erdnîgarîyên cuda cuda ji hev bêxeber reng vedaye. Ev jî bûye sedem ku têkilîyên nivîskarên kurd bi hev re çênebe û li ser meseleyên edebî nîqaş û nirxandinên edebî pêk neyên (Gümüş, 03.02.2006). Sedemeke vê yekê jî helbet kêşeya sînoran e. Kurd her ku ji hev parçe bûn, aloziyên ziman û edebîyatê jî mezintir bûn. Van sînoran jî rê nedaye ku xwîner, xwe bigihîne çîrokên parçeyên din. Ev arîşe piştî belavbûna Sovyetê mezintir û aloztir bûye (Tilermenî, 2022: 98).

Parçebûna kurdan bi xwe re parçebûna ziman û alfabeyan jî derxistîye holê. Bi sê alfabe û sê zaravayên sereke ve edebîyata kurdî di nava xwe de parçe parçe bûye. Vê yekê danûstandinên navbeyna nivîskar û rewşenbîrên kurdan asteng kirîye û hişmendîyeke hevpar pêk nehatîye. Vê rewşê nehiştîye rewşenbîr û nivîskar ji tecrûbeyên hev îstifade bikin (Kızılkaya, 2004: 10, Cewer, 2018: 11). Helbet

sedemên derengmayîne ne ev tenê ne. Sabir Reşîd vê derengmayînê di çarçoveya dewletbûnê de şirove dike. Li gorî nivîskar, nebûna sazîyên dewletê, tunebûna derfetên matbaayê jî sedemên vê derengmayînê ne (Reşîd, 2005: 54).

Astengî û arîşeyên edebîyata kurdî li Sovyetê jî berdewam bûne. Polîtîkayên Sovyetê yên li hemberî kurdan her wiha bandor li edebîyata kurdî jî kirîye. Her çî qas Şoreşa Cotmehê ji bona edebîyata kurdî derfetên mezin dabîn kiribe jî hin caran bi polîtîkayên cîyawaz ve rê li pêşîya edebîyatê girtîye. Rojnameya *Rêya Teze* weku organeke propagandayê ya komara Ermenistana Yekîtiya Sovyetê ye û bi kurdî derçûye. Rojname ji nava kurdên Sovyetê bigire heta Emerîka, Kanada û Ewropayê belav dibû. Lê belavkirina wê ya di nava kurdên Tirkîyê, Îran, Iraq û Sûrîyeyê de qedexa bû (Gültekin, 2016: 59).

Li gorî Mehmed Uzun (2010: 68) “Edebîyata Kurdî ya Sovyeta berê her çiqas bi temamî edebîyata mişextî neyê pênasakirin jî; dîsa jî ev edebîyat ji welat dûr hatîye afirandin. Sovyetan piştgirî li polîtîkayên Kemalîzmê kirine û her wiha li hemberî tevgerên edebî yên Kurdistan û Surîyê yên kurdî, bi guman tevgerîyane. Ev tevgerên edebî jî weku sîxûrtîya emperyalîst dîtîye. Lewra ji ber van dîyardayan edebîyata kurdî ya Sovyeta berê hatîye îzolekirin”.

Mirov dikare serdema Stalîn mîna astengîya herî mezin a li Sovyetê ya li pêşberî geşbûna edebîyata kurdî bide nîşandan ku di vê serdemê de rojnameya *Rêya Teze* tê girtin. Ne tenê *Rêya Teze* dibistanên kurdî jî tên girtin. Di navbeyna salên 1937-1955an, edebîyata kurdî ya qonaxa Sovyetê bi astengî û qedexekirineke mezin re rûbirû dimîne. Bikaranîna alfabeya kurdî ya latînî jî hingê tê qedexekirin.

5.3. Pênasekirin û Gengeşîyên li ser Navlêkirina Çîroka Kurdî ya Modern

Pênasekirina çîrokê di edebîyata cihanê de çawa ku bûyê cîyê nîqaşê her wiha di edebîyata kurdî de jî weku arîşeyekê derketîye holê. Li ser vê yekê hem ji alîyê çîroknûsan ve hem jî ji alîyê lêkolanan ve mijar hatîye nîrxandin. Lê digel van hewildanan jî li ser babetê pênasekirineke hevpar derneketîye holê.

Genre (Janr) ji alîyê etîmolojîyê ve bêjeyekî fransî ye û bingeha xwe ji zimanê grekî wergirtîye (Chandler, 2018: 16) Di pêşketina wêjeyê de nivîsîna metnên edebî û polînkirina wan weku du dîyardeyên sereke yên giring derdikevin pêş. Pîrhêlîya metnên edebî hêza wêjeyê xurtir dike. Xurtbûna metnên edebî jî bi pênasekirina wan ve girêdayî ye. Her metna edebî ji hêla têgih û termînolojîyê ve hewceyê pênasekirin û senifandinê ye. Ev pênasekirin ji bo tevlihevîya metnên edebî pir giring e. Ger em di çarçoveyeke bi vî rengî de li navlêkirin/pênasekirina çîroka kurdî binêrin em dê bibînin ku li ser vê babetê hîna jî gengeşî berdewam in û hîn jî pênasekirineke teqez nehatîye kirin.

Bêjeya çîrokê di zimanê kurdî de li hemberî peyva îngîlîzî ya “story”ê tê bikaranîn. “çîrok” weku çeşneke edebî di kurdî de em dikarin li hemberî peyva “öykü” ya tirkî jî bi kar bînin (Geverî, 2010-2011: 62). Peyva çîrokê weku peyva “qise” jî tê nivîsandin (Duskî, 2008: 710). Wek wateya xwe ya ferhengî jî çîrok bi tehrê devkî yan jî nivîskî vegêrana bûyerekê ye (Farqînî, 2013: 407).

Çîroka nivîskî ya modern çeşneke edebîyata modern e. Çawa ku di edebîyata kurdî de jî rû da li ser pênasekirina wê hin gengeşî derketine holê û ev gengeşî hîn jî bi berdewam in. Metna ewil a çîroka kurdî, bi sernavê “Çîrok”ê hatîye weşandin. Lê di kurdî de wateya çîrokê ya pêşîn çîrçîrok (masal) e. Ji ber vê yekê jî hin nivîskaran, ji bo cudahiyeke daynin nava vê pênasekirinê li şûna çîrokê peyva “kurteçîrokê”¹ ji bo metnên xwe tercîh kirine. Lê dîsa jî peyva “kurteçîrokê” di edebîyata kurdî berbelav nebûye û li hemberî peyva “kurteçîrok”ê, peyva “çîrok”ê zêdetir cihê xwe girtîye. Li gorî nivîskar Ayhan Gevêrî ev arîşe ne tenê di edebîyata kurdî de her wisa di wan edebîyatan de jî ku çavkanîya xwe ji kevneşopîya rojhilat wergirtine, arîşeyeke sereke ye (Geverî, 2010-2011: 62-63).

Di edebîyata kurdî de li ser pênasekirina çîrok/kurteçîrokê nêrînên ji hev cuda derketine holê. Di wêjeya kurdî de hem ji bo çîrokên gelêrî hem ji bo çîrçîrokan (masal) ev peyv tê bikaranîn. Hasan Kaya di xebata xwe ya li ser antolojîya çîrokên

¹ Bnr. Xalid Salih, **Kurteçîroka Kurdî Li Devera Behdînan 1960-2005z.** weş. Hawar, Duhok, 2010. Bnr. Dr. Abdulla Agrîn, **Karîgerî Bîrî Neteweyî le Geşesendîni Kurteçîrokî Kurdî Kurdistanî Iraq da,** weşanên zankoya Selaheddîn, Hewlêr.

kurdî de “çîrok”ê ji bona “çîrokên gelêrî” û “çîrçîrokan” bi kar tîne. Lê di şûna çêşna modern de, di şûna “öykü” ya tirkî de “kurteçîrokê” bi kar tîne (Kaya, 2005: 7).

Di xebatên ku li ser vê cureyê edebî hatine kirî de pênasayên ji hev cuda lêhatine kirin. Xebatên ku bi zimanê tirkî hatine nivîsîn de peyva “öykü” an jî hikâye (Bnr. Kaya, 2005; Kızılkaya, 2004); xebatên ku kurdî hatine amadekirin de jî peyva “çîrok” û “kurteçîrok”ê hatiye bikaranîn (Bnr. Cewerî, 2018, Duhokî, 2012) Her çiqas weku metneke modern neyê pejirandin jî Mela Mehmûdê Bazîdî di berhema xwe de peyva “hikayet”ê bi kar anîye. Ji hêla kurdên kevneSovyetê ev çêşn weku serhatî/serpêhatî hatiye bilêvkirin (Shakely, 1998: 8). Kurdên li Yekîtiya Sovyetan bi vî awayî navbeyna metnên gelêrî û metnên sêwirandî de cudahiyeke danîne. Dîsa em dibînin ku Wezîrê Nadîrî çîrokên xwe di berhema xwe ya bi navê *Nûbarê* de, bi sernavê “hikaye”yê daye ber çapê (Nadîrî, 2016: 20).

Li gorî nivîskar Yaqob Tîlmenî hewce ye çêşna çîrokê bi awayekî resen bête pênasakirin (Tîlmenî, 2015: 44, 2022: 96).

Divê ev pênasaya ‘çîrokanûjen’ be û min ev ramana xwe di gelek hevpeyvîn û gotûbêjan de jî ragihandibû xwînêran. Di vê meseleyê de hewldanên gelek çîroknûsan çêbû. Yanî di kurdî de digel ku pênasayên weku Xeberoşk, Metelok, Pêkenok, Dastan, Çîrok û Kurteçîrok hene jî, di demên dawî de weşanxaneyên ku ji van çêşnan pirtûkan diweşînin, jî bo hemûyan têgeha ‘çîrok’ê bi kar tînin. Ev bikaranîn tevlihevîya di serê civakê de hîna aloztir dike û nahêle ku em di vî warî de gaveke pêşdetir biavêjin.” (Tîlmenî, 2022: 96)

Nivîskar Yaqob Tîlmenî li ser vê mijarê di pirtûka xwe ya *Lemişta Çîrokên Kurdî (Salnameya ÇîrokaKurdî ya 2012-2013-2014’an)* de dibêje ku peyva çîrokê ji bo cureyê modern pênasakirineke çewt e. Ji ber ku çîrok rasterast keresteyên folklorîk tîne ziman. Lewra jî ji bo vê pênasakirinê peyva “çîroka nûjen” bi kar tîne û vê têgihê ji bo çêşna modern a edebîyata kurdî pêşnîyaz dike. Ji bo vê yekê jî nakokîyên weşanxaneyan dide ber çavan. Weşanxaneyên ku pirtûkên kurdî çap dikin hem çîrokên modern û hem jî çîrokên gelêrî bi heman navî diweşînin (Tîlmenî, 2015: 44).

Tîlermenî li ser pênasikirina çîrokê tenê pisrgirêkê destnîşan nake û her wiha ji bo vê çeşna edebî pêşnîyazên xwe jî dike. Ji bo pênasikirina çîrokê jî sê navan dîyar dike. Yek ji van çîrok e; lê bele vê termê ji kokê ve dîyar dike ku ji “çêr” û “çîrr’ê” tê lewra ji vî navî ji bo çeşna edebî ya modern peyveke guncan nabîne. Pênasikirina din jî têgiha “kurteçîrokê” dibîne. Lê li gorî wî ev nav jî ji bo hin tekstan tam di cî de nîne; ji ber ku ev nav jî ji short story’ a îngîlîzi jêderka xwe girtîye û mirov dikare ji bo tekstên kurt û kin biemilîne. Pênasikirina dawî, ya nivîskar jî hildibijêre peyva “çîroka nûjen” e. Lewra mirov dikare vî navî di nav xwe de, ji bo tekstên hûnandî bi kar bîne. Ji ber vê yekê jî peyva *nûjen*, ji bo vê çeşna guncantir dibîne (Tîlermenî, 2021: 104-105, 2022: 98-99). Lê belê her çi qas der barê mijarê de rexne û pêşnîyazên nivîskar hebin jî wî bi xwe jî navê pirtûka xwe weku pirtûka çîrokên kurdî nav kirîye û heman awayî jî weşandî ye (Bnr. Tîlermenî, 2015).

Çîroknûs Hesênê Metê jî li ser vê babetê di hevpeyvîneke xwe de tev li mijara navlêkirina vê janra edebî dibe û nêrînên xwe bi vî şiklî dîyar dike:

Ez dizanim ko ev navê ‘çîrok’ê di nav nivîskarên kurd de bi maneya ‘novel’ê tê bikaranîn û çi xwenda û çi jî bêsewad ev ‘çîrok’ di nav xelkê kurd de jî tê bikaranîn. Lê bi du maneyên cuda. Bi qasî ko ez dizanim tevayîya xelkê kurd bi maneya ‘saga’ya swêdî yan jî “masal” a tirkî de bi kar tînin û nivîskarên kurd jî bi maneya “novel”ê. Îcar ez jî û ew hemû nivîskarên ko novelan dinivîsîn jî... bêguman em novelist in, nivîskarên novelan in; em ne çîroknivîs in. Ji ber ko vî navê “çîrok”ê maneyeke xwe ya din heye, bi hezar salan e ko her bi maneya xwe ya “saga”ya swêdî û “masal” a tirkî di nava xelkê de cihê xwe girtîye. Cih, wext, qehreman û vebêjerê çîrokê anonîm in. Lê ev xalên vegotina hunerî ne welê ne, mişexis in. Ji ber vê yekê divê em navekî ji vî navê “çîrok”ê dûr li vî babetê edebîyatê bikin.” (Hesênê Metê, 22.03.2022)

Dîsa li ser vê babetê di sala 2019an ji alîyê Emîn Bozan ve li ser çîrokên kovara Hawarê ve tezek hatîye amadekirin û di vê tezê de jî ji bo vê çeşna edebî *çîroka modern* hatîye bikaranîn. Tez bi ser navê “Çîroka Modern a Kurmancî di Hawarê de” li zanîngeha Mardin Artukluyê der çûye. Hin nivîskaran jî di vê dawîyê de ji bo vê çeşna edebî qenaeta xwe anîne ziman û her wiha li ser babetê dîsa hin

navên ji hev cuda pêşnîyaz kirine û bi vê mebestê jî xwestine termînolojîyeke xweser bête dîyarkirin. Yek ji wan jî, lêkolîner Ayhan Yıldız e û ji bo vê çêşna edebî peyva “hikaye”yê pêşnîyaz dike (Yıldız, 2018: 177).

Wek edebîyateke cînar, di edebîyata tirkî de jî ev cure gengeşî berdewam bûne. Heta derdora salên 1930yî ev çêşn di edebîyata tirkî de weku “hikaye” hatîye binavkirin. Pişt re li hemberî vê peyvê, peyva “öykü”yê belav bûye û heta niha jî ev her du peyv di edebîyata tirkî de bi hev re tên bi kar anîn (Kahraman, 2015: 13). Kenan Subaşı di teza xwe ya doxtorayê de, di şûna çîrokên gêlêrî û çîrçîrokan (masal) peyva çîrvanokê pêşnîyaz dike û vê têgihê jî ji bo keresteyên folklorîk guncan dibîne (Subaşı, 2019: 7).

Li gorî van gengeşî û pênaseyan; me jî ji bo vê çêşna edebî peyva “çîrok”ê guncantir dît û di lêkolîna xwe de jî em ê tim vê peyvê di şûna metnên modern de bi kar bînin. Lewra pênaseyên hatine pêşnîyazkirin li gorî me hin arîşeyan derdixin holê. Ger mirov, peyva kurteçîrokê bi kar bîne hingê ji bona hemû metnên vê çêşna edebî guncan nabe. Ji ber ku dê hingê arîşeya penasekirina metnên herî kurt wê derkeve holê. Peyva “çîroka modern” jî bi serê xwe alozîyek e; ger çîroka modern hebe, wê çaxê divê çîrokeke klasîk yan jî çîrokeke kevin jî hebe û sînoren van jî li gorî vê yekê bê dîyarkirin. Hem ji hêla lêkolêran ve hem jî ji hêla xwîner û weşanxaneyan ve peyva çîrokê çêtir rûniştîye û ne hewce ye mirov navekî cîyawaz û çêkirî lê bike. Ji ber van sedemên dîyarkirî jî me di lêkolîna xwe de peyva “çîrok”ê bi kar anî.

5.4. Bandora Kovar û Rojnameyan li ser Çîroka Kurdî

Di edebîyata kurdî de nemaze di warê çîroka modern de tiştê ku çîrokê derdixe pêş bandora kovar û rojnameyan e. Çîrokên kurdî yên modern ên ewil di nav rûpelên kovara û rojnameyan de çap bûne. Mirov dikare bibêje ku bingehên çîroka modern a kurdî/kurmancî di nav rûpelên kovar û rojnameyên mîna Rojî Kurd, Hawar, Ronahî, Roja Nû, Rêya Teze, Tîrêj, Rewşen û hwd. de hatiye avêtin. Nexasim kovara Hawar û Ronahiyê di vî warî de nimûneyên pêşîn û serkeftî yê çîroka modern pêşkêş dike. Lê divê bê gotin ku heta van demên dawî jî di edebîyata

kurdî de, kovarake serbixwe ya çîrokan tune bû. Vê dawîyê bi navê Kurdeçîrokê kovarek derket û ev kovar li ser çîroka kurdî dixebite, tenê çîrokan diweşîne û li ser pêşxistina çîrokê kar dike.

Kovarên edebîyatê di edebîyatê de zindîbûnekê bi xwe re tînin û tevgereke çalak didin destpêkirin. Bi saya van kovaran ruhekî çalak dikeve nava edebîyatê. Li derdora kovaran meseleyên aktûel tînin mînaqêşekirin û her wiha bi xwe re bizavên nû yên edebî didin destpêkirin. Li alîyekî din jî xwînerên edebîyatê zêde dibin û tiştên aktûel germegerm bi rêya kovaran digihîje girseyeke mezintir. Giringîya kovaran ji bo xwîneran ne tenê şopandina meseleyên aktûel e, xwîner di van kovaran de gelek nivîskarên cuda jî nas dikin. Bo nimûne xwîner bi rêya pirtûkekê tenê dikare nivîskarekê/î binase; lê bi rêya kovaran bi gelek fikr û ramanên cuda û nivîskarên nû re dibe nas (Kalkan, 1982: 33). Têkilîya xwîner û nivîskaran ya bi rêya kovargerîyê saz bûye; têkilîyeke dualî ye û ji bo her du alîyan jî sûdwergirtinek e. Xwînerên kovar û rojnameyan bi nameyên xwe ve şiklekî jî didin naveroka kovar û rojnameyan. Xwîner bi rêya van nameyên xwe, nivîskar teşwîqê berhemdarîyê jî dikin (Aydogan, 2014: 54).

Kovargerî ji bo nivîskaran weku dibistanekê ye, laboratuarek e ku ziman û wêje tê de şikl digire, çavkanîyeke giring e ji bo dîroka wêjeyê. Her wiha kovargerî bi ruhê xwe yê çalak ve berxwedêr û şahidîya dema xwe jî dike (Ay, 2021: 6-10). Di warê modernîteyê de û zêdetir jî di edebîyata modern de rola rojname û kovaran pir zêde ye. Kovar û rojnameyên çapkirî di demeke kin de digihîjin ber destê xwendevanan. Belavkirina metnên edebî û fikrên civakî jî bi rêya van kovar û rojnameyan; digihîje girseyeke mezin a xwîneran (Serfiraz, 2015: 36). Di çand û edebîyata kurdî de jî kovar, rola “atolye”yê digirin. (Roj, 2023: 88)

Pêşketin û belavbûna çîrokê bi pêşketina alavên teknîkî û her wiha bi çapemenîyê ve girêdayî ye. Ev pêşketin bi xwe re xurtbûna kovar û rojnameyan tîne. Wekî çeşneke pexşanê çîrok jî bi saya van alavên çapemenîyê belav dibe û pêş dikeve (Mistefa, 2004: 73).

Ji bo nivîskarên ji hebûna kovaran gelek giring e. Ger nivîskarek bixwaze bi pirtûkan xwe bigrîne xwînerên xwe divê çend salan bixebite. Ji ber vê yekê ji navberek dikeve nava vê têkilîyê. Lê bi rêya kovaran nivîskar û xwîner di demên kin de hevdu dibînin û ev yek ji têkilîyeke xurt navbeyna wan de pêk tîne (Kalkan, 1982: 33). Ji alîyekî din ve zehmetîyên çapkirina pirtûkan ji astengîyeke din e ku derdikeve pêşîya nivîskarên. Gelek caran ji bo nivîskarên kovar dibin cihê naskirinê, ev ji zêdetir ji bo nivîskarên ciwan tecrûbeyekw giring e.

Di edebîyata kurdî de ji derçûna rojnameya “Kurdîstanê” werçerxekî dîrokî ye. Ji ber ku cara ewil e bi rêya vê rojnameyê pexşana kurdî di weşanekî perîyodîk de tê nivîsîn. Mehmed Uzun (1953-2007) giringîya rojnameya Kurdîstanê wiha tîne ziman: “Ji bo ziman û edebîyata kurdî destpêka serdemeke nû û nîşana şewaza vegêraneke edebî ya nû û modern e.” (Uzun, 2016: 74).

Kovargerî û rojnamegerî weku du amrazên sereke yê serdema modernbûnê ne. Bi hesta netewebûnê yan ji netewedewletê tên weşandin. Rojnamegerî û kovargerîya kurdî ji bi vê mebestê derçûne (Veroj, 2021: 9). Firat Cewerî ji di destpêkirina rojnamegerî û kovargerîyê de vê yekê piştrast dike û destpêka rojnamegerîya kurdî ji wiha pêname dike: “Doz û armanca rojnameya me ya pêşî hişyarbûn, zanebûn, û azadîya kurdan bû” (Cewerî, 1996: 169). Bêguman ji bo hemû çand û zimanên giringîya kovar û rojnameyan pir e. Lê ji bona ziman û çanda kurdî kovar û rojname tekane rêya sereke ye (Cewerî, 1993: 7).

Kovargerî û rojnamegerî kurdî, di dawîya sedsala 19an û di destpêka sedsala 20an de rû daye. Di vê serdêmê de kovar û rojnameyên weku Kurdistan (1898-1901), Jîn (1919), Hetaw-î Kurd (1913) bi mebesta damezrandina nasnameyeke nû dest bi weşana xwe kirine. Ji bo avakirina nasnameyeke kurdî ya nû serî li ziman, dîrok û çanda kurdî dane. Standardîzekirina zimanê kurdî, ji xwe re weku armanc danîne (Karaman, 2012: 41).

Di geşedana çîroka kurdî de têkarîya weşanên perîyodîk rojname û kovaran cihekî xwe yê taybet heye. Ev hem ji ber taybetmendîyên çeşna çîrokê ye û hem ji hin astengîyên ku pêşîya nivîskarên kurd e, ku nekarîne pirtukeke çîrokan binivîsin û

biweşînin. Di vê derê de ji bo weşandina çîrokên wan kovar bûne derfeteke mezin. Piştî sedasala nozdehan di împaratoriya Osmanî de tevgerên li ser şopa rojava rê li pêşîya çapemenîyekê nû jî vekirine. Di heman demê de ev helwest di nava rewşenbîrên tirk de ku rû daye; di nava rewşenbîrên kurd yê ku li Stenbolê niştecih in jî belav bûye (Aydoğan, 2014: 53).

Kovargeriya Kurdî yekem car payîtexta dewleta Osmanîyan li bajarê Stenbolê dest bi weşanê kirîye (Zeraq, 2020: 17). Stenbol di vê serdemê de derîyek e ku ber bi Ewropayê vedibe. Taybetmendîyeke Stenbolê ya din jî ew e ku bajarekî kozmopolît e û tê de kurd jî cihê xwe digirin. Di vê maweyê de kurdên ku li Stenbolê bi cih bûne, fersenda weşandina rojname û kovaran dest dixin. Nimuneyên ewil yê edebîyata kurdî yê modern di vê serdemê de, di rojname û kovarên vê derê de tên weşandin (Alan, 2019: 20).

Mebesta derçûna kovaran bi belavkirin, an jî bilêvkirina fikr û ramanekê ve giredayî ye. Hin caran bi armanca dengê muxalîf yan jî fikrekê nû tên weşandin (Tosun, 2020: 133). Dema ji vê hêlê ve kovarên kurdî binêrin em ê bibînin ku her kovar an jî rojnameyên kurdî bi vê mebestê derçûne. Yek ji van kovaran jî, kovara Komeleya Hêvîyê *Rojî Kurd* e. Rojî Kurd weku organa Komeleya Hêvîyê dest bi weşana xwe dike (Rojî Kurd, 2002: 2).

Li gorî Ferhad Shakely di peydabûn û geşbûna çîroka kurdî de mirov dikare qala du hêmanên sereke bike. Yek ji van rojnamegerî û kovargerî ya din jî werger e. Çewa ku di dinyayê de xebatên rojnamegerî û kovargerîyê bandor li edebîyatê kirine; her wiha di edebîyata kurdî de jî çalakîyên bi vî şiklî bandoreke mezin li edebîyatê kirine. Her wiha Shakely angaşt dike ku destpêka çîroknûsîya kurdî bi rojnamegerîya kurdî ve pêwendîdar e. Çîrok ji ber forma xwe ya kurt ve bi hêsanî dikare di kovar û rojnameyan de bê weşandin ji ber vê yekê ye ku neşirkirina çîrokê di van weşanan de pêkan bûye. Babetên çîrokên ewil li gorî bûyerên çandî û siyasî yê erdnîgarîya kurdan guherîye, şikl girtîye. Metnên çîrokan her wiha li gorî atmosfera kovarê ya fikrî û siyasî têşe girtî ye (Shakely, 1998: 12).

Shakely di çarçoveya peydabûna çîroka modern a kurdî de girîngîya rojnamegerîyê tîne ziman û ji Marûf Xeznedar neqil dike ku di navbeyna salên 1925-1975an da 1100 çîrok hatine weşandin. Ji van çîrokan jî 800 heb cara ewil bi rêya kovar û rojnameyan gihîştine ber destê xwendevanan (Shakely, 1998: 24-25).

Li gorî Firat Cewerî kovarên *Hawar* (1932-1943), *Ronahî* (1942-1945) û rojnameya *Roja Nû* ji bona zimanê kurdî di ast û nirxa komarekî de bûne. Cewerî dibêje ku van kovaran; “di navbera edebîyata klasîk û edebîyata nûjen de rola pirekî lîstin e.” Her wiha çîroka kurdî ya nûjen jî bi gelek kesayetên cuda cuda ve di van kovaran de şax vedaye, geş bûye û di dawîyê de; çîrokên giranbiha derketine holê (Cewerî, 2018: 14-15). Lêkoler û nivîskar Remezan Alan jî dî vî warî de payeyeke girîng dide kovara *Hawarê* û bandora kovarê li ser çîroka kurmancî wîha şirove dike “Çîroka modern (kurteçîrok) bi wê re gihîştîye nimûneyên pîr û kamil.” (Alan, 2022: 25).

Li gorî nivîskar Muhsin Kızılkaya derçûna kovara *Hawarê* ji bona edebîyata kurdî gaveke dîrokî ye. Kovara *Hawarê* “qedera edebîyata kurdî diguherîne” lewra çîroka kurdî bi *Hawarê* re digîhîje asteke mezin (Kızılkaya, 2004: 23).

Li gorî Haşîm Ahmedzade jî kovarên ku Şam û Lubnanê derçûyî ji bo geşedana çîroka kurdî derfeteke girîng dane destpêkirin (Ahmedzade, 2004: 191). Haşîm Ahmedzade, girîngîyê dide rojnamegerîya kurdî, lewra li gorî nivîskar rojnamegerîya kurdî bandoreke mezin li çîroka kurdî ya nûjen kirîye. Lê rewşa kurdan ya sîyasî bandor li Weşangerîya kurdî jî kirîye. Kovargerîya kurdî jî mînanî kurdan li çar alîyê ku kurd lê dijîn belav bûye. Ji ber vê yekê jî di navbeyna van weşanan de pêwendîyek pêk nehatîye her yek di qada xwe de maye û bandora wan li hev çênebûye (Nado, 2013: 43).

Kovargerî her çend ji bona kurdî derfeteke mezin jî be, piştî serdemekê ev rola xwe ya sereke bi cih neanîye. Ev rewş piranî di destpêka salên 60î dest pê dike. Zimanê kovaran di vê serdemê de piranî ne bi kurdî ye. Kurdî tenê di çend rûpelên dawîya kovaran de cih girtîye. Ev rewş hema bibêje hetanî salên nodî berdewam dike

(Denîz, 2013: 50). Ev rewş ne ji ber fikr û ramanên Weşangerîya kurdî ye, lewra di vê serdemê de li ser zimanê kurdî zexteke zor tê meşandin.

Rojname û kovarên kurdî li çar alîyên ku kurd lê dijîn bûye derfeta weşandina çîroka kurdî. Yek ji van navendan jî bêguman Sovyet e. Piştî damezrandina Yekîtiya Sovyetên Sosyalîst li Kafkasan rewşa kurdan jî diguhere. Piştî şoreşê ji hêla Sovyetan ve ji bona kêmeteweyan hin mafên nû tên dîyarkirin. Kurd jî weku kêmetewe ji vê yekê para xwe digirin. Di vê serdemê de li Erîvanê rojnameyeke bi navê *Rêya Teze* tê weşandin. Bi weşnadina rojnameya *Rêya Teze*, rê li pêşîya weşandina metnên kurdî yê modern vedibe (Akbaş, 11.01.2023). Em dibînin ku hema bibêje li hemû deveran têkilîyekê xurt di navbeyna weşangerî û pexşannûsiya kurdî de heye. Edebîyata kurdî ya Sovyeta berê jî dîsa bi derçûna rojnameya *Rêya Teze* dest pê dibe û saya vê rojnameyê geş dibe û her diçe pêş dikeve (Reşîd, 1996: 6).

Rojname, weku weşaneke perîyodîk, rojane derdikeve û di nava gel de li heremên ji hev cihê belav dibe. Bi saya vê yekê jî di nava civakê de hişmendîyeke hevpar dide avakirin. Ne tenê hişmendîyeke hevpar her wisa di standardîzebûna ziman de jî rojname û kovar kartêker in. Haşîm Ahmedzade angaşt dibe ku derengbûna derçûna romana kurdî, bi derengbûna rojnamegerîya kurdî ve têkildar e. Ji ber ku rojnamegerîya kurdî li gorî cîranên xwe dereng dest pê kir, romana kurdî jî dereng derçû. Lewra rojnamegerîya kurdî dibe sedema destpêbûna romana kurdî. Her wiha rojnamegerîya kurdî hem di geşedana pexşanê de roleke xwe ya sereke heye û hem jî dibe sedema gencîneya peyvan (Ahmedzade, 2004: 182). Ger em bi vî awayî lê binêrin dê hêsanî bête dîtin ku tespîten Ahmedzade di cih de ne. Lewra di qonaxa Stenbolê de destpêka çîroka kurdî bi derçûna kovara *Rojî Kurd* dest pê kirîye. Li Silêmanîyê jî em dibînin piştî ku kovara *Pêşkewtin* derdiçe yekem car çîrok wergerê kurdî dibin. Li Şamê derçûna kovara *Hawarê* di gelek waran de edebîyata kurdî pêş ve dibe. Ne tenê edebîyata kurdî, kurd bi *Hawarê* re dibin xwedîyê alfebeya latînî û ev alfeba bi rêya vê kovarê di nava kurdan de belav dibe. Dîsa em dibînin ku li Sovyetan jî derçûna rojnameya *Rêya Teze* dibe navendeke pir girîng. Lewra yekem romana kurdî di vê rojnameyê de derdiçe. Her wiha li Tirkîyeyê jî piştî salên

bêdengîyeke dirêj edebîyata kurdî bi saya kovaran rêya xwe dibîne. Li Tirkîyeyê heta ku rojnameya Dicle-Firat² neweşîya em rastî metneke kurdî nayên.

Dîsa li Tirkîyeyê bi derçûna kovara *Tîrêjê* ve em rastî hin nimûneyên çîrokan tên. Di vê serdemê de çîroka zazakî jî cara ewil li ser rûpelên kovara *Tîrêjê* derçûye (Birîndar, 1980: 32) Dîsa em bala xwe didinê piştî rawestana kovara *Tîrêjê* çîroknûsiya Kurdî jî radiweste û ev yek heta ku weşandina kovarên “*Nûdem*”³ û “*Nûbiharê*” dom dike. Kovara *Nûdemê* li Swêdê dest bi weşana xwe dike. Di heman salê de li Tirkîyeyê jî kovareke din bi sernavê “*Nûbihar*” derdiçe. Ev her du kovar jî piştî weşandina xwe ji çîroka kurdî re dibin du navendên girîng. Bandora rojname û kovargerîyê ya li ser geşbûna edebiyatê diyar e; xala herî sereke jî ew e ku piştî dawîlêhatina kovar û rojnameyên kurdî yên weku *Hawar*, *Ronahî* û *Roja Nû*, em hetanî salên nodî rastî metneke çîrokî nayên. Ev bêtengî piştî ku kovara *Nûdem* û kovara *Nûbiharê* dest bi weşanê dikin dişikê û çîroka kurdî ji nû ve şitil dide û pêş dikeve (Geverî, 2010-2011: 64).

Îbrahîm Seydo Aydogan rojnameya Kurdistanê weku “destpêka pexşana kurdî” pênase dike û kovara *Hawarê* jî weku “mezintirîn û xurttirîn gava wêjeya kurdî ya nûjen a pexşanî” bi nav dike (Aydogan, 2014: 105). Di kovara *Hawarê* de her wisa çîroka kurdî ya nûjen jî ji vê yekê para xwe hildaye û ji alîyê gelek kesan ve çîrok hatine weşandin. Nivîskar Yıldız jî li ser mijarê wiha lê zêde dike;

Heke em pêşî behsa edebîyata Kurdî ya Kurmancî bikin, helbet divê em serê ewil behsa kovar û rojnameyên Kurdî bikin ku cara pêşî wan hikaye dane çapkirin û weşandin. Di nav van kovaran de, pêşî em rastî rojnameya Kurdistan, Rojî Kurd, Hetawî Kurd, Hawar, Ronahî, Welat, Welatê Me, Azadîya Welat, û Dema Nû. Kovara Rewşenê û *Nûbiharê* jî, bi derfetên xwe yên gewre, ketine milê kedkarên edebîyata kurdî û digel kovarên mîna War, Bîr, W, Zend, Çirûsk û Mulemmayê jî li ber çapkirina hîkayeyên Kurdî bergeh vekirîye.” (Yıldız, 2018: 184).

² Rojnameya Dicle-Firat ji alîyê Edîp Karahan ve li Stenbolê hatiye weşandin. Rojname di navbeyna salên 1962-1963an bi tevayî heşt hejmar derçûye.

³ Kovara *Nûdemê* li Swêdê ji alîyê nivîskar Firat Cewerî ve hatiye weşandin. Hejmara ewil a kovarê di sala 1992an de derketîye û hejmara wê ya dawîyê jî di sala 2001an da derçûye û kovar bi tevayî 40 hejmar hatiye weşandin.

Bi vî awayî jî Yıldız di derçûna kovargerî û rojnamegerîya kurdî heta roja îroyîn kovar û rojnameyên kurdî rêz dike û wan ji bo destpêk û geşbûna çîroka kurdî derfetên giranbiha dibîne û her wiha di derçûna çîroka kurdî de pêleyekî giring dide rojname û kovaran.

Li Başur jî em dikarin bibêjin derçûna kovara “Gelawêj”ê di çîroknûsîya kurmançîya jêr (sorani) de dibe navendeke girîng. Li gorî Cewerî bi derçûna kovara “Gelawêjê” re çîroknûsîya Başûr “dikemile” û pêş de diçe. Her wiha Cewerî dibêje: “rola kovarên Hawar, Ronahî û rojnameya Roja Nû di pêşdexistina edebîyata kurdî û bi taybetî jî çîroka kurmançî de çi be, rola Gelawêje jî ji bo kurmançîya jêr (sorani) ew e (Cewerî, 2018: 20).

Huseyn Arif ji xeynî kovara Gelawêjê di vê serdemê de di pêşdeçûna çîroknûsîya kurdî de behsa kovareke din jî dike. Ev kovar, kovara “Dengê Gîtî Teze” ye. Li gorî Arif vê kovarê jî, di geşbûna çîroka kurdî de roleke sereke girtîye (Arif, 2011: 42).

Kovargerî û rojnamegerî ne tenê li ser çîrokê her wiha li ser hemû cureyên edebî bi bandor in. Kovar û rojname bi hebûna xwe ve dibin arşîveke sereke. Li ser vê yekê Qanatê Kurdo jî giringîyeke mezin dide van weşanên perîyodîk. Kurdo her wiha rol û kemala kovar û rojnameyan wiha dîyar dike: “Kovar û rojnamên kurdî li tarîxa peydabûn, pêşveçûn û lêgerîna lîtêratûra kurdan cîkî hêja û layiq girtine, çimkî peydabûn û pêşveçûn û lêgerîna lîtêratûrê wê bi peydabûn û pêşveçûna kovar û rojnamên kurdî va girêdaye.” (Kurdo, 1983: 23).

Li gorî Amir Hasanpour, kovar û rojnameyên kurdî bi derfetên xwe ve edebîyata kurdî ya modern gihandine lûtkeyeke bilind. Her wiha bi saya van weşanan jî edebîyata kurdî ya modern, di veguherîn û gihandina asta edebîyatên Ewropî û rojhilata navîn de bûne navgînên giring (Hasanpour, 2003: 96).

Em dibînin ku di çarçoveya agahiyên li jorê hatine dayîn de kovargerî û rojnamegerî ji bona çîroknûsîya kurdî du kanên sereke bûne. Lewra ji destpêka wê bigire heta salên nodî û her wiha roja îro jî çîroknûsî hewcedarîyê bi kovar û

rojnamgerîyê dibîne. Kîngê ku kovargerîya kurdî pêş ketîye bi xwe re çîroknûsîya kurdî jî pêş ve birîye.

5.5. Kurtenêrîneke Giştî li Çîroka Kurdî

Ji ser raborîya çîroka kurdî re sed salî zêdetir derbas bûye. Di vê maweyê de gelek astengîyên mezin jî derketine pêşîya çîroka kurdî. Li welat û mekanên curbicur carna serî hildaye û carna jî ji ber hin sedemên polîtîk bêdeng maye. Lê dîsa jî her carê hewl daye û rêya xwe dîtîye, herikîye û heta îro jî hatîye. Her çî qas li hin deveran asê mabe jî di mekanên cuda cuda de bêrawestan hatîye nivîsîn û dom kirîye. Çîroka kurdî li Tirkîyê, Surîyê, Iraq, Îran, Sovyet û Ewropayê rengvedaye. Di erdnîgarîyên cihê de rengvedana çîroka kurdî bi hin şert û mercên cîyawaz ve girêdayî ye. Li Tirkîyê destpêka çîroka kurdî bi pêla modernîzma dewleta Osmanî ve pêwendîdar e. Lewra pêla modernîzma Împaratorîya Osmanî heman demê de bandor li edebîyatê jî kirîye. Kurdên ku li payîtexta Osmanîyan Stenbolê niştecîh in ji ber vê pêla modernîzmê ketine û çeşnên modern xistine nava edebîyata kurdî. Li Surîyê û Iraqê jî destpêk û geşedana çîroka kurdî mirov dikare bi mandeterîya Frensî û Îngîlîzan ve pêwendîdar bike. Şam û Beyrût ji van navendan in ku bi mandeterîya fransîyan çîroka kurdî lê derçûye. Weku tê zanîn Hawar li Şamê di bin desthilatdariya frensîyan de tê weşandin (Ergün, 2014: 24). Li Iraqê jî destpêk û geşedana çîroka kurdî dîsa bi mandeterîya Îngîlîzan ve pêwendîdar e. Pirsgerêkên navbera Iraq û komara Tirkîyê rê li pêşîya çîroknûsîya kurdî daye vekirin. Lewra di vê serdemê de li ser meseleya Kerkûk û Musilê Îngîlîz û Tirkîye li hemberî hev tevdigerin. Îngîlîz da ku bikaribin angaştên xwe di rojeva Neteweyên Yekbûyî de bînin ziman serî li meseleya kurdan dayîne û zimanê kurdî weku zimaneke fermî naskirine û dibistanên kurdî dane vekirin (Hassanpour, 2005: 191-194).

Li gorî ciranên xwe di edebîyata kurdî de metnên çîrokê bi rêya romanê nimunêyên xwe yên ewil dane. Çîroknûsîya kurdî di bin bandora edebiyata tirk, ereb û farisan de dest pê kirîye (Ahmedzade, 2004: 193-194). Ferhad Pîrbal jî angaşt dike ku çîroka kurdî ji çîroka cîranên xwe feyz girtîye (Pîrbal, 2001: 60). Yek destpêka jêderka çîroka kurdî ya din jî werger in. Bi saya wergeran metnên nivîskarên rojavayî, nivîskarên kurd ji şîkl û forma çîrokê agahdar bûne, berhemên çîroknûsên

rojawayî yê navdar xwendine û bi vî awayî jî bingeha çîroka kurdî ya modern danîne (Shakely, 1998: 12).

Ferhad Shakely di xebata xwe ya *Modern Kürt Öykü Sanatı*'yê (1998) de, di edebîyata kurdî de peydabûn û geşedanê çeşna çîrokê ya heta salên 1990î dinirxîne. Shakely di vê pirtûka xwe de; geşedana dîroka çîroka kurdî, nivîskarên wê, babet û taybetmendiyên wê yê şeweyî destnîşan kirîye. Bi vî awayî berhema Shakely ji bo çîroka modern a kurdî çavkanîyeke taybet e. Li gorî Ferhad Shakely çîroka kurdî di derdora salên 1920î de derketîye holê. Çîrokên ewil her çiqas ji hêla estetîkê ve lawaz bin jî; ew wan çîrokan di navbeyna çîrokên gelêrî û çîrokên modern de weku pirekê dibîne (Shakely, 1998: 11).

Çîroka kurdî ya modern li mekanên ji hev cihê û ji hev dûr derçûye. Ne tenê ji hev dûr di heman demê de li derveyî welat rûdaye. Vê dûrbûnê bi xwe re tenêtiyek jî peyda kiriye û gelek caran berhem û metnên derçûyî tenê di nav sînorên wan deveran de mane û belav nebûne. Ji ber van sedeman jî li ser metna ewil a çîroka kurdî nêrîn û nirxandinên ji hev cihê peyda bûne. Li gorî Ferhad Pîrbal *Mem û Zîna* (1856) Mela Mehmûdê Bazîdî (1799-1867) yekem metna çîroka kurdî ye. Ku ev berhem di wê serdemê de weku pexşankî hatîye nivîsîn. Îbrahîm Seydo Aydoğan, Mela Mehmûdê Bazîdî weku pexşanûsekî kurd dide nîşandan. Lê her çiqas metnên Bazîdî weku tekstên pexşanê yê ewil bîn pejirandin jî ji alîyê formên xwe ve weku nimuneyên modern nayên pejirandin (Aydoğan, 2014: 104). Hin nivîskar û lêkolerên din jî di wê angaştê de ne. Abîdîn Pariltî û Ozlem Galîp jî ji bo metna ewil a çîroka kurdî berhema Bazîdî nîşan didin. Ew angaşt dikin ku “Mem û Zîna Mele Mehmûdê Bazîdî ji hêla terzê nivîsandinê ve yekem çîroka kurdî ya modern tê hesabkirin” (Pariltî, Galîp, 2010: 19).

Me gotibû li ser yekem metna çîroka kurdî gengeşî pir in. Yaqob Tilermenî dema behsa nimûneyên ewil yê çîroka kurdî dike; *Mem û Zîna* Mele Mehmûdê Bazîdî weku yekem metna çîroka kurmancî dide naskirin. Tilermenî li pey *Mem û Zîna* Bazîdî di rêza duyê de jî çîroka Fûad Temo rêz dike. Dûv re jî çîroka Celadet Bedîrxanî “Li Ber Tevna Mehfûrê” di rêza sêyem de dijmêre. Bi vî awayî Tilermenî

van her sê çîrokên navborî weku nimûneyên ewîl yên çîroka kurmançî dide nasandin (Tilermenî, 2022: 73).

Her çî qas li ser metna ewil a çîroka kurdî, nêrîneke mişterek pêknehatibe jî ev mesele di nava lêkoleran de bûye arîşeyek. Li ser metna ewil a çîroka kurdî Ebdulreqîb Yusuf û Ferhad Pîrbal xwe dispêrin *Adat û Rusumatnameyi Ekradîye* ya Mela Mehmûdê Bayezîdî. Lê hem çîroka Fûadê Temo hem jî *Adat û Rusumatnameyi Ekradîye* ya Bayezîdî ji formên çîroka modern nahewînîn. Bi ser de jî mirov nikare bibêje ku berhema Bayezîdî çîrokeke klasîk e (Geverî, 2010-2011: 63) Li gorî me çîroka Fûadê Temo her çiqas metneke lawaz jî be; hem ji hêla hêmanên teknîkî û hem jî ji hêla şewazê ve mirov dîkare wê weku şîklê çîroka modern bipejirîne. Lê ne mimkune ku *Adat û Rusumatnameyi Ekradîyeyê* weku çîroka modern pênase bike. Lewra ev berhem berhemeke folklorîk e û mirov tenê dikare vê berhemê weku nimûneya ewil ya pexşana kurdî binav bike. Di teza xwe ya “Ji Hêla Naverokê ve Dahûrîna Çîrokên Mela Mehmûdê Bazîdî” de Evîn Bîlge vê berhemê di nava berhemên çîrokî de bi cih nake û berhemê wiha pênase dike: “Ev kitêb yekem lêkolîna civaknasî, etnolojî û etnografî ya li ser kurdan e ku bi kurdî hatîye nivîsandin.” (Bîlge, 2013: 19).

Li Başûr jî ev gengeşî berdewam bûne. Dr. Îzeddin Mistefa Resûl *Mewlûdnameya Şêx Hûseynê Qazî* (1790-1870) yekem berhema çîroka kurdî dihesibîne. Rauf Hesen yekem metna çîroka modern ya kurdî bi çîroka Kerîm Seîd, *Bo Çi Cil Xarem* dide destpêkirin. Ev çîrok di sala 1925an, di hejmara 15an a rojnameya *Jîyaneweyê* de derçûye. Lê belê lêkolerên weku Hûseyn Arif û Omer Maruf Berzencî yekem metna çîroka kurdî bi *Le Xewmaya Cemîl Saîb* didin destpêkirin (Reşid, 2005: 10).

Ev mijar di nava lêkoler û nivîskarên kurd de heta van salên dawîyê jî bûye cihê niqaşê. M. Emin Hêvîdar di pêşgotina pirtûka *Wezîrê Nadîrî* (1911-1946) ya *Nûbarê* de, angaşt dike ku yekem metna çeşna çîroka kurdî bi *Nûbar*’a Wezîrê Nadîrî destpê kirîye. Li gorî Hêvîdar metna FuadaTemo ya ku di kovara *Rojî Kurd* de weşîyaye ji çîrokan wêdetir dişibe “xewroşkan” û ji ber vê yekê jî dirûvên çîroka modern lê nayê. Her wiha Hêvîdar, metna Cemîl Saîb jî ji alîyê hecma wê ve stûr

dibîne û lewma vê metnê ji çîrokê bêhtir dişibîne novelê. Ji ber van sedeman jî Hêvîdar dîyar dike ku yekem metna modern a çîroka kurdî bi *Nûbara Wezîrê Nadîrî* destpê kirîye (Nadîrî, 2016: 16). Ji van agahîyan jî dîyar dibe ku her nivîskar û lêkoler di peydabûna yekem metna çîroka kurdî de xwedîyê nihêrînên ji hev cihê ne. Vê yekê jî mirov dikare bi helwesta wan ya netewetîyê ve girê bide. Lewra nivîskar û lêkoler bi hest û helwesteke netewî xwestine îspat bikin ku kurd jî di vî warî de xwedîyê paşxaneyêke dîrokî ne û bi vê mebestê jî peydabûna çîroka kurdî gihandine mêjûyên kevin (Salih, 2010: 43).

Heta salên 1980yî qenaeta giştî ew bû ku yekemîn çîroka kurdî di sala 1925an hatîye nivîsîn. Lê piştî hin agahî û dokumentan kifş bû ku yekem çîroka kurdî ji alîyê Fuadê Temo ve di sala 1913an de hatîye nivîsîn. Ev metna çîrokê bi sernavê “çîrok”ê di hejmarên kovara *Rojî Kurd* de tê weşandin. Çîroka Temo hejmarên *Rojî Kurd* yên 1 û 2yê da derdikeve. Li gorî Shakely çîroka Fuadê Temo jî çîrokek hunerî wêdetir metneke jirêzê ye, lê ji hêla binyatê ve her çend ne giring jî be dîsa jî yekemîn metna çîroka modern a kurdî tê hesibandîn. Piştî yekem metna çîroka kurdî di sala 1925an jî alîyê Cemîl Saîbî ve çîroka *Le Xewma* (Di Xew da) tê weşandin. Çîrok cara ewil di *Jîyanneweyê* de, pişt re jî di kovara *Jîyanê* de tê tefrîqekirin. *Le Xewma* metneke dirêj e her wiha tekane metna nivîskar e. Çîroka Saîbî rexneya desthilatdariya qraltîya Kurdistanê ya wê serdemê dike. Shakely vê rewşê îronîk dibîne.

Li gorî Huseyn Arif di navbeyna salên 1925-1939an di warê çîrokê de mirov dikare behsa çar nivîskaran bike. Cemîl Saîb, Ehmed Muxtar Caf, Pîremêrd û Mihemed Elî Kurdî. Cemil Saîb di vê maweyê de tenê bi çîrokekê derdikeve pêş. Çîroka *Le Xewma* ya Saîb di navbera salên 1925 û 1926an de weku 23 rêzenivîs derdiçe (Arif, 2011: 13-14, Shakely, 1998: 27). 18 beşên vê çîrokê di rojnameya *Jîyanneweyê* de, 15 beş jî di rojnameya *Jîyanê* de derdiçe. Lê çîroka *Le Xewma* çîrokeke nîvco ye. Di tefriqeya 23an ya ku di rojnameya *Jîyanê* de derçûyî de tê nîşandayîn ku dê çîrok bidome lê di hejmarên rojnameya yên pişt re em rastî berdewamîya vê çîrokê nayên (Ahmedzade, 2004: 191-192). Lî gorî Ferhad Pîrbal peydabûna çîroka kurdî li Başûr vedigere salên 1920î. Di vê salê de Mêrgesonê Îngîlîz di rojnameya xwe *Pêşkewtînê* de hîn çîrokan ji zimanên Emerîkî, Îngîlîzî û

Frensizî wergerê kurdî dîke û ev yek jî di nava kurdan de çeşna çîrokê belav dike. Bi saya Mêrgeson kurdên Başûrî bi vê celeba edebî re dibin nas û Cemîl Saîb jî li ser vê rêyê dest bî çîroknivîsîne dike û çîroka *Le Xewmayê* dinivîse (Pîrbal, 2001: 59).

Ferhad Shakely çîroka modern a kurdî li ser çar werçerxan dabeş dike. Serdema ewil weku “Serdema Çalepkî” nîşan dide û vê serdemê jî navbeyna salên 1913-1939 dîyar dike. Di serdema çalepkîyê de çîroka kurdî ya modern derketîye holê. Shakely peydabûna çîroka kurdî bi rojnamegeriya kurdî û wergerên ji edebîyata rojava ve girê dide. Her wiha nivîskarên kurd bi rêya rojnamevanîya ereb, fars û tirk bi çeşna pexşanê re bûne nas û vê yekê jî rê li pêşîya berhemdarîya wan a li ser çîrokê vekirîye. Çîrokên vê serdemê, zêdetir di bin bandora çîrçîrokên gelêrî û destanan de mane. Di ziman û binyata çîrokên serdemê de şopa çîrçîrokên tradîsyona gelêrî tîn dîtin. Ji bilî vê yekê di çîrokan de şopa jêgirtinên edebîyata Ewropayê jî xuya dibe. Shakely dibêje ku li ser babetên çîrokên serdemê piranî bandora hêmanên folklorîk serdest in. Bi ser de jî angaşt dike ku hin çîrok rasterast teqlîdên çîrçîrok û çîrokên gelêrî ne. Di serdema çalepkîyê de çîroknûsekî din jî Ahmed Muxtar Caf e. Di navbeyna salên 1927-1928an de bi çîroka xwe ya bi navê *Mesele-y Wijdan* nivîsiye. Ahmed Muxtar Cafî ev çîrok bi dest nivîsiye lê hetanî sala 1970yan paşê hatiye weşandin. Shakely vê çîrokê; di serdemê de çîroka herî serkeftî pênase dike. Çîrokê meseleyên di navbeyna desthilatdarên zalim û gundîyên hêjar de ji xwe re kirîye mijar. Ji bilî van kesan nivîskarekî navdar ê serdemê jî Pîremêrd e ku di warê çîroknûsiyê de karên giring kirine. Di vê maweyê de mijarên dîrokî cara ewil e ku bi saya serê Pîremard di çîrokê de cih digirin. Çîrokên wî yên *Duwanzde Suware-y Merîvan* û *Mem û Zîn* di vê qadê de çîrokên ewil in. Çîroknûsekî din jî Mihemed Elî Kurdî ye. Mihemed Elî Kurdî çîroka xwe ya bi navê *Duwa-y Serxoşî-y Zor Şêtiye* di sala 1934an de di kovara *Dîyarî Lawan* de diweşîne (Shakely, 1998: 24-29).

Di dabeşkirina çîroka kurdî ya modern de Ferhad Shakely serdema duyemîn jî *Nifşa Gelawêjê* dide nîşandan. Ev serdem bi derçûna kovara *Gelawêjê* dest pê dike û bi dawîbûna wê jî diqede (1939-1949). Kovara *Gelawêjê* 1 Kanûna 1939 de bi naverokeke tîr û tijî dest bi weşana xwe dike. Heta sala 1949an weşana xwe didomîne. Di nava deh salan de kovara *Gelawêjê* bingeha çîroka kurdî ya modern

datîne. Li gorî Shakely rêveberiya kovarê bi awayekî hostane û zanyarî tevdigere ji bona nûkirina çîroka modern kedeke bêhempa derdixe holê. Kovarê hem çîrokên bîyanî wergerandine hem jî ji bona nivîsîna metnên çîrokî piştgiriya nivîskarên kirîye. Di nava van deh salan de 105 hejmarên kovarê hatine derçûne û di van hejmaran de 114 çîrok hatine weşandin. Ji van 114 çîrokan; 82 hebê wê çîrokên werger, 32 hebê wê jî ji alîyê nivîskarên kurd ve hatine nivîsîn. Di kovarê de, wergerên çîrokên nivîskarên weku Guy de Maupassant, Oscar Wîlde, Henore de Balzac, Anton Çexov, Maksim Gorki, Leo Tolstoy, Îlya Ehrenburg cih girtine. Di kovara Gelawêjê de nivîskarên kurd yê weku Eladîn Seccadî, Îbrahîm Ehmed û Şakir Fettah bi çîrokên xwe beşdar bûne.

Ferhad Shakely kovara *Hawarê* jî di nava vê serdemê de dinirxîne. Kovara *Hawarê* di navbeyna salên 1932-1933, 1934-1935, 1941-1943 weku sê serdeman derdiçe. Kovara *Hawarê* ji ber hincetên siyasî carna tê girtin. Wekî kovara *Gelawêjê* kovara *Hawarê* jî di çanda kurdî de xwedîyê cihekî giring e. Ne tenê di çanda kurdî de her wiha ji bona hilberînîya çîroknûsîya kurdî jî bûye dibistanek (Shakely, 1998: 31-34). Di weşana kovarê de serdema sêyê ku dikeve navbeyna salên 1941-1943yan ji hêla çîroka kurdî ve pir dewlemend e. Di vê heyama de nivîskarên weku Qedrîcan, Bişarê Segman⁴, Fuad Cemîl Paşa, Osman Sebrî û Nureddîn Zaza naveroka kovarê bi çîrokên xwe dagirtine. Çîrokeke din ya vê serdemê jî çîroka *Ber Tevna Mehîrê* ye. Çîrok ji alîyê Celadet Alî Bedîrxan ve hatîye nivîsîn û di hejmara 4an a kovara *Hawarê* de derçûye. Celadet Bedîrxan weku rojnamevan û zimannas kesayetekî pêşeng ê serdemê ye. Çîrok bûyerên piştî têkçûna serhildana Şêx Seîd vedibêje û ji bo paşerojê jî şîretan dike (Shakely, 1998: 26-28).

Di destpêka çîroka kurdî de bêguman serdema herî dewlemend em dikarin bêjin derçûna kovara *Hawarê* ye. Weşandina kovara *Hawarê* ji bo çîroka Kurdî derfeteke zêrîn e. Çîroka kurdî bi saya *Hawarê* şiklekî modern digire. Remezan Alan di gotara xwe ya bi navê “Çend Gotin Li Ser Du Adaptasyonên Nifşê *Hawarê*” de

⁴ Îbrahîm Seydo Aydogan di pirtuka xwe **Guman 2** de diyar dike ku Bişarê Segman yek ji nasnavê Celadet Alî Bedîrxan e. Li gorî Aydogan, Celadet Alî Bedîrxan di *Hawarê* da bi gelek nasnavên cuda nivîs û çîrok nivîsandine. (bnr. Îbrahîm Seydo Aydogan, *Guman 2 “Nasnavên Celadet Bedîrxan”*, r. 171-178)

kovara *Hawarê* wiha pê nase dike: “Hawar di edebîyata kurdî de ne tenê navê kovarekê ye, di heman demê de navê pêngav, dibistan, avakirina tradîsyon, zêdekirina cûreyên edebî û çalakîya maweyeke taybet a edebîyata kurdî ya modern e jî. ...Çîroka modern (kurteçîrok) bi wê re gihîştîye nimûneyên pir û kamil.” (Alan, 2022: 25).

Ferhad Pîrbal çîrokên *Hawarê* hunerî û serkeftî dide nîşandan. Pîrbal her wiha dîyar dike ku di kovara *Hawarê* de 69 çîrokên hunerî û 6 heb jî çîrokên werger hatine weşandin. Di kovarê de Kamuran Bedîrxan 12, Celadet Bedîrxan 11, Osman Sebrî 7, Nureddîn Zaza 7, Mistefa Ehmed Botî 6, Qedrîcan 5 û Bişarê Segman jî 4 çîrok nivisîne. Ji xeynî van nivîskaran hin nivîskarên din jî rûpelên *Hawarê* bi çîrokên xwe ve dagirtine (Pîrbal, 1994: 100). Emîn Bozan li ser çîrokên *Hawarê* tezekê mastirê amade kirîye û di teza xwe de dîyar dike ku di kovara *Hawarê* de 78 çîrok hatine weşandin û ji van çîrokan tenê 50î hebê wê mirov dikare weku nimûneyên çîroka nûjen a kurdî bide nîşandan (Bozan, 2019: 37-39).

Kovarekî din ya ku di dema *Hawarê* de tê weşandin jî, kovara *Ronahî* ye. Kovara *Ronahî* weku “Pêveka wêneyî ya Kovara Kurd Hawarê” dest bi weşana xwe kirî ye. Di kovara *Ronahî* de 51 çîrok tene nivîsîn û ji van çîrokan 10 hebê wê çîrokên werger in (Cewerî, 2018: 16). Di kovarê de nivîskarên herî çalak Celadet Bedîrxan, Osman Sebrî û Qedrî Can e. Lê di kovara *Ronahî* da em rastî tu çîrokeke Kamuran Bedîrxan û Nûreddîn Zaza nayên. Di vê serdemê de weşaneke din ku bûye navenda çîroka kurdî, rojnameya *Roja Nû* ye. Rojnameya *Roja Nû* ji alîyê Kamiran Bedîrxan ve li Beyrûdê di nevbeyna salên 1943-1946an de derçûye (Veroj, 2021: 143). Di rojnameya *Roja Nû* de li gorî Ferhad Pîrbal 19 heb çîrok hatine weşandin. Di Kovarê de çîrokên Kamiran Bedîrxan, Qedrîcan, Brahîmê Metînî û Silêmanê Hesenê Mercê weku çîroknûsên sereke derdikevin pêş. Ji van nozde heb çîrokan; deh hebê wê ji alîyê Silêmanê Hesenê Mercê ve hatine nivîsîn (Pîrbal, 1994: 107-108).

Ferhad Shakley weku serdema sêyem a çîroka kurdî jî “Nifşê Nivîskarên Gel” dide dîyarkirin û vê jî di navbeyna salên 1950-1969ê sînordar dike. Di navbera van salan de hin bûyerên siyasî rû didin. Ev rûdanên siyasî di heman demê de bandora xwe li çîroka kurdî ya modern jî dikin. Di vê heyamê de Komara Mahabadê

hildiweşe û bi hilweşîna Komara Mahabadê çîroka kurdî jî navendeke xwe ya taybet winda dike û ji deskeftîyên komarê bêpar dimîne. Dîsa di vê navberê de rejîma Iraqê li hemberî kurdan êrîşên mezin pêk tîne û ji ber van erîşan jî zirareke mezin digihîje weşangeriya kurdî. Kovara Gelawêjê jî, ji ber van astengîyan tê girtin. Lê piştî çend salan hin tevger û rêxistinên nû tên damezrandin. Di sala 1958an li Iraqê di pêşengîya General Qasim hikumeteke nû tê avakirin. Ji alîyê rejîma nû ve mafên kurdan di makezagona Iraqê de tên dîyarkirin. Bi vî awayî di qada weşangerîyê de kurd hin maf û destkeftîyan bi dest dixin. Hejmara rojname û kovaran zêde dibin. Ev yek jî bandorê li qada edebîyatê dike û çîroka kurdî jî ji vê yekê para xwe digire. Ev serdem ji bo çîroka kurdî salên giring in. Hejmara çîrokên kurdî di vê serdemê de bi awayekî berbiçav zêde dibe; bi şewaz û çîroknûsîya xwe ve nêzîkî deh nivîskaran derdikevin pêş. Babetên ku di vê heyamê de ji nivîskaran bûne mijar berfireh in. Ji bilî mijarên ji kevneşopîyê; mijarên nû yên weku zexta li ser jin û gundîyan jî di çîrokan de dîyar dibin. Taybetmendîyeke din jî ew e ku êdî mekanê çîrokê berfireh dibe û bajar jî ji çîrokê re dibe mekanekî nû. Mafên kurdan ên sîyasî, têkoşîna polîtîk, berxwedana li hember zordestan, çewisandina sîyasî; hin temayên din ên sereke ne. Ji alîyê şewazê ve ji nivîskarên vê nîfşê ji nîfşa Gelawêjê tekûztir in. Mustafa Salih Kerîm, Cemal Nebez, Muharrem Mihemed Emîn, Mihemed Mewlûd, Cemal Baban, Huseyîn Arif, Hesên Qizilcî, Dr. Rehîm Qazî, Kawis Qeftan, Mihemed Salih Seîd û Marûf Berzencî nivîskarên çalak yên vê serdemê ne (Shakely, 1998: 35-40).

Shakely, di dabeşkirina dîroka çîroka modern a kurdî de serdema çaran jî weku *Nîfşê Nû* pênase dike. Nîfşê nû di destpêka salên 1970î de destpê dike û heta dawîya salên 1990î berdewam dike. Li Kurdistana Iraqê piştî sala 1967an kovarên weku *Birayî*, *Ronahî*, *Rizgarî* û *Beyan* tên weşandin. Bi saya van kovaran çîroka kurdî bi awayekî berbiçav pêş dikeve. Van kovaran hewl dane ku di her hejmareke xwe de çîrokekekê biweşînin. Bi saya van kovaran çîroknûsên modern ên weku Ehmed Mihemed, Raûf Hesên û Sedrettin Arif gihîştine xwendevanan. Huseyn Arif nivîskarê herî navdar ê vê serdemê ye. Ji bo çîrokên xwe, bajar weku mekanekî nû bijartîye û di çîrokên wî de ji çînen cuda cuda leheng cî digirin. Ronakbîrên kurd ên modern di çîrokên wî de weku lehengên sereke derdikevin pêş û mijarên têkildarê

felsefeyê temayên sereke ne. Temayên zayendî jî di çîrokên wî de derdikevin pêş. Dîsa têkoşîna sîyasî jî weku mijareke sereke naveroka çîrokên wî dadigire. Hin çîroknûsên çalak ên vê serdemê ev in: Abdullah Sarrac, Muhamed Reşîd Fettah, Kaka Mem Botanî, Muhammed Fariq Hasan, Selam Menmî, Tahir Salih Saîd û Abdullah Agrîn (Shakely, 1998: 41-45).

Li gorî Sabir Reşîd, ger mirov behsa qonaxên çîroka kurdî bike divê mirov senifandineke cuda bi kar bîne. Lewra mirov nikare weku hin lêkolera çîroka kurdî li ser dehsalan dabeş bike. Ji ber ku li gelek deveran ev dem hinek caran ji deh salan kêmtir kêşaye û li hinek deveran jî temendirêjtir bûye. Rewşa kurdan ya sîyasî jî her wiha bandora wê li ser vê pêvajoyê çêbûye. Ji ber vê yekê jî qonaxên çîroka kurdî dema bê dîyarkirin hewce ye li gorî qad û kovar û rojnameyan bête dabeşkirin. Bo nimûne derçûna kovara *Gelawêjê*, destpêka salên 1970an û her wiha raperîna sala 1991ê bi sere xwe weku qonaxên edebî derdikevin pêş (Reşîd, 2005: 8).

Lêkoler Sabir Reşîd jî li ser rêça Shakely dimeşe. Lê senifandinên Sabir Reşîdî ji yên Sakely cîyawaztir dibin. Reşîdî çîroka kurdî li ser heft qonaxan dabeş dike. Reşîdî li gorî peydabûn û cîyawazîya xwe ve van qonaxan wiha rêz dike.

1. Qonaxa yekem: Reşîdî vê qonaxê weku destpêk diwesfîne û her wiha destpêka wê jî weku me li jor jî dîyar kirî bireferansên hin lêkolera ve heta sala 1852yan dibe û digihijîne berhema Mem û Zîn a Mele Mehmûdê Bazîdî.

2. Qonaxa duyem: Reşîdî vê qonaxê di navbeyna salên 1925-1939 sînordar dike. Ew vê qonaxê bi *Le Xewma* ya Cemîl Saîbî dide destpêkirin û derçûna Kovara *Gelawêjê* ve jî diqedîne.

3. Qonaxa sêyem: Reşîdî vê qonaxê bi derçûna kovara *Gelawêjê* ve girê dide û di vê qonaxê de behsa hin kovarên weku Nizar, Dengê Gêtî Taze û Peyamê dike.

4. Qonaxa çarem: Vê qonaxê di navbeyna salên 1950-1961 dîyar dike. Di vê qonaxê de çîroka kurdî bi awayekî berbiçav kamil dibe û pêş de diçe. Di vê navberê de çîroknûsên hêja derdikevine qada wêjeyê. Nivîskarên weku Muherem Mihemed Emîn, Mihemed Mewlûd Mem, Cemal Baban, Dr. Maruf Xeznedar, Hesên

Qizilcî, Kawis Keftan, Huseyn Arif, Kamran Mukrî, Mistefa Salih Kerîm û Maruf Berzencî di vê serdemê de bi awayekî çalak nivîsandine.

5. Qonaxa pêncem: Di vê serdemê de çîroknûsên kurd bi awayekî aşkera berhemên xwe nekarîne biweşînin. Hin astengî bêderfetbûn pêşîya berhemdayîna niviskaran girtîye lewma di vê serdemê de ji hêla hilberînîyê ve lawazîyek derketîye holê. Di dawîya vê serdemê de çîroknûsên weku Sedredîn Arif, Kake Mem Botanî, Ehmed Şakelî, Huseyn Arif û Ehmed Mihemed Îsmail bi çîrokên xwe ve derketine pêş.

6. Qonaxa Şeşem: Di vê qonaxê de çîroka kurdî hem ji hêla naverok hem jî ji hêla hejmarê ve pêş dikeve. Bidestxistina hin mafên sîyasî rê li pêşîya zimanê kurdî û derçûna kovarên kurdî vedike. Di vê serdemê de çîroknûsên nû derdikevin pêş bi vî awayî çîroka kurdî bi awayekî din diherike.

7. Qonaxa Heftem: Reşîdî vê qonaxa piştî salên 1991an dide destpê kirin û vê qonaxê weke qonaxa piştî raperînê pênase dike. Di vê serdemê de kurd ji ber hin destkeftûyên polîtîk di gelek warên jîyanê de di nava guherînên mezin de bûne. Vê guherînê bandora xwe li qada edebîyatê û herwiha çîroka kurdî jî kirîye. Çîrok, di vê serdemê de li gorî serdemên berê zêdetir hatine çapkirin. Çîroka kurdî di vê serdemê de ji hêla şêwaz û naverokê ve jî dugethere (Reşîd, 2005: 8-17).

Hevterîbê rewş û serpêhatiya çîroka modern a kurdî ya li Şamê û Başûrê Kurdistanê li Tirkîyeyê, di nava kurdên bakurî de çîroka kurdî lawaz maye. Her çiqas yekem metna kurdî li vir derçûbe jî; çîroka kurdî ji ber hin astengîyan bi rêkûpêk nehatiye hilberandin. Di destpêka sedsala 20î de li Stenbolê hin kovar û rojnameyên kurdî dest bi weşanê dikin. Derçûna kovar û rojnameyan rê li pêşîya pexşana kurdî jî vedike. Cara ewil di vê heyamê de weku çeşneke edebî çîrok jî di van kovaran de cihê xwe digire. Lê mixabin ev çeşn zêde belav nabe û tenê di kovara *Rojî Kurd*⁵ de çîrokek ji alîyê Fuadê Temo ve tê nivîsîn. Fuadê Temo çîroka bi sernavê “Çîrok”ê di her du hejmarên ewil yê *Rojî Kurd* de dide weşandin. Her çend di hejmara kovarê ya duyem de tê gotin ku wê çîrok berdewam bibe jî mixabin em di hejmarên pey de

⁵ Komeleya Hêvî di di 27ê Tîrmeha 1927an de li Stenbolê hatiye damezirandin. Pêşengên Komeleyê piştî damezirandinê bi mebesta belavkirina fikr û ramanên xwe kovara *Rojî Kurd* derdixin. *Rojî Kurd* di 6ê Hezîrana 1913an bi yekem hejmarê wê tê weşandin û di heman salê da çar hejmarên wê weşandin. (bnr. Seîd Verroj, *Rojnamegerî û Kovargeriya Kurd (1898-1932)*)

rastî berdewamîya vê çîrokê nayên û her wiha çîrok nîvco dimîne. Ji ber vê yekê jî çîroka kurdî em dikarin bêjin bi derengî û kulek dest pê kirîye (Rojî Kurd, 2002: 65, Cewerî, 2018: 39). Çîroka Fûadê Temo di nav edebîyata kurdî de weku “Şewêş” navdar bûye. Lê Fûadê Temo çîroka xwe bi sernavê “Çîrok”ê daye weşandin. Em teqez pê agahdar nînin gelo ev nav ji alîyê Fûadê Temo ve hatîye hîlbijartin yan ev nav ji alîyê berpîrsîyarên kovarê hatîye tercîhkirin. Şewêş navê lehengê çîrokê ye. Dema ku Mahmûd Lewendî wê ji tîpên erebî û tipguhêzê latînî dike navê lehengê çîrokê lê dike û çîrok jî her wiha bi sernavê “Şewêş” tê naskirin (Delikaya, 2014: 24).

Di warê çapemenî û edebîyatê de pêngavên ku li Stenbolê tên avêtin, piştî avabûna komara nû ya Tirkîyeyê re yekcar tên berhewakirin. Avabûna komara nû bi xwe re zext û qedexekirineke nedîtî jî tîne. Zimanê kurdî tê astengkirin û qedexekirin. Edebîyata kurdî jî para xwe ji van zextên giran digire û demeke dirêj li Tirkîyeyê êdî tu berhemeke kurdî nayê afirandin û çapkirin (Cewerî, 1996: 94).

Ev bêdengî hetanî derdora salên 1960î didome. Di vê serdemê de dîsa bi derçûna kovargerî û rojnamegerîya kurdî rêya çîrokê careke din jî dide vekirin. Li gorî saloxdayînên Firat Cewerî, Edîp Karahan (1930-1976) rojnameyeke mehane ya bi navê *Dicle-Firat* (1962-1963) derdixê û di vê rojnameyê de bi nasnavê Reşo hin çîrok nivîsandine (Cewerî, 2018: 171)⁶ Piştî rojnameya Edîp Karahan vê bêdengîyê dom kirîye û heta salên 1979-1980yî. Mehmed Emîn Bozarslan di sala 1979an de pirtûkeke çîrokan ya binavê *Meyro* diweşîne (Cewerî: 1996: 94-95). Berhema M. Emîn Bozarslan *Meyro* di warê çîroknûsîya kurdî de gaveke giring e. Lewra heta berhema Bozarslan li Tirkîyeyê tenê çend metnên çîrokan tenê hebûn. Cara ewil e ku ji hêla nivîskarekî ve pirtûkeke xwerû çîrokê tê weşandin.

Em dibînin ku di derdora salên 1980yî de çîroka kurdî hêdî hêdî ji bêdengîyê hişyar dibe. Filît Totanî di sala 1979yan de, di hejmara duyan a kovara *Tirêjê*⁷ de,

⁶ Rojnameya *Dicle-Firatê* de Edîp Karahan dihejmarên 2-3-4-6-7-8an de bi nasnavê Reşo tevahî 6 çîrok nivîsandine. Ji van 5 heb tirkî ne û yek tenê kurdî ye. Ew çîrok jî di hejmara rojnameyê ya 8an de bi navê Heydo û Ferho hatîye weşandin.

⁷ Kovara *Tirêje* di sala 1979an da dest bi weşana xwe dike û bi tevayî çar hejmar derdixê. Kovar li bajarê Tirkîyê Îzmîrê sê hejmar derdikeve û hejmara wê ya çaran li Swêdê hatîye çapkirin.

çîrokeke bi navê *De Were Binivisîne* diweşîne (Uzun, 1993: 55). Di kovara *Tîrêjê* de, Filît Totanî bi tevahî çar çîrok, M. Elî çîrokek û M. Brîndar (Malmîsanij) jî çîrokekê dinivîse. Çîroka ku ji alîyê Malmîsanijî ve bi sernavê *Engîştê Kejê* hatiye nivîsîn di hejmara kovara *Tîrêjê* ya duyemîn de derçûye. Ev çîrok, çîroka ewil e ku bi zaravayê zazakî/kirmanckî hatiye nivîsîn (Akman, 2018: 13). Ji xeynî van navan di kovarê de, di hejmara çaran de çîrokeke Mîrza Îbrahîmov⁸ tê weşandin (Tîrêj, 1981: 34).

Ji nav xebatên ku li ser çîroknûsîya kurdî hatine kirin xebata herî berfireh berhema Firat Cewerî ya bi navê *Antolojîya Çîrokên Kurdî* ye. Antolojî ji 3 bergan pêk tê û Cewerî di antolojîyê de ji Sovyeta berê, Iraq, Îran, Suriye, Tirkîyeyê û Ewropayê 151 çîroknûsan rêz dike û li gel kurtejiyana van nivîskaran ji her nivîskarê/î jî çîrokek daye weşandin. Her wiha di antolojîyê de ji tûpên kirîlî û erebî çîrok hatine latînîzekirin. Di antolojîyê da ji kurmancî, zazakî û soranî metnên çîrokan dane weşandin. Hinek ji van nivîskaran tenê metneke çîrokê nivîsîne hinekan jî pirtûkeke çîrokan û hinekan jî çend pirtûken çîrokan nivîsîne. Ji bilî çîroknûsên kurd ên li parçeyên welat çîrokên nivîskarên kurd ên li diasporayê jî di antolojiyê de cih digirin.

Bêguman şaxeke giring a ku çîroka kurdî lê vebûye û geş bûye jî diaspora ye. Ji ber sedemên polîtîk û civakî ji hemû parçeyan gelek kurd neçar man ku welatê xwe biterikînin û li deverên cuda cuda koçber bibin. Li Tirkîyeyê jî piştî cuntaya 12 Îlona 1980yê, gelek rewşenbîr û nivîskarên kurd mecbûr man koçî Ewropayê bikin. Koçkirina kurdan ya ber bi welatên Ewropayê ve bêguman digihîje salên beriya cuntaya 1980yê. Lê kurd, bi girseyî herî zêde di vê serdemê de mişextî bûne. Mişextîbûna kurdan li Ewropayê bi xwe re zindîbûna edebîyata kurdî jî anîye. Ewropa, di vê serdemê de nemaze jî Swêd, ji bo edebîyata kurdî dibe navendeke sereke. Piştî salên nodî, li Swêdê bi weşandina kovara *Nûdemê* re, çîroka kurdî ji xwe re ji nû ve derfeteke din peyda dike. Kovara *Nûdemê* di sala 1992yan de bi pêşengîya Firat Cewerî li Swêdê dest bi weşana xwe dike. Kovar di vê serdemê de di maweya

⁸ Li gorî agahîyên ku kovar dide, ev çîroka Mîrza Îbrahîmov e û Mîrza Îbrahîmov yek ji nivîskarên sovyetê ye. Çîrok ji alîyê Qanatê Kurdo ve hatiye neqilîkirin. Li gorî kovarê çîrok ji pirtûka wî ya bi navê “Rojê Wê Bê” hatiye wergirtin û bi navê “Strana Te Xelkê Aza wê Bistrê” di kovarê de weşîyaye. Lê mixabin her çend me hewl da jî me pirtûkeke nivîskar ya bi kurdî peyda nekir.

deh salan de 40 hejmar tê weşandin. *Nûdem* bi vî awayî li hêla Ewropayê dibe navendek. Di vê serdemê de gelek nivîskarên bi çîrokên xwe di kovarê de cihê xwe girtine. Di kovarê de ji bilî çîrokên nivîskarên kurd çîrokên werger jî hatine weşandin. Di hejmara yekê de çîrokek Hemîngway ji alîyê Dr. Poloço (wek nasnav xuya dike) ve hatîye wergerandin (Poloço, 1992: 52). Di hejmara sêyem de jî ji alîyê Firat Cewerî ve çîrokeke Jean Paul Sartre hatîye wergerandin (Cewerî, 1994: 78). Ji bilî van nivîskarên çîrokên hin nivîskarên weku Yaşar Kemal, Jack London, Jean Paul Sartre û hwd. jî hatine wergerandin. Ji ber ku ne pêkan e em hemûyan yek bi yek di xebata xwe de bi cih bikin me çend nimûne tenê jê dan. Di Kovara *Nûdemê* de çîroknûsên weku Lokman Polat, Hesenê Metê, Huseyn Arif, Fawaz Husên, Felat Dilgeş, Şahîne Bekirê Soreklî, Suzan Samanci û Fevzî Bîlge... bi çîrokên xwe ve beşdarê kovarê bûne.

Nivîskarên li qada Ewropayê, di edebîyata kurdî de weku nîfşê sûrgûnê jî tê naskirin. (Cewerî, 1996: 110). Ferhad Shakely, Firat Cewerî, Hesenê Metê, Helîm Yûsiv, Enwer Karahan di vê qadê de nivîskarên çalak in ku berhemên çîrokî afirandine.

Li Tirkîyê, di nava kurdên bakur de, salên nodî hem di warê çapemenîya kurdî de hem jî ji hêla çîroknûsîya kurdî ve salên giring in. Qedexeya li ser zimanê kurdî, di sala 1991ê de li Tirkîyê nisbî be jî tê rakirin (Zeraq, 2021: 89). Ev yek pêşîya weşangeriya kurdî û her hiwa nivîskariya kurdî vedike. Di vê serdemê de kovarên weku *Nûbihar* û *Rewşen* tên weşandin. Di van her du kovarên navborî de jî gelek çîrok tên weşandin. Lê di vî warî de *Nûbihar* ji ber ku temendirêjtir bûye zêdetir çîroknîvîs di hejmarên xwe de ciwandine.

Ji xeynî van kovaran piştî salên 2000î û şûn de, kovarên wek; kovara *W, Çîrûsk*, *Hawara Botanê*, *Tîroj* û *Hinarê* de jî çîrokên kurdî cîye xwe girtine (Tilermenî, 2015: 12). Li bakur di warê çîrokê de mirov dikare nivîskarên wek; Munzur Çem, Îhsan Espar, Nadîre Gûntaş Aldatmaz, Îlhamî Sîdar, Şener Ozmen, Yaqob Tilermenî, Fatma Savci, Qahir Bateyî, Denîz Gûndûz, Mehmet Dicle, Lokman Ayebe, Mihemed Şarman, Bahoz Baran, Şêxo Fîlîk, Mem Zinistanî, Mîran Janbar, Omer Dilsoz û Yildiz Çakar mînak nîşan bide (Cewerî, 2018: 36). Ji bilî van

nivîskarên navborî di çîroka kurdî de mirov dikare van navên hanê jî rêz bike: Receb Dildar, Fawaz Husên, Enwer Karahan, Şêrzad Hesen, Lorin S. Doğan, İnan Eroğlu, Ferhad Pîrbal, Hesenê Metê, Ciwanmerd Kulek.



BEŞA YEKEM

1.1 EDEBÎYATA KURDÎ YA QONAXA SOVYETÊ

1.1.1 Perwerdeya bi Kurdî li Ermenistana Sovyetê

Beriya mirov li edebîyata kurdî ya Sovyeta berê binêre divê di serî de paşxaneyê peydabûna vê qonaxê dîyar bike. Lewra destpêbûna edebîyata kurdî li Sovyetan ne bi helwesta nivîskar û rewşenbîrên kurdan bi vîn û serwerîya Sovyetan derketîye holê. Ji xwe di vê serdemê de li Sovyetan mirov nikare qala nifşekî xwende bike. Mafê perwerdehîyê nemaze ne tenê ji bona kurdan, ji bona hemû gelên jêdestîya Sovyetan hatîye dabînkirin. Ji ber ku piştî Şerê Cîhanê yê Yêkemîn kurd ji hev parçe dibin û sînorên zexm dikevin navbeyna kurdan. Kurd ji hev dûr dibin û li welatê ku kurd lê dijîn jî, ji bo kurdan mafê zimanê dayîkê ji holê tê rakirin. Kurdên ku mişextîyê Sovyetê dibin bi jîyaneke nû re rû bi rû dimînin. Di vê jîyana nû de kurd dibin xwedîyê mafê zimanê dayîkê. Vê derfetê jî li Sovyetan, nemaze li Ermenistana Sovyetê rêya edebîyata kurdî daye vekirin.

Pêşketina edebîyata kurdî bi şert û mercên kurdan ve girêdayî bûye. Dîroka edebîyata kurdî ji vî alîyî ve gelek dîyardayan dihevwîne. Kêngî ku kurdan derfeteke azadîyê bi dest xistine; di encamê de gelek berhemên giranbiha afirandine. Rewşa Kurdên Yekîtiya Sovyetê ji bona vê yekê mîna keke giring e (Ertekîn, Yıldırımçakar, 2020: 12).

Di çarçoveya perwerdeya kurdî ya li welatê Sovyetê de vebûna dibistanên kurdî digihîje beriya Şoreşa Cotmehê. Li gorî agahîyên ku Eskerê Boyik dide navbeyna salên 1900-1904an de di gundên kurdan de ji bo perwerdeya zarokên kurdan sê dibistanên seretayî yên çar sale tên vekirin. Ev dibistan bi zimanê rûsî perwerde didin û di demekê kin de jî tên girtin (Boyik, 2012: 10). Ev yek piştî Şoreşa Cotmehê yekser diguhere. Piştî Şoreşa Cotmehê bi serkêşîya Bolşevîkan perwerde dibe mecbûrî û li seranserê welatê Sovyetan bi 30 zimanên cuda ve perwerde tê dayîn (Bonnard, 2001: 15-16). Li welatê Sovyetê perwerdeya zimanê kurdî jî di nava van şert û mercan de dest pê kir û kurd li vî welatî bûn xwedî ziman û dibistanên kurdî.

Her wiha rojnameya *Rêya Teze* di 25 Adara 1930an de dest bi weşana xwe dike. Li ser rûpela rojnameyê gotineke Lenîn bi tîpên mezin wiha cih girtîye: “Dewleta şêwrê da meryê nexwendî gerekê qe nemîne” (Alakom, 2023: 15). Ev gotin helwesta Sovyetan ya li hemberî perwerdekirina gelên Sovyetê nîşan dide. Rayedarên Sovyetê di bin pêşengîya Partîya Komînîst de pêngaveke mezin diavêjin. Piştî damezirandina Yekîtiya Komarên Sovyetê ên Sosyalîst (YKSS) her netew li gorî hejmara xwe di cihê xwe de weku otonom hatin naskirin. Lê kurd ji vê yekê bêpar man. Kurdên Sovyetan her çiqas ji otonomîyekê bêpar mabin jî, ji îmkânên Sovyetan para xwe girtin. Li Azerbaycanê Qezaya Kurdistana Sor û li Ermenistanê jî derdora Elegezê xwendina kurdî pêş de çû û kurdan di warê edebîyata kurdî de xwe pêş ve birin. Li gorî sîstema Sovyetê hemû mafên xwendine ji aliyê dewletê ve dihat dabînkirin (Eşo, 2018: 28).

Dema Şoreşa Cotmehê pêk tê û Ermenistan dikeve bin desthilatdariya Sovyetan, dewleta Sovyetê li gorî bîrdozîya sosyalîzmê li Ermenistanê ji bona perwerdeya kurdî gelek derfetan dabîn dike. Di gundên kurdan de dibistanên kurdî tên vekirin û alfabeya kurdî tê amadekirin (Serdar, 2017: 6). Piştî vebûna dibistanên kurdî ji bo dersên kurdî materyal jî tên amadekirin. Di sala 1929an de ji bo dersên zimanê kurdî ji hêla Îsahak Marogûlov û Ereş Şamîlov ve pirtûka bi navê “Xu Xu Hînbûna Xwendina Nivîsara Kurdî Kurmancî” tê amadekirin (Serdar, 2017: 6). Rojnameya *Rêya Teze* bi vê alfabeyê tê çapkirin. Ev yek jî li gorî bernameya Lenîn dihat pêkanîn. Her netew, kêmnîetew bi zimanê xwe perwerde dibûn. Lê mixabin ev maf tenê li hin navçe û gundên Ermenistanê pêk hat. Piştî ku li Ermenistanê dibistanên kurdî hatin vekirin li paytexta Gurcîstanê Tiflîsê jî dibistaneke kurdî hate vekirin. Li Ermenistanê jî bi alîkarîya hin ermenîyan kurd gihîştin mafê perwerdeya zimanê dayîkê. Di derdora salên 1930î paş ve hemû dibistanên gundên kurdan werdigerîne kurdî (Eşo, 2018: 34-35).

Berê li Ermenistanê nîfşekî kurd yê xwende nebû. Ne ku nîfşeke xwende; rêjeya xwendînê di nava kurdan de di vê serdemê de hema bêje hezaran yek bû. Ev yek piştî şoreşa cotmehê û vebûna dibistanên kurdî ve di derdora salên 1970yan de digihîje %99an (Hassanpour, 2005: 336-338). Ev jî ji bo perwerdeya kurdî arîşeyeke

giring bû. Ev valahî ji alîyê rewşenbîrên ermen yê kurdîzan ve hate çareserkin. Di sala 1921ê de li ser biryara hukumeta Ermenistanê, ji bo polên yekemîn û duyemîn perwerdeya zimanê dayîkê tê destpêkirin. Tam di vê navê de ji bo kurdî jî ji alîyê Lazo ve pirtûka Şems bi tîpên ermenkî hatîye amadekirin. Her wiha dema em tî sala 1925an di bin desthilatdariya Sovyeta berê de li Ermenistan û Azerbaycanê hejmara dibistanên kurdî digihije 55an (Şamil, 2005: 93). Di salên 1927-1928an de ji nav sêzdeh mamosteyên ku li dibistanan ders didin, weku kurd tenê Emînê Evdal heye. Ji bona holêrakirina vê yekê jî, da ku qadroyên kurd pêş bikevin di salên 1928 û 1929an de 23 xwendekarên kurd, ku yek ji van jî Qanatê Kurdo bû, ji bo xwendina bilind dişînin Lenîngiradê. Ev pêşketin berdewan dîkin û di sala 1928an Erebe Şemo û Îsahak Marogûlov bi tîpên latînî alfabeya kurdî amade dîkin. Di sala 1930î de li paytexta Ermenistanê Erîvanê vê carê Teknîkûma Pedagojîya Kurdî ya Dibistana Bilind tê avakirin (Şamil, 2005: 94-95). Di vê teknîkumê de gelek kesayet perwerde dibin û di paşeroja edebîyata Sovyetê de cihê xwe digirin.

Em ji bîranînên nivîskar Emerîkê Serdar (1935-2018) jî pê agahdar dibin ku li gundê wan beriya Şoreşa Cotmehê dibistan tune bûye. Di sala 1922an de di gundê wan de dibistaneke çar sale tê vekirin (Serdar, 2018: 38).

Li Ermenistanê di sala 1928an de bi biryara Partîya Komînîst ve amadekirina alfabeya kurdî tê girtin û ev kar A. Mravyan, A. Şamilov, Ş. Teymûrov tê spartin. Di heman salê de ji alîyê Îsahak Marogulov û A. Şamilov ve alfabeke kurdî li ser tîpên latînî tê amadekirin. Di sala 1929an de ji alîyê Komîserîya Perwerdehîya Gel ve ji bona belavkirina vê alfabeke plansazîyek tê amadekirin. Li gorî vê plansazîyê;

1. Hem ji alîyê çapemenîyê ve hem jî di civînên gel de giringîya vê alfabeke bête dîyarkirin.
2. Ji bona xwe bi xwe hînbûnê divê li gorî vê alfabeke pirtûk bî çapkirin.
3. Di dibistanên kurdî de, di polên yek û duyê de ji bona zimanê dayîkê polên nû bî vekirin û hî pirtûkên giştî yê edebî bî çapkirin.
4. Di qursên du mehane de qadroyên nû bî amadekirin.

5. Di Adara 1929an de konferanseke giştî ya kurdî bê lidarxistin (Şamil, 2005: 94).

Li Ermenistanê di Teknîkûma Pedagojîya Kurdî ya Dibistana Bilind de, di sala 1931an de; di bin berpirsîyarîya Erebe Şemo de xwendekar dest bi xwendina xwe dikin. Ev Teknîkûm ji bona gihîştina qadroyên zimanê kurdî dibe navendeke girîng. Hejmara xwendekarên ve teknîkûmê di salên 1933-1934an de digihîje 101 xwendekarî. Ji Ermenistan, Azerbaycan û Gurcîstanê gelek xwendekar di vê teknîkûmê de perwerde dibin. Li Teknîkûmê Erebe Şemo, Hecîyê Cindî, Emînê Evdal, Wezîrê Nadîrî, Casimê Celîl, Çerkez Bakayev, Xalit Çetoyev, Bro Memoyev û hin kesên ermenî weku mamoste perwerdeyê didin. Bi van hewildanan ve xwendekarên kurd her ku diçe zêde dibin. Di sala 1934an li Ermenistanê di 45 dibistanên kurdî de bi tevahî 2365 xwendekar tên perwerdekirin (Şamil, 2005: 96). Ev hejmar di destpêka sala perwerdeyê ya 1932-1933an bi 40 dibistan, 71 mamoste û nêzî 2000 xwendekaran pêk dihat (Öztaş, 2016: 27). Ji van agahîyan jî tê dîtin, her ku çûye; sal bi sal perwerdeya kurdî berbelav bûye û pêşda çûye.

Li Ermenistana Sovyetê cihê kurd lê dijîn perwerde heta lîseyê bi zimanê kurdî û bi alfabeya latînî hatîye dayîn. Ev polîtîkaya Sovyetê bû û heta derdora 1938an bi vî şiklî dom kirîye. Lê Şerê Cîhanê yê Duyemîn darbeyeke mezin gihandîye vê polîtîkaya Sovyetê. Di destpêka şer de mafên ji kêmteweyan re hatine tayînkirin demildest tên qedexekirin. Bi vî awayî perwerdeya kurdî ya kevne Sovyetê jî ji holê tê rakirin (Gültekin, 2019: 7).

Piştî rejîma Stalîn tê ser kar hema bibêje hemû derfetên ku ji bo kêmteweyan hatibûn dayîn ji holê radibin. Piştî vê serdemê her çiqas ev qedexe hatibe rakirin jî êdî dibistanên kurdî hew vedibin. Tenê cîyê ku kurd lê zêdene di dibistanên wan deveran de ji pola duyan heta pola heştan heftê du saet dersên ziman û edebîyata kurdî tên dayîn (Gültekin, 2017: 76).

1.1.2 Danasîneke Giştî li ser Edebîyata Kurdî ya Sovyetê

Edebîyata kurdî weku kurdan ji hev parçebûyî û ji hev dûr hatîye berhemanîn. Yek ji van parçeyan jî li Kafkasyayê rû daye. Edebîyata kurdî ya Kafkasyayê bi

piranî di navbeyna salên 1920-1991ê de tê tarîxkirin û li welatên; Ermenistan, Gurcistan û Azerbaycanê de pêşketîye. Hin lêkolerên edebîyata kurdî vê serdemê weku “Êwra Kavkazê” pênase dikin (Ertekin û Yıldırımçakar, 2020: 11). Pênasekirina “Êwra Kavkazê/Kafkasyayê” di edebîyata kurdî de weku jargoneke zanistî cihê xwe girtîye (Ulugana, 2017: 46). Ev dîrok bi avabûna Yekîtiya Komarên Sosyalîst ên Sovyetê dest pê dike û piştî hilweşîna wê jî dawî dibe. Hilweşîna Yekîtiya Sovyetan edebîyata kurdî ya li vî welatî pêkhatî, bêpişt dihele û her ku diçe ev qonax lawaz dibe û rewşa xwe ya berê ji dest dide. Rewşenbîrên kurd ji ber bêmecalîyê her yek li devereke belav dibin û her wiha ev qonax giringiya xwe wenda dike.

Êwra Kavkazê di edebîyata kurdî de bi awayekî giştî li ser sê qonaxan tê dabeşkirin. Ev dabeşkirin li gorî hin guherînên siyasetîkirin. Bi Şoreşa Cotmehê re jîyana kurdên Ermenistanê yekser diguhere. Kurd mecalên perwerdeyê dest dixin û di gundên xwe de bi zimanê xwe perwerde dibin. Ev yek jî di heman demê de bandora xwe li edebîyatê dike û berhemên kurdî yek bi yek tên weşandin. Her çiqas yekem çîroka kurdî li vê qonaxê rû nedabe jî ev qonax dibe warê yekem romana kurdî.

Nivîskar Lal Laleş edebîyata kurdî ya ku di serdema Sovyetê de geş bûye weku “edebîyata mişextî” bi nav dike. Li gorî nivîskar ev edebîyat ji hêla kurdên êzîdî ve yên ku ji serhedê mişextîyê Sovyetê bûne hatîye lêkirin. Lewra divê ev qonax weku qonaxa mişextî bê navkirin. Bo nimûne ji pêşengên vê qonaxê Hecîyê Cindî, Erebê Şemo, Emînê Evdal ji Qersê Elîyê Evdîlrehman ji bajarê Wanê mişextîyê Sovyetan bûne (Laleş, 2012: 371).

Mişextîbûn di edebîyata Kurdî ya hêla Sovyetê de weku temayeke serekê di berhemên serdemê de xwe dide nîşandan. Ev babet di vê serdemê de ji alîye gelek nivîskaran ve tê bikaranîn. Ber bi dawîlêhatina Şerê Cîhanê yê Yekemîn re li Sovyetan Bolşevîk desthilatdarîyê dest dixin û ji pêşkafkasyayê hêzên xwe vedikişînin. Piştî vekişîna hêzên Bolşevîk kurdên êzîdî bi êrişên Osmanîyan re rûbirû dimînin û koçî welatê Ermenistanê dikin ku wê çaxê di bin desthilatdariya Sovyetan de bû (Ulugana, 2017: 39). Dîroka dîasporaya kurdan a li nav sînorên Rûsyayê

digihîje berîya Şoreşa Cotmehê. Di sala 1877-1878an de şerê di navbera Rûsya û Osmanîyan de devera serhedê dikeve bin hukumranîya Rûsyayê. Kurdên Êzîdî jî wek niştecihên herêma serhedê qasî çil salan di bin vê hukumranîyê de jîyana xwe didomînin. Piştî Şoreşa Cotmehê û pêvçûnên navbera Osmanî, Ermenî û Rûsan dibe sedema koçbûna kurdên Êzîdî ber bi Sovyetan. Kurdên Êzîdî di derdora sala 1918an bi awayeke girseyî ji serhedê koç dikin (Can, 2017: 51).

Peydabûna edebîyata kurdî li Sovyetan weku ku tê dîtin bi mişextîbûna êzîdîyan ve jî girêdayîye. Lewra hem di nava sînorên Osmanîyan de hem jî di nava sînorên Îranê de kurdên êzîdî rastî zordestîyê tên û ji ber vê zordestîyê jî koçî nava sînorên Rûsyayê dibin. Împaratorîya Rûsyayê di vê serdemê de ji bona kurdan, ku zêdetirî wê êzîdî bûn, dibe stargehek. Pişt re hatina bolşevîkan jî bi xwe re derfetên çandî û edebîyatê tîne û kurdên ku mişextî bûne, ji welatê xwe derketine, dibin xwedîyê dibistanan û pêşdaçûyîneke bêhempa (Boyik, 2012: 10).

Nivîskar Tosînê Reşîd di pêşketina edebîyata kurdî ya qonaxa Sovyetê de rol û giringîya rewşenbîrên ermenî derdixe pêş.

Li YKSSyê her çiqasî hejmara kurdan kêmtir jî be, bi derfetên Sovyetan di warê edebîyatê de berhemên hêja afirandin. Ger qala vê serdemê bête kirin divê tavlê heyce ye mirov qala edebîyata Kurdên Ermenistanê bibîr bîne. Ji ber ku ji sedî 80-90 rewşenbîr û nivîskarên Kurd ji Ermenistanê bûn. Du sedemên vê yekê hene; yek ji van Tevera Kurdî ya netewî li Ermenistanê her tim xurt bûye û ya duyem jî helwesta ermenîyan li hemberî çand û edebîyata kurdî helwesteke êrenî bû. (Reşîd, 2012:202).

Têmûrê Xelîl jî li ser vê babetê radiweste û di geşbûna edebîyata kurdî ya li Ermenistanê de du sedemên din dîyar dike. Li gorî nivîskar; di Şerê Cîhanê yê Yekemîn de gelek zarokên kurd bêxwedî dimînin û di sewîxaneyên Amerîkayê ya li Ermenistanê de tên xwedîkirin û perwerdekirin. Kurdên ku ji vê sewîxaneyê mezin dibin pişt re di edebîyata kurdî ya Ermenistanê de dibin navên pêşeng û bi berhemên xwe ve edebîyata kurdî pêş ve dibin. Li gorî nivîskar sedema din jî; li Ermenistanê di 35 gundan de kurd hebûn û ev gund piştî destpêka perwerdeya kurdî di bin stargeha ziman û çanda kurdî (Xelîl, 2014: 17-18). Her çiqas ev nêrînên Tosînê Reşîd û

Têmûrê Xelîl tespîten rast bin jî; çend sedemên taybet ên pêşdaçûyîna edebîyata kurdî li Ermenistanê jî hene. Lewra di pêşketina edebîyata kurdî ya Ermenistanê de sedemek jî dîne êzîdîtî/êzdayetîyê ye. Hem kurdên ku li Ermenistanê niştecih bûn hem jî kurdên ku pişt re mişextîyê vî welatî bûn piranîya wan êzîdî bûne. Qedexebûna zewaca êzîdîyan a bi endamên dînen din re bûye sebeb ku nasnameya xwe ya kurdî û her wiha zimanê xwe yê kurdî biparêzin. Vê yekê jî bandor lê kirîye ku zimanê kurdî pêş de here. Edebîyata vê qonaxê mirov dikare weku edebîyateke dînî jî binase (Eşo, 2018: 39). Mirov rewşa kurdên Azerbaycanê û yên Ermenistanê bi vî alîyî ve binirxîne dê vê yekê îsbat bike ku dîne êzîdîtîyê bûye stargeha parastina nasnameya kurdî. Lewra kurdên Azerbaycanê li gorî kurdên Ermenistanê zêdetir bûn. Di nava Yekîtîya Sovyetan de hejmara kurdan herî zêde li Azerbaycanê bûye. Lê kurdên Ermenistanê ji ber ku êzîdî bûn nasnameya xwe parastin lê kurdên Azerbaycanê di nava azerîyan de hatin pişavtin û ji ber vê sedemê jî çand û edebîyata kurdî li vî welatî bi pêş de neçû (Şamil, 2005: 15). Lê sebebê vê yekê ne tenê dîne êzîdîtîyê ye, lewra helwesta komarên girêdayî Sovyetê jî ji hev cihê bû. Rayedarên Ermenistanê, li gorî rayedarên Azerbaycanê nermtir bûn ev jî sedemeke din e ku li van her du welatan çand û edebîyata kurdî ji hev cihê bibe (Eşo, 2018: 71).

Digel van xalên ku me behsê kirin, li Sovyetan edebîyata kurdî rasterast bi polîtîkaya dewletê ve pêwendîdar bûye. Carna bi kurdan têkilîyên xurt ava kirine û carna jî ev têkilî yekser ji holê hatine rakirin. Meseleya Sovyetan ne tenê li hemberî kurdên di nava Sovyetê de bûye, hin caran rewşa kurdên derveyî Sovyetê jî li ser edebîyata kurdî ya wê serdemê bi bandor bûye (Tael, 2001: 91). Ji ber vê yekê jî edebîyata kurdî ya Sovyeta berê ji alîyê naverok û babetên xwe ve, ji edebîyata parçeyên din cihêtir e. Edebîyata ku parçeyên din hatîye afirandin bêhtir li ser babetên mîna mafên kurdan û têkoşîna kurdan rawestiyaye. Lê dijberî vê, ji ber polîtîkayên Sovyetê, di edebîyata kurdî ya dema YKSS de mijar yekser diguhere û mijarên weku biratîya gelan, xweza, evîn û îdealîzekirina nîrxên jîyana nû di çarçoveya rêbaza realîzma civakî de hatine afirandin (Breteque, 2017: 106). Mirov dikare bibêje her çiqas polîtîkayên Sovyeta berê kêrhatî jî bin, sînordarkirina nivîskaran ya derdora realîzma civakî rê li pêşîya dewlemendbûna edebîyata kurdî girtiye.

Edebîyata Kurdî ya Sovyeta berê weku edebîyateke pir şax hatîye avakirin û edebiyateke pircureyî derketiye holê ku di warê roman, helbest û çîrokan de gelek berhem hatine afirandin. Lê di nav ewqas xebatan de rexneya edebî pêşde neçûye. Tosinê Reşîd di vê babetê de berpirsîyarên rojnameya *Rêya Teze* nexasim berpirsîyarê rojnameyê Mîroyê Esed tawanbar dike.

Mîroyê Esed, berpirsîyarê rojnamê bû, endamê komîta navendî, ya partîya komunîst ya Ermenîstanê bû, endamê parlamentoya Ermenîstanê bû. Wî bi temamî rê li pêşîya rexnegirîyê girtibû. Bi bawerîya wî, eger gotarên rexnegirîyê çap bibûna, ji rojnamê û kesayetîya wî re problem dê çêbibûya. Problema edebîyata kurdî wisan jî ji wî nebûne xem. Wî karê xwe yê şexsî, di ser derd û kul û problemên edebîyata kurdî re digirtin. (Reşîd, 1996: 154).

Çarçoveya ku me heta li vir ji bo edebiyata kurdî ya li Sovyetê xêz kiriye ji der barê panoramaya giştî ya sedsalekê de agahiyên giring dide me. Li gel hemû kêşe û kêmasiyên xwe edebiyata ku li Sovyetê pêş ket demekê bû parçeya herî berhemdar a edebiyata kurdî. Ji ber sedemên navxweyî û taybet her çiqas navbirî dabin xebatên xwe û Sovyet hilweşiyabe jî mirov dikare ji bo sînorên edebiyata kurdî tim mîna jêderkeke bingehîn serî li mîrateya wê derê bixe. Ev edebiyata li sovyetê pêş ketiye ji aliyê gelek kesan ve ji ber rewşa xwe ya taybet li ser hin qonaxan hatiye dabeşkirin. Niha jî em ê behsa qonaxên vê edebiyatê bikin.

1.1.3 Qonaxên Edebîyata Kurdî li Sovyetê

Edebîyata kurdî ya kevne Sovyetê ger em bi damezrandina Sovyetê û têkçûyîna wê bidin ber çav bi qasî heftê salan dom kirîye (Xelîl, 2014: 12). Bi giştî di edebîyata kurdî de dabeşkirina deman tiştêkî zehmet e. Lewra edebîyateke belawela ye û yekrengîyek jî pêk nehatîye. Lê mirov dikare bi hêsanî edebîyata kurdî ya kevne Sovyetê li ser hin qonaxan dabeş bike. Ji ber ku her serdemek di nava xwe de xwedîyê taybetmendîyên ji hev cihê ye. Lêkolînên li ser vê qonaxê hatine kirin nîşan didin ku ev qonax, li gorî hin taybemendî û rûdanên siyasî; li ser sê serdeman dikare

bê dabeşkirin.⁹ Me jî di xebata xwe de ev yek weku rêgez hîlbijart û edebîyata kurdî ya serdema Sovyetê li gorî van qonaxên dîyarkirî nirxand. Her çend piştî têkçûna Sovyetê ji alîyê hin nivîskaran ve li Sovyetê berhemên edebî hatibûn nivîsîn jî edebîyata kurdî li vê qonaxê giringî û geşedana xwe ya di dema Sovyetê de ji dest dide, piştgirîya ku ji hêla dewletê ve dihate dabînkirin yekcar disekine û nivîskarîya kurdî asta xwe ya berê di vê qonaxê da wenda dike.

Li ser vê nivîskar Eskerê Boyîk di pirtûka xwe ya bi navê “Çanda Kurdên Sovyetê” de bi berfirehî li ser vê serdemê rawestîyaye û nûserên vê serdemê yek bi yek daye nasandin. Li gorî Boyîk, ev serdem bi tevahî derdora 65-70 salan dom kirîye. Li gorî hin rûdanên sîyasî edebîyata kurdî ya Sovyetê ji alîyê Boyik ve li ser sê serdeman tê dabeşkirin. Dema pêşîyê di navbeyna salên 1920-1937an hatîye dîyarkirin. Ev serdem bi damezrandina Sovyetan dest pê dike û heta sala 1937an dom dike. Di sala 1937an de ji alîyê Stalîn ve, di vê serdemê de sekreterê giştî yê partîya komînîst ya Sovyetan e, rojnameya *Rêya Teze* û dibistanên kurdî tên girtin, hin nivîskarên kurd dikevin girtûgehê û hinek ji wan jî ber bi Sîbîrê ve tên nefîkirin. Ev qonax weku qonaxa “rawestan”ê tê pênasekirin. Di destpêka desthilatdariya Stalîn de li Yekîtiya Sovyetan hemû derfetên ku ji bo çand û zimanê kurdî derketibûn holê bi destê Stalîn ve hatine qedexekirin û hejmareke zêde kurdên Ermenistanê ku di nav de hin rewşenbîr jî hebûn, hatine nefîkirin. Ev yek hetanî destpêka salên 1950î domîyaye û edebîyata kurdî di vê serdemê de, di nava bêdengîyeke de dimîne. Lê piştî mirina Stalîn ev rewş yekser dîsa diguhere û derfetên ji bo kurdî di berê de hatibûn dabînkirin dîsa bi piştgirîya dewletê hin sazî û dibistanên kurdî hatine vekirin. Vê yekê piştî sala 1955an dest pê kir. Di sala 1955an de Radyoya Rewanê bi kurdî dest bi weşana xwe dike (Eşo, 2018: 75). Di destpêka vê qonaxê de rojnameya *Rêya Teze* ji nû ve dest bi weşana xwe dike. Li gorî qonaxên din di vê serdemê de xebatên nivîskarên kurd gumrehtir dibin. Ev qonax her wisa di dîroka edebîyata kurdên kevne Sovyetê de weku “qonaxa zêrîn” tê navkirin (Boyîk, 2012: 18).

⁹ Di dabeşkirina edebîyata Kurdî ya Yekîtiya Komarên Sovyeta Sosyalîst de me berhem û gotarên nivîskarên wê serdemê berçav girtin. Bnr. Eskerê Boyik, *Çanda Kurdên Sovyetê*, r. 12-20; Hejarê Şamil “Diaspora Kurtleri”, 93-102; Tosîne Reşîd, “Sovyetler Birliği’nde Kürt Edebiyatı”, Vecdî Erbay, *Inatçı Bir Bahar Kürtçe ve Kürtçe Edebiyatı*, r. 202-212; Têmûrê Xelîl, *Antologîya 35 Helbestvan û Nivîskarên Kurd ên Sovyeta Berê*, r. 12-26 û Emerîkê Serdar, “Pêşdeçûyîna Lîteratûra Kurdaye Sovyetê”, *Wêje û Rexne*, (Wêjeya Kurdî Ya Kafkasyayê) r. 6-22.

1.1.3.1 Qonaxa Yekem: Destpêk (1920-1937)

Bi damezirandina Sovyetan re neteweyên li vî welatî di vejandin û pêşxistina çand û edebîyata xwe de bûne xwedîyê derfetên mezin. Kêm û zêde, pirjimar yan jî kêmjimar hemû neteweyan ji vê yekê para xwe jê wergirtin. Kurdan jî ji vê yekê sûd wergirtin û vê yekê jî li pêşîya edebîyat û çanda kurdî qadeke berfireh vekir.

Edebîyata kurdî ya Sovyetê li ser rêbaza *realîzma sosyalîst* hatîye berhemandin. Kongreya Yekîtiya Nivîskarên Sovyetê di sala 1934an de tê lidarxistin û di vê kongreyê de Realîzma Sosyalîst weku rêbazeke îdeolojîk a fermî li ser nivîskaran tê ferz kirin. Heman salê, li Sovyetan kongreyeke kurdzanîyê jî tê amadekirin (Eroğlu, 2016: 141, Kutlay, 2012: 230). Ji bona pêşxistina zimanê kurdî û li ser xebatên kurdî di vê kongreyê de hin xalên sereke tên dîyarkirin. Pirsgrêkên li pêşîya kurdolojîyê, esasên gramera kurdî, avakirina termînolojîya kurdî di kongreyê de tên nirxandin û biryara tomarkirina berhemên folklorîk yên kurdî ji tê girtin. Ev yek ji bona parastina keresteyên folklorîk gaveke giring e. Biryar û nirxandinên ku di vê kongreyê de tên dîyarkirin li Sovyetan dibe bingeha kurdolojîyê. Piştî vê kongreyê em dibînin gelek kesayet li ser kurdolojîyê tezên doxtorayê amade dikin. Di vê navê de ji bo çapkirina pirtûkên kurdî di bin banê weşanxaneyê dewleta Ermenistanê de beşa kurdî tê vekirin. Piştî vê yekê pirtûka ewil a edebî ji alîyê Lazo ve bi sernavê *Serpêhatîya Casim* hatîye çapkirin. Hem biryarên kongreyê hem jî vekirina beşa kurdî rê li pêşîya berhemên kurdî vedike. Berevokeke şair û nivîskarên kurdan di sala 1932an de tê çapkirin. Hin helbest û çîrokên nivîskarên weku Hecîyê Cindî, Emînê Evdal û Etarê Şero di vê berhemê de cih digirin (Boyîk, 2012: 13-14, Şamil, 2005: 96-97). Li gorî lêkolera Hejarê Şamil berîya Kongreya 1934an du kongreyên din yên kurdzanîyê tên lidarxistin. Yekem konferansa kurdzanîyê di sala 1925an de li Ermenistanê navçeya Lenînakanê tê lidarxistin. Konferanseke din jî di sala 1926an li navçeya Talînê tê lidarxistin. Biryara amadekirina alfabeyeke kurdî ya li ser hîmê latînî di van konferansan de tê girtin û ji bona pêkanîna vî karî jî ji komarên Azerbaycan, Ermenistan û Gurcîstanê dawxaz tê kirin û pişt re ev yek di komarên Ermenistan û Gurcîstanê de tê rojevê (Şamil, 2005: 93-94).

Berhema “Efrandina Ewlîn” ji alîyê çapxaneyê dewletê ve di vê serdemê de hatîye çapkirin. Pişt re di sala 1934an de berhemek din bi sernavê “Efrandina Duda” weku antolojî tê çapkirin. Di vê berhemê de jî berhemên nivîskarên serdemê yên weku Hecîyê Cindî, Cerdoyê Gêncî, Emînê Evdal, Ahmedê Mirazî û Casimê Celîl tê de cih digirin. Berhemeke din jî di sala 1935an de bi sernavê “Nivîskarê Kurmanca Şêwirî; Efrandina Sisîya” li Erîvanê çap dibe. Ji xeynî van berhemên antolojîk hin nivîskar jî berhemên xwe weku pirtûk didin çapkirin. Ahmedê Mirazî “Zemanê Çûyî”, Emînê Evdal “Bihar”, Etarê Şero “Biriqandina Ewîl” Erebe Şemo “Şivanê Kurmanca” û Wezîrê Nadrî “Nûbar” û “Reva Jinê” berhemên serbixwe ne ku di sala 1935an de hatine çapkirin (Xelîl, 2014: 18).

Ji xeynî van xebatan di sala 1931ê de sê berhemên Erebe Şemo *Koçeke Derewîn*, *Kurmancê Elegezê* û *Înqilaba Oktobirê* tîne weşandin. Di sala 1932an de Hecîyê Cindî berhema xwe ya şanoyê bi sernavê *Qutya dû-dermana* dide çapkirin (Emerîk, 2017: 6-7). Di sala 1936an de ji alîyê Hecîyê Cindî û Emînê Evdal *Folklorê Kurmanca* bi tîpên latînî tê çapkirin (Xelîl, 2014: 19-20).

Li Yekitîya Sovyetan ne tenê edebîyata kurdî her wiha gelek şaxên hunerê jî di nava geşadeneke bêhempa de ne. Yekem car li vî welatî filmek li ser jîyana kurdan tê kêşandin.¹⁰ Her wiha li Elegezê Şanoya Kurdî dest bi xebatên xwe dike. Di vê şanoyê de gelek klasîkên kurdî yên weku *Ker û Kulik*, *Mem û Zîn* û *Sîyabendê Silîvî* tîne pêşkêşkirin (Eşo, 2018: 36).

Edebîyata kurdî ya Sovyetê de qonaxa destpêkê weku nîfşê ewil tê pênasekirin. Nivîskarîya kurdî di vê serdemê de piranî bi sîyaseta rojane ve pêwendîdar e û li ser xwesteka Sovyetê û di çarçoveya realîzma civakî de afirîye. Hema bibêje di hemû berhemên serdemê de berawirdkirina jîyana berê û ya nû tê şayesandin. Wekhevî û azadîya jinê weku babet derdikeve pêş û li hemberî vê yekê jî zordestîya çînên serdest, zulma axa û began û edetên kevin tîne rexnekirin û redkirin. Ev cûre afirandin hem ji ber helwesta nivîskarên serdemê ye ku xwe weku kirdeyekî

¹⁰ Filma bi navê *Zerê* ji alîyê rejîsorê ermenî Hamo Bêk Nazariyan ve di sala 1920î da bê deng tê kêşandin. Film pişt re di sala 1970an de bi awayekî deng tê sererastkirin. (bnr. Wezîrê Eşo *Kilam û Pênûs* 2018 r.36)

vê jîyana nû dihesibînin hem jî edebîyata kurdî ya dema Sovyetan ji rehên xwe yê eslî dîr ketîye. Ji mîrateya çand û edebîyata kurdî dîr bûne û edebîyat jî bi xêra wergerên ji edebîyata rûs û ermenîyan nas kirine. Ger mirov polîtîkayên wê serdemê jî berçav bigire sedema helwesta nivîskarên kurd yê wê serdemê dê çetir xwe bide der (Reşîd, 2012: 206).

1.1.3.2 Qonaxa Duyem: Rawestan (1937-1955)

Di vê serdemê de helwesta Sovyetan yekcar diguhere û li seranserê Sovyetan bi dehhezaran rewşenbîrên tîr girtin û nefikirin. Wek kêmneteweyêke Sovyetan rewşenbîrên kurd jî ji van rûdanan para xwe digirin. Di sala 1937an de rojnameya *Rêya Teze*, weku gelek rojnameyên Sovyetê bi hinceta karên sîxûrî û alîkarîya emperyalîzmê ve tîr tawanbarkirin û girtin. Rewşenbîrên kurd, Hecîyê Cindî, Cerdoyê Gêncî û Ahmedê Mirazî li Yêrevanê tîr girtin. Nivîskar û endamê Partîya Komînîst Erebe Şemo jî tîr nefikirin (Eşo, 1998: 9).

Di vê serdemê de di dibistanan de dersên kurdî û pirtûkên kurdî yê ku bi tîpên latînî hatine amadekirin tîr qedexekirin. Ji van polîtîkayên Sovyetê ne tenê rewşenbîr her wisa hezaran kurd ji Azerbaycan, Ermenistan, Gurcistan û Naxçivanê ber bi Asyaya Navîn û Qazakistanê ve tîr nefikirin (Şamil, 2005: 98-99).

Alfabeya kurdî ya latînî jî para xwe ji qedexekirinê serdemê digire û di sala 1941ê de bi biryara hukumeta Ermenistanê di dewsa alfabeya latînî, alfabeya kurdî bi tîpên kirîlî ji aliyê Hecîyê Cindî ve tîr amadekirin (Boyîk: 2012: 15). Ev serdem her çî qas jî bo kurdên Sovyetê weku salên bêdengîyê bin jî dîsa jî rewşenbîrên kurd her ku şîyane berhemên xwe afirandine. Di nava van salan de du berhevokên kurdî (1948, 1954) ji aliyê nivîskarên kurd ve tîr weşandin. Berhevoka Hecîyê Cindî ya çîrokan bi sernavê *Siba Teze* di sala 1947an de neşr dibe. Ji bilî vê berhemê hin xebatên nivîskar yê zanistî û folklorîk jî tîr weşandin (Reşîd, 2012: 208).

Di vê serdemê de di warê kurdolojîyê de Şanoya Kurdî geş dibe. Di sala 1937an li Elegezê *Şanoya Dewletê ya Elegezê* te vekirin û ji aliyê dewletê ve tîr finansekirin. Lîstîkvanên şanoyê ji derdora Elegezê ji nav ciwanên kurd tîr bijartin. Ciwanên weku lîstîkvan hatine bijartin ji hêla hunermendên ermenî ve tîr

perwerdekirin. Her wisa senaryoyên Şanoya Elegezê jî ji alîyê van hunermendên ermenî ve tên nivîsîn. Pîyeseke bi navê *Mem û Zîn* ya nivîskarê ermenî S. Taronsî, dîsa ji xebatên S. Gensoyan *Ker û Kulik*, *Keça Mîrikê*, *Sîyabend û Xecê û Gur û Heso* di bin banê vê şanoyê de tên pêşkêşkirin. Di van pîyesan de nivîskarên ermenî babetên xwe ji çand û jîyana kurdan wergirtine. Ji xeynî van berhemên navborî di Şanoya Elegezê de hin berhemên ji şanoyên nivîskarên rûs, ermen, gurmî û azerî jî derketine sehneyê. Ne tenê şanoyên nivîskarên bîyanî; şanoyên nivîskarên kurd jî hatine lîstîn. *Lur De Lura* Celatê Koto, *Miraza Hecîyê Cindî û Xuşka Doxdiryê û Bira* ya Cerdoyê Genco jî pêşkeşî temaşevanan kirine. Şanoya Elegezê di giHANDINA qadroyên kurdî de xwedîyê roleke mezin e. Di nava deh salan de 30an zêdetir pîyes li ser sehnê raber kirine. Bi hinceta kêmbûna temaşevanan di sala 1947an de Şanoya Elegezê tê girtin (Şamil, 2005: 99).

Avakirina Şanoya Elegezê dikeve dema Şerê Cîhanê yê Duyemîn. Di nava van hemû qedexeyan de ji hêla dewletê ve damezrandina şanoyeke kurdî her çiqas jî bo çand û edebîyata kurdî gaveke giring jî be, lê di rastîyê de mebesta dewletê ne ev e. Şano di vê maweyê de weku amûreke propagandayê tê bikaranîn. Lewra Sovyet di vê demê de li hemberî almanan şerekî mezin dimeşîne. Şano jî di vê serdemê de ji bona zindîkirina hestên gel hatîye bikaranîn. Di van şanoyan de trajedî û karesatên şer tên pêşkêşkirin. Bi rêya van şanoyan, şerê li hemberî faşîzmê hatîye îdealîzekirin û ji gel, daxwaza beşdarbûna şer hatîye kirin. Naveroka pîyesên serdemê bi sloganên netewperwerî û lehengîyê ve hatine dagirtin. *Heso*, *Heyfhildan*, *Mêrgên Elegez* û *Partîzan Jeleznyak* bi vê mebestê derketine pêşberî temaşevanan (Oztaş, 2016: 84-85).

1.1.3.3 Qonaxa Sêyem: Zêrîn (1955-1991)

Qonaxa sêyem di dîroka edebîyata kurdî ya kevne Sovyetê de qonaxa herî giring û herî berhemdar e. Ev qonax pîranî di navbeyna salên 1955 û 1991ê tê kifşkirin. Rojnameya Rêya Teze ku di sala 1937an de hatibû girtin ji nû ve dest bi weşana xwe dike. Heman salê, li paytexta Ermenistanê Erîvanê rûdaneke giring din jî pêk tê ku ne tenê ji bona hişyarîbûna kurdên vê deverê ji bona hema bibêje hişyarîbûna hemû kurdên cîhanê dibe mîladek. Ev mîlad jî mirov dikare bibêje

destpêka weşana Radyoya Erîvanê ye. Ev radyo di nava kurdan ji hêla hizrî ve dibe navgîneke muhîm. Radyoya Erîvanê di berhevkirin, tomarkirin û belavkirina kilam û stranên kurdî de qasî 50î salan kedeke mezin dide. Keda Radyoya Erîvanê mirov nikare tenê bi mûzîkê ve sînordar bike. Her wiha der barê têkoşîna rizgariyê de jî weku navgîneke ragihêner karekî giring bi cih tîne (Şamil, 2005:101-102).

Dema Radyoya Erîvanê dest bi weşana xwe dike di heman demê de li Bexdayê jî radyoya kurdî xebatên xwe didomîne. Lê belê radyoya Bexdayê mîna radyoya Erîvanê di nava kurdan de deng venade. Sedema vê yekê jî, ji ber ku zaravaya kurdên Sovyetê kurmancî bû. Kurdên Sovyetê bi perwerdehiya kurdî derçûbûn û zimanekî xwerû bi kurdî bi kar dianîn vê yekê jî hişt ku Radyoya Erîvanê di nava kurdên Tirkîyeyê de li gorî Radyoya Bexdayê zêdetir bê guhdarîkirin. Di radyoyê de hunermendên weku Efoyê Esed, Reşîdê Baso, Egîdê Têcir, Neçoyê Cemal, Mecîdê Silêman, Şeroyê Biro, Sûsika Simo, Zadîna Şekir, Belga Qadir, Şewabê Egîd, Dawudê Xelo, Aramê Tîgran, Fatima Îsa, Egîdê Cimo, Xelîlê Evdila û Şamilê Beko bi deng û amûrên xwe yê mûzîkê ve reng û dengêkî cîyawaz pêk anîne. Di bin banê radyoyê de ji alîyê hin dengbêjan ve hunera dengbêjiyê jî hatîye domandin (Oztaş, 2016: 102-103).

Ev serdem ji alîyê kurdên kevne Sovyetê ve weku ronesansa kurdî tê pênasekirin. Nivîskar Wezîrê Eşo di gotara xwe ya bi navê “Ronesansa Çanda Kurdî Li Sovyeta Berê” ku di kovara Nûdemê de weşandiye, vê serdemê wiha şirove dike: “Bê guman, meriv kare ji vê yekê re bibêje: Ronesans. Ji ber ku, weku ronesansa li Ewrûpayê Rojava bû, ku di sedsalên navîn de bi lêvegera çanda kevnar a Grek û Romyayê pêk hatibû. Belê, dema ronesansa kurd piştî bêdengîya salên 40î kin bû, lê ew dişibîya vemirîn û ronesansa welatên Ewrûpayê” (Eşo, 1999: 46).

Jîyana kurdên Ermenistanê di salên 50î û 60î de rastî guherînên mezin hat. Hejmara xwendekarên kurd di zanîngehan de zêde dibe û kurd her awayî li gorî serdema Stalîn pêş dikevin. Erebbê Şemo di vê serdemê de ji sirgûnê vedigere û dest bi xebatên xwe dike. Bi tevî Hecîyê Cindî, Emînê Evdal, Ahmedê Mirazî û Casimê Celîl; Qaçaxê Mirad, Usivê Beko, Elîyê Evdilrehman, Nado Maxmûdov, Mîroyê Esed û Xelîl Mûradov nivîskarên nifşa ewil in ku di vê serdemê de jî bi awayekî

çalak beşdarî xebatên çand û edebîyatê dibin. Her wiha hejmareke zêde romanên kurdî tên çapkirin. Hingê di warê romanê de nivîskarê herî çalak Erebe Şemo derdikeve pêş. 1956an de romana Erebe Şemo *Berbang*, sala 1959an de romana *Jîyana Bextewar*, di sala 1965an de romana *Dimdim* û pişt re jî di sala 1969an de jî romana wî ya bi navê *Hopo* tê weşandin (Boyîk, 2012: 18).

Elîyê Evdilrehman di sala 1959an de romana xwe ya ewil *Xate Xanimê* çap dike. Li pey romana xwe ya ewil, romaneke din bi sernavê *Gundê Merxasan* di sala 1968an de û romana *Şer li Çîya* 1989an de dide çapkirin (Boyîk, 2012:274-275). Berhema Elîyê Evdilrehman *Morof* jî di hin çavkanîyan de weku roman tê nîşandan lê bi nêrîna me mirov nikare vê berhemê weku romaneke serbixwe nîşan bide. Lewra di vê berhema navborî de ji bilî metna “Morof”¹¹ du metnên din jî tê de cih digirin (“*Bextê Wî Zilamî*”, r. 86-95, “*Bextewariya Emir*”, r. 96-102) û metnên kurt in. Tu têkîlîya van her du metnan bi metna *Morof* re tune ye. *Morof* belkî weku çîrokeke dirêj bê qebûl kirin ne ku weku romaneke serbixwe. Eskerê Boyîk di pirtuka xwe ya *Çanda Kurdê Sovyetê* de vê berhemê weku berhevoka kurteçîrokan nîşan dide (Boyîk, 2012: 272). Ne tenê Eskerê Boyîk Têmurê Xelîl jî di berhema xwe ya bi navê *antologîya 35 helbestvan û nivîskarên kurd ên Sovyeta berê* de vê berhemê weku “serhatî” dide nîşandan (Xelîl, 2014: 72). Peyva “serhatî” di nava kurdên Sovyeta berê de piranî di şûna çîroka modern de hatîye bikaranîn.

Romannûsekî din jî di vê serdemê de Hecîyê Cindî ye. Ew romana xwe ya bi navê *Hewarî* di sala 1967an de dide çapkirin (Sezer, 2020: 42). Sala 1979an ji alîyê Sehîdê Îbo ve romanek bi navê *Kurdê Rewî* tê weşandin (Xelîl, 2014: 65). Di sala 1986an de romana Egîtê Xudo *Dê û Dêmarî* tê weşandin. (Boyîk, 2012:335) *Fîncana Ferfurî* ya Ezîzê Gerdenzerî di sala 1990î de tê weşandin (Xelîl, 2014: 113).

Di edebîyata kurdî ya Sovyeta berê de çawa ku romana kurdî pêş ket her wiha çîroka modern ya kurdî jî pêş dikeve û gelek berhem ji alîyê nivîskaran ve tên nivîsîn. Li ser çîroknûsîya kurdî ya Sovyeta berê xebateke rêkûpêk û tekûz nehatîye kirin. Çîrokên nivîskarên vê serdemê piranî yan li ser rûpelên rojnameya *Rêya Teze* hatine weşandin yan jî di berhevokan de cih girtine û weku pirtûk nehatine weşandin.

¹¹ Bnr. Elîyê Evdilrehman, *Morof*, 2012, Weşanên Lîs.

Hîn gelek berhemên wê serdemê jî ji tîpên kirilî nehatine guhastin. Ji ber van sedeman jî diyar kirina çîrokên vê serdemê li pêşîya lêkolanan weku arîşeyekê mezin disekine.

Di berhema xwe ya *Antolojîya Çîrokên Kurdî* da Firat Cewerî navên weku Erebe Şemo (1897-1978), Elîyê Evdilrehman (1920-1994), Sîma Semend (1933-2009), Şemsî (1933-2002), Xelîlê Çaçan (1924-1981), Wezîrê Eşo (1934-2015), Emerîkê Serdar (1935-2018), Babayê Keleş (1947-2014), Eskerê Boyîk (1941), Tosinê Reşîd (1941), Têmûrê Xelîl (1949), Rizalîyê Reşîd (1929) rêz dike û her nivîskarekî çîrokekê di antolojîyê xwe de diweşîne (Cewerî, 2018: 19).

Ji van nivîskarên navborî; hinekan tenê bi çend metnên çîrokî nivîsandine û berhemeke serbixwe ya çîrokan nenivîsandine. Çîroknûsekî din ê vê serdemê jî Wezîrê Nadîrî (1911-1946) ye û çîrok û helbestên wî weku berhevok bi navê *Nûbar* di sala 1934an de hatine weşandin. Di vê pirtûkê de heft çîrok cih digirin. Çîrokên Wezîrê Nadîrî jî li ser tradîsyona çîrokên Sovyeta berê hatine honandin. Di çîrokan de koçkirina kurdan ya ji welatê Romê û damezirandina Sovyetê û guherîna jîyana nû, erf û edetên kurdan temayên sereke ne.

Çîroknûsekî din yê serdemê jî Elîyê Evdilrehman e. Elîyê Evdilrehman berhema xwe ya çîrokî *Morofê* di sala 1957an de weşandîye. Di berhema *Morof* de sê çîrok cih digirin. *Morof* navê çîrokekê ye, ku navê xwe daye pirtûkê. Di vê berhemê de jî zulma Roma Reş û axa began, koçkirina kurdan ya ji welat weku babetên sereke derdikevin pêş. Elîyê Evdilrehman jî mîna nivîskarên serdemê di bin rêbaza realîzma civakî de berhemên xwe sêwirandine. Ji bilî van babetan di berhemê de mîrxasîya kurdan û avakirina Sovyetan re; veguherîna jîyaneke nû jî weku mijarên sereke derdikevin pêş. Li gorî Maruf Xeznedar hin çîrok û helbestên nivîskar bi sernavê *Dê* weku berhevok hatine weşandin (Xeznedar, 2001: 123).

Di warê çîroknûsîya kurdî de çîroknûseke bi nav û deng jî Sîma Semend e. Li gorî Îbrahîm Seydo Aydogan Sîma Semend yekem jina kurd e di wê serdemê de pirtûkeke wê ya wêjeyî bi kurdî çap bûye (Aydogan, 2014: 182). Sîma Semend berhema xwe ya çîrokan bi sernavê *Xezalê* cara ewil 1961ê li Erîvanê çap dike. Di

pirtûkê de “Xezal”, “Reva Rihanê” û “Mizgîn” sê çîrok cih digirin. Ev berhem tevahî li ser propagandaya realîzma civakî hatîye sêwirandin. Di çîrokan de serleheng piranî jin in. Jîyana kurdên Sovyeta berê, edet û bawerîyên wan, berawirdkirina jîyana berê û ya nû, xebata kolxozan û pesindayîna Şoreşa Cotmehê weku babetên sereke ne ku di çîrokan de hatine honandin. Du berhemên çîrokan ên Sîma Semend ên din jî di çavkanîyan de hatine dîyarkirin. Yek ji van *Du Şahî* ya din jî *Guman* e. (Cewerî, 2018: 126, Boyîk, 2012: 348).

Nivîskarekî din jî di wê serdemê de Xelîlê Çaçan e. Xelîl Çaçan di sala 1976an berhema xwe ya çîrokan bi sernavê *Morîyên Nenê* daye çapkirin. Sêzde heb çîrok di pirtûkê de hatine ciwandin. Xelîlê Çaçan jî li ser rêbaza nivîskarên serdema xwe meşîyaye û babetên xwe ji çand û jîyana kurdan ya berîya Şoreşa Cotmehê û piştî Şoreşa Cotmehê girtine. Di çîrokan de ji bilî van babetan Şerê Wetenîyê yê Mezin¹² jî weku tema derdikeve pêş.

Li gel van derfetan qedeyeke qismî jî li ser hin berheman hebûye. Bo nimûne dema Eskerê Boyik dixwaze dîwana xwe ya helbestan di sala 1966an çap bike ji ber ku pesnê Sovyetan nedaye berhem çap nabe û piştî hingê di sala 1975an diçe ber çapê. Astengîya herî mezin a pêşîya kurdên kevne Sovyetê jî ew bû ku ji kokên xwe dûr ketine. Girseyekî hindik bûne û ji edebîyata kurdî ya heyî jê bêpar mayîne. Nivîskar û şahkarên edebîyata kurdî Ehmedê Xanî û Melayê Cizîrî bes ji bo wan navek bûye (Gültekin, 2017: 74-76).

Di serdema Sovyeta berê de ne tenê nivîskarên kurd her wiha nivîskarên ermenî jî çîrokên xwe bi zimanê kurdî nivîsîne. Yek ji van nivîskaran Nûrî Hîzanî ye. Nûrî Hîzanî ku navê wî yê ermenîkî Hovakîm Margaryan, eslê xwe ji ermenên Hîzana Bedlîse ye. Bi navê *Şewqa Sibê*¹³ di sala 1934an de, berhemeke kurdî ya çîrokan dide weşandin. Nivîskarekî din ku eslê xwe ermenî ye û çîrokan kurdî nivîsîne jî Sîras (1902-1983-Himayag Sahagi Vosganyan) e. Sîras ji Qerekilîsa

¹² Kurdên Sovyetê Şerê Cîhanê yê Duyemîn weke “Şerê Wetenîyê” nav kirine. Nivîskarên kurd ev pêname di wê serdemê de ji nivîskarên Sovyetê wergirtine. Lewra Şerê Cîhanê yê Duyemîn li seranserê Welatê Sovyetan rû da ye û ev şer li hemberî Almaniyaya Hitlerî weke şerê man û nemanê hatîye dîtin. Ji ber vê yekê jî ev şer wek Şerê Wetenîyê yê Mezin (Великая Отечественная война) hatîye pênamekirin. (Gürsoy, 2018: 121)

¹³ Nûrî Hîzanî, “*Şewqa Sibê*” weş. Lîs, Dîyarbakir, 2022.

Kurdistanê koçî Gurcistanê bûye. *Letîfe*¹⁴ û *Memê û Eyşê*¹⁵ du pirtûken çîrokan in ku ji alîyê Sîras ve bi zimanê kurdî hatine nivîsîn.



¹⁴ Sîras, “*Letîfe*”, weş. Lîs, Dîyarbakir, 2012.

¹⁵ Sîras, “*Memê û Eyşê*”, weş. Evrensel Çocuk kitablığı, İstanbul, 2014. Ev berhem her çiqas di hin çavkanîyan da weku çîrokeke hunerî bê qalkirin jî; çîrok varyantek jî strana gêlêrî ya “Hoy Hoy Memo” ye.

BEŞA DUYEM

2.1 EMERÎKÊ SERDAR Û ÇÎROKNÛSÎYA WÎ

2.1. Jîyana Emerîkê Serdar

Emerîkê Serdar yan bi navekî din Emerîkê Derweşê Serdar di 8 Sibata 1935an li gundê Pampê (ku pişt ra weku Sîpah hatîye guherandin) dayîk dibe. Gundê Pampê dikeve li ser navçeya Axbaranê. Emerîkê Serdar di maleke xizan de tê dinê û hîn di temenê xwe yê zarotîyê de bavê wî Derweş di nava Artêşa Sor de tev li Şerê Cîhana yê Duyemîn dibe. Dema bavê wî û apê wî di sala 1941ê de tev li şer dibin; Emerîkê Serdar bi dayîka xwe Seyrana Xudo re tenê dimîne. Digel hemû bêmecalîyan jî Seyrana dayîka wî, wî dide ber xwendine û dibistana heftsale di gundê xwe de kuta dike (Eşo, 2018: 235, Bréteque, 2017: 104)

Navê nivîskar Emerîk e û Serdar navê kalikê wî ye. Di qada edebîyatê de naskirina wî weku Emerîkê Serdar ji alîyê nivîskar ve hatîye hilbijartin. Di destpêka nivîskarîyê de cara ewil bi vî sernavî helbestekî xwe dide weşandin. Emerîk di bîranînên xwe de vê rewşa xwe wiha şirove dike:

Şiêr bi qolê Emerîkê Serdar derket. Wê çaxê min texmîn nedikir, weku di Kurdî de navê bavê min gotî bûbûya paşnavê min. Lê min navê kalikê xwe ji xwe re kirîye paşnav. Ez niha gelekî li ber xwe dikevim, weku paşnavê min bi wî cureyî ye. Wê rast bûya, weku ne ku “Emerîkê Serdar”, lê “Emerîkê Derwêş” bûya. (Serdar, 2018:332).

Nivîskar di sala 1942an dest bi dibistana gund dike (Serdar, 2018: 74). Emerîk di bîranînên xwe de radigihîne ku ev dibistan heftsale bûye, li gundê xwe li ber destê mamosteyekî kurd ku navê wî Cewoyê Emer Mamoyan bûye qedandîye. Ew di bîranînên xwe de hem bi serfirazî mamosteyê xwe tîne ziman û hem jî ji ber tûndbûna wî, jê gazindan dike. Vê serhatîya xwe weku çîrok bi sernavê “Du Qewimandin Ji Emrê Mektebê” pirtûka xwe ya *Hisreta Emir* de diweşîne. Gava behsa mamosteyê xwe dike û dibêje: “Bi saya serê wî bû, weku me, çend şagirtên wî yî berê, di paşwextîyê de xwe li rêya zimên girt” (Serdar, 2018: 40). Li gorî

agahdarîyên ku nivîskar radigîhîne wî di dibistanê de dersên kurdî nexwendîye. “Ez li mekteba 3’yan bûm, gava di mekteba gundê me de dest pê kirin dersên zimanê Kurmancî ji koma 2’yan da derbas kirin. Ez jî li koma 3’yan bûm. Loma jî dersên zimanê Kurmancî derbas nebûm. Ez bi xwe hînî herfan bûm û min bi Kurmancî dixwend.” (Serdar, 2018: 74).

Salên wî yên dibistanê bi zehmetî derbas dibin. Di dibistanê de rastî tundîya mamosteyan hatîye. Mamosteyên wî yên ku qala wan dike pir tund bûne. Di dibistanê de yê ku qala wî dike mamosteyekî din Reşîdê Mîrze Mîrzoyev e ku dersên dîrokê jê hîn bûye (Serdar, 2018: 40).

Nivîskar dema behsa xwendekarîya xwe û rojên dibistanê dike bi awayekî hurmet mamosteyên xwe yên edebîyata ermenî û zimanê almanî bi bîr tîne (Serdar, 2018: 79). Piştî kutakirina dibistana seretayî li gundê cîran Elegezê di dibistana navendî de dibe xwendekar. Pişt re dibistana navîn ya Elegezê jî diqedîne û ji bo xwendina bilind berê xwe dide paytexta Ermenistanê. Li Erîvanê di enstîtûya bi navê Abovyan de di beşa dîrok û filolojî yê de weku xwendekar tê qebûl kirin û di sala 1959an de li vir jî kuta dike. (Eşo, 2018: 235, Bréteque, 2017: 104)

Sala 1953an nivîskar xwendina ya xwe dibistana navîn kuta dike û vedigere gundê xwe. Ji ber ku di kûnyeya (îdentîte) gund de weku Êsûbov di belgenamêyên fermî yên dewletê de Serderyan derbas dibe û tevlihevîyek çêdibe û nikare derbazê xwendina bilind bibe. Heman salê li gundê xwe de weku serwerê klûbê dixebite. Di sala 1954an li Erîvanê, Înstîtûta Pedagojîyê qeyd dibe. (Emerîk, 2018: 95)

Gava Emerîk sêwî dimîne hemû berpirsîyarîya wî ketîye ser milê dayîka wî. Dema behsa dayîka xwe dike li beramberî keda wê ya di rêya xwendina wî de daye hurmeteke mezin nîşan dide: “Gava min di mekteba Elegezê ya navîn de dixwend, car caran diya min dihat vî gundî mala xaltîya min Zelxo. Te hew dinêrî derîyê dersxaneyê vedibû, diya min derda dihat, li ser kursîyekî rûdinişt. Bi ermenî jî pakî nizanîbû. Bi teherekî dersdar dida famkirin, weku dersdar dersê ji min bipirse, çika ez dersa xwe zanim an na” (Serdar, 2018: 78). Dîya wî giringîyeke mezin dide ser xwendina kurê xwe yê sêwî. Ji ber vê yekê ye Emerîkê Serdar ji gundê ku lê dijî

tekane xwendekar e diçe dibistana navîn ya ku li Elegezê ye. Emerîk emrê xwe yê xwendekarîyê bi hêjarîyê derbas dike. Dema behsa van rojên xwendina xwe dike wiha dibêje;

Wê çaxê berf jî ew qasî diket, weku diavêt çokê. Di lingên min de çarix, gore bûn. Hetanî ez digihîştim Elegezê, goreyên min berf digirtin. Di dersxaneyê de me xwe dida ber sobeyê, ew berf dihelîya, gore şil dikir. Gava ders xilas dibûn û di hişkîya berêvarê de vedigerîyam malê, çarix û gore li min diqerimîn û çarix ji lingên min dernediketin. Min lingên xwe dikir tendûrê hebekî germ dikir, paşê çarix diêxist (Serdar, 2018: 8).

Ev rewşa wî piştî ku li Erîvanê cih dibe jî berdewam dike. “Gundîyekî me Reşîdê Hemîd di bajêr de otax kirê kiribû û dima. Ez di mala wî da dimam. Min kirêya otaxê nedida. Her meh diya min 30 hêk dişand, min ew hêk dibirin bazarê, heba wan bi 1 manatî dida û bi wî 30 manatî ebûra xwe dikir.” (Serdar, 2018: 98). Nivîskar li ser perwerdebûna xwe giringîyeke mezin dide dayîka xwe. Nivîskar, di dema xwendekarîya xwe ya zanîngehê da diya wî diçe rehmetê (Bréteque, 2017: 104).

Emerîkê Serdar di sala 1959an ji Enstîtûya pedagojîyê mezûn dibe û heman salê li dibistaneke Elegêzê de weku mamoste dixebite. Di vê dibistanê de dersên kurmancî û ermenî dide xwendin (Serdar, 2018: 127-129). Emerîkê Serdar bi qasî sê mehan di vê dibistanê de weku mamoste dixebite. Nivîskar sala ku dest bi mamostetîyê dike ji alîyê Xelîl Muradov ve tê vexwendin ji bona spîkerêya Radyoya Erîvanê. Di heman salê de ji mamostetîyê dest dikêşe û li radyoyê dest bi xebata xwe dike (Serdar, 2018: 133). Emerîkê Serdar dide ragihandin ku di serê ewil de endama partîya komînîst nebûye. Li gorî wî kesên ku di partîyê da cî negirin di cîyên payebilind de nehatine peywirdarkirin. Ew dema ku radyoyê de dixebite vê endamtîyê naîne cih. Piştî ku derbasî rojnameya *Rêya Teze* dibe, di sala 1965an de dibe endamê partîyê. Heman salê dibe endamê Yekîtiya Rojnamevanên Ermenistanê (Serdar, 2018: 180).

Emerîkê Serdar di dema xwendekarîya xwe de, di çapemenîya kurdî û ermenî de bi çalakbûna xwe ve tê naskirin û her wiha ji ber vê çalakbûna xwe di radyoya Erîvanê de weku spîker dest bi xebatê dike. Li Radyoya Erîvanê, di amadekirina şanoyên kurdî de cih digire. Bi xebatên wî yên di radyoyê de navê Emerîkê Serdar her ku diçe belavtir dibe û nivîskar vê carê jî vedixwînin rojnameya *Rêya Teze*. Nivîskar di Radyoya Erîvanê de weku spîker û cîgirê serokê parê karê xwe rêve dibe. Xebata nivîskar ya di Radyoya Erîvanê de bi vî awayî hetanî sala 1962yan berdewam dike. (Gültekin, 2016: 57). Emerîkê Serdar di rojnameya *Rêya Teze* de weku rojnamevan dîv re jî weku gerînende xebitîye. Berhemên nivîskarên ermenî wergerê kurdî kirîye û her wiha di rojnameyê de jî çîrokên xwe weşandine (Bréteque, 2017:103). Emerîkê di rojnameya *Rêya Teze* de hema bibêje di hemû karên bi rojnamevanîyê ve girêdayîne dike û dixebite. Dawîya dawî jî dibe berpîrsîyarê rojnameyê (Xelîl, 2014: 77-78).

Emerîkê Serdar di sala 1962yan û heta sala 2006an di rojnameya *Rêya Teze* de weku wergêr, serwerê para çand û nameyan, katibê cabdar kar kirîye. Karûbarên rojnameya *Rêya Teze* di sala 1992an bi tevahî dikeve ser milê nivîskar. Piştî têkçûyîna YKSSyê ev sal ji bona rojnameya *Rêya Teze* salên tengasîyê ne. Piştigirîya dewletê yekcar qut dibe û ev yek jî her ku diçe barê nivîskar zêde dike. Di nava van tengasîyan de Emerîkê Serdar bi serfirazî vî karê xwe didomîne. Piştî sala 2006an ji ber problemên tendûristîyê ji kar aza dibe (Gültekin, 2016: 57).

Emerîkê Serdar ji ber çalakbûna xwe ya di qada rojnamevanî edebîyatê de ji hêla dewletê ve jî hatîye xelatkirin. Nivîskar endamê Yekîtiya Nivîskar û Rojnamevanên Ermenistanê û Sovyetê bûye û di sala 1986an de jî ji ber van kar û xebatên xwe ji aliyê Sedirtîya Şêwira Ermenistanê ve hejayê xelatê hatîye dîtin û pîrozkirin (Xelîl, 2014: 80). Nivîskar di sala 1986an da xelata rojnamevanîyê yê emekdar yê Ermenistanê digire. Di sala 2009an da ji aliyê sazîya Navenda Bîografîyê ya Nevnetewî (Kembrîc, Angliya) navê “Profêsiyonelê Cîhanê yî Pêşîkêş-2009” an digire (Gültekin, 2016: 57).

Di sala 1991ê de nivîskar Emerîkê Serdar dibe berpîrsîyarê rojnameya *Rêya Teze*. Ev serdem hem ji bo kurdên Sovyetê hem jî ji bona edebîyata kurdî demên herî

giran in. Ji ber ku hem çapemenîya kurdî û hem jî berhemên kurdî bi piştgirîya dewletê dihate fînansekirin. Bi têkçûna YKSSê re pêvajoyeke nû dest pê dike. Rojnameya *Rêya Teze* bê piştgirî dimîne, xebatkarên rojnameyê kêm dibin. Di nava van şert û mercan de Emerîkê Serdar kedeke mezin dide û rojnameyê li ser pîyan dihêle (Kanî, 2014: 274).

Emerîkê Serdar di edebîyata kurdî ya serdema YKSSê de, di nava nifşê duyem dê tê hesibandin. Yek ji navdarê nivîskarên piştî salên 1950î de cihê xwe girtîye û bi şêwaz û bi berhemên giranbiha ve di dîroka edebîyata kevne Sovyetê de navê xwe daye qeydkirin (Xelîl, 2014: 80).

Emerîkê Serdar 19 Sibata 2018an li Ûkraynayê, bajarê Xarkovê çû ser diloanîya xwedê.

2.2 Berhemên Emerîkê Serdar

Emerîkê Serdar di jîyana xwe ya berhemdar de li ser hev 8 heb pirtûk dane weşandin. Ji xeynî pirtûkan gelek gotarên nivîskar yê cûrbicûr jî di rojnameya *Rêya Teze* de hatine neşîrkirin. Her wiha gelek çîrokên Emerîkê Serdar di berhevokên pirtûkên dersan yê Ermenistanê de jî çap bûne. Emerîkê Serdar nivîskarekî pirhêl e û her wiha berhemên wî hem bi kurdî û hem jî bi rûsî hatine çapkirin. Berhemên nivîskar yê bi kurdî çapbûyî: *Destê Dê*¹⁶ (1974), *Êdî Dereng Bû* (1979)¹⁷, *Dengê Dil*¹⁸ (1985) (Boyîk, 2012: 357-358).

Ev her sê berhemên nivîskar cara ewil bi tîpên kirîlî hatine çapkirin. Lewra di wê demê da li Sovyetan jî bilî alfabeya kirîlî bikaranîna alfabeyeke din qedexe bû (Gültekin, 2016: 58).

¹⁶ Ev berhem di sala 2015an jî aliyê Weşanxaneyê Lîsê ve bi tîpên latînî çap bûye. Bnr. Emerîkê Serdar, *Destê Dê*, Lîs, Dîyarbakir, 2015.

¹⁷ Ev berhem di sala 2015an jî aliyê Weşanxaneyê Lîsê ve bi tîpên latînî çap bûye. Bnr. Emerîkê Serdar, *Êdî Dereng Bû*, Lîs, Dîyarbakir, 2015.

¹⁸ Ev berhem di sala 2015an jî aliyê Weşanxaneyê Lîsê ve bi tîpên latînî çap bûye. Bnr. Emerîkê Serdar, *Dengê Dil*, Lîs, Dîyarbakir, 2015.

Piştî van her sê berhemên nivîskar, *Gundê Me*¹⁹ (2006), *Hisreta Emir* (2008)²⁰, *Bijare* (2011), *Keşkûl* (2013), *Mikûrî* (2014) bi kurdî tên çapkirin.

Hejmara berhemên nivîskar di hin çavkanîyan de ji hev cuda tên dîyarkirin. Sedema vê yekê jî wergêrên berhemên nivîskar e. Li gorî agahîyên ku me ji qîza nivîskar Nûrê Serdaryan wergirtî; Pirtûkên ku zimanê Rûsî hatine wergerandin ne berhemên serbixwe ne û berhevokên pirtûkên wî yên kurdî ne bi zimanê rûsî hatine wergerandin. Ji xwe dema mirov naveroka pirtûkên nivîskar ên çîrokan dinêre mirov vê yekê bi hêsanî dibîne. Ji berhemên nivîskar 4 heb bi zimanê rûsî hatine wergêrandin. *Dewetek Du Caran Kirin* (2005), *Hetanî Kengê* (2007), *Wê Şevê* (2013), *Em Çûne Aş* (2014) bijareyên çîrokên nivîskar in ku bi zimanê Rûsî hatine wergêrandin. Pirtûka *Dewetek Du Caran Kirin* û *Wê Şevê* navê xwe ji çîrokên nivîskar ya pirtûka wî “*Êdî Dereng Bû*” weku “*Du Caran Bûk Siwar Kirin*” û “*Wê Şevê*” digire, pirtûka “*Hetanî Kengê*” jî di pirtûka wî ya “*Hisreta Emir*” de weku “*Hetanî Kîngê*”, pirtûka “*Em Çûne Aş*” jî navê xwe ji çîrokeke nivîskar ya di berhema wî ya “*Destê Dê*” de weku “*Em Çûne Aş*” digire.

Ji van berhemên nivîskar yên navborî *Destê Dê*, *Êdî Dereng Bû*, *Gundê Me* û *Hisreta Emir* berhemên çîrokî ne. Berhema wî *Bijare* bi gotar, hevpeyvîn û nameyên nivîskar yên di berê de di rojnameyên cuda cuda de dane çapkirin pêk tê. Berhema wî ya *Keşkûl* mijarên ji zargotina kurdî ne. Berhema nivîskar ya dawî jî weku *Mikûrî*²¹ hatîye çapkirin û bi bîranînên nivîskar dihewîne.

Emerîkê Serdar weku nivîskarekî pirhêl wergêrî jî kirîye. Ji edebîyata rûsî û ermenî gelek berhem wergerê kurdî kirine. Ji xeynî berhemên rûsî û ermenî bi sipartina Partîya Komînîst ya Ermenistanê bername û rêziknameyên partîya komînîst wergerê kurdî kirine.

¹⁹ Çapa vê berhemê me dest nexist û herwiha jî ji bona analîzkirina vê berhemê me ji rûpela nivîskar ya bi sernavê <http://kurd.amarikesardar.com> ku ji aliyê qîza nivîskar Nûrê Serdaryan ve hatîye amadekirin sûd wergirt û di xebata xwe de da cihkirin.

²⁰ Ev berhem di sala 2015an ji aliyê Weşanxaneyê Lîsê ve bi tîpên latînî çap bûye. Bnr. Emerîkê Serdar, *Hisreta Emir*, Lîs, Dîyarbakir, 2015.

²¹ Ev berhem ne ji aliyê nivîskar ve ji aliyê qîza nivîskar Nûrê Serdaryan ve hatîye nivîsîn. Lewra li gorî agahîyên ku nivîskar di pirtûkê de dîyar dike; ji ber çavên xwe nikare binivîse. Ji ber vê çendê jî nivîskar bi devkî bîranînên xwe vegotine û qîza wî jî nivîsîye. Bnr. Emerîkê Serdar, *Mikûrî*, Lîs, Dîyarbakir, 2018.

Ji berhevoka çîrok û helbestên nivîskarê ermenî Hovhannes Tumanyan bi navê *Efrandinêd Bijare* di sala 1970yî de, romana nivîskarê ermenî Hraçya Koçar bi navê *Hizret*, berhema helbestan ya Avetîk Îsahakyan bi sernavê *Berevok* (1977) wergerê kurdî kirîye. Emerîkê Serdar di bîranînên xwe de radigîhîne ku wî pirtûka Mîkhaîl Semenovîch Lazarev²² jî, ya derheqê dîroka kurdan ya nevbeyna salên 1891-1917an ji zimanê rûsî wergêrê kurdî kirîye (Serdar, 03.03.2022). Ji bilî berhem û wergerên nivîskar, di rojnameya *Rêya Teze* de di navbeyna salên 1950-2010an de nêzîkê şêst heb gotar û nivîsên wî weşîyane.

2.3 Nêrînên Emerîkê Serdar Der barê Edebîyat û Çîrokê de

Emerîkê Serdar ji bilî rojnamevanî, wergervanî û nivîskarîyê der heqê edebîyata kurdî ya kevne Sovyetê de jî xwedîyê nêrîneke cuda ye. Li ser vê yekê gelek gotar nivîsîne û di van gotaran de “di çawanîbûna edebîyata kurdî” de nêrînên xwe anîne ziman. Emerîkê Serdar di nivîskarîyê de giringîyeke mezin dide xwezayê. Di gotara xwe ya bi navê “Tebyet Nava Lîteratûra Kurda Ye Sovêtîda” fikr û ramanên xwe wiha dide der:

Nava efrandina bedewetîê da nişandayîna tebyetê bê me’nî û bê fikir nîne. Tebyet bi xwe gelekî bedew e. Wexta ew bi hostatî nava efrandinê da tê nişandayînê, xeml û rewşeke dha mezin dide wê. Xwendevan wextê efrandina usa dixûne, temamya bedewya tebyetê tê ber ç’evê wî (Serdar, 03.03.2022)

Li gorî nivîskar di honandina metnê de xweza cîyekî taybet digire. Bi kar anîna wê metnê bihêztir dike. Lewra ger bi hostatî xweza di metnê de bê bicihkirin wê metin ji alîyê xwendevan ve çêtir bê famkirin. Ev jî bi şîyana nivîskar ve girêdayîye. Nivîskar divê xwezayê bi awayekî rasteqîn bişayesîne, da ku xwendevan bi şayesandina nivîskar ve xwezayê li ber çavê xwe şênber bike.

Emerîkê Serdar her wisa jî di metnê de şayesandina xwezayê parçeyek ji honandina metnê ya bingeîn dibîne.

²² Ev pirtûk di nava weşanên Roja Nû de li Stockholmê di sala 1999an de tê çapkirin. Di pirtûkê de wergêr weku Têmûrê Xelîl tê nişandan. Emerîkê Serdar angaştîdike ku ev pirtûk ji alîyê wî ve hatîye wergêrandin. bnr Emerîkê Serdar, *Mikurî “M.S. Lazarev Pirsê Kurdan, an Dîroka Diziya Wergêrekê”*, r.351-361.

Tebyet ne ku tenê rewşeke bedewetîya lîteratûraê ye, lê ew usa jî mecaleke baş e bona rind diharkirina halê qewmandina. Nava şuxulêd usa da efrandar yan bi cûrê kontrastê, yanê jî bi cûrê nonîhevîkirinê hal yanê qewmandina dha bi fireh nîşan dide. Vêderê jî, çawa dibêjin, nîşandayîna tebyetê bê fikir nîne, tebyet nava efrandina da pasîv nîne, ew eseyî qewmandina ra girêdayîye. (Serdar, 03.03.2022)

Emerîkê Serdar di nivîskarîya xwe da jî xwezayê bi awayekî hostatî bi kar tîne. Ji bona derbirîna fikr û ramanên xwe ji xwezayê feyz digire. Ev yek jî piranî di nivîsên wî yên di bin sernavê “Nexş û Nîgarên Hûr” de hatine nivîsîn xwe dide der. “Bi xuşîna belgeke jî darê hat xwarê. Nizanim, dar êşîya an na, lê çîkekê avêt dilê min û ji nişkê ve mirin ket bîra min.” (Destê Dê. 104). Emerîk bi vî awayî mirinê bi weşîna belgeke jî darê ra hestên xwe dide der.

Nivîskar bi helwesta xwe ve xweza û guherîna xwezayê bi şayesandineke realîst ve metna xwe bihêztir dike û di fikra xwîner de wê şênber dike: “Ewrê reş kimkimîn. Brûskê birq veda. Tavîya teyrok û baranê girtê. Şerê li erşan daket erdan.” (Hisreta Emir. 153).

Di çîrokên Emerîk de honandina metnê gelek caran bi şayesandina xwezayê dest pê dibe. Nivîskar xwezayê weku wênesazekî diwesfîne. “Biharê, gava çîya, gelî û geboz, kewşênê gundê me şîn dibin, bi hezar awazî dixemilînin, roj li pişt çîye diçe ava, dest bi êvarên gundê me dibin. Pêşîyê newal û deşt dikevin bin sîyê, paşê sîya çîyê dirêj dibe û bere-bere aqara xwe fire dike.” (Êdî Dereng Bû. 210) Bi vî awayî nivîskar xweza û demê bi hev re di nava harmonîyekê de diwesifîne. Xwîner bi vî awayî hemû guherînan li ber çavê xwe û di fikr û ramanên xwe de dibîne, dibe parçeyekî metna honakî.

Li gorî Emerîkê Serdar di pêşdaçûn û geşedana edebîyatê de wergervanî jî rêyeke sereke ye. Lewra bi wergêrê asoya nivîskar fireh dibe û pêş dikeve.

Rêke pêşdabirin û dewlemendkirina lîteratûra kurda ye sovêtî jî – ew tercmekirina bedewetî ye. Çawa bona lîteratûra her cimetekê, usa jî bona ya me tercmekirina şuxulêd bedewetî ye dinênas hesab dibe çawa

qewmandineke eyan nava terîqa kûltûra me da. A lema jî kemaleke ewqasî mezin didine lîteratûra tercmekirî, hertim derheqa cûre û fesala kirina wê da tê xebirdanê (Serdar, 03.03.2022)

Lê ji bona wergêrê jî li gorî nivîskar divê kesê wergêrvan qadêyên wergêre zanibe. Hem zimanê tê wergêrandin û hem jî zimanê lê tê wergêrandin de divê wergêr bi hostatî bixebite û wan her du zimanan de jî şareza be. Ji bona vê yekê jî divê wergêr ruhê her du zimanan jî baş têbigiheje. Metna werger ji orîjînalîya xwe zêde neyê dûrxistin û ruhê wê yê sade bê parastin. Li gorî nivîskar wergêrvanîyeke tekûz afirandinekî nû ye. Emerîkê Serdar di vê yekê de jî nêrînên xwe di gotarekî xwe ya bi sernavê “Çend Gîlî Derheqa Tercma Bedewetîfêda” wiha tîne ziman.

Her gava efrandin tê tercmekirinê, tercmecîê e’slî usa dikan, weku çiqas dikarin wê ûymîşî wî zimanî bikin, bi çî zimanî ew tê tercmekirinê. Lê bona vê yekê ew gerekê temamya dewlemendbûna wî zimanî zanibe û wê bide xebtandinê. Hilbet, xebtandina xeberekê, cumlekê yanê jî p’areke efrandinêye biç’ûke ne bi cî bi xwe lek’eye, lê ne xeber, ne cumle, ne jî ew p’ara biç’ûk nînin, weku gerekê bibne qîmetê wê tercmê. Qîmetê tercmê ewe, çika tercmecî çiqasî karibûye nifûsa wê efrandinê xweyke û bigihîne xwendevana. Tercmekirin jî efrandine, çawa her efrandarekî e’slî nikare her tiştî binivîse yanê t’embe û xwestinêd her kesî biqedîne, usa jî tercmecîê baş her kitêbekê yanê her efrandinekê hilnade, tercmê nake. Ew wan efrandina tercmê dike, kîjan nêzîkî ruhê wî ne, ew bi dilê wî ne, bi kîjana va ew dijî, ser kîjana ew k’elyaye. Lê wexta tercmekirinê jî ew hemîn dixebite, weku zyanê nede orîgînalê, gelekî jê dûrnekeve, lê wê tercmê dilê xwera derbaz dike, tişteki xwe dike, çawa dibêjin, nîşan dide, weku tercmecîê wê k’îye (Serdar, 03.03.2022).

Der heqê edebîyata kurdî ya Sovyetê de nivîskar xwe dispêre welatê xwe. Li gorî nivîskar bêtî welat ne mimkun e ku edebîyatek li ser pîyan bimîne. Nivîskar der barê vê yekê de nêrînên xwe wiha dide der: “Maka edebîyata kurdî, Kurdistan e. Bê vê yekê nê pêkan e ku edebîyat bê afirandin. Dibe ku heta çend deh salekî din jî li ser pîyan bimîne, lê di dawîyê da wê ji holê rabe. Ji ber ku ji bona îlhamgirtinê divê li ser xaka xwe û li welatê xwe şîn be.” (Bréteque, 2017: 108-109). Emerîk Serdar

lîteratûra berîya xwe ji alîyê naverok û binyadê ve sist dibîne û ji bo ku xwe ji vê dûr bixe her tim di nava nûgeranîyekê de bûye. “Ji nivîsara Kurdan î vekirî çi bi min xweş nedihat? Berî her tiştî ew nivîsar mînanî çîrokê sist bûn, nîgarên wan bê xwîn û qinê bûn, xeyset û psîgologîya wan tune bû, gişk mînanî hev bûn, her tenê sêmatîzm bû. Ew mînanî gotarên rojnameyên dîwaran bûn. Te yê bigota ew di salêd sedsalîya derbasbûyî yî 20-30’yîde hatine nivîsarê.” (Serdar, 2018a: 364).

Emerîkê Serdar her wiha der heqê nivîskarîya xwe de jî wiha lê zêde dike: “Wexta min dest bi nivîsara vekirî kir, min cedand, weku ew kêmasî di nava nivîsarê min de tune bin û tu yê bibêjî (bi gotina xwendevanan) ew yek ji min re li hev hat. Ev jî tezetîyek bû, ku ket nava nivîsara me yî vekirî.” (Serdar, 2018a: 364).

Li gorî Emerîkê Serdar edebîyata kurdî ya Sovyeta berê di salên 30î heta salên 60î de li ser rêbaza realîzma civakî hatîye berhemanîn. Nivîskar, berhemên ve serdemê her çi qas kurdî hatibine nivîsandin jî ji ruhê kurdayetîyê dûr dibîne. Nivîskar her wiha dîyar dike ku Qaçaxê Mirad bi helbestên xwe ve ruhekî neteweyî dide edebîyata kurdî (Bréteque, 2017:105).

2.3.1 Rexne di Nivîskarîya Emerîkê Serdar de

Rexne bi wateya xwe ya ferhengî ji bona hilsegandina kesekî, mijarekê yan jî berhemeke edebî û hunerî ye tê bikaranîn. Di edebîyata kurdî de bi peyvên rexne û krîtîkê ve tê pênasekirin (Îzolî, 2013: 770). Peyva rexneyê ji hêla termînolojîyê ve bingeha xwe ji peyveke Frensî “critique” digire û di qada edebîyatê de jî êdî weku celebekî nivîsê cîyê xwe girtîye (Kudret, 1980: 383).

Emerîkê Serdar çawa nivîskarekî bi nav û deng her wisa jî rexnegirekî edebîyata kurdî yê serdema Sovyeta berê ye. Ew nebûna rexneya edebî ya di edebîyata kurdî de weku kêmasîyekê dibîne. Ji ber vê yekê jî nivîskar giringîyeke mezin dide rexneya edebî û di derdora salên 1960î ve hewl daye bi gotarên xwe ve berhemên edebî, di çarçoveya rexneya edebî de nirxandine. Di vî warî de yekem gotara wî bi sernavê “Edebîyata Kurdan î Sovyetîyê yî Îro” rojnameya ermenî “Grakan Têrtê” de bi zimanê ermenî daye weşandin (Serdar, 2018a: 335) Emerîkê

Serdar her wiha bi vê gotara xwe ve di qada edebîyatê de navê xwe daye bihîstin. Yekem gotarên wî yên rexneyî der barê helbesta kurdî de bûne.

Kurdzan Thomas Bois, Emerîkê Serdar di hêla edebîyata Sovyetê de weku yekem rexnevanê edebîyata kurdî dide nîşandan (Bois, 1966: 128). Ev danasîn rastî jî di wê serdemê de hejayî pesindayîne ye. Lewra di wê serdemê de, di edebîyata kurdî ya Sovyeta berê de karê rexnegirîyê weku pesindayîna nivîskar dihate kirin. Emerîkê Serdar piştî ku dest ji nivîsîna helbestê berdide dest bi nivîsên rexneyî dike. Lê her ku van nivîsan dinivîse li hemberî bertekên tûj tê. Li gorî nivîskar di nava kurdên Sovyetê de rexneya edebî pêş neketîye. Nivîskarên wê serdemê rexneya edebî weku şikyat û xayîntî bi nav kirine. Di bîranînên xwe de anektodekê radigihîne ku dema li ser pirtûkeke Emînê Evdal di çarçoveya rexneya edebî de diaxive ji alîyê malbata Emînê Evdal ve rastî erîşe tê. Li gorî Emerîkê Serdar ji famdarîya nivîskarên wê serdemê ya ji rexneyê tenê nîşandayîna hin xeletîyên sentaksî ne. Loma jî dibêje di wê heyamê de ji rexneya edebî fêhm nekirine û ji dûrî vê yekê ne. Angaşt dike ku, hîn jî helwesta nivîskarên kurd bi heman awayî ye (Serdar, 2018a: 119).

Ev rewş di heman demê de dema ku nivîskar di rojnameya *Rêya Teze* de dixebite jî berdewam dike.

Wexta ez teze hatibûm di redaksîyaya *Rêya Teze* de dixebitûm, min êpêce gotarên rexnekirina edebîyatê nivîsîn û dan çapkitin. “Lawikan” texmîn kirin, weku ez ê derheqa “afîrandinêd” wan de jî gotarên wisa yî tûj binivîsim, hatin cem redaktor, daw kirin, weku ez êdî gotarên bi vî teherî nenivîsim. “Lawik”, ku hînî rexnekirinê nebûbûn, her tenê pesnê hev didan. (...) Çi qas caran di rûyê gotarên rexnekirina edebîyatê de gef li min xwarine, hatine pêşîya min, ji mala min re têlê xistine û hezar cure gilîyên netê gotine. (Serdar, 2018: 335).

Emerîkê Serdar weku rexnegirekî edebîyata kurdî gelek caran rastî hin bertekên neyînî hatîye û di vê babetê de asteng maye. Nivîskar radigihîne ku di dema xwendekarîya xwe de gotarekî dinivîse û ji ber bertekên nivîskarên wê serdemê nikare bide weşandin û gotara xwe diqelişîne (Serdar, 2018: 334).

Emerîkê Serdar ji sûdwergitina kevneşopîyê û folklorê ji bona nivîskaran kêrhatî dibîne. Lê li gorî nivîskar, hin nivîskarên serdemê ne ku ji folklorê sûd werdigirin; berhemên folklorîk qet naguherînin û li ser navê xwe weku afirandineke nû didin çapkirin. Nivîskar vê yekê weku dizîya folklorê nav dike: "...hinek şayîrên me giva nimûneyên folklorê veçê dikin, lê diha xirab dikin û gelek caran jî naguhêzin û çawa afirandina xwexwetîyê li ser navê xwe çap dikin, dêmek, dizîya folklorê dikin." (Serdar, 2018: 333).

Emerîkê Serdar di sûdwerhirtina folklor û afirandinê de hin xalên sereke dîyar dike. Ew di gotara xwe ya bi sernavê "Nema Vekirî Şayîr Qaçaxê Mirad ra" helwesta xwe ya di vî warî de dide der û di vî warî da jî pesnê Qaçaxê Mirad dide.

Folklor me ye pîrçîmet bona sazkirina lîteratûra me ye teze kanîke nemiç'iqîye. Şayîrê me temam jî avê ji wê kanya sar û zelal veduxun. Hine şayîr jî diçin ava wê şêlû dikin. Hine şayîr jî rya wê kanîke kirine rya kadiz. Lê hinek jî hene, weku bi sidq û nifûsa qenc berbi wê kanîke diçin, weku qinyatê p'ak jê hildin, Hûn tevî wê k'oma axrîne. Veçêkirina ç'îroka 'Mîrze Mehmûd' angorî ç'îroka cimetê dereceke bilinde. Tê kivşê, weku We ser veçêkirina wê xûdana şayîrtîê rêtye. Ç'îroka "Mîrze Mehmûd" vî alîda gihîştîye meremê xwe. (Serdar, 03.03.2022)

Emerîkê Serdar ne tenê rexnegirê berhemên nivîskarên din e. Ew di heman demê de rexneyê li nivîsên xwe jî dike û di nivîskarîya xwe da jî bi guman e. Li ser vê yekê di gotara xwe ya rojnameya *Rêya Teze* "Min Çira Dest Şayîrtîê Kîşand" de balê dikişîne ser helbestvanîya xwe jî.

Wextekê (ew jî zemanek bû, ha) ez jî şayîr bûm, ew jî şayîrekî erhede...

Ew wext-wedekî usa bu, weku nava meda çiqas merîê xwendî hebûn, çiqas merîê, ku herf nasdikirin, temam jî şayîr, nivîskar û aşîq bûn. Ê, ez jî înstîtûtêda, hela fakûltêta ziman û lîteratûrêda hîn dibim, dêmek, ez jî şayîrim. Ya duda, şîera mine neşîrbûyî derheqa edlayêdane. Kî, ku miqabîlî şîera minbe, bizanbe, ew jî dijmînê edlayêye. Em, şayîrê kurdê sovêtî, temam jî weku hevîn, ez jî usa dinivîsim, çawa ku gişk dinivîsin. Lê ya

krîfîkaê!.. Ewê çi xelqê kirye, weku çi min jî bike. Xwe destê min p'elawa bavê krîfîkaêda neşewitye, weku jê şerm bikim. Min serê rê û me'nya hemûşka bir'ye.

Lê min nizanbû, weku ew şayîrtiya minê zûtirekê wê ber minda bimîne.

Rojekê jî ecêbeke giran hate serê şayîrtiya min. Bextê şayîrtiya minra gazêtêda şîera şayîrê me “Kilama edlayê” neşir bû. Çimkî têma şîerê me yek bû, lema jî min ku ew şîer xwend, qudûmê çokê min hema berda şkest. Min tê derxist, lê hey lo, lo... t'extekî şayîrtiya min kême! Hema wê rojêda terkek li şayîrtiya min ket. (Serdar, 03.03.2022)

Emerîkê Serdar di pêşdaçûna edebîyatê de rola rexneyê pir mûhîm dibîne. Li ser analîzkirina berheman gelek serê xwe êşandîye û gelek caran jî di vî warî de rastî hin astengîyan hatîye. Ew di hêla rexnêyê de xwe dispêre rexnegirê edebîyata Rûsan nivîskar Belînskî. Emerîk dîyar dike ku gelek tesîra Belînskî le ser wî çêbûye.

Alî rexneya wêjeê da hukmekî mezin rexnegirê rûsayî mezin Bêlînskî ser min hiştibû. Min gotara wî usa dixwendin û dimihandin, çawa merîkî tî avê vexwe. Nava me da çend merî hebûn, pirî-hindikî wêje û rexne fem dikirin û min ra digotin “Bêlînskîê Kurda” (Serdar, 2014: 182). Nivîskar xwe weku evîndarê rexneya edebî dibîne û lê bi helwesta xwe ya rexneyê ve di nava edebîyata kurdî ya Sovyeta berê de weku “dijminê çanda kurdan” hatîye binavkirin (Serdar, 2018:333). Nivîskar her wiha di qada rexneyê de edebîyata kurdî ya kevne Sovyetê kêmbûnê dibîne û ji bilî xwe rexnegirekî din nade pêş. Nivîskar gotarên xwe yên rexneyî di pirtûka xwe ya “Bijare”de cih dike û di sala 2011an dide weşandin. Lê ev pirtûk tenê bi gotarên rexneyî pêk nayê (Yeşilmen, 2014: 282-283).

Li gorî nivîskar Tosinê Reşîd, di edebîyata kurdî Sovyeta berê de cureya herî qels rexnegirî ye. Lewra ev qonax ew qas temên dirêj nebû. Ji ber vê yekê jî bingeşên rexneya edebî dereng derketîye holê. Ev jî di vê qonaxê de bi pêşengîya Emerîkê Serdar pêk hatîye. Ji bilî Emerîkê Serdar tenê mirov dikare behsa çend nivîsên Çerkezê Reş bike (Reşîd, 2012: 210).

2.4 Çîroknûsiya Emerîkê Serdar

Berhemên edebî li gorî hin şert û mercên cîyawaz yên serdema xwe ve tên afirandin. Ji ber vê yekê jî metnên edebî weke neynikekê; serdema ku tê de tê afirandin dide nişandan. Ji vê hêlê ve jî berhemên edebî herçî weke neynika serdema xwe bin jî xwedîyê wateyên cîyawaz in (Eagleton, 2016: 129). Ger mirov ji vê hêlê ve li çîrokên Emerîkê Serdar binêrê dê bête dîtîn ku Emerîkê Serdar herçî di hêla Sovyetê de jîya be jî çîrokên wî bi mijar û wateyên xwe ve ji serdema xwe cihê dibin. Metnên çîrokên Emerîkê Serdar di analîzkirina sosyolojîya kurdan û çanda kurdan de mîna laboratûvarekê ne. Çîrokên Emerîkê Serdar ji hêla dîrokê ve şahidiya serdemekê ya beşeke kurdan dike her hiwa di civakê de têkilîyên mîr û jinan, têkilîyên malbatî û kodên çanda kurdî dihewîne. Her çî qas naveroka çîrokên Emerîkê Serdar bi jîyana kurdên Sovyeta berê ve hatibin dagirtin jî lê dîsa bi babetên xwe yên curbicur ve ew bi awayekî giştî vebêjîya kevneşopîya kurdan ya yekpare dike. Her wiha bi çîrokên xwe yên otobîyografîk ve çand, nêrît û kevneşopîya kurdan raçav kirîye, di vê hêlê de meseleyên civakî û malbatî raberî xwîneran kirîye. Ji ber van taybetmendîyên xwe em dikarin; çîrokên nivîskar bi jîyana kurdan ya sedsala bîstemîn ve pêwendîdar bikin. Lewra çîrokên nivîskar bi piranî dîmena jîyana kurdan ya derdora salên 1940î û derdora salên 2000î raber dike. Naveroke çîrokên Emerîkê Serdar bi taybetmendîyên civaka kurdan ve hatine dagirtin. Emerîkê Serdar çîrokên xwe ji nimûneyên folklora kurdî, bi pêşgotinên kurdî û jîyana kurdan ya rojane ve pêşkêşî xwînerên xwe dike.

Ji ber vê yekê jî em hêsanî dikarin bibêjin ku; Emerîkê Serdar temsîliyeta, realîzma civakî dike û di bin bandora realîzma civakî de maye û çîrokên xwe jî li ser vê rêbazê nivisîne. Di realîzma civakî de nivîskar bi rêya raçavkirineke realîst kêşeyên civakê weku babet ji xwe re vedibijêre. Feqîrî, mehrûmîyet, ked, kar, têkoşîna karkeran û berawirdkirin û dijberîya nîrxên berê û yên serdemê bingeha nivîskarîye wî digire. Di ve hêlê ve naveroka çîrokên Emerîkê Serdar jî bi hejarîya gel, nexwendîbûna wê, rexnekirina pergala bavîksalarîyê, jin û têkoşîna jinê, şer û karesatên şer ve temsîliyeta realîzma civakî dikin. Nivîskar ji ber van babetên navborî weku nivîskarekî realîzma civakî tê pênasekirin. Di vê xebatê de jî em ê li derdora pîvanên realîzma civakî, di çîrokên Emerîkê Serdar de temayên sereke bidin

kifşkirin. Berhemên nivîskar yên *Destê Dê* (2015), *Êdî Dereng Bû* (2015), *Dengê Dil* (2015), *Gundê Me* (2006) û *Hisreta Emir* (2018) ji vê hêle ve hatine nirxandin

Li gorî Alî Necîp Erdogan, ya ku nivîskar dide nivîsîn di serî de arezûya xwe ifadekirina wî ye. Di dawîyê de tişta herî berbiçav ew e ku nivîs “xwesteka xwe ifadekirinê” ye. Ji ber vê sedemê jî pirs sereke ya çîrokê vêbejer kî ye? (Erdogan, 200: 353). Ger em ji vê hêlê ve çîrokên Emerîkê Serdar binêrin di serî de em şopên jîyana nivîskar dibînin. Vebêjer, leheng û nivîskar di çîrokên nivîskar de yek kes e û ew jî nivîskar bi xwe ye. Ne tenê zarokatîya xwe ve ew gundê xwe ve, fikr û ramanên xwe ve û bi hemû derdora xwe ve di nava çîrokên xwe de cih digire. Di çîrokên Emerîkê Serdar de şopên zarokatîya wî pir bi bandor in. Feqîrî, êş û bêkesîtiya wî di çîrokên wî de jî derdikevin pêş. Hinek çîrokên wî piranî bi bîranînên zarokatîya wî ve hatine honandin.

Ji bo ku em bikaribin çîrokên nivîskar binirxînin me cih daye jînenîgarîya nivîskar jî. Lewra ger mirov bi awayekî hûrgilî li çîrokên Emerîkê Serdar binêre dê hêsanî bête dîtin ku jîyana wî bandor li çîroknûsiya wî jî kirîye. Bêyî jînenîgarîya nivîskar ger mirov çîrokan binêre dê valahîyek bimîne û çîroknûsiya wî dê zelal neyê ravekirin. Ji ber ku çîrokên Emerîkê Serdar, li ser bîr û bîranînan hatine honandin. Çîrokên nivîskar sehneyên ji jîyana wî ya takekesî vedihewînin. Ne tenê sehneyên ji jîyana nivîskar jîyana derdora nivîskar jî di çîrokên wî de xwe didin der. Jîyana kurdan ya wê serdemê, gundê nivîskar û gundîyên wî babetên sereke yên çîrokên nivîskar in. Berawirdkirina jîyana berê û jîyana nû dibin mijara çîrokên nivîskar. Piştî avabûna Sovyetan ji bona kurdên kevne Sovyetê weku jîyaneke nû tê vegotin. Kurd destkeftiyên rejîma nû ji xwe re weku bihar dibînin. Ev destkeftî ne tenê di warê çandî de di heman demê de veguherina jîyana wan ya civakî jî pêk tîne.

Xalekî sereke yê nivîşkariya Emerîkê Serdar jî xweza û jîyana gund e. Ew di hevpeyvîneke xwe de gundê xwe wiha dişayesîne: “Zarotîya min di gundê Pambê da derbas bûye. Pamb jî cîkî bilindcî ye, tebyeta wê gelekî xweş e, her sê aliyên gund çîya ne, şînayî gul û kulîlk reng-rengî ne û gelek in; baharê û havînê bîna bihuştê ji wan çîya û banîyên me tê û ez di wî gundî da mezin bûme û ewê yekê gelekî li ser min hukum kirîye.” (Gültekin, 2016: 60).

Emerîkê Serdar di nivîskarîya xwe de her çend li ser nêrîta realîzma civakî meşîyabe jî; di nava nivîskarên kevne Sovyetê de rêyeke cîyawaz vedike û pirî caran xwe ji vê nêrîtê cihê dike. Di nivîskarîya wî de her çi qas bilindkirina nirxên Sovyetan hatibin vegotin jî ew yekcar di bin bandora zimanekî propagandîst de namîne û xwe ji vê yekê rizgar dike. Mijar û babetên nivîskar her çend ji bona vê yekê hatibin nivîsîn jî lehengên xwe ji vê yekê dûr dixwe û kirasekî din li wan dike. Lewra di vî kirasî de nasnameyeke nû ya lehengan heye. Lehengên wî êdî ne tenê lehengên êrenî yên civaka Sovyetê ne, ew bi hemû hal û helwesta xwe ve ji çanda kurdî derçûne û welatperweriya kurdî di dilê wan de heye.

Xaleke din jî ew e ku li cem lehengên wî tenê kirinên baş yên lehengan nayên vegotin. Heman demê de leheng bi hemû derûnî û astengî û arîşeyên xwe ve di çîrokan de tên vegêran. Ew rewşa lehengsazîya ku ji hêla nivîskarîya kevne Sovyetê ve danandî di nivîskarîya Emerîk de derbeke giran dixwe. Emerîk bi vê helwesta xwe ve jî di nava vê serdemê de dibe dengê cîyawaz û mohra xwe ya xweser li vê serdemê dixwe. Lewra berîya nivîskar hema bibêje du cure leheng hene. Yek ji van lehengên êrenî ku sembola civak û sîstema nû dikin û ji hemû kêmasîyan wêde ne. Ya din jî lehengên dijber in û sembola paşverûtîyê û paşdemayîna heyamên berê ne. Leheng bi vî awayî reş û spî ne. Ger em ji vê hêlê ve jî lehengên wê serdemê û lehengên Emerîkê Serdar binêrin em dê bibînin ku, xebatkar, xwendekar û teşkîldarê sovxoz û kolxozan; parezvan û bawermendên sîstema nû û jîyana nû ne. Di nava van lehengan de jina kurd jî bi helwesteke azadîyane cihê xwe digire. Li hemberî van lehengên idealîzekirî şêx û dewletîyên serdemê, hin mêrên paşverû di nava civakê de bi temsîliyeta jîyana berê tên şayesandin. Ev mirov pirî caran weku bavekî nezan û kevneperest derdikevin pêşîya xwîneran. Dê li hemberî mêran hem ji bona civakê hem jî ji bona malê û zarên xwe dilsoztir in.

Çîrokên Emerîkê Serdar ji bona analîzkirina jîyana kurdên kevne Sovyetê metnên kêrhatî ne û ji bona lêkolanan jî derfeteke baş in. Lewra kurdên li welatê Sovyetê bi hemû awayan di çîrokan de hatine honandin. Di çîrokan de mişextîbûna kurdên êzîdî, malbatên kurdan çand û hunera wan, dewleta Sovyetê û di vê çarçoveyê de jî jîyana wan ya nû di çîrokên nivîskar de îmajeke têkûz a kurdan

radixe ber çavên xwîner û lêkoleran. Temayên çîrokê Emerîkê Serdar piranî bi gundê ku lê ji dayîk bûye ve girêdayî ne. Çand û kevneşepîyên niştecihên gund bi awayekî realîst di çîrokên wî de xwe didin der. Hin çîrokên wî paşxaneyê xwe ji bûyerên rasteqîn girtine û di şiklê çîrokan da hatine honandin (Bréteque, 2017: 103).

Emerîkê Serdar jî li ser nêrîta nivîskarên berîya xwe dom kirîye. Di nava nivîskarên kurd yê Sovyetê de berawirdkirina jîyana berîya şoreşa cotmehê û piştî şoreşê bi awayekî hûrgilî tê vegotin. Hema bibêje di nava hemû metnên serdemê de ev yek li ser nivîskaran weku erkekê xwe dide der. Jîyana berîya şoreşê bi her awayî reş û ya piştî şoreşê bi her awayî spî ye. Her çiqas Emerîkê nivîskarîya xwe li ser vê nêrîtê domandibe jî; ji nivîskarên berîya xwe cihê dibe. Ji ber ku di gelek çîrokên xwe de nivîskar hem nîrxên şoreşa cotmehê bilind dike û car bi caran kêmasî û guvaşên wê yê li ser gel jî bi awayekî rekûpêk nîşan dide. Emerîkê Serdar di bîranînên xwe de jî vê yekê diyar dike. Zordestîya li ser gel jî teşhîr dike.

Cîranekî me jî çûbû bajêr dixebitî. Êdî dest bi gîhadrûnê bûbû. Zevîya keke girtibûn, lê ew hela nehatibû. Zevîya li ber derîyê wan jî rind şîn bûbû. Zevî jî zevîya ceh bû. Çavê neferên malê li wê zevîyê bû, ebûra wan li ser wê bû. Rojekê jî dadxwazê (prokûrorê) nehîyeya Elegezê A.X. hat û gava pê hesîya, weku hela ew cîranê me ji bajêr nehatîye û dest bi xebata sîlos hazîrkirina bûye, sedrê kolxozê da pê xwe, li ber derîyê wê mala cîranê me sekinî û dawa malxuyê mala kir. Diya wî got, weki hela ji bajêr nehatîye, lê ew zûtireka bê. Dadxwaz vegerîya ser sedrê serwertîya kolxozê û bi hêrs gotê;

-De weku nehatîye, gazi çend kelendîkêşan bike, bila bîn, zevîya wî ya şîn bidirûn, bibin bikin sîlos, weku zanibe, çawa neyê di kolxozê de nexebite (Serdar, 2018a: 45-46).

Bi vî awayî jî nivîskar di hêla Sovyetan de dibe damezrînerê nûgerîyeke xweser. Lewra nivîskar pergala Sovyetê bi çavekî alîgir nanêre, ew pergala Sovyetê bi hemû heyîna wê ve derdibire.

Li Sovyetan di dewra Stalîn de civak bi hemû awayan ve hatîye dorpêçkirin û zext û zulmeke giran li ser civakê hatîye sepandin. Civak li gor bîrdozîya komînîzmê

hatîye rêvebirin. Vê yekê di warê edebîyatê de; di çarçoveya rêbaza realîzma civakî de xwe daye der. Li gorî rêbaza realîzma civakî nivîsandin, li ser nivîskaran weke erkeke wetenperwerîyê hatîye ferz kirin. Berhemên nivîskarên ku pesnê Sovyetê nedayîne nehatine weşandin û li rastî sansûrê hatine (Gültekin, 2017: 74). Piştî mirina Stalîn Nikita Kruşçev dibe sekreterê giştî ya Partîya Komînîst a Sovyetê. Kruşçev di sala 1956an de di bîstemîn Kongreya Partîya Komînîst de rexneyên tûj li Stalîn û serdema Stalîn dike. Stalîn weke sûcdarekî tawanbar dike (Klavuz, 2017: 91). Di serdema Kruşçev de zordariya li ser civakê hebekî nerm dibe. Di vê serdemê de nivîskar hêdî hêdî dest bi rexnekirina Sovyetê dikin. Ev yek xwe di warê edebîyatê de jî dide nîşandan. Salên 1960an ve naveroka roman û çîrokan diguhere. Berhemên serdemê ji hêla mijar, qadroya lehengan û mekanê ve ji berhemên berîya xwe cudatir dibe. (Morkoç, 2022: 42)

Piştî mirina Stalîn li sovyetan mirov çêtir karibûne fikr û ramanên xwe bi awayekî azad bînin ziman û bijîn. Vê yekê Asliqa Qadir jî di bîranînên xwe de tîne ziman. Asliqa Qadir radigihîne ku piştî mirina Stalîn çêtir karibûne fikr û ramanên xwe bînin ziman. Ev dem, dema herî xweş û bextawar bûye ji bona hemwelatîyên Sovyetê. Li gorî Asliqa Qadir di vê serdemê de rexnekirina Kruşçev jî tiştekî rêzê bû. Lê ev yek di serdema Stalîn de nepêkan bû (Qadir, 2023: 42). Ger em weşandina berhemên Emerîkê Serdar û nivîskarîya Emerîkê Serdar berçav bigirin ev yek dê hêsanî bête dîtin. Lewra nivîskar Emerîkê Serdar yekem berhema xwe ya çîrokan 1974an (Destê Dê) daye weşandin. Di vê serdemê de zextên rejîma Sovyetê li ser civakê hebekî siviktir bûye û nivîskar û hemwelatîyan li gorî serdema pêşîyê çêtir karibûne xwe îfade bikin.

Zülküf Ergün edebîyata Sovyetê ya kurdî ji ber hin sedemên cihê “yekreng û yekdeng” pênase dike û di vê yekreng û yekdengîyê de jî cihekî cîyawaz dide Emerîkê Serdar (Ergün, 2022: 150). Cîyawazîya Emerîkê Serdar jî mirov dikare ji ber van sedemên jor hatine destnîşankirin ve şîrove bike.

Di berhemên kurdên Sovyetê de mijareke berbelav jî mijara koçberîbûna kurdên êzîdî ye. Ev mijar hema bibêje di seranserê berhemên serdemê de derdikeve pêş. Zülküf Ergün vê yekê wiha şîrove dike: “Li ber zordariya axa, beg û artêşa

Romê ji welatê xwe direvin, bi arîkarîya ermenîyan û bi saya rûsan ji tevkujiyê rizgar dibin û bi avakirina Sovyetê jî digihîjin “bextewerîya jîyanê” (Ergün, 2022: 151-152).

Ev mijar di heman demê de hem trajediyekî nîşanê me dide û hem jî ji bona nirxdayîna sîstema nû tê bikaranîn. Lewra dema ku jîyana berîya şoreşê û piştî şoreşê bê ravekirin ev babet jî weku amajeya jîyana berê tê şayesandin. Di berhemên novela Elîyê Evdilrehman *Morof*, romana Hecîyê Cindî *Hewarî*, di hin çîrokên Wezîrê Nadîrî de ev babet dibe mijara berhemên navborî. Emerîkê Serdar jî ji vê nêrîte namîne û ew jî di hin çîrokên xwe de vê babetê dike mijara çîrokên xwe. Ne tenê mijara çîrokên xwe ew paşxaneyê malbata xwe jî digihîne welatê serhedê û serpêhatîya malbata xwe jî bi vê yekê ve girê dide.

Emerîkê Serdar bîranînên xwe de; Qaçaxê Mirad weku dersdarê xwe yê edebîyata kurdî dihesibîne (Serdar, 2018a: 140). Nivîskar her wiha der heqê Qaçaxê Mirad de di rojnameya *Rêya Teze* de bi navê “Nema Vekirî Şayîr Qaçaxê Miradra” gotarekê dide çapkirin û di vê gotara xwe de jî bi pesindkarî qala helbestvan Qaçaxê Mirad dike.

Emerîkê Serdar radigihîne ku bandoreke mezin a Qanatê Kurdo û Erebe Şemo li ser wî çêbûye. Nirxekî mezin dide Qanatê Kurdo û di hêla Sovyetê de wî weku pêşengekî bêhempa dibîne. Her wiha pesnê Erebe Şemo jî dide û wî weku “Pîr”ekî êzîdîyan ê dînî dide pêş (Bréteque, 2017: 103-105). Nivîskar rasthatina xwe û ya Erebe Şemo jî wiha dîyar dike: “Sala 1954an di rojnameya Sovyetakan Hayastanê de (Ermenistana Sovyetîyê) înfomasîyayeke biçûk çap bû der heqa wê yekê de, weku bolşevîkê kevn, nivîskarê kurd Erebe Şamîlov vegerîyaye Yêrêvanê. Hetanî wê çaxê me navê Erebe Şamîlov nebihîstibû, pêketîyên wî jî li tu cîyan navê wî nedidan, ne jî dinivîsîn. Loma jî em, wekîlê silsileta cahil, hay ji Erebe Şamîlov nîn bûn.” (Serdar, 2018a: 148).

Emerîkê Serdar her çiqas weku çîroknûs bê naskirin jî cara ewil bi helbestvanîyê dest bi nivîse dike. Yekem helbesta nivîskar bi navê “Edlayî” di sala

1955an di rojnameya *Rêya Teze* de tê weşandin. Emerîk di vê derê de radigîhine ku ev helbest bi sernavê Emerîkê Serdar hatîye weşandin (Serdar, 2018:332).

Lê piştî ku helbesta wî di rojnameyê de çap dibe û nivîskar helbestvanîya xwe kêr dibîne û ji ber vê yekê jî dest ji helbestvanîyê dîke. Li ser helbestvanîya xwe jî Emerîkê Serdar di rojnameya *Rêya Teze* de di sala 1960an de bi navê “Min Çira Dest Ji Şayîrtîê Kîşand?” gotarekî diweşîne. Emerîkê Serdar di vê gotara xwe de dîyar dike ku helbesta wî di nava xwendevanan de hatîye ecibandin. Lê piştî ku nivîskar li ser rûpelên rojnameya *Rêya Teze* helbesteke bi navê “Kilama edlayê” ya Qaçaxê Mirad dixwîne der barê helbestkariya xwe de dikeve gumanan û wiha terka helbestê dike.

Rojekê jî ecêbeke giran hate serê şayîrtiya min. Bextê şayîrtiya minra gazetêda şîera şayîrê me “Kilama edlayê” neşir bû. Çimkî têma şîerê me yek bû, lema jî min ku ew şîer xwend, qudûmê çokê min hema berda şkest. Min tê derxist, lê hey lo, lo... t’extekî şayîrtiya min kême! Hema wê rojêda terkek li şayîrtiya min ket.

Ez duşurmîş bûm. Oho, lê şayîrtî tenê xwendin nîne. Xwendinêra tevayî tiştekî mayîn jî lazime. (Serdar, 03.03.2022)

Piştî Emerîkê Serdar terka helbestvanîyê dike û carê jî xwe di pexşanê û çîrokê de diceribîne. Li ser vê yekê jî nivîskar helwesta xwe ya nivîskarîyê wiha dide der: “Ji nivîsara kurdan î vekirî çî bi min xweş nedihat? Berî her tiştî ew nivîsar mînanî çîrokê sist bûn, nîgarên wan bê xwîn û qinê bûn, xeyset û psîgologîya wan tune bû, gişk mînanî hev bûn, her tenê sêmatîzm bû. Ew mînanî gotarên rojnameyên dîwaran bûn. Te yê bigota ew di salêd sedsalîya derbasbûyî yi 20-30’yêde hatine nivîsarê.” Emerîk her wiha der heqê nivîskarîya xwe de jî wiha lê zêde dike. “Wexta min dest bi nivîsara vekirî kir, min cedand, weku ew kêmasî di nava nivîsarê min de tune bin û tu yê bibêjî (bi gotina xwendevanan) ew yek ji min re li hev hat. Ev jî tezetîyek bû, ku ket nava nivîsara mey î vekirî.” (Serdar, 2018a: 364)

Emerîkê Serdar nivîskarekî berhemdar e û hin behremên ku bi jîyana kurdan ve pêwendîdar in, ji zimanê ermenî û rûsî wergerandine kurdî. Di karê wergerîyê de

li hêla Sovyetan de nivîskarekî çalak û pêş e (Xelîl, 2014: 80). “Mijûlîyên wî pircureyî ne. Ew nivîskar e, rojnamevan e, wergêr e, rexnegirê edebîyatê ye....” (Memê, 2020: 30).

Emerîkê Serdar her çiqas di bin bandora realîzma civakî de berhemên xwe afirandibin jî; di berhemên wî de meseleyên çînî zêde cih nagirin. An jî em dikarin bi awayekî din bibêjin ku di nivîskarîya Emerîkê Serdar de şûna meseleyên çînî meseleyên neteweyî cih girtine. Nivîskar bi vî şêwaza xwe ve di edebîyata kurdî ya serdema Sovyetê de rêyeke cîyawaz dide pêşîya xwe. Emerîkê Serdar hem bi şêweya Maupassant û hem jî bi şêweya Çexov çîrokên xwe nivîsîne. Çîrokên wî yên ku dişibin çîrokên kurt di forma Çexovî de hatine nivîsîn. Lewra di van çîrokan de hin rewşên jîyanê hatine vegotin. Di çîrokên şêweya Çexovî de; dem, mekan û bûyer cihekî taybet nagirin. Ji bûyerê wêdetir; rewşa wê keliyê xwe dide pêş. Ne tenê rewş, hin hestên mirovane û derûnîya mirovan, di van çîrokan de cihekî taybet digirin. Ew van çîrokên xwe yên kurt weku “nexş û nîgarên hûr” dide nasîn. Ew di bîranînên xwe de radigihîne ku wî cara ewil bi van nexş û nîgarên hûr ve dest bi nivîskarîyê kirîye. Çîrokên Emerîkê Serdar yên dirêj li ser bûyerê hatine sêwirandin. Di gelek çîrokan de dem û mekan xwe zêde nade der. Lê çîrok xwedî encameke dîyarkirî ne. Di encamdanînê de nivîskar bi helwesteke xurt xwe dîyar dike û peyama xwe beyan dike. Li gorî nivîskar Horacio Quiroga jî di çîrokan de destpêk û fînal pir giring in. Nivîskar her wiha dîyar dike ku “Di çîrokekê de, divê hevoka pêşîyê li gorî fîнала çîrokê hatibe nivîsîn.” (Quiroga, 2018: 209). Ger em ji vê hêlê ve metnên çîrokên Emerîkê Serdar binêrin em ê vê yekê bi hêsanî bibînin. Lewra serenav û destpêka çîrokên nivîskar li gorî encama wan hatine dîyarkirin.

Di çîrokên nivîskar de tiştên nepenî tune ne. Hemû tişt li gorî encamê tên vegotin. Ger tişteki derasayî yan jî aşkerenebûyî pêk were nivîskar teqez vê yekê ji xwîneran re rave dike.

2.5 Şopên Jînenîgarîya Emerîkê Serdar di Çîroknûsiya Wî de

Otobîyografi weku cureyeke edebî vegotina şexsekî ya der barê jîyana xwe de ye. Vegotina çîroka jîyana takekesî di edebîyatê de weku otobîyografi hatiye

pênasekirin (Farqînî, 2013: 1332). Otobîyagrafi peyveke frensizî ye û bingeha xwe ji peyva "autobiographie" girtîye. Her wiha otobîyografi di edebîyatê de jî êdî weku cureyeke serbixwe tê pênasekeirin. Bi wateyeke giştî mirov dikare bibêje otobîyografi, veğerandina jîyana mirovan ya şexsî ye. Lewra ne tenê di warê edebîyatê de di hemû qadên huner û zanistîyê de jî otobîyografi tên nivîsîn. Li gorî Yazıcı takekes xwe ne weku kirdeyekî; di şûna heyberekî de derdixe pêş û vê helwestê jî hiştîye ku otobîyografi weku cureyeke edebî derkeve holê (Yazıcı, 2006: 191). Li gorî Yakın otobîyografi bîranîneke jî rêzê wêdetir avakirina vegotinekê dihevine (Yakın, 2003: 132). Li gorî boçûna Yakın, otobîyografi cureyek ji vegotinê ye. Ji ber ku mirov jîyana xwe bi xwe dinivîse, di vegêrana bûyeran de kesayet û şiroveyên xwe jî lê zêde dike. Otobîyografi ji hemû alîyan ve kesayet, fikr û raman û darazên nixrên vebêjer li ber çavê xwîneran re radixîne (Özyer, 1993: 74).

Nivîskarê otobîyografiyê dema ku jîyana xwe ya takekesî vedigerîne; serdemên jîyana xwe jî dide der. Lewra ji vî alî ve jî otobîyografi şahidiya serdemekê diyarikirî dikin. Ji ber vê taybetmendîya xwe ve jî otobîyografi, belgefilmek e ku tê de dirok, çand û kevneşopî tên nîşandan. Panoramayek ya cîvak û serdemekê ye (Özyer, 1993: 75). Îhtîmaleke mezin e ku cureyên edebî yên weku roman û çîrok li ser serpêhatîyekê hatine avakirin. Nivîskar an ji serpêhatîyên xwe yan jî ji kes û bûyerên ku li cîhana derve çavdêrî kirîye û berhema xwe jî bi vî awayî radiçîne. Nivîskar bi vegêrana jîyana xwe ya şexsî, serborî û raçavkirinên xwe ve metna xwe disêwirîne. Vê yekê jî rêbaza otobîyografiyê pêk anîye. Tekîn vê yekê wiha şirove dike: “Hema bibêje her romannûs, di berhema xwe de; cih dide xwe, zanyarî û ezmûnên xwe. Bi rastî, hin romannûs tenê jîyana xwe vedibêjin.” (Tekin, 2002: 248 - 249).

Hin çîrokên Emerîkê Serdar ji dahûrandina şopên jîyana wî wêdetir rasterast bi jîyana wî ve hevterîb in. Ew di pênc pirtûkên xwe yên çîrokan de, bi rêya lehengên çîrokê hin serpêhatîyên jîyana xwe vedibêje. Kesên ku em di çîrokan de weku hevjin, dê, bav, nivîskar, leşker û hwd nas dikin ji jîyana nivîskar hatine esagirtin. Şopên jînenîgarîya nivîskar, bîranînên zaroktîyê û jîyana gundê nivîskar û nostaljiya rabirdûyê mîna temayên sereke derdikevin pêş. Emerîkê Serdar di hin hevpeyvînên

xwe de amaje bi çîroknûsîya xwe dike û dibêje: “Nivîsen min yên ewil li ser bîranîna dayîka min bûn. Min ji bo wê, ji bo ku qala wê bikim dest bi nivîsînê kir. Gundê min û şênîyên gund jî min di çîrokên xwe da cih kirine.” (Breteque, 2017: 106). Di jîyana Emerîk da ne tenê diya wî her wisa xwezaya gundê wî jî li ser bandor hîştîye. Di bin tesîra xwezaya gundê xwe da maye û ev yek jî di çîrokên xwe da daye der (Gültekin, 2016: 57). Weku tê dîtin di jîyana Emerîkê Serdar de hin tişt hene ku bandoreke mezin li nivîskarîya wî kirine. Me jî di vê beşê de hewl da di çîrokên wî de şopên jînenîgarîya wî tespît bikin.

Mirov di çîrokên wî yên bi navê “Name”, “Em Çûne Aş”, “Bavê Min Çû”, “Guman”, “Ji Eskerê Neeyan Re”, “Êdî Dereng Bû”, “Awazê Gundê Me”, “Zînê”, “Wê Şevê”, “Hetanî Kîngê?”, “Zewaca Elo”, “Du Qewimandin Ji Emrê Mektebê” de şopên jînenîgarîya wî dibîne.

Di pirtûka *Destê Dê* û çîroka “Name”yê de vegêr bi gotina “Qîzek di gundê me de hebû, Navê wê Çîlê bû.” (Destê Dê.7) dest pê dike. Bi şayesandinên gund û têkiliyên gundîyan û şayesandinên li ser vegêr hatine kirin; bi me eyan dibe ku vegêrê çîrokê nivîskar bi xwe ye. Çîrok jî bîranînek ji zarokatîya nivîskar e. Lewra di berdewamîya çîrokê de ev yek baştir tê xuya kirin. Di çîrokê de vegêrê çîrokê xwendekar e û ji metnê dîyar dibe ku vegêr xwendekarîya xwe, di nava zor û zehmetîyekê de derbas dike: “Ez î di emir de şermoke, ew bi bedewîya xwe guman. Her pakbûna min tenê ew bû, weku di mektebê de rind hîn dibûm, rûnêrm î milûk bûm. Lê hînbûna min hela nedibû sol nediket lingên min, nedîbû, kincekî teze bi stûyê min de nedihat xwarê...” (Destê Dê. 7).

Di berdewamîya çîrokê de jî em dîsa rastî salên nivîskar yên xebata radyoyê tên. Emerîkê Serdar piştî kutakirina zanîngehê di Radyoya Erîvanê de weku spîker xebitî ye. Ev yek jî di çîrokê de hema bibêje bi heman awayî tê vegêran. Piştî wextan em dibînin Çîlê zewicîye û ji vegêrê çîrokê re nameyekê dişîne û di nameyê de evîna xwe ya li hemberî vegêr mikûr tê. Di çîrokê de ji ber ku navê vegêr derbas nabe û me ew weku vegêr daye naskirin:

Sal derbas bûn, min xwendina xwe temam kir, ûnîvêstêt kuta kir, di radyoyê da xebitîm çawa dîktorê xebardana Kurdî. Birînên min êdî kew girtibûn. ... xebat jî gelekî bi dilê min bû. Ji emrê xwe razî min wiha ji xwe re derbas dikir, hetanî rojekê... Rojekê jî, wexta ez hatim ser xebatê, nameyak dan min. Destnivîsara li ser pakêtê nenas bû, adrêsa şandî jî tune bû. Min name vekir û xwend: ...Dibe te niha ez bîr kirime. Xwezîya min bi te... Lê a min? Ez nikarim te ji bîr bikim. Her êvar, wexta tu di radyoyê de xeber didî, bê hemdî xwe dibî mêvanê dilê min. (Destê Dê. 14).

Di heman pirtûka *Destê Dê* de di çîroka “Em Çûne Aş” de jî vegêrê çîrokê serpêhatîya nivîskar a zarokatîya wî ji me re vedibêje. Di vê çîrokê de ne bi qodên veşartî bi awayekî eşkere şopên jînenîgarîya nivîskar tînin vegotin. Lewra nivîskar di bîranînên xwe de bi heman sernavî qala serpêhatîyeke zarokatîya xwe û xizantîya malbata xwe dike. Emerîkê Serdar di bîranînên xwe de vê serpêhatîyê wiha vedigêre: “Min êdî koma 7’an xilas kiribû. Arvanê me tune bû. Çewalek cehê me yî nehêrayî hebû. Apê min çûbû Tîblîsîyê dixebitî. Rojekê diya min gote min, weku Şerefê Emer û Rostemê Îvo diçin aş. Tu jî bi wan ra here, vî çewalê cehê me bihêre.” (Serdar, 2018a: 80). Di çîroka “Em Çûne Aş” de jî bûyer nêzîkê vê diqewime: “Teze Şerê Wetenîyê yî mezin kuta bûbû. Birînên şer hela necebirîbûn. Mala me jî talîya wî şerî dîtîbû; bavê min çûbû şer û nehatîbû, lê apê min hela di eskerîyê da qulix dikir. “Mêrê malê ez bûm ku ancax deh salên min temam bûbûn. Arê me kuta bûbû. Rojekê cîranê me –Aqoyê Xalit, ku brîgadêdîrê kolxozê bû, karê xwe kir, weku here aş. Dîya min ez pê re danîm, weku çewalê cehê me bibim bihêrim.” (Destê Dê. 68).

Em pê dizanin bavê nivîskar jî beşdarî Şerê Wetenîyê yê Mezin bûye û venegerîyaye. Heman demê apê wî jî di leşkerîyê de peywirdar e û Emerîkê Serdar bi dayîka xwe re dijî. Di çîroka “Bavê Min Çû” de vegêr li ser bîranînên bavê xwe zûr dibe. Bavtîya xwe û bavtîya bavê xwe de hestên xwe tîne ziman. Dema vegêr li ser dergûşa zaroka xwe de xwar dibe bavê xwe bi bîr tîne û bi zimanekî hestiyar sêwîlbûna xwe dide der. Çûyîn û nehatina bavê nivîskar û ya vegêrê çîrokê jî mînanî hev in. “Zanim, weku bavê min wisa li ser bêşîka min de mêl nebûye, li min nenêriye, şa nebûye. Ez hatime dinyayê, lê dijmin jî derî li me girtiye... Bavê min çû, nehat, weku dewesê edlayî bê.” (Destê Dê. 87).

Di pirtûka nivîskar ya *Dengê Dil* de jî şopên jîyana nivîskar tên dîtin. Di çîroka “Guman”ê de dîsa babet Şerê Wetenîyê yê Mezin û karesatên piştî şer di ser zarokekî biçûk re hatine vegotin. Ev çîrok jî dişibe çîrokeke otobîyografîk. Lewra di çîrokê de vegêr zarokek biçûk e. Bavê vegêr di şer de mirîye û ew diya xwe û apê xwe, Hemîd, di malekê de dijîn. Apê wî diçe bajêr dixebite û aborîya wan pêk tîne: “Şerê Wetenîyê yê mezin teze kuta bûbû. Salêd giran bûn. Ew çetinayî hela nehatibûn hildanê, ku şêr bi pêş de anîbûn. Zulma şêr gihîştibû mala me jî. Bavê min çûbû ber şêr û venegerîyabû. Apê min teze ji eskerîyê hatibû. Rast e, neferê mala me giran nîn bûn (ez bûm, diya min, pîrika min û apê min)” (Dengê Dil. 23).

Di berdewamîya çîrokê de em rastî navê apê vegêr jî tên ku navê wî Hemîd e. “Rojekê jî me tendûra xwe temirandibû, nanê nîvro xwaribû û em li dora tendûrê rûniştibûn. Li ser xanîye me bûbû reperep, meriv hilkişîyane ser. Me dît yekî devê xwe kire kulekê û kire gazî: -Mala Hemîd ev e?” (Dengê Dil. 23). Ger em li jîyana Emerîkê Serdar binêrin ev yek heman çîroka zarokatîya wî û serborîyek ji jîyana wî ya takekesî ye. Lewra navê apê nivîskar jî Hemîd e û bavê wî jî ji şer venegerîyaye.

Di pirtûka *Dengê Dil* de çîrokek din jî ya ku jîyana nivîskar dihevwîne, çîroka “Ji Eskerê Neeyan Re” ye. Çîroka “Ji Eskerê Neeyan Re” de mijar piştî kutabûna şer e. Lehengê çîrokê bavê xwe di şer de wenda kirîye û ne mexberê wî dizane û ne jî bavê xwe bîr dike. Lê bi serfirazî qala bavê xwe dike. Bavê nivîskar jî di şer de mirî ye lê em di bîranînên nivîskar de rast lê nayên weku cinyazê bavê xwe girtibe û spartibe axê. Lewra nivîskar di tu cîyan de dîyar nake weku bavê wî li ku derê şehît bûye. Ger mirov li ser vê çîrokê jî bi hûrgilî raweste dê bête dîtin ev çîrok jî, li ser bîranînên nivîskar hestên wî yên der barê bavê wî de hatine nivîsîn. “Tu cahilê hetahetayê, tu kurê dayîkekê, lê temamîya cimetekê dayîka te, tu eyan, eyana eskerê çil û yekê yî Neeyan.” (Dengê Dil. 61).

Emerîkê Serdar di bîranînên xwe de radigîhîne ku bavê wî di gulana 1941ê de çûye leşkerîyê. “Sala 1941ê bû. Meha Gulanê bû. Bavê min û apê min ji Tibîlîsîyê vegeîyabûn. Hatibûn ji bo tevî xebata gîhadirûnê bibin. Lê dest bi Şerê Wetenîyê yî Mezin bû. Di mobîlîzasîya pêşîn de bavê min birin eskerîyê.” (Serdar, 2018a: 65). Di

metna çîrokê de jî destnîşankirina sala “çil û yekê” çûyîna bavê nivîskar ya ji bo leşkerîyê ye.

Berhema Emerîkê Serdar ya bi navê *Êdî Dereng Bû* jî xalên otobîyografîk dihewînin û di vê berhemê de em rastî çar çîrokan tên ku honaka xwe ji bîranînên nivîskar wergirtine. Di çîroka “Êdî Dereng Bû”yê de vegêr rasterast jîyana nivîskar ya serdemekê vedibêje. Vegêrê çîrokê kesê yekem e û çîrok bi çavên wî tê vegotin. Ji bûyerên ku di çîrokê de tên vegotin, serpêhatîya jîyana nivîskar e. Lewra em di çîrokê de hay jê dibin ku bavê vegêr beşdarî şer bûye û vegêr bi dayîka xwe re dijî. “Bavê min jî çûbû ber şer. Diya min ji bo min her tişt fikir, kincên min û çarixên min didirût.” (Êdî Dereng Bû. 38-39).

Piştî ku bavê nivîskar diçe leşkerîyê ew û dayîka xwe bi hev re dimînin. Nivîskar vê yekê di bîranînên xwe de jî bi awayekî berfireh dibêje. Piştî çûyîna bav nivîskar û dayîka xwe di nava jîyaneke zor û zehmet de dimînin. Ji xwe ev çîrok jî li ser vê yekê hatîye honandin. Ger em li bîranînên nivîskar û çîrokê bidine berhev; em dibînin çîrok, serpêhatîya jîyana nivîskar bi xwe ye. Hem di bîranînên nivîskar de hem jî di metna honakî de mirina dê heman awayî hatîye vegotin. “Cara kutasîyê destê min hilda, da ser çavên xwe. Êpêce wext destê min berneda. Çavên wê di bin destê min de direqîsîn. Min texmîn kir, weku kefa destê min şil bû. Min dît di bin destê min re hêsîrên wê hatin, daketin ser sûret. Destê min li ser çavan, enîya diya min sar bû. Min destê xwe hilda, dît çavên wê ketine hev. Destê min li ser çavan diya min texdîr da.” (Êdî Dereng Bû.43).

Mirina diya nivîskar jî hema weku metna çîrokê ye: “...diya min bi destan gazî min kir, destê min danî ser çavên xwe, hêsîrek dudu hatin, çavên wê di bin destê min de perpitîn. Gava min destê xwe ji ser çavên wê hilda, çavên wê êdî heta hetayê hatin girtin.” (Serdar, 2018a: 114).

Di vê berhemê de çîroka “Awazê Gundê Me” de vegêr xwe dispêre şayesandina gundê xwe. Lê gundê ku vegêr qala wê dike dişibe gundê nivîskar bi xwe. Lewra rûdanên ku di vê çîrokê de pêk tên û şayesandina gund, heman awayî di

bîranînên Emerîkê Serdar de jî cih digirin. Nivîskar dema behsa dîroka gundê xwe dike behsa bûyereke dîrokî dike ku li gorî nivîskar di gundê wan de qewimîye.

Newala Ecelê cîyekî gelek xweş e. Lê çima wisa jê re gotine? Çimkî sala 1920î Rom hatîye derketîye gundê me. Çawa cahilên gundê me, wisa jî cahilên gundê cîran berhev kirine, anîne di wê newalê de qetil kirine. Hetanî ez li gund bûm, zaro bûm, em diçûn wê newalê, me bi qûmê dilîst û car caran hestî û pestîyên merivan derdiketin. (Serdar, 2018a: 26).

Ev rûdana ku di bîranînên nivîskar de derbas dibe, heman demê de dibe honaka çîroka “Awazê Gundê Me” jî. Di çîrokê de jî vegêr kesê yekem e û dema qala gundê xwe dike wê wiha pêname dike;

Gundê me gundekî biçûk e. Terîqa wî ji sed salan zêdetîr e. Binelîyê wî ji zulma Roma Reş (ev “Reşê” han çi qasî bi cî ye!) revîne û hatine li vir star bûne. Revîne, hatine, lê dîsa jî wê zulmê xelas nebûne. Di fêza gundê me da newalek heye. Jê re dibêjin ‘Newala Ecelê’. Sala 1918’an eskerê Roma Reş hatine ketine gundê me jî. Şevêkê bi nava gundê me, gundên cîran ketine, mêr top kirine. gişk birine wê di newalê de kuştine. Hetanî çend salan bi pêş de jî hestî û pestên merivan ji nava qûma wê newalê derdiketin (Êdî Dereng Bû. 47).

Dîsa pêkhatina bûyerê di bîranînên nivîskar de em dibînin bi dengê defê dest pê dike. Di metna honak, ya çîrokê jî bi heman wayî ve hatîye vegotin.

Çendek derbas dibe, eskerê Romê rojekê defê û zurneyê dixin, di bendera nava gund de govendê digirin, dilîzin. Êpêceyî dilîzin. Cahilên gund diçin, hinek dikevin govendê, dilîzin, hinek jî temaşe dikin. demekê dirêj li defê û zurneyê dixin, ji nişkê ve dengê defê dibirin, dora cimeta berhevbûyî digirin, xort û mêrên cahil digirin dikin merekekê, derî li ser wan dadidin, çend eskeran qerewîl datînin... (Serdar, 2018a: 27).

Vegêrê çîrokê jî vê bûyerê hema bibêje mîna bîranînên nivîskar vedibêje.

Rojekê jî ji nîvro bi şûn de, di orta gund de def û zurneyê lê didin. Qeydê govenda kurdî lê didin, bi xwe jî dikevîne govendê. Êpêceyî lê didin.

Dengê defê cahilên gund ji malan dertîne. Têna orta gund, temaşa wan dikin. Dinêrin, weku esker nikarin qeydê me bilîzin, dil û dîne wan li ber hev nade, bi destê hev digirin, dikevin govendê û dilîzin.... Ji nişkê ve ve dengê defê didin kerkirin û cahilên gund î berhevbiyê digirin dikin merêkê, du zabîtan dikin qerewîl, bi xwe jî bi nava gund dikevin, mêran digirin, tînin bi ser wan de zêde dikin (Êdî Dereng Bû. 48).

Wek ji van jêgirtinan jî dîyar dibe di navbeyna bîranînên nivîskar û honaka metnê de û dîroka rûdana bûyerê de tenê çend peyv ji hev cihê dibin. Şayesandina gund jî di çîrokê de dişibe gundê nivîskar. Di çîrokê de vegêr gundê xwe wiha pêname dike: “Her sê alîyên gundê me çîya ne. Tenê alîyek vekirî ye, tu yê bibêjî ew jî ji bona wê yekê ye, weku gund bi dinyayê re bê girêdan. Ew Başûr e. Kanî û çavkanî mînanî morî û mîrcanan li sînga wan çîya ber tavê dibiriqin. Li alîyê rojhilatê Çîyayê Heftêmanat e...” (Êdî Dereng Bû. 49).

Pênasekirina vegêr ya dir der barê gund de, di bîranînên Emerîkê Serdar de jî bi heman awayî derbas dibe: “Gundê me gundekî biçûk e, weku 50-60 malî ye. Her sê alîyên wî gundî çîya ne... di navbera Çîyayê Qûçan û Çîyayê Zîyaretê de gêdûkek heye. Me jê re digot Gêdûka Xemê... Çend kanîyên gundê me hebûn. Kanîya mezin, Kanîya Heftêmanat bû.” (Serdar, 2018a: 25-26).

Bi çîroka “Zînê” jî mirov dikare bibêje nivîskar serhatîyeke xwe bi rêya vegêr daye der. Lewra hin meseleyên ku di çîrokê de derbas dibin em dikarin bi jîyana nivîskar ve pêwendîdar bikin. Vegêr di çîrokê de qala hevalekî xwe dike ku navê wî Xetîf e. Vegêr û Xetîf di dibistaneke navendî de bi hev re xwendekar bûne. Lê li gorî saloxdayînên vegêr ev dibistan dişibe dibistana Elegezê ku Emerîkê Serdar di wê dibistanê de xwendekar bûye. Vegêrê çîrokê jî salên dibistanê wiha vedigêre: “Xetîf hevaldersê min bû. Min û wî sê salan bi teyayî di mekteba navîn de xwendibû. Ez û Xetîf ne ji gundekî bûn. Ew gundê li cîran dima. Ne li gundê me, ne jî li gundê wan wê çaxê mekteba navîn tune bû. Merkeza li nehîyeyê mekteba navîn hebû. Û em her du ji gundê başqe-başqe çî qas roj dihatin mektebê û diçûn.” (Êdî Dereng Bû. 59).

Emerîkê Serdar di bîranînên xwe de radigihîne ku di gundê xwe de piştî kutakirina dibistana seretayî ji ber nebûna dibistana navendî; her roj bi peyatî diçe

gundê cîran Elegezê û li wir dibistana navîn diqedîne. Di metna honakî de dibistana qala wê tê kirin merkeza nehîyeyê ye. Ji xwe piştî wextan Elegez weku nehîye tê kifşkirin. “Ji gundê me ez tenê diçûm mekteba Elegezê. Mala me li fêza gund bû û ez di nava temamîya gund re derbas dibûm, diçûm. Îlahî zivistanan, gava berf gelek diket merivê pêşîn ku rê vedikir, ez bûm.” (Serdar, 2018a: 86).

Di çîroka “Wê Şevê” de jî vegêr qala şerekî dike ku bi rêya radyoyê dibihîze. Vegêr xemgîn e lewra di radyoyê de dengê pîrozbahî û serkeftinên dijmine gelê wî tê bihîstin. Mijara çîrokê em tê digîhîjin şerê navbeyna hukumeta Iraqê û hêzên kurd de ye: “Di radyoyê de dengê zurneya dijmin, dengê altindarîya wî dengê azabûna cimeta min dixeniqand.” (Êdî Dereng Bû: 144).

Ji vê jêgirtinê jî dîyar dibe ku qesta nivîskar şerê li Kurdistanê ye û ev yek kirîye honaka çîrokê. Risteya “dengê azabûna cimeta min” jî vê yekê baştir dide xuyakirin; lewra ev hevok amaje bi kurdbûna wî dike. Di pirtûkê de nivîsandina çîrokê jî weku sala 1975an hatîye dîyarkirin. Di vê serdemê de jî li Kurdistana Iraqê de şer berdewam e. Nivîskar şopên jînenîgarîya xwe ne tenê di metna çîrokê de her wiha di bîranînên xwe de jî vê yekê vedibêje. Ew radigîhine ku li Sovyetan, şerê welêt bi rêya hin radyoyan dişopîne. Yek ji van radyoyan jî “Dengê Kurdistana Iraqê” ye ku nivîskar bi awayekî xef guhdarîya wê dike. (Serdar, 2018: 225-226).

Di berhema “Hisreta Emir” de jî em şopên jînenîgarîya nivîskar di çîrokan de dibînin. Di vê berhemê de di çîroka “Hetanî Kîngê?” de vegêr kesê yêkê e û bi rêya flashbackê vedigere zarokatîya xwe û wan rojên zarokatîyê vedibêje. Hîn di destpêka çîrokê de nivîskar nasnameya xwe aşkera dike.

Her car, wexta ez bi cîyekî de diçim, Zera min î biçûk timî dipirse:

-Bavo, tu yê kîngê bêyî?

Ev pirs wê serhatîyeke derbasbûyî yî melûl tîne bîra min. Û çî qas caran min ew pirs bihîstîye, ew qasî ew serhatî hatîye bîra min û ji min tirê ew ne ku zaf ji zû de qewimîye, lê do bûye (Hisreta Emir: 12).

Wek ku tê dîtîn vegêr navê qîza xwe weku “Zera min” pê nase dike, lê em dizanin ku navê qîzeke nivîskar Zerê ye. Dîsa di berdewamîya çîrokê de vegêr vedigere salên zarokatîyê û sala 1941ê. Ev sal, sala çûyîna bavê nivîskar ya leşkerîyê ye. Vegêr vê yekê rasterast çawa ku nivîskar di bîranînên xwe de vedibêje bi heman awayî vedibêje: “...Sala 1941’ê bû. (Helbet, ez paşê bi vê yekê hesîyam). Havîn bû, germê diqijiland. Li heyata komîsarîyata nehîyeyê yî eskerîyê tijî meriv bûn. Xên ji mêran, wisa jî gelek jin û zaro hebûn. Kom kom bûbûn û xeber didan. Ez î wê çaxê heft salî bûm û min hela bi pakî tê dernedixist, weku çi qewimîye, çima diya min û pîrika min digirîn...” (Hisreta Emir. 12).

Ne tenê di vê çîrokê de her wiha di hin çîrokên din de jî çûyîna bavê wî ya leşkerîyê tê vegotin. Li jor jî di çîroka “Ji Eskerê Neeyan Re” de vê yekê dîsa bi heman awayî cih girtibû.

Dewrêşê Serdar ku bavê Emerîk e divê biçe û beşdarî şer be. Di vê çîrokê de xwîner rastî kesayetîyekî balkêş tê. Ew bi awayekî fîzîkî tenê di destpêka çîrokê de xuya dibe. Lê di rastî de lehengekî çîrokê jî ew e. Heya dawîya çîrokê jî xwîner nizane ka bavê Emerîk li kudere û di çi rewşê de ye, lê qet jê xafil nabe. Lewra jî bawê lehengekî çîrokê di hemû hevokan de heye. Çîrok bi dûrketina wî dest pê dike û bi bendewarîya vegeerîna wî berdewam dike.

Dewrêş bavekî rastîn e. Ew jî kurê xwe pir hez dike. Nivîskarê çîrokê bi rengê xerîb wesfa cudabûna wî ji malbatê dike. Lê ji hezkirina wî jî xafil nabe. “Bavê min ez danîbûm ser çoka xwe, serê min dabû ber sînga xwe û destê xwe li nava porê serê min digêrand.” (Hisreta Emir. 12-13).

Sala 1941ê çûyîna bavê Emerîk e jî ku ji bona beşdarbûna şerê wetenîyê. Ev yek di bîranînên nivîskar de weku serpêhatî hatîye vegotin. Lewra piştî çûyîna ap û bavê, Emerîkê Serdar bi dayîk û pîra xwe re bi tenê dimîne. Sala 1941’ê bû... Di mobîlîzasîya pêşîn de bavê min birin eskerîyê. Di mobîlîzasîya duydan de apê min birin eskerîyê. Mala me ma bê mîr...” (Serdar, 2018a:65). Ji van jê girtinan jî amajê pê dibe ku çîrok serpêhatîya nivîskar ya dema zarokatîya wî ye. Çîrok seranser li ser vê serpêhatîyê hatîye dagirtin.

Hemîd Apê min bû, du rojan bi pêş de biribûn. Wê çaxê bavê min, diya min û pîrika min we verê kirin, nehiştin ez jî bi wan re herim. Roja apê min birin, bavê min di nava xênî de dîçû dihat û ofeofa wî bû. Hêsîr ji çavên pîrika min kêr nedibûn, lê diya min karê apê min dikir.

-Derwêşê Serdar...

-Ez li vê derê me, bavê min got, ez ji serpêşa xwe pêya kirim...
(Hisreta Emir. 14-15).

Em di vegêranê de hem rastî çûyîna bav û apê wî tîn û hem jî di nava honaka çîrokê de em rastî navên wan tîn. Hemîd û Dewrêşê Serdar weku du kesayetên rastî ne ku di honaka metnê de navên wan derbas dibe. Her wiha di çîrokê de du kesayetên din jî derbas dibin ku vegêr wan weku dê û pîrika xwe dide pênasekirin. Her çiqasî navên wan nehatibin dîyar kirin jî ev her du kes kesên rastî ne û çawa ku malbata vegêr her wisa malbata nivîskar jî, ji van çar kesan pêk tê.

Di berdewamîya çîrokê de jî vegêr behsa mirina bavê xwe dike û dibêje ku ew li leşkerîyê mirîye û li wan hew vegeirîyaye. "Rojekê kaxezeke wisa yî 'reş' derîyê me kuta..." (Hisreta Emir. 23). Bi kaxeza reş ve nivîskar mirina bavê xwe dide der. Em di jînenîgarîya Emerîk de jî pê dizanin ku bavê wî di şer de mirîye û li malbata xwe venegerîyaye.

Di çîroka "Zewaca Elo" de jî vegêr jîyana gund li derdora lehengê çîrokê Elo vedibêje. Her çiqas bi awayekî eşkere şopên jînenîgarîya nivîskar xuya nebin jî di hin cihan de em rastî wê yekê tîn ku bûyer ji serpêhatîyek, ji jîyana nivîskar e: "Lê jinêd beter (yêd wiha di wê malê de hebûn) radibûn, bi dizîka ji piştê ve dihatin, Elo diavêtin erdê û gazî jinên mayîn dikirin: Lê lê, werin hela em binêrin, çika ew mên e an na! Dibe tişt pê nabe, loma naxwaze bizewice." (Hisreta Emir: 108).

Di hevoka ku di nava kevanekê de nivîskar behsa jinên malekî dike lê di çîrokê de rasterast tu mal û jin, ji bîlî Aslîkê nayê vegotin. Her çiqasî nivîskar behsa jinên wê malê bike jî di çîrokê de malekî wisa derbas nabe. Dibe ku ev çîrok jî serpêhatîyek ji jîyana gundê nivîskar be û ji bûyereke rasteqîn hatibe wergirtin. Lê nivîskar bi xwîneran vê yekê nîşan nade. Ji xwe di dawîya çîrokê de jî nivîskar vê

yekê bi me dide zanîn ku ev çîrok ji bîranînên wî hatîye honandin: “Bi wê beşera xweş jî ew di bîra min de maye.” (Hisreta Emir. 122).

Çîrokek din jî ya ku di pirtûka *Hisreta Emir* de bi sernavê “Du Qewimandin Ji Emrê Mektebê” de em dîsa rastî jînenîgarîya nivîskar tên. Vegêr qala serpêhatîyeke ji dema şer ya dibistana xwe dike. Vegêr di dibistaneke gund de xwendekar e. Çîrok li ser bîranîna salên dibistanê, kirinên mamosteyên wî hatîye honandin. Karesata şer di vê çîrokê de jî xwe dide der. Qala serpêhatîya rojên xwendekarîyê tê kirin. Têkilîya xwendekaran, helwesta mamosteyan ya li hemberî xwendekaran û tundbûn û zexta wan a li ser xwendekaran hatîye vegotin. Ev çîrok jî weku tê dîyar jîyana gund û rojên xwendekarîyê vedibêje. Ji xwe Emerîk Serdar di bîranînên xwe de dibêje min li ser jîyana xwe ya xwendekarîyê bi vî navî çîrokek nivîsandîye (Serdar, 2018a: 39). Ev çîrok dişibe wê çîrokê. Heta rasterast navê vê çîrokê dide. Ji ber vê yekê jî em dikarin bibêjin ku ev çîrok binyata xwe ji serborîya nivîskar werdigire. Lewra em dikarin bibêjin vegêr nivîskar bi xwe ye û serpêhatî jî serpêhatîyên nivîskar in. Ji ber ku em pê dizanin dema şerê wetenîyê yê mezin diqewime nivîskar zarok e û di dibistana seretayî de dixwîne. Têkilîyên xwe û mamosteyan bi awayekî realîst vegotîye. Ev çîrok şahidiya nivîskar ya demên dibistanê ye. Têkilîyên wan û mamosteyan hewqasî jî baş nînin. Mamosteyên dibistanê bi tûndbûna xwe ve tên şayesandin: “Salêd Şerê wetenîyê yî mezin bûn. Çawa di hemû dereceyêd emmrê mayîn de, wîsa jî di mektebê de bûbû xelaya mêran, diha rast bûbû xelaya dersdarêd eslî.” (Hisreta Emir. 123).

Ger mirov bi hûrgilî çîrokên Emerîkê Serdar binixîne, dê hêsanî bê dîtî ku çîrokên nivîskar ji jîyan û bîranînên wî dizên. Di çîrokan de ev yek li ser gelek leheng û bûyeran xwe dide der. Emerîk ku kurê bavê xwe yê bi tayê bi tene ye û di dehsalîya xwe da ye, bavê wî diçe şer û êdî li wan venagere. Jidestdana bav û êtîmbûna wî di heman demê da, di çîrokan da jî xwe dide kifşê. Her çiqas bûyer yek û yek li hev neyên jî dîsa em dikarin li jîyan û hin çîrokên wî miqayeseyê hev bikin. Di hin çîrokan de em dibînin ku kesên ku dibine leşkerê dewletê û diçin şer ji paş xwe de zarekî bi tayê tenê û jineke ciwan hîştine. Gava bavê nivîskar diçe şer ew

dayîka xwe û pîra xwe bi tena serê xwe dimînin. Em şopên van bîranînan di çîrokên wî de bi awayekî berbiçav dibînin.

2.2 HÊMANÊN TEKNÎKÎ DI ÇÎROKÊN EMERÎKÊ SERDAR DE

2.2.1 Ziman

Emerîkê Serdar di çîrokên xwe de zimanekî herikbar bi kar anîye. Di beşa jîyana nivîskar de me dîyar kiribû ku nivîskar cara ewil bi helbestê dest bi nivîse kirîye û dûv re jî bi “Nexş û Nîgarên Hûr” ve nivîskarîya xwe domandîye. Vê yekê bandor li vegotina çîrokên wî jî kirîye. Lewra di vegotina çîrokên wî de carna em rastî zimanekî helbestî jî tên. Paşxaneyê çîrokên nivîskar ji jîyana gundê wî û derdora wî pêk tê. Vê yekê bandor li mijara babetên çîrokên wî, lehengên wî her wisa zimanê wî jî kirîye. Lewra karakterên çîrokan piranîya wan, gundî ne û zimanê çîrokên wî jî piranî devoka derdora wî ye. Nivîskar zimanê kurdî di çîrokan de bi awayekî serkeftî bi kar tîne. Zimanê kurdî di jîyana nivîskar a takekesî de jî cihekî giring digire. Ev yek bingeha xwe ji neteweperwerîya nivîskar werdigire. Bikaranîna zimanê kurdî ji bona nivîskar amraza sereke ye. Ev yek di çîroka “Xerîbo” ya *Êdî Dereng Bûyê* de bi awayekî berbiçav tê dîtin. Bekirê Teyo ku piştî dîl dikeve û nîkare ji welatê xwe vegere; xwe dispêre zimanê xwe. Zimanê kurdî ji bo lehengê çîrokê dibe sitargeh. Zimanê kurdî di xeribîya Bekirî de dibe rêhevalê wî.

Çîrokên nivîskar piranî bi hevokên bi bandor dest pê dikin. Hevok hin caran bi şokekî dest bi vegêranê dikin. Ev yek jî behtir li ser xwîneran bandor dike. Xwîner bi hevoka pêşî re di bin bandora çîrokê de dimînin. Ji zimanekî propagandîst dûr, zimanekî hestiyar bi kar tîne. Hem di şayesandîna lehengan hem şayesandîna xwezayê de ev yek bi awayekî zelal tê dîtin. Di çîroka “Namebir” ya *Êdî Dereng Bûyê* de çîrok bi hevokeke balkêş dest pê dike: “Temo milekî xwe di şêr de winda kir...” (*Êdî Dereng Bû. 7*).

Xwîner di hevoka destpêkê de bi hişekî meraqdar tev li nava metnê dibe. Çîrok piranî bi hevokên kurt ve dest pê dikin û bi awayekî hostatî û bi zimanekî helbestî ve tên vegotin. Di çîroka “Çavê Dê Li Rêya Kur Bûn” ya *Destê Dê* de

destpêka çîrokê weku sê risteyên helbestekê hatine honandin: “Rê li gund dinêre. Gund li rê dinêre. Rê çavê gund e.” (Destê Dê. 32).

Weku di hevoka jor de jî tê dîtin, nivîskar zimanekî helbestî bi kar anîye. Şayesandinên nivîskar jî pir balkêş in. Lewra weku di vê hevokê de jî dîyar dibe “rê” bi rêya şayesandinê ve wateyeke nû werdigire û di şiklê mirovekî de derdikeve pêş. Nivîskar di çîrokên xwe de xwezayê bi zimanekî hestiyar diwefîne. Xwezayê jî di çarçoveya ragihandina dijberîya şer de derdixe pêş. Demsal û xweza ji bona derbîrîna karesata şer jî tîr şayesandin. Şer bi tarîbûna ewran ve tê şibandin. Di van metnan de nivîskar qirêjî û neheqî û tarîfîya şer bi xwezayê ve şirove dike. Şibandinên pir balkêş tîr kirin. Gule, bi teyrokê ve hatine şibandin. Deng û teqînên şer jî şibandine ewr û birûskê. Di çîroka “Çîyayan Mizgînî Dane Çîyayan” diyardeyên mirovî li xwezayê tîr barkirin: “Ewrê reş kimkimîn. Brûskê birq veda. Tavîya teyrokê û baranê girtê. Şerê li erşan daket erdan. ...Çîyayan mizgînî dan çîyayan.” (Destê Dê. 78).

Xweza zêdetir jî di metnên nexş û nîgarên hûr de derdikeve pêş. Nivîskar ji bona derbîrîna hestên xwe, xwe dispêre xwezayê. Şahî û kêfxweşî her tim di nava biharekê de hatine vegotin. Demsal yan jî dem li gorî reftarên lehengan diguhere. Di çîroka “Dûr e, Lê Nêzikê Dil e”yê de nivîskar kêfxweşîya xwe û ya welatê xwe bi biharê ve şirove dike. Lê şer bihara rengîn bi rûyekî din ve dide guherandin. Di vê biharê de gul û çîçek nînin. Bihar di nava rewşeke bedbîn de hatîye vegotin: “Di welatê min de bihar û şayîyê mil dane milê hev hatine. Lê zanim, weku di welatekî dûr de şer û mirin e, qomsî û nemam li edlayîyê bûne xenîm, bihar jî ji xwînê, qetla kirî tirsîyaye û nayê, dewsa barana derbiharê tavî û teyrokan gule barandin.” (Destê Dê. 77).

Nivîskar hestên xwe bi şayesandina xwezayê dide der. Weşîna belgeke ji darê bi mirinê ve tê şibandin. Guherîn û libatên xwezayê bi zimanekî helbestî û hestiyar tîr vegotin. Hostatîya zimanê nivîskar zêdetir jî xwe di van metnên kurt de dide der: “Û xuşîna belgeke ji darê hate xwarê. Nizanim, dar êşîya an na, lê çîkekê avêt dilê min û ji nişkê ve mirin ket bîra min.” (Destê Dê. 104).

Nivîskar her çend zimanekî helbestî û zimanekî herikbar bi kar anîbe jî hin caran xwe ji dubarekirinê rizgar nekirîye. Destpêka hin çîrokan hema bibêje bi yek hevokê destpê dikan. Di çîroka “Em Çûne Aş” ya *Destê Dê* û çîroka “Guman”ê ya *Dengê Dil* û de vegêr bi yek hevokê ve dest bi vegêrandinê dike. Çîroka “Em Çûne Aş” bi vê hevokê destpê dike: “Teze Şerê Wetenîyê yî mezin kuta bûbû.” (*Destê Dê*, 68). Heman hevok di çîroka “Guman”ê de jî, bi heman awayî û tenê cîyê peyvekî diguhere. “Şerê Wetenîyê yî mezin teze kuta bûbû.” (*Dengê Dil*, 21).

Wek ku tê dîtin nivîskar di du berhemên cuda û du çîrokên ji hev cihê de bi heman hevokê çîroka xwe sêwirandîye. Nivîskar di hin çîrokên xwe de jî bi şeweyekî gelêrî ve çîrokên xwe nivîsandine. Di van çîrokan de jî weku van mînakên nivîskar, ketîye nava dubarekirinê. Di çîroka “Serhatîya Hubekê” ya *Destê Dê* de nivîskar di şiklên çîrokên gelêrî de dest bi gotinê dike. Hetta mirov dikare bibêje di şiklê çîrçîrokan de; çîrok tê vegêran. Çîrok bi hevoka: “Bi gotina gotîyan, gundekî biçûk bûye.” (*Destê Dê*, 17). Ev yek di çîroka “Esmer” ya *Êdî Dereng Bûyê* de jî bi heman awayî tê vegotin. Vegêr dîsa weku ku dest bi vegotina çîrçîrokekê yan jî dest bi çîrokeke gelêrî bike, çîrokê vedigêre: “Bi gotina gotîyan, mêr û jinek hebûne.” (*Êdî Dereng Bû*, 192.).

Wek ku tê dîtin nivîskar di hin çîrokên xwe de hem ketîye xeletîya dubarekirine hem jî tama çîrokên gelêrî ji hin çîrokan tê. Mirov dikare vê yekê jî weku kêmasîyeke nivîskar bide nîşandan.

Emerîkê Serdar di çîrokên xwe de peyvên, ji zimanên bîyanî jî bi kar tîne. Ev yek zêdetir di berhemên nivîskar yên ewil de tînin dîtin. Bikaranîna peyvên zimanên bîyanî her ku diçe kêm dibe. Ev peyv piranî ji zimanê tirkî ne. Vê yekê jî mirov dikare dîsa bi koçkirina kurdên Sovyetê ve girê bide. Lewra kurdên Sovyetê ji serhedê koçî Sovyetê bûyîne û ji ber vê yekê jî zimanê tirkî berê de naskirine û bi kar anîne. Ji ber vê yekê jî çîrokên nivîskar de hin peyvên zimanê tirkî tînin dîtin. Her çend nivîskar di nava Ermenistana Sovyetê de jîyabe jî peyvên ji zimanê rûsî û ermenî gelek kêmin. Wek mînak mirov dikare ji van peyvên çend heban jê bide:

Ardimîyeke(yardım) rind dida kur (*Destê Dê*, 56).

Avayîyeke teze yî çend **goze** (göz) (Destê Dê. 57).

Di nava der û cîranan da bibe **oyñ** (oyun) û sosret (Destê Dê. 58).

Îşıqa (ışık) çavan kêmbûbû (Destê Dê. 63).

Em ji we re **açixîya**(açık) bextewarîyê dixwazin. (Êdî Dereng Bû. 32).

Paşê **duşurmîşî**(düşünmek) xwe bûn.(Êdî Dereng Bû. 64).

Şayî bikeve **qapîyê** (kapı) we jî (Êdî Dereng Bû. 142).

Berî şêr **arişverîşa**(alışveriş) wan...(Dengê Dil. 78).

Emerîkê Serdar her çend di çîrokan de zimanekî serkeftî û herikbar bi kar anîbe jî di vegêrana lehengan de em rastî devokeke cîyawaz nayên. Hema bibêje hemû leheng bi yek zimanî û yek şeweyî diaxivin. Vê yekê jî mirov dikare bi şert û mercên jîyana nivîskar ve girê bide. Lewra Emerîkê Serdar li Sovyetan dijî û di serdema Sovyetan de jî têkilîyên kurdên Sovyetê yên derveyî Sovyetê ne pêkan bûn. Ji xeynî vê yekê di wê serdemê de em lê rast nayên ka gelo pirtûkên kurdî yên ji derveyî Sovyetê çap bûne digihîjin ber destê wan yan na. Nivîskar jî ji ber van sedeman; di çîrokan de zimanekî yekreng bi kar anîye. Jixwe di nava wan şert û mercan de ne gengaz e ku nivîskar bikare devokeke cuda ve lehengên xwe bide xebardan. Lewra kurdên ku di wê serdemê de li Ermenistanê niştecîh in di erdnîgarîyeke sînordarkirî de jîyana xwe didomînin. Ji ber van sedeman jî zimanê çîrokan, bi şeweyekî tenê hatine honandin. Lewra jî di şibandin û şayesandinên nivîskar de ziman û peyvsazîyeke cîyawaz mirov nabîne. Taybetmendîyeke din jî ew e ku zimanê hin berhemên nivîskar ji hev cihê dibe. Berhemên ku ji alîyê weşanxaneyê Lîsê ve hatine çapkirin (*Destê Dê, Êdî Dereng Bû, Dengê Dil, Hisreta Emir, Mikûrî û Keşkûl*) û yên ku nehatine çapkirin de (*Gundê Me û Gotarên nivîskar*) cîyawazîyek heye. Lewra di weşanên Lîsê de ziman herikbartir û peyv jî hêsantir in. Ger em vê yekê li ser çîrokekê binêrin dê ev yek çêtir bê dîtin. Çîroka bi navê “Dawet Bû” di berhema nivîskar ya *Destê Dê* û çîroka “Dengbêj” ya di berhema *Gundê Me* de heman metn in û weke du çîrokên cîyawaz hatine weşandin. Lê

berhema nivîskar a *Gundê Me* li tirkîyeyê nehatîye weşandin. Dema mirov metnên van her du berheman bide berhev tê dîtîn ku metna ji alîyê weşanxaneyê Lîsê ve hatîyê weşandin hin guherîn tê de hatine kirin.

“Çûyîn-hatin nava gundda dha zef bûbû, merî hevra qurban-heyran bûbûn. (Gundê Me. 1) Heman hevok di berhema *Destê Dê* de jî wiha cih girtîye: “Çûyîn û hatin di nav gund de diha zaf bûbû, meriv bi hev re qurban û heyran bûn.” (Destê Dê. 34). Em pê nizanin ka ev yek ji alîyê nivîskar ve yan ji alîyê weşanxaneyê ve hatîye kirin. Lewra ne nivîskar ne jî weşanxaneyê der heqê vê yekê de tiştek negotîye.

2.2.2 Qadroya Lehengan

Metnên edebî li ser sê hêmanên sereke têne afirandin. Dem, mekan û bûyer. Weke rêgezeke teqlîdî nivîskar ji bo bigihîje mirazê xwe yê encamê di metnê de karakteran bi cih dike. Bi gotineke din mirov dikare bibêje binyada roman û çîrokê bi karakteran pêk tê. Emerîkê Serdar di berhemên xwe de gelek lehengên ji hev cihê afirandine û lehengên xwe li gorî tema û atmosfera metna çîrokê bi cih kirine. Berhemên xwe bi motîvên dê, bav û zarokan ve honandine. Di çîrokên nivîskar de karakterên herî sereke gundî ne. Êş, astengî û arîşeyên sedsalan zêdetir e ku hukûm li civakê kirine bi raçavkirinên nivîskar dewlementir dibin û di çîrokan de weku mijar têne vegêran.

Berovajî romanê di çîrokan de leheng, bi şayesandinên hûrgilî nayên pêşkêşkirin. Lewra çîrok li gorî hecma xwe ji romanê kurtir e û ji ber vê yekê jî çîrok weku janr, van xususîyetan nahewîne. Leheng, dem û mekan bi hûrgilî di çîrokê de nayên vegêran. Ev yek di navbeyna roman û çîrokê de weku cîyawazîyeke sereke xwe dide der. Di çîrokên Emerîkê Serdar de jî karakter li gorî vê hişmendîyê hatine saz kirin. Loma jî karakter hem fîzîkî û hem jî ji hêla dêrûnîya xwe ve bi hûrgilî nayên vegêran. Lê dîsa jî di çîrokên nivîskar de gelek serleheng û lehengên alîkar derdikevin pêş. Leheng di çîrokên Emerîkê Serdar de piranî mirovên ji rêzê ne. Di çîrokan de karaktereke/î berbiçav peyda nabe. Emerîkê Serdar ji ber ku çîrokên xwe zêdetir li ser bûyerê saz dike giringîyeke zêde nade lehengan. Lehengên çîrokan piranî mirovên derdora gundan in. Hin caran hin kesên bajarî jî weku leheng di

çîrokan de hatine şayesandin. Dayîk, bav, jin, bûk, zarok weku leheng di çîrokan de derdikevin pêş.

Emerîkê Serdar lehgên xwe piranî ji jîyana kurdan ya rojane wergirtine. Lewra jî karakterên çîrokan û helwestên wan jî ji şopên çanda kurdî dihewîne. Mirovên gundî û jiyana wan; çawa tên pênasekirin û çawa cih digirin bi heman rewşê di çîrokan de jî hatine şayesandin. Di gelek çîrokan de navên lehengan bi awayekî kurtkirî derbas dibin: Qero, Reşo, Temo, Êso û Teyo û hwd. Mirov dikare vê jî weku şopên çand û jîyana kurdan ya gundewar şirove bike.

Şayesandinên lehengan di çîrokan de zêde nayên dîyar. Leheng piranî bi navên xwe di çîrokê de dîyar dibin. Şayesandinên hûrgilî zêde nayên kirin. Leheng di çîrokan de ji şiklê xwe wêdetir bi dêrûniya xwe ve cih digirin. Şayesandina lehengan bi awayekî klasîk hatiye kirin. Di çîroka “Destê Dê” de lehenga jin xwedîyê “enîya kever” û “çav û birîyên belek” e. Di çîroka “Zengilê Bêwext” de jî şayesandinên nivîskar bi heman awayî dom dikin: “Hinar yeke qerqaş, neyseyî qalim bû, çavine mezin lê, porê wê, ku dikirin çend kit gulî, dihat digihîşte hetanî serê panîyan.” (Dengê Dil. 41).

Şayesandina lehengên mêr jî di çîrokan de bi heman awayî, bi awayê fîzîkî ve tên kirin. Di çîroka “Dengê Dil” de nivîskar Eslanî bi hûrgilî dişayesîne: “Eslan, di bejnê de yekî nîvçe bû. Stûyê kin î qalim. Navmîla wî fire, sînga wî hebekî bel bû. Yekî qemer î pozberanî bû. Porê serê wî reş î six bûn û hatibûn nîva enîya wî girtibûn. Brûyên wî wisa qalim bûn, weku gihîştibûne hev du û wexta çavên xwe digirtin. Ji te tirê du perên reş in tene ser hev. Xaleke mezin di orta enîya wî de hebû, te hew zanibû qestîkan kutane.” (Dengê Dil. 71).

Lehgên nivîskar di hin çîrokan de jî bê nav in. Ew, weku endamê malbatê yan jî endamê civakê hatine şayesandin. Navên zarokan di kêman cihan de tê kifşkirin, ew tenê weku kur yan jî qîza malê derbas dibin. Ev helwest ne tenê li ser zarokan li ser lehengên temen mezin jî xwe dide der. Di çîroka “Name”yê de gelek leheng derbas dibin lê em tenê navê Çîlê û bavê wê Eslan dibihîsin. Ji bilî wan em navê lehengekên din hîn nabin. Lehengên din wek, pîra vegêr, lawikên Tbîlîsî, qîz û

xortêd gund, kulfetên (jin) li ser kanîyê, û lawikên gund derbas dibin. Lehengên din di çîrokê de bi wêneyên meçhûl hatine dîyarkirin. Ew bê nav in tenê bi reftarên xwe ve tîne vegotin. Di hin çîrokan de jî qet navê lehengan derbas nabe. Navên lehengan di çîrokên mîna “Destê Dê”, “Rasthatin”, “Ji Eskerê Neeyan Re”, “Şikilê Dê”, “Bav Kire Ber Gunehan” de nayê dayin. Ew bi peywirên xwe yê civakî ve tîne vegêran. Di çîroka “Destê Dê” de jîna leheng di nava cihan de û li ber sekeratê ye. Mêr li ber serî rûniştîyê temî û xwestekên wê yê dawîyê guhdarî dike. Li gorî vegêrana vegêr di çîrokê de behsa zarokan û dê û bav tê kirin; lê em qet navê wan nabînin. Jîna leheng di çîrokê de wek; “dayîka zarêd hûr” û “kevanîya mala giran” tê şayesandin.

Kurtkirina navan piranî di çîrokên vegêrana jîyana gundan de derdikevin pêş. Ev yek di çîrokên ku behsa jîyana bajêr dikin de nayê dîtin. Di çîroka “Şixûlê Min î Pêşîn” de jîyana bajarvanîyê tê ragihandin. Lê di vê çîrokê de her çiqas karakterên gundî jî cih girtibin; em di çîrokê de rastî navekî kurtkirî nayên. Lehengên çîrokê weku Abas, Memed, Eslan û Rafîk derbas dibin.

Taybetmendîyeke lehengan ya din a di çîrokên Emerîkê Serdar de jî; hîlbijartina navên wan e. Hinek nav di hin çîrokên jî hev cuda de derdikevin pêş. Navê Eslan di çar pirtûkan û di pênc çîrokên cuda de weku navê lehengê çîrokê hatîye hîlbijartin. Di pirtûka *Destê Dê* de bi çîroka “Name”yê û “Serxweşî Dane Kê?”, di pirtûka *Êdî Dereng Bûyê* de bi çîroka “Şixûlê Min î Pêşîn”, di pirtûka *Dengê Dil* de bi çîroka “Dengê Dil” û di pirtûka *Gundê Me* de bi çîroka “Xîret”ê navê Eslan li ser pênc kesayetên jî hev cuda derdikeve pêş. Navê “Îvan” jî di çîrokên “Dibûrî” û “Ewled” de yê pirtûka *Hisreta Emir*, li ser du kesayetên cuda bûye navê lehengê çîrokê. Avdel jî, du çîrokên nivîskar de weku leheng hatîye hîlbijartin; di çîroka “Nikaribû” ya *Êdî Dereng Bûyê* de û di çîroka “Heyfhildan”ê ya *Gundê Me* de, Avdel weku du kesayetên cuda hatîye sêwirandin. Navek din jî Apê Cimşît e ku di du çîrokan de weku leheng derdikeve pêş. Di pirtûka *Êdî Dereng Bûyê* di çîroka “Se” û di pirtûka *Dengê Dil* di çîroka “Tirs”ê de Apê Cimşît weku du lehengên cîyawaz tê şayesandin.

Emerîkê Serdar di lehengsazîyê de jî şayesandinên fîzîkî zêdetir li ser dêrûnîya lehengan disekine. Psîkolojî û dêrûnîya lehengan bi awayekî serkeftî rave

dike. Bi rêya monologan di çîrokan de leheng tèn şayesesandin. Di çîroka “Namebir” ya *Êdî Dereng Bûyê* de psîkolojîya şer li ser dêrûnîya Temo tê vegotin: “Dibe ‘kaxeza reş be’, - Temo difikirî. Dibe birîndar e, nikarîbûye binivîse, hevalan jê ra nivîsîye. Ez çima gorî wê bêbextîyê zû bigihînim mala wan? Ji destê min nayê nameyên şabûna ji wan re bînim, lê qe na ji destê min tê bahsa bêbextîyê hebekî dereng bigihînim wan.” (Destê Dê. 8).

Temo jî weku leşkerekî birîndar di nava dêrûnîyekî kûr de tê vegêran. Nivîskar bi rêya Temo psîkolojîya şer ya li ser lehengan bi awayekî realîst dide ber çavan. Temo ji ber karesatên şer di nava bobelatan de xerk dibe. Nivîskar ne tenê dêrûnîya lehengên temenmezin; her wisa dêrûnîya zarokan jî bi hostatî di çîrokên xwe de vegêraye. Kêfxweşî, hevî û xemgînîya zarokan di çîrokan de bi rêya monologan tê ravekirin. Ev yek di çîroka “Guman”ê ya *Dengê Dilê* de bi rêya lehengê piçûk tê vegêran. “Niha ne zivistan, ne ev gelîyê kûr, ne jî tarî nikarin nehêlin, weku ez wê şevê neçim dawetê, min di dilê xwe de wiha qirar kiribû, ku jî mabe, ez gereke îşev herim dawetê.” (Dengê Dil.27).

Vegêrê çîrokê di nava dudilîyekê de ye, ji alîyekî ve kêfxweş e ku apê wî ji bajêr vegeirîyaye û ji malê re tişt anîne, ji alîyekî ve jî bi guman e, heye ku apê jê ra kinc nekirîbe. Nivîskar vê yekê jî li ser derûnîya leheng bi rêya monologê vedibêje. “Ez wisa jî şa bûm ji bo hatina apê xwe; ne axir niha wî ji me re xwîrekên xweş anîne. Di dilê min de gumaneke biçûk jî hebû; dibe apê min kincekî teze ji min re anîbe.” (Dengê Dil. 27).

Emerîkê Serdar fikr û ramanên xwe yên polîtîk jî, bi rêya lehengên xwe tîne ziman. Leheng dibin amraza derbirîna binhişê nivîskar. Ev yek di çîroka “Di Rihîna Biratîyê De” ya *Hisreta Emir* de li ser Temir Beg tê vegêran. Temir Beg di qirkirina ermenîyan de rayedarên Romê tawanbar dike. Nivîskar vê yekê bi dêrûnîya Temir Beg ve dide nîşandan: “Tu çi qasî kirêt î, -Temir Beg di dilê xwe de derheqa wî qulixçîyê Romê de difikirî. –Hûn temam jî wisa ne, yekî pak di nav we de tune ye. Çavê we her tenê li xirabîyê û mirdarîyê ye...” (Hisreta Emir. 66).

Di çîrokên nivîskar de mirov dikare bibêje leheng, piranî ji kesayetên derdora nivîskar in. Piranîya lehengên çîrokan gundî ne. Em di çîrokan de zêde rastî pîşeyên modern nayên. Leheng yan bi karê gund ve mijûl in yan jî weku xebatkarên kolxozan in. Di kêma çîrokan de jî em rastî bijîşkan tên. Lehengên bijîşk jî dîsa di peywenda jîyana gundîyan de tên dîyarkirin. Leheng piranî bi rûyê xwe yên erenî ve hatine şayesandin. Leheng xwedîyê derûnîyeke safik in û di tevgerên wan jî li gorî vê yekê hatine ravekirin.

Di hin çîrokan de jî em rastî karakterên neyînî tên. Di çîroka “Serhatîya Hubekî” ya *Destê Dê* de bavê Sêvê Qero, di heman berhemê de çîroka “Serxweşî Dane Kê?” de kurê Ozman Êso, weku lehengên neyînî hatine şayesandin. Qero bi kirinên xwe ve dijminatîyekê di dilê xwe de dikelîne û nahêle qîza wî Sêvê û Keleş bi mirazê xwe şa bibin. Êso jî piştî ku mezin dibe naxwaze bavê wî Ozman bi wan re bijî û ji ber vê yekê jî bavê wî ji malê cihê dibe. Êso her wiha erka kurîniya xwe ya li hemberî bavê nayîne cih. Di çîroka “Zewaca Elo” ya *Hisreta Emir* de jî Aslîk bi fêl û fendên xwe ve weku jîneke neyînî hatiye şayesandin. Lewra Aslîk bi kirinên xwe ve Elo dixapîne û keda wî dixwe. Di çîrokên Emerîkê Serdar de diz jî jî alîyê helwestên xwe ve ji hev cihê dibin. Di çîroka “Neheqî Erdê Nema” ya *Gunde Me* de Svik jî weku lehengekî neyînî derdikeve pêş. Svik yekî bêrehm e, dema dikeve mala Haco zarokê dergûşe de hişyar dibe. Svik ji bo mal pê nehesin wî davêje kûpê tîrşî û derê wê dadigire. Dizên hevalê wî, wî tawanbar dikin çawa tişteki wisa kirîye. Lê li vir di gotina hevalê wî de îronîyek jî heye. Hevalê wî, bi xwe jî diz in; lê Svikê hevalê xwe weku yekî nanheram pêname dikin.

Rêjeya temenê lehengan bi piranî mezin in. Mirov dikare bibêje ji sedî heştêyî lehengan mirovên temenmezin in. Zarok her çend di çîrokan de weku leheng hatibin vegotin jî rêjeya wan li gorî ya temenmezinan kêma e. Di çîroka “Em Çûne Aş” ya *Destê Dê*, çîroka “Êdî Dereng Bû” ya *Êdî Dereng Bûyê*, çîrokên “Tîrs” û “Guman” ya *Dengê Dil*, çîroka “Du Qewimandin Ji Emrê Mektebê” ya *Hisreta Emir* de serleheng zarok in. Di Hilbijartina lehengan de nivîskar bi hişmendîyeke zayendperest tevnagere û hem jin û hem jî mêr weku lehengên sereke di çîrokan de tên vegotin.

Wek ku me li jor jî gotî lehengên Emerîkê Serdar piranî mirovên ji derdora wî ne. Ermenistan jî di wê serdemê de weku cihekî kozmopolît bûye û nivîskar jî ji ber vê yekê gelek mirovên neteweyên din re bûye nas. Vê yekê di heman demê de bandor li nivîskarîya wî jî kirîye. Di çîrokên Emerîkê Serdar de ji bilî kurdan karakterên neteweyên din jî tên dîtin. Rûs, tirk û ermen di çîrokan de weku leheng cihê xwe girtine. Di çîroka “Dibûrî” ya *Hisreta Emir* da Îvan û di çîroka “Ewled” de jî Îvan, Nîkolay û Vasîlî weku karakterên Rûs hatine bicihkirin. Di hin çîrokan de jî lehengên ermenî derdikevin pêş. Di çîroka “Hesp” ya *Destê Dê* de Tîgran, di çîroka “Dengê Dil” ya *Dengê Dilê* de Hasmîk, çîroka “Di Rihîna Biratîyê” ya *Hisreta Emir* de Vardan û di çîroka “Xîret”ê ya *Gundê Me* de jî Masak û Sato ji kesayetên ermen in ku di çîrokê de weku leheng cih girtine.

Gelek caran di çîroknûsîya Emerîkê Serdar de leheng bi sernavê nivîskar diaxivin. Jixwe di gelek çîrokan de vegêr-leheng yek kes in. Ji ber vê yekê jî di nevbeyna leheng û nivîskar de têkilîyeke pir xurt heye. Ev yek jî ji ber helwesta nivîskar e. Lewra hin çîrok rasterast bi jîyana nivîskar ve têkildar in.

Di dawîyê de jî mirov dikare qala bawerîyên lehengan bike. Piranîya leheng çîrokên Emerîkê Serdar, bawermendên dînê êzîdîtîyê ne. Ji bilî van, di hin çîrokan de karakterên misilman jî cih girtine.

2.2.3 Mekan

Mekan weku têgeh di metnên sêwirandî de ji bona cîyê ku bûyer lê diqewime tê bikaranîn. Çîrok jî weku metneke sêwirandî hewceyî mekanekê ye. Mekan di guherînên civakî de, di roleke ragihîner de derdikeve pêş. Nivîskar ji bo bikaribe serdem û civaka tê de jîyaye bide nîşandan karakteran diafirîne. Her wiha nivîskar, mekanê jî li gorî serdema xwe disêwirîne. Ji ber vê yekê jî weku metneke sêwirandî çîrok jî, di tespîtîkirina guherînên civakî de daneyên giranbiha dihewîne. Mekan di metnên edebî de piranî bi pêwendîya psîkolojîyê ve tê sêwirandin. Nivîskar bi alîkarîya mekanê rewşa dêrûnîya karakterên romanê dide nîşandan. Li gorî Tekîn di dîyarkirina rewşa karakteran de mekan jî weku dîyardeyeke sereke cih digire. (Tekin, 2006: 147) Ev yek di çîrokan de jî tê dîtin. Di navbeyna karakter û mekanê çîrokê de

pêwendîyeke xurt heye. Lewra roman û çîrok weku du metnên sêwirandî; di gelek alîyan de xwedîyê hevparîyekê ne.

Çîrok ji alîyê binyadê ve piranî li ser sê hêmanên sereke (dem, mekan û kesayet) tê honandin. Yek ji van hêmanan jî mekan e. Mekan di çîrokê de hem ji bo analîzkirina çîrokê û hem jî ji bona analîzkirina lehengan derfeteke mezin dide xwînê û lêkoleran. Ev boçûn, her çiqas ji bona çîrokên klasîk bê dîyarkirin jî; di çîrokên modern de jî ev yek tê dîtin. Ji ber binyada xwe çîrok di şayesandina mekanê de derfeteke berfireh nade nivîskar. Lewra her çiqas mekan weku sê hêmanên sereke bê pênasekirin jî; hin çîrok bêyî mekan jî dikarin bî vegêran. Nivîskar ji bo bikaribe atmosfera çîrokê bi awayekî hostatî raxe ber çavê xwîneran serî li mekanê dide. Mekan, ji bona derbirîna fikra nivîskar dibe amûrek.

Di analîzkirina berhemên edebî de mekan ji du alîyan ve têne nirxandin. Yek ji van mekanên girtî û ya din jî mekanên vekirî ye. Ger ev yek li ser çîrokên Emerîkê Serdar bê sepeandin wê bê dîtin ku di piranîya çîrokên Emerîkê Serdar de mekan, weku mekanê derveyî (vekirî) hatiye tercîhkirin. Nivîskar di çîrokên xwe de giringîyekê nade şayesandina mekanê. Ji xwe di çîrokan de mekanên vekirî pir têne dîtin. Di çîrokên Emerîkê Serdar de mekanên ji hev cihê derdikevin pêş. Ji ber ku çîrok li ser du deman hatine vegotin; di çîrokan de jî du mekanên cuda hatine bikaranîn.

Mekan, di çîrokên ku paşxaneyê xwe ji rêbaza realîzma civakî werdigirin de piranî dişibin hev. Her çiqas mekanên ji hev cuda bî bicîhkirin jî di rastîyê de mirov dikare bibêje mekan piranî mînanî hev in. Di çîrokan de; navçe, gund, malên gund, mala axa, meydana gund, dibistana gund, zevî, daristan û hwd weku mekanên çîrokê tên şayesandin (Çıkla; Konyalı, 2022: 115).

Her wiha di çîrokên Emerîkê Serdar de mekan ji bo dîyarkirina hejarîya gel tê şayesandin. Hin caran jî ev yek bi mebesta berawirdkirina jîyana berê û jîyana piştî Şoreşa Cotmehê tê kirin. Di çîrokên Emerîkê Serdar de mekan piranî gund e û weku mekanên derveyî tên şayesandin. Gund weku mekan, dûredest bîmecalbûna xwe ve derdikevine pêş. Li wir tu alavên teknîkî tune ne. Gundî û xweza bî hev re; di nava

hev de tîn pêşkêşkirin. Di çîroka “Awazê Gundê Me” ya *Êdî Dereng Bûyê* de, nivîskar bi şayesandinên hûrgilî xaniyên gund dide nîşandan. Ev nîşandayîn hem ji bona dîyarkirina feqîrîya gundîyan tê kirin û hem jî ji bona berawirdkirina jîyana berê û jîyana piştî Şoreşa Cotmehê tê kirin. Nivîskar bi amraza pesindayîna nîrxên Sovyetê jî vê yekê derdibire. Di çîrokê de xaniyên ku tîne şayesandin di şiklê xirbeyan de derdikevine pêş. Nivîskar bi hostatî û bi şayesandinên zindî ve xaniyên gund dişayesîne.

Malên gundê me binerd î biçûk bûn. Dîwarên wan bi kevirên gicûce bûn. Ronkayî di kulekê re diketê. Di xênî de xên ji kuleka mezin wisa jî dûkêşk hebû. Zivistanê kuleka mezin venedikirin, weku xanî sar nebe, dûyê tendûrê di dûkêşkê re dikişîya. ... Xanî ew qas nîzm bûn, weku çi qas jî meriv kin bûya, gava di dêrî re dîçû hindûr û derdiket, gotî ese xwe kûz bikira, weku serê wî li serşêmîkê neketa. (*Êdî Dereng Bû*. 50).

Nivîskar bi vî awayî hem xaniyên gund dişayesîne û hem jî bi şayesandinên hûrgilî ve fonksîyonên wê jî dide nîşandan. Di vê çîrokê de weku ku tê dîtin nivîskar bi mebesta dîyarkirina feqîrîya gund, xaniyên gund dişayesîne. Ev rewş ne tenê ya xaniyekî ye. Hema bibêje di temamîya gund de ev yek tê dîtin. “...Meheleyeke gundê me hebû, jê re digotin ‘neqeb’. Malên wê mehelê gişk bi hev re bûn, diha rast dîwarê malekê dîwarê mala mayîn jî bû. Di dîwarê orta wan de qulik hebû. Wexta şer û dewan ji malên xwe derdiketin, di wê qulikê re bi hev re xeber didan.”(*Êdî Dereng Bû*. 51).

Şayesandinên bi vî awayî di çîroka “Zewaca Elo” ya *Hisreta Emir* de jî tîn dîtin. Nivîskar di vê çîrokê de jî ji bona şayesandin û dîyarîkirina feqîrîya Elo serî li mekanê dide. Mekan ji xaniyekî wêdetir di şikle xirbeyekî de tê nîşandan. “Xaniyê wan binerd bû, diha rast ji sê alîyan de dîwar nedihatî kîvşê, ew û erdê li dorê weku hev bûbûn...”(*Hisreta Emir*.104).

Di çîrokan de tenûr jî weku mekanekî derdikeve pêş. Tenûr hem ji bo germkirin û nan çêkirinê ye û hem jî weku cîyê civînê hatiye şayesandin. Ev yek, ji xwe di jîyana gundan a berê de tiştêkî berbelav bû. Di hin çîrokan de jî nivîskar, ev yek kirîye nava honaka metna xwe. Di çîroka “*Êdî Dereng Bû*” ya *Êdî Dereng Bûyê*

de lehengê çîrokê dema qala tenûrê dike; wê derê, weku cîyê sohbetê dide nîşandan: “Timî êvaran, îlahî zivistanan, dihat mala me, li ber tendûrê rûdinişt, qelûna xwe dadigirt, dû didayê û dest bi mijûliyên xwe dikir...”(Êdî Dereng Bû. 137).

Wek ku ji jêgirtina jor jî tê dîtin; di gund de tenûr bi armanca germkirin û sohbetê hatîye şayesandin. Ev yek di çîroka “Guman”ê ya *Dengê Dilê* de jî bi heman rengî hatîye şayesandin. Vegêrê çîrokê dema behsa mala xwe dike em pê hay dibin ku xanîyê wan bi tenûrê tê germ kirin. “Min jî çarixên xwe êxistin. Pîrika min cilikeke kevn danî ber tendûrê, ez li ser rûniştim, min lingê xwe kirin tendûrê, weku goreyên min î şil zû zîwa bibin, ji bo ez xwe dewetê re bigihînim.” (Dengê Dil.36).

Tenûr di çîroka “Zewca Elo” ya *Hisreta Emir* de jî weku mekanê sohbet û xwelêgirtinê hatîye nîşandan. Tenûr, ji cîyê nanpatin û germkirinê zêdetir di şiklê mekanekî serbixwe de derdikeve pêş. “-Da dayê, bûye curm ketîye stûyê min. Dikim, nakim, ji kêleka tendûrê ranabe.” (Hisreta Emir: 111).

Di çîrokên Emerîkê Serdar de mekanekî din jî cîyê şevbihêrkên gundan e ku di hinek cîyan de jî weku dîwanxane derbas dibe. Yek ji van mekanên jî odeya Apê Cimşît e ku du çîrokan de weku mekanê girtîye. Di çîroka “Se” ya *Êdî Dereng Bûyê* de gundî li odeya Apê Cimşît berhev dibin û qala serpehatîyên xwe dikin. Ode di çîrokê de zêde nayê şayesandin. Ew tenê weku cîyê şevbihêrkê tê qalkirin. Odeya Apê Cimşît di çîroka “Tirs”ê ya *Dengê Dilê* de jî dîsa bûye mekanê çîrokê. Di vê çîrokê de jî ode nehatîya şayesandin. Di her du çîrokan de jî tenê bixêrîya odeyê weku hûrgilîyekê derdikeve pêş. Di çîroka “Di Rihîna Biratîyê De” ya *Hisreta Emir* de jî odeya Temir Beg weku mekanekî sereke derdikeve pêş. Di çîrokê de odeya Temir Begê weku dîwan hatîye bikaranîn. Ev ode cîyê şewra êlê ye. “wexta ode berhev dibû, wî pêşîyê derheqa gilîyê bihîstî de ji haziran re digot...”(Hisreta Emir. 59).

Odeya Temir beg cîyê berhevbûna gund e. Gundî bi tevahî, êvaran li wir dicivin. Pirs û pirsgirekên gund li wir tînin çareserkin. Lê; rûniştina odê li gorî hîyerarşîyekê pêk tê. Zarok jî binpîyê odê de cîyê xwe digirin. “Her tim êvarê mêrê gund li odeya wî top dibûn, hilbet cîyê her yekî kivşkirî bû... Çi qas pirsêd gund î

ferz hebûna, di wê odeyê de bi destê Temir Beg dihatin safîkirin...”(Hisreta Emir. 62).

Odeya Temir beg ne tenê cîyê şewra gund e herwisa weku dibistanekê jî tê wesifkirin. Di nava giregirê gund de em rastî zarokan jî tên ku beşdarî civîna odeyê dibin. Lê ode bi tu alîyan ve nayê şayesandin. “Odeya wî mînanî mekteban bû. Zarên li bînpîya odeyê rûniştî dibûn guhdarê tiştên qenc, bi ruhê baş dihatin terbiyekirin.” (Hisreta Emir. 62).

Ji bilî van mekanan di çîrokên Emerîkê Serdar de bajar jî weku mekan hatine sêwirandin. Di bajaran de nexweşxane û sêwîxane weku du mekanên sereke cih digirin. Li gorî mekanên gundan şikil û navên mekanan jî cuda dibin. Di çîroka “Hesp” ya *Destê Dêyê* de û di çîroka “Dengê Dil” ya *Dengê Dilê* de mekan di dema vegêranê de tevayî nexweşxane ye. Di her du çîrokan de jî nexweşxane tenê weku nav derbas dibe û der barê nexweşxaneyan de, şayesandinên hûrgilî nehatine kirin. Mekan tenê weku cîyê rûdana bûyerê hatîye kifşkirin. Di çîroka “Dengê Dil” de mekanekî din jî sêwîxane ye. Di çîrokê de sêwîxane li hemberî nexweşxaneyê cîyê xebata lehengê çîrokê Eslan hatîye nîşandan. Sêwîxane di vê derê de ji bona vegêrana trajedîya lehengê çîrokê hatîye sêwirandin.

Di hin çîrokan de jî vagona trêna û stasyona trêna jî weku mekan hatîye dîyar kirin. Di çîrokên “Em Çûne Aş” ya *Destê Dê*, çîroka “Dengê Dil” ya *Dengê Dilê* û di çîroka “Xîret”ê ya *Gundê Me* de stasyona trêna bûye mekana çîrokan.

Navên gund û bajaran di çîrokên Emerîkê Serdar de zêde nehatine dayin. Navên ku di çîrokan de hatine bilêvkirin jî bi şayesandinên hûrgilî ve nayên vegotin. Di çîrokan de tenê em dikarin bibêjin “Tiflîs” weku navê bajar û gundê “Mêrgesor”ê jî weku navê gund hatîye bilêvkirin. Ji bilî van navan piranî çîrok di mekanên meçhûl de hatine vegêran. Wek ku tê dîtin di çîrokan de her wiha gund, xaniyên gund û bajar û hin sazîyên bajar bûne mekanê çîrokan. Di çîrokan de hem mekanên vekirî û hem jî mekanên girtî cih digirin. Der barê mekanan de şayesandinên hûrgilî nehatine dayîn. Mirov dikare mekanên çîrokan, piranî bi derdora jîyana nivîskar ya takekesî ve girê bide.

2.2.4 Dem

Dem, li gorî hin lêkolera di metnên sêwirandî de dem bi sê awayan tê dabeşkirin. Dema çîrokê, dema nivisînê û dema xwendinê (Korkmaz, 2016: 177). Dem, her wiha di çîrokên Emerîkê Serdar de bi du awayan ve derdikeve pêş. Yek ji van, dema gotarê ye û ya din jî dema çîrokê ye. Dem di pêvajoya vegotinê de, bi kêlîyan, seetan, rojan û hin caran jî bi deh salan pêk tê. Di hinek çîrokan de jî demeke dîyarkirî tune ye. Şayesandina demê di hin çîrokan de bi danên rojê (sibe, êvar, nîvro û şev û hwd.) ve û di hin çîrokan de jî bi demsalan (rokurtkên payîzê, havîn bû, şevên payîz û zivistanan û hwd.) ve hatine dîyarkirin. Dem, carna jî di hin çîrokan de bi dîyarkirina salê (şerê hemdinyayê yî pêşîn bû, teze şerê wetenîyê yî mezin kuta bûbû, sala 1963'an bû, sala 1941'ê bû û hwd.) ve xwe dide nîşandan.

Demên dîyarkirî di çîrokên nivîskar de weku Şerê Cîhanê yê Yekemîn, Şerê Cîhanê yê Duyemîn û Şoreşa Îlonê derdikevin pêş. Ji bilî van deman di çîrokan de ji alîyê dîrokê ve demeke dîyarkirî nayê dîtin.

Çîroka “Eşîr Bavê Eşîrê Ye” û “Di Rihîna Biratîyê De” vegêr dîmenên salên derdora 1915-120î vedigêre. Çîrokên “Çavên Dê Li Rêya Kur Bûn”, Em Çûne Aş”, “Namebir”, “Xerîbo”, Dawet Nîvcî Ma”, “Guman”, “Ji Eskerê Neeyan Re”, “Dengê Dil” û “Hetanî Kîngê?” de jî salên 1940î tên vegêran. Di çîrokên “Wê Şevê” û “Dudu Bûn” jî vegêrana salên 1960-1970yî ye.

Dema gotarê di hin çîrokan de demeke gelek kurt e yan jî kêlîyek e. Di çîroka “Hetanî Kîngê?” de dema gotarê pir kêr e û bi pîrsekê “Bavo tu yê kîngê bêyî?” dest pê dike û vegêr li ser vê pîrsê derdikeve rêwîtiyeke xeyalî û çûyîna bavê xwe ya Şerê Cîhanê yê Duyemîn. Vegêr bi vê pîrsê ve bîranînên xwe yên zarokatîyê û salên şer bi bîr tîne. Dema gotarê di vê çîrokê de pir kurt e lê dema çîrokê çend salan didome. Di çîroka “Destê Dê” de dema gotarê û dema çîrokê jî bi qasî çend kêlîyan e. Dayîka nexweş li ber mirinê çend gilîyên xwe yên dawî dibêje û dimire, dem di çîrokê de bi qasî vegotina sê dîyalogan didome.

Di çîroka “Hesp”ê de dema gotarê çend kelîyên nexweşxaneyê ye. Dema gotarê bi vegotina bîranîneke Tîgran dest pê dike û diqede. Lê di çîrokê de dema çîrokê nehatibe dîyarkirin jî ji mehekê zêdetir e.

Di hin çîrokan de jî hem vegêrana demê û hem jî dema çîrokê ji çend seetan yan jî şev û rojekê pêk tê. Çîroka “Ewled” bi rêwîtiyekê erebê dest pê dike û li gorî vegêrana vegêrîya wan ew qasî jî dûr nebûye. Çîrok bi vegotina serpêhatîya Îvan û Nîkolay dest pê dike û bi qedandina rêwîtiyê de jî diqede. Dema gotarê weku çend seetan pêk tê.

Dema gotarê di çîrokên “Se” û “Tîrsê” de, bi qasî şevbihêrkekê didome. Çîrok vegotina serpêhatîyên şevbihêrkên gunda ye. Odeya Apê Cimşît di her du çîrokan de jî weku cihê şevbihêrka gund derdikeve pêş. Mijara çîroka “Se” serpêhatîyên gundîyan yên der barê seyan de ye û di çîroka “Tîrsê” de jî beşdarê civatê qala serpêhatîya gornepişîkê dîkin. Dema gotarê di her du çîrokan de jî bi çend seetan dom dike.

Di Çîroka “Wê Şevê” de jî deam gotarê bi şevê ve sînordar e. Vegêr ji radyoyê xeberên nexweş dibîhîse û ev yek jî li ser ruhê wî bêaramîyekê ava dike. dema gotarê li ser van çend seatên şevê hatîye sazîkirin.

Dema gotarê di çîroka “Zînê” de jî şevê e. Xetîf dibe mêvanê hevalê xwe û şevê qala serpêhatîya evîna xwe dike. Her wiha vegêran seranserê şevê berdewam dike. Lê dema çîrokê her çiqas tam kifş nebe jî bi salan dem dikêşe. Vegêrana demê di çîroka “Guman”ê da rojek e. Çîrok piştî kutabûna şer rêwîtiya lehengê çîrokê vedigêre.

Dema gotarê di hin çîrokan de jî bi maweya çend rojan pêk tê. “Rasthatin”, Şixûlê Min î Pêşîn”, “Zengîlê Bêwext” û “Dibûrî” ji van çîrokan in.

Di hin çîrokên Emerîkê Serdar de jî dema gotarê salên dirêj digire. Hinek ji wan bi çend salan û hinek ji wan jî bi deh salan dom dike.

Dema gotarê di çîroka “Xerîbo” de Şerê Cîhanê yê Duyemîn e. Bekirê Teyo ku di şer de birîndar dibe û dîl dikeve; li welatekî ne dîyar dizewice. Piştî zewaca wî jî em dibînin gelek sal derbas dibin û du qîzên wî çêdibin. Vegêrana demê di çîrokê de her wiha hetanî mirina Bekir didome.

Çîroka “Dengê Dil” de jî vegêrana demê berîya şerê cîhanê yê duyemîn dest pê dike. Gulê, ku di wê demê de xwendekar e, serhatiya wê ya heta dawîya emrê wê di çîrokê de tê vegêran. Her çi qas temenê Gulê di çîrokê de nehatibe dîyar kirin jî ew di berdewamîya çîrokê de weku xwedan nevî û jineke temenmezin tê şayesandin. Ev yek jî dide îspat kirin ku vegêrana demê di çîrokê de derdora pêncî salan e.



BEŞA SÊYEM

3.1 TEMA DI ÇÎROKÊN EMERÎKÊ SERDAR DE

Em ê di vê beşê de temayên sereke di berhemên Emerîkê Serdar yên *Destê Dê* (2015), *Êdî Dereng Bû* (2015), *Dengê Dil* (2015), *Gundê Me* (2006) û *Hisreta Emir* (2018) de binirxînin. Di vê beşê da me tema li gorî taybetmendiyên wan; weku temayên civakî, temayên polîtîk û temayên takekesî, dabeş kirin. Li gorî babetê jî di çîrokên Emerîkê Serdar de temayên derketine pêş di bin temayên sereke de hatine kifşkirin.

Di metneke edebî de du tişt bala xwîner dikêşe. Yek ji van mijar û ya din jî tema ye. Tema û mijar piranî tîvî tevlihevîkirin lê ji hev cihê ne. Mijar, dîyardeyên şênber dihevine û xwîner rasterast dibe şahidê mijarê. Lê tema, di metnê de weku mijarê zû bi zû nayê dîtin. Tema dijberîya mijarê dîyardeyên razber dihevine (Gariboğlu, 1983: 134). Tema hin caran hûrgilîyên mijarê dihevine û xwe piranî di nava hûrgilîyan de dide der. Tema weku termeke edebî bîngeha xwe ji peyva latînî *thème* yê digire. Di fransî de weku *thème* û di îngilîzî de jî weku *theme* tê nivîsîn. Tema ne tenê di qada helbestê de her wiha di cureyên weku roman û çîrokan de jî tê bikaranîn (Çıkla û Kuran, 2021: 43). Di wateya xwe ya ferhengî jî tema, di honandina metneke edebî de bîngeha hest û ramanê ye (Yalçın, 1989: 160).

3.1.1 Temayên Civakî

3.1.1.1 Çand û Jîyana Kurdan

Di nivîskarîya Emerîkê Serdar de mirov dikare bibêje xala herî giring jî vegotina çand û jîyana kurdan ya serdema wî ye. Nivîskar bi nêrîneke raçavkar jîyana derdora xwe vegotîye û di bin tesîra vê yekê de jî berhemên xwe afirandine. Dawet û şayî, mêvanperwerî, mêrxasî û tekilîyên rojane di çîrokên nivîskar de weku nimûneyên çanda kurdî derketine pêş.

Di çîroka “Dawet Bû”yê de nivîskar bi vegotina dawetekê kurdan ya li gundekî radixe ber çavan. Di vê çîrokê de edetên gund û civakê tîvî vegotin. Gundî di şahîyên xwe de bi hev ra ne. Dawetek dibe şabûna gundekî. Ew ne tenê şahîya

malbatekî yan kesekî ye. Ew şahîya hemû gund û niştecihên gund e. “Wê rojê te derîyê kîjan malê vekira, texte rastkirî bû, bi hezar naz û nemetî xemilandî bû. Yekî bizineke wî hebûya, wî jî karê xwe kiribû, vexwendî hildabûn.” (Destê Dê. 35).

Çîrok jîyana gund ji me re dişayesîne, em pê dihesin ku di nava gund de tifaqeke zor heye. Vexwendî û mêvanên dawetê hemû li nava gund belav dibin û bi vî şiklî tên xweyî kirin. Nivîskar bi vê yekê gundekî bi tifaq derdixe pêş. Ji alîyê edet û kevneşopîyan ve gundekî gelek bikêf û bişahî tê behskirin. Di govendê de hîyerarşîyek heye. Mêrên navsere li serê govendê ne. Li pêy wan jî yên din rêz dibin. Bûk û keçên din jî di dawîyê û di herî dawîyê de jî zarok dikevne govendê.

Şîn û şahî di nava hev de ne. Di çîrokê de em pê dihesin ku gava Cindîyê kal ber mirinê ye temî li kurê xwe Emer dike ku mirina wî nedin der; da ku Şahîya ciranên wan xerab nebe. “-Lao, şîn û şayi birayên hev in. Lê şîn gotî şayîyê alt neke. Lewma jî edetên mileta me ye; wextên wiha şînê nakin dengî... guncê min li stûyê we be, hûn jî nekin dengî... Emer, lawo, ese bidî pêşîya neferên malê, bibî dawetê, weku kes şik nebe, bila çavên cahilên me ji dawetê nemîne.” (Destê Dê. 37).

Nivîskar çawa di nava gundekî kurda de jîyaye her wiha vê yekê di metnên xwe yên çîrokê de bi kar tîne. Paşxaneyê çîrokên wî pirî caran li ser edet û jîyana gund hatine avakirin. Mijarên çîrokên xwe jî ji van babetan wergirtîye. Danûstandinên rojane yên gundîyan dibin mijarên çîrokên nivîskar. Şahidîyên xwe yên civakî bi rêya çîrokê derdixe pêş. Lê di vê çîrokê de jî ku dîyar dibe; nivîskar bi çavekî erênî li civakê dinêre. Di muxayelata nivîskar de her çiqas hin tiştên ne li gorî dilê nivîskar hebin jî; civak bi piranî bi rûyê xwe yê baş ve tê şayesandin. Tifaq û pêwendîya mirovan, edet û kevneşopîyên wan bi zimanekî erênî tên ravekirin.

Her wiha em di çîrokê de weku xaleke din jî rastî hunera dengbêjîyê ya li dawetan tên. Dengbêjî weku ku tê zanîn di nava hemû kurdan de kar û hunereke giring e. Di vê çîrokê de jî em rastî hunera dengbêjîyê tên. Dengbêj bi stranên xwe beşdarê vê şahî û kêfxweşîyê dibin. “Dengbêjan rê nedidan hev, bi ber hev da dihatin.” (Destê Dê. 39).

Ya ku nivîskar di çîrokê de bi me dide nîşandan hewceye şîn û şahî bi hev re bên pêkanîn. Ne şîn cîyê şahîyê bigire ne jî şahî cîyê şînê bigire. Her wiha nivîskar giringîyeke mezin dide nerîtên gelêrî. Ev yek di vê çîrokê de jî xwe dide der. Dema ku Cindî li ber sekeratê ye temî li kure xwe Emer dike ku xebera mirina wî nedin, da ku daweta gundîyê wan neyê belavkirin û şahîya wan berdewam bike. Kurê wî Emer jî heman bi vê yekê dike û vê xeberê di nava gund de belav nake. Piştî ku dawet diqede em dibînin ku mirina Cindî – ku ev du roj e – mirî ye di nav gund de belav dibe. “Rojtira mayîn teze bahs li gund belav bû, weku ev du roj in Cindî çûye rehmetê...” (Destê Dê. 41).

Nivîskar di çîroka “Mala Mêran Neketî” de li ser lehengîya kurdan radiweste. Çîrok dîsa li ser çand û jîyana kurdan ya gelêrî hatîye honandin. Di çîrokê de qala dijminî û dostanîyê tê kirin. Dijmin jî divê mêr be. Çîrok dişibe çirokeke folklorîk. Pesnê mêranîyê tê dayîn. Bav, ku kurê xwe dişîne şer dema ku meytê wî tê dipirse, ka gelo birîna wî li berve ye yan jî pişt ve, her wiha heta ku pê dihesa kurê wî jî ber ve derb xwarîye û mirî ye paşê cinyazê wî dispêrin axê û şîna xwe didanin. Di vê çîrokê de em dibînin ku mêranî ji mirinê wêdetir e. Mêrxasî tê îdealîzekirin.

Nivîskar di çîroka “Dawet Nîvco Ma” ya *Êdî Dereng Bûyê* de dîsa bi rêya dawetekê edetên kurdan dike honaka çîroka xwe. Şahî û şîn weku du dîyardeyên sereke bi hev re tên vegotin. Di şahîyê de em gelek caran lê rast tên ku şîn jî bi şahîyê re ye. Ne jî şahîya xwe vedibin ne jî ji şînê. Di vê çîrokê de jî em rastî bihevrebûna şahî û şînê tên. Di kevneşopîya kurdan de jî xuya dibe ku şîn û şahî her yekê cihê xwe heye. Nivîskar bi vê yekê ve dixwaze jîyana kurdan bi awayekî resen bide ber çavan.

Di çîroka “Du Caran Bûk Siwar Kirin” de Wekîl di şeva daweta xwe de di qezîyekî de dimire. Malbata wî pê dihesa û lê dîsa jî caba mirina Wekîl ranagihînin da ku şayî belav nebe. Di malê de şîn e û li derve jî şayî dom dike.

Duh, piştî anîna bûkê, li wê bêxwedîya maşîna me siwar bû, çû pê hevalên xwe. Bi rê ve avarya daye, maşînê wergerandîye û xwe bi xwe jî hatîye kuştin.

-Weylê mala te xerab bûyî, te çî ecêb anî serê xwe!-merivekî navsere got û bê hemdî xwe destê xwe li hev xistin.

-Hûn kîngê pê hesîyan – dolebaşî jê pirsî.

-Nîvê şevê bû, gava cinyazê wî anîn... Lewma ez wê çaxê dereng ketim... Min nehişt bikin dengî... Bi min re dest neda nedida; min hûn anîbûn ser şayîyê, ne ku ser şînê... (Êdî Dereng Bû. 114).

Em dibînin ku her çiqas di malbata zava de şîn be jî, naxwazin şayîya kesên vexwendî nivco bimîne. Dawet êdî dibe daweta zavayê mirî.

Nivîskar di çîroka “Hunera Sazbendîyê” de jî bi rêya dawetê dab û nêrîtên kurdan vedibêje. Dawet û şayî di civaka ku nivîskar qal dike de ne tenê ji şayîyên rêzê ne. Ew di heman demê de weku amrazê pevgirêdanê ne. Em dibînin ku di çîrokê de, di navbeyna du gundan de dilsarîyek heye. Lê dema dengê defê lê dikeve û sazband dest pê dike gundê hember tîvê li daweta wan dibin mêvan.

Serkarê wan î kal da pêşîyê û hatin mala xwedîyê dawetê. Gava xwedîyê dawetê çav li wan ket, ecêbmayî ma. – Qe ecêbmayî nemîne, - serkarê berekê gote xwedîyê dawetê, - weku em îro bi pêyên xwe hatine daweta kurê te. Gerekê em rojekê bi hev re pev ketana? Qe jî vê rojê xwestir tune ye. Şikir menî dawet e, bila mirazê me jî bi şayî bibe. Lê dibêjin sazbandê te filan kes e. Bira, çî rast, rast e, em wisa zû bi zû rûyê we nediketin, weku pîrsa wî sazbandî di ortê de tune bûya.” (Êdî Dereng Bû. 123).

Sazbandî bi vî avayî di navbeyna şênîyên du gundan de dibe pêkhênera sulhê. Sazbandî, em dibînin li ser civakê xwedîyê roleke sereke ye. Ev yek jî dîyardeyên çanda kurdan in. Kurd gelek caran bi minasebetên bi vî cureyî tîvê ba hev. Çîrok jî li ser vî babetê hatîye honandin. Di çîrokê de jî rihspîyê gund giringî û rola sazband wiha dîyar dike: “Bila her tim wiha sazbandîya te ne ku tenê her du gulan bigihîne hev du, lê wisa jî xirabîya di orta merivan de bide hildan.” (Êdî Dereng Bû. 124).

Em bi rêya denbêjan di çîroka “Nikarîbû” de şopên çanda kurdî dibînin. Di çîrokan de giringîyeke pîr mezin didin sazband û dengbêjan. Ew di dawet û şayîyan

de, zivistanê di malan de, havînan jî li çîya û banîyan tim distrên. Yek ji van jî Avdel e. Avdel dengbêj û sazbandekî qerase ye. Bi rûyekî nerm û biken di nava civatê de tê hezkirin. Lê piştî ku kurê wî ye bi tayê tenê ji ber nexweşîyekî dimire, Avdel per û baskên wî dişikên û di nava bêdengîyekî de dimîne. Pir di bin tesîra kurê xwe yê mirî de dimîne. Lê xelasbûna ji vê bêdengîyê de xwe dispêrê dengbêjî û sazbandîyê. Dengbêjiya wî dibe stargehek jê ra. “Mirinê ji sazbandîyê re dest danîbû, hatibû rayê. Sazbandîyê mirin dabû jibîrkirin û alt kirin” (Êdî Dereng Bû. 134). Sazbandî ji bona Avdel tiştekî pir muhîm e. Ew jê ra weku av û nan e. Yekane girêdana wi ya jîyanê ye. “Avdel mînanî gunehkar di ber xwe da got, - Tilîyên min dixurîyan. Min nikarîbû.” (Êdî Dereng Bû. 136).

Nivîskar di çîroka “Tirsê” ya *Dengê Dil* de li ser şevbûherkên gundan radiweste. Nivîskar di paragrafa yekem ya çîrokê de gelek bi başî kariye ku dab û nerîtên kurdan di serdema xwe de wesf bike. Ew qala awayê rûniştina çarmêrkî dike. Niha jî di civatên kurdan de ev cûreyê rûniştinê nîşaneyek e ji rêzgirtin û hurmetdarîya amadebûyên civatê li hemberî hevûdin. Bêguman jîyan û dab û nerîtên gundewarî yên kurdan di her werzê de cuda ne. Di vê çîrokê de nivîskar nabêje demsal kijan e. Lê bi amajeyê veşartî dema ku qala bixêrîyê dike, xwîner pê dihesin ku çîrok di werzê zivistanê de derbas dibe. Ev bi serê xwe nîşaneyek xurtbûna pênuşa nivîskarî ye.

Li welatê kurdan niha jî zivistan demsala şevnişînî an jî bi wateyê din demsala şevbihêrîyan e. Xelkê gundan her şevê li malekê kom dibin û qala bûyer, serpêhatî, çîrok û dab û nerîtên xwe yên kevin dikin. Ew niha jî li gelek gundan mîna bavûkalên xwe heya derengîya şevê li malekê kom dibin û demeke xweş bi hev re derbas dikin. Di vê çîrokê de jî kal û pîr, navsal, cahil û zarok li mala Apê Cimşît kom bûne. Gurbûna agirê bixêrîyê jî germîya civatên kurdan nîşan dide. Di çîrokê de jî mirov pê dihesê ku civat her şev pêk hatine: “Her şev der heqa tiştekê xeber didan.” (Dengê Dil. 9).

Her wiha di nav kurdan de çandeke wiha heye ku cixareyê dirêjî alîyê dost û heval û kesên rûniştî dikin. Di vê çîrokê de jî dema ku Apê Bedo gilîya xwe dike û behsê sawa gornepişîka Pira Nîşokê dike, heta cihekê serpêhatîyê xwe dibêje, pişt re

qutîya cixareya xwe derdixê û piştî pêçana cixareyekê ji bo xwe, qutîyê dirêjî alîyê rîsipîyê rûniştî dike.

Yek ji dab û nerîtên kurdan yê nirxdar ew e ku di civatan de her gotinekê nayînî ziman. Heger ku pêwîst be behsê mijareke sivik bê kirin jî, piranî bi gotina “haşa hizûrê...” perdeyekê bi ser mijarê de tê kişandin. Di çîrokê de dema ku Apê Bedo dixwaze gornepişîkê bişîbîne tajî, ji ber ku anîna navê tajî hinekî ji bo wî şerim tê, dibêje “haşa hizûra maqûlê rûniştî.”

Bêdengbûna civatê di dema axaftina kesekê de jî yek ji nerîtên kevin yê kurdan e. Heger ku mijar tirs nebe jî, dema ku di civatekê de kesek dest bi axaftinê dike hemû kesên amadebûyî hewl didin ku bêdengîyê biparêzin. Nivîskar ku di heman demê de vegerê çîrokê ye amajê bi vê xalê dike û dibêje ku: “Wexta yekî gilîyek fikir, gişkan xwe ker fikir.” (Dengê Dil. 12).

Her wiha nivîskar li dereke din dibêje: “Wekî di odeyê de mêşek bifirîya, vengînîya wê, wê bihata bihîstin.” (Dengê Dil. 12). Heger mirov bala xwe bide hevoka dawî ya çîrokê, nerîtek din ya kurdan jî li ber çavên mirov dikeve ku ew jî rêzdarîya li hember mirîyan e. Di wê hevokê de nivîskar dibêje: “Hetanî Sefoyî sax bû, li gund ev gilîyê wî dikirin.” (Dengê Dil. 14).

Li gor vê hevokê mirov pê dihesê ku kurd çiqas rêzê ji mirîyan digirin ku neşên piştî mirina wan bi henekê be jî qala wan bikin. Hîyerarşî di civatên kurdan de hertim hebûye. Mirov di vê çîrokê de jî vê hîyerarşîyê dibîne ku dibêje: “Mêrên mezin li sêrê jorîn rûdiniştin, li binetara wan mêrên navsere bûn. Li jêr cahil bûn. Lê zaro an li binpîya odeyê disekinîn, an jî li ser erdê rûdiniştin.” (Dengê Dil. 9).

Ev tema di çîroka “Mêrxasî”yê de jî hatîye vegotin. Sêwî û xwedîderketina wan li cem kurdan kevneşopîyeke giring temsîl dikin. Nemaze di çarçoveya jîyana eşîrtîyê de heger ku zarokek ji ber her sedemekê sêwî bimîne, kesên din hewl didin ku wê/wî biparêzin û lê xwedî derdikevin. Di vê çîrokê de jî serokê qebîlê (eşîrê) erkê mezinkirina Cemalî qebûl dike û wî xweyî dike.

Digel ku di nav eşîrên kurdan de dijminî hebûye, di heman demê de dostî û hevaltî jî yek ji taybetmendîyên kurdan e. Rengvedana vê taybetmendîyê di vê çîrokê de jî dîyar e û dema ku mezinekî eşîreke cîranê eşîra Cemalî dimire, tevî hebûna dijminan hemû mîrên eşîra wî, bi rê dikevin û xwe digihînin şîna wî kesî.

Di nav hevoka yekem ya Cemalî de ku dibêje talançîyan, demarên dab û nerîteke din ya kurdan xuya dibin ku ew jî neheqînekirin e. Xuya ye ku eşîra dijmin wê demê diçe talanê ku mîrên eşîrê hemî ji bo şînê ji nav eşîrê derketine. Lewra jî Cemal dema ku dide pey talançîyan û xwe bi wan re digihîne, vê nerîtê tîne bîra wan û dibêje ku: “Heyran, xwe li neheqîyê negirin, mîrên me çûne hewariyê, talanê me nebin.” (Dengê Dil. 17). Li gor vê hevokê, Cemal li bendê nebûye ku tu pez û dewarên eşîrê bînin talankirin, lê belê bi bawerîya wî divîyabû talan niha pêk neyê ku tu mîrên eşîrê li nav malan nînin.

Di dîrokê de hertim amaje bi siwarçakîya kurdan hatîye kirin. Şerê lehengê çîrokê û talançîyan di vê çîrokê de bi temamî li ser piştê hespan rû dide. Nivîskarî ev hunera kurdan gelek baş aniye ziman û bi taybet di rûbirûbûna sêyem ya di navbera Cemalî û serokê talançîyan de kariye ku dîmenek şênber ya vê hunerê nîşan bide: “... rimê carekê, duduyan hildiqoşîne, û mihîne zenhû dike, xwe dirêjî Cemal dike. Rimê digire, bi bayê xwe tê. Cemal gemê li devê mehîne dixê, xwe berdide alîyekê. Derba wî pist diçe. ... mehîne nasekine, bi bayê xwe diçe.” (Dengê Dil. 188).

Mixabin yek ji taybetmendîyên civaka kurdan jî berê heya îro dijminatîya navbera el û eşîrên wan e. Dijmindarî di vê çîrokê de jî yek di hemanên sereke ye ku dibe sedemê pevçûnek mezin di navbera eşîra lehengê çîrokê û eşîreke din. Di rastî de ev dijminahî jî bo Cemalî ku sêwîyekî bêxwedî ye wê derfetê diafirîne ku bibe lehengê eşîrê û li her derê navbangê mîrxasîya wî bê bihîstin.

Kuştina mîran û dizî û talan çend kiryarên sereke bûn ku eşîrên dijminên hevûdin li dijî hev pêk dianîn. Her weku ku di vê çîrokê de jî em dibînin, dema ku mîr û zalamên eşîra Cemalî ji bo beşdarbûnê di rê û resmên şîna kesekî ji eşîrekî din bi rê dikevin, eşîra dijmin pilana talankirina pez û dewarên wan didin. Sêwîyek di vê navberê de hewl dide heyîna eşîra xwe biparêze û bi hemû hêza xwe ji bo

paşvegerandina malên talankirî hewl dixebite. Bêguman derbasbûna hêmana dijmindarîyê di nava çîrokên nivîskarî de nayê vê wateyê ku ev adetê kirêt tenê di nav kurdan de hebûye. Bêguman di nav hemû gelên cîhanê de parastina berjewendîyan û destdirêjîya li ser axa eşîr, gel û netewên din çavkanîya sereke ya dijmîn û dijmindarîyê ye di navbera alîyên cuda de.

Bêguman taybetmendîya sereke ya lehengê çîrokê mêrxasî ye. Helbet dilovanî, wêrekî û nefsbîçûkî jî di wî de hene lê ew hemû hêmanên mêrxasîyê ne. Ew bi mêrxasîya xwe talanê bi paş ve tîne û rûmeta eşîrê diparêze. Di bin bandora heman taybetmendîyê de ye ku dikare heft mêran bikuje û gelekên din jî mecbûr bike ku birevin. Nivîskar di dawîya çîrokê de li ser zimanê serokê eşîrê jî vê taybetmendîya Cemalî berceste dike û weku mînakekê ji bo hemî law û gencên eşîrê. Helbet serokê eşîrê bixwe jî li vê rastîyê mikûr tê ku mêrxasîya Cemalî bi vê bûyerê dest pê nebûye. Ew di axaftinên xwe yên der barê wî da dibêje ku: “Ew bi derbekê mêrxas nebûye.” (Dengê Dil. 19).

Di çîroka “Eşîr Bavê Eşîrê Ye” ya *Hisreta Emir* de dab, nêrît û mêrxasîya kurdan li ser du ciwanên êzîdî tê vegotin. Teyo û Xudo ji gundê Dûzgêçîyê û du ciwanên êzîdî ne. Di nava leşkerên rûs û ermen de erka xwe ya leşkerîyê bi cî tînin. Dema lî eşkerîyê ne, gundekî kurdan tê dorpêçkirin û lê digerin û dibînin gund hatîye valakirin û her kes revîyaye. Di malekê de rastî du jinên ciwan tên ku navê wan Qazê û Perî ye. Gundî tev revîyane û Qaze û Perî ji ber ku wê demê çûyîne pincarê bi vê yekê nehesîyane û dema vedigerin gund dibînin gund vala ye. Dikevin malê û derî li ser xwe kîlît dikin. Dema di gund de lêgerîna mirovan dibe Teyo û Xudo rastî wan tên wan teskîn dikin da ku netirsin. Çîrok bi pesindayîna dab û nêrtûtên kurdan ve dagirtî ye:

Bira, hûn êzîdî ne?- wê hedîka pirsî

Erê, xwîşkê, em Êzdî ne, -Teyo gotê. -Çi firqî? Eşîr bavê eşîrê ye.

Pak e, me hûn dîtin. (Hisreta Emir. 43).

Bi vî awayî di çîrokê de dostanîya navbeyna du alîyên kurd ve tê dîyarkirin. kurdên Êzîdî û kurdên misilman weku du terefên pêşkêşkirin û li ser dab û nêrtûtên

eşîrtîyê jî tîn pesendkirin. Jinên misilman dema bang li ciwanên êzîdî dikin wan weku “bira” binav dikin, di heman demê de bersiva ciwanan jî dibe “xwîşk”. Bi vê yekê ve jî nivîskar dîyar dike ku kurdên misilman û êzîdî di eslê xwe de weku hev in. Lê di şerê qewimî de her çiqas bêvîna xwe, beşdar bibin jî dîsa li hev xwedî derdikevin û rê nadin da ku rûdaneke nelirê li hemberî wan pêk were.

Kesek destê xwe nade we, lela min, -Teyo gotê.

-Çima em mirine, weku bihêlin destekî nepak bigihîje we?... Ew kîjan mêrê eşîrê wê bihêle, weku kulfeta Kurmanc xwe biavêje ser dest û pîyên wî?-nêzîkî wan bû, destê xwe biavêje milê wan. – rabin, rabin, lela min, ji xwe em ne kafir in.(Hisreta Emir: 43).

Çend caran di çîrokê de ji bona pesendkirina dab û nêrîtên kurdan hevoka “Eşîr bavê eşîrê ye” tê dubarekirin. Bi vî awayî hem kurdên êzîdî û hem jî kurdên misilman tîn îdealîzekirin. Lê di çîrokê de her çiqas kurd weku du terefên şer bîn nîşandan jî em rastî sedema vê yekê nayên. Nivîskar nade dîyar ka gelo çima kurd du terefan da cih digirin. Di çîrokê de çawa ku alîkarîya êzîdîyan ya li hemberî hev du tê şayesandin û her wisa lehengîya kurdên misilman yê ku di nava alayên hemîdîyê de cih digirin jî tê şayesandin. Vê carê di berdewamîya çîrokê de em pê hay dibin artêşa Rûs bi paş de vegerîyaye û li hemberî artêşa Osmanî û alayên Hemîdî artêşa ermenî nikare ber xwe bide û rev dikeve nava kurdên êzîdî. Teyo jî ji bo ku agahdarîyê bide gundê malxalanên xwe; rê dikeve û ber bi gundê wan ve diçe. Bi mebesta xebera koçkirinê li wan bigihîne û bi hev re koç bikin. Lê di rê de jî alîyê hêzên tirk ve tê girtin. “Teslîm” (Hisreta Emir. 51).

Dema Teyo tê girtin ji alîyê leşkeran ve rastî lêdanê tê û di dawîyê de wî dibin li hemberî paşayê artêşê. Di axaftinên navbeyna Paşa û Teyo de em pê haydar dibin ku Paşa jî yekî kurd e û bi kurmancî diaxive. Ev hêz weku hêzên Hemîdîyê tîn pênasekirin. Di nava vê hêzê de jî mirovekî bi navê Hesê Misto heye û ev mirov, bavê Qazê û xwezûrê Perîyê ye ku ji alîyê Teyo û hevalê Xudo ve hatibûn xelaskirin. Vê carê jî vê peywîrê li gorî dab û nêrîtên kurdewarî Hesê Mistê li ser xwe hildigire. Bi pesendkarî qala serpêhatîya qîz û bûka xwe ji paşa re dike: “wan erzê me, namûsa me xweyî kirine, nehiştine bikevin destê kafiran... Eşîr bavê eşîrê ye... ew yek îlahî

rojên oxirmeyên giran tê kivşê. We merivayîya xwe kirîye, hûn weku eslê xwe rabûne û rûniştine. Were ez enîya te maç bikim. Hûn weku eslê xwe rabûne û rûniştine. Were ez enîya te maç bikim.” (Hisreta Emir. 55). Bi vî awayî jî ji alîyê binyada wan ve kurd weku qewmekî esîl tîn şayesandin û qîmetkirin.

Di çîroka “Dew Didî Haco”ya *Hisreta Emir* de jî şopên çand û jîyana kurdan tîn dîtin. Di wesifkirina kesayetiya Şelalî de çî hatibe gotin mirov dikare berovajîya wê weku nerîteke pejirandî ya civaka kurdan bibîne. Xîtabkirina mezinan bi bêjeyên mîna apo û xalo edetek e li ba kurdan lê karakterê çîrokê ku Şelal e ji ber ku rêz ji vê nerîta civakî re nagire, ji hêla civakê ve weku kesekî nehêja hatîye wesfkirin. “çi qas jî ew di emir de mezin bûna, navê wan hildida.”(Hisreta Emir. 135).

Her wiha giringîya rastgobûnê jî di çîrokê da tê dîtin. Nivîskar bi vê hevokê ku: “kesekî ji gotinê wî bawer nedikir”(Hisreta Emir. 135) giringîya vê çendê li bal kurdan berceste dike. Li gorî dab û nerîtên kurdan nabe ku mirov bê destûr û hema rasterast xwe têxe nava axaftinên kesên din. Nivîskar dibêje: “Ji cîyê tê û netê xwe di nav gilîyan ra dikir.”(Hisreta Emir. 135). Ev jî yek ji kêmasî û taybetmendiyên nebaş yê Şelalî ye.

Yek ji nerîtên kurdan jî ev e ku hewl didin di warê xizmatîyê de kesên herî hêja hîlbijêrin. Nivîskar di vê çarçovê de jî balê dikşîne ser pêngavên ku dê û bavên Şelalî ji bo zewicandina wî avêtine. Ji ber ku Şelal di nav gundîyan de kesekî neqenc, derewkar, jixwerazî û hwd e, kes hez nake ku keça xwe bide wî. Tevî ku ew evîndarê keçekê ye, lê heman xisletên wî yê xirab dibin sedemê sivikbûna wî û di encamê de keça ku bixwe berçav digire jî rû nade wî û bersiva vê hezkirina wî bi neyînî dide.

3.1.1.2 Berawirdkirina Jîyana Berî Şoreşa Cotmehê û Piştî Wê

Jîyana kurdan ya Sovyetê piranî li ser du serdeman tê şayesandin. Yek ji van jîyana berîya Şoreşa Cotmehê ye û ya din jî jîyana piştî Şoreşê ye. Ev tema di nivîskarîya serdema Sovyetê de temayeke serdest e. Gelek nivîskarên wê serdemê metnên xwe li ser vê babetê sêwirandine. Ev yek hem ji ber helwesta nivîskaran e hem jî ji ber polîtîkaya Sovyetan e. Lewra bi awayekî mecbûrî hewce bû nivîskar di metnê xwe de nîrxên Sovyetê bi êrenî bişayesînin û qîmet bidinê. Emerîkê Serdar jî

yek ji van nivîskaran e ku di çîrokên xwe de cih dayê vê berawirdkirinê. Di jîyana berîya şoreşê de nexwendin, zilma feodalîteyê, feqîrî weku qedera gel tê vegotin. Lê jîyana piştî şoreşê yekcar vediguhere û bindestên heyamekê êdî di rewşeke serdestî de derdikevin holê û mirov di nava jîyaneke bextewar de dijîn. Her çiqas di çîrokên Emerîkê Serdar de zimanekî propagandîst nehatibe bikaranîn jî dîsa em şopên vê nerîte di çîrokên wî de dibînin.

Di çîroka “Awazê Gundê Me” de vegêr bi çavekî nostalgîk rojên borî bibîr tîne û roja îro û ya berê rabeî hev dike. Nivîskar di şayesandina gundê xwe de qala bûyereke trajîk dike û sebeba vê yekê jî Roma Reş dide nîşandan. “Newala Ecelê” jî ber qetlîamekê ev nav hilgirtî ye. Vegêr bi vegotina vê bûyerê ve dixwaze di nava nîfşên nû de bi bîr bîne ka gelo kurd ji çi trajedîyan gihîştine roja îro. Vegêr bi vê yekê ve Romê û Sovyetê muqayeseyê hev dike û bi awayekî şîretwarî hestên xwe wiha dide der: “Bila nav ‘ecel’ be, lê wê her tim bîne bîra gundîyên me, weku kî ye dostê wan î rast kî ye dijminê wan î xayîn.” (Êdî Dereng Bû. 48).

Vegêr her wiha cudatîyekî datîne nevbeyna dewleta Rom û Sovyetê. Di dema Romê de qirkirina kurdan tiştêkî ji rêzê ye lê îro di şûna wan de bi saya Sovyetê dengê şahîyê belav dibe. Nivîskar jîyana gundê xwe ya berîya şoreşê bi awayekî panoramîk li ber çavên xwîneran şênber dike. Di vê jîyanê de feqîrî û sefaletî ji çar alîyê wan de dadiwere xwarê. Xanîyên binerd û tarî, sir û seqema zivistanê derdora gundîyan dorpêç kirîye. Vegêr wê jîyanê bi awayekî realîst wiha diwesfîne:

Malên gundê me binerd î biçûk bûn. Dîwarên wan bi kevirên gicûce bûn. Ronkayî di kulekê re diketê. Di xênî de xên ji kuleka mezin wisa jî dûkêşk hebû. Zivistanê kuleka mezin venedikirin, weku xanî sar nebe, dûyê tendûrê di dûkêşkê re dikişîya. Banê xanîyan ji dû reş dibûn. Wexta yek radibû ser ban, xuşexuşa xwelîyê bû ji jor de dihat. Êvarê çirayê neftê vêdixistin. Hetanî sibeyê dûyê wê di hindur de dibû telp û gava neferên malê sibeyê radibûn, serçavê wan di tenîyê de dima. Xanî ewqas nizm bûn, weku çi qas jî meriv kin bûya, gava di derî re diçû hindur an derdiket, gotî ese xwe kûz bikira, weku serê wî li serşêmîkê neketa.

Gelek malan zivistanê dewar an pezê xwe di xênî de xwedî dikirin, weku xanî germ be, çimkî ardûyê wan kêr bû. Ardûyê wan jî sergîn û pêsarî bûn. ‘rewşa gund qelaxên rexmalan bûn an basmeyên li ber derîyan. Her tim kelb li ber qelaxan girê didan, weku neyêne dizîya sergînan.

Wexta baran dibarî, malan dilop dikir. Dilopê çi! Ava reş ji jor de dibarî...” (Êdî Dereng Bû. 50).

Wek ku tê dîtîn jîyana şênîyên gund di nava zehmetîyeke mezin de ye. Ne tenê rewşa wan a aborî her wiha xweza jî li wan hatîye xezebê. Xanîyên wan ji xanîyekî wêdetîr bi şiklê xirabeyan didin. Xanî mîna koxan in û belengazîyekî mezin ew hingaftine. Gundî him ji ber nezanîyê û him jî ji ber nebûna alavên teknîkî ji derfetên derdora xwe jî bêpar in: “...Der û dorên gund tijî kanî bûn, lê gundîyan ava cihokê vedixwarin. Ê vê avê çi qas nexweşî bi pê de dianîn, dibû qesasê serê çi qas merivan!.. Kanî gelek bûn, lê mecal tune bûn, weku ava wan bînin gund.” (Êdî Dereng Bû. 51).

Ev rewşa giran piştî Şoreşa Cotmehê yekser diguhere. Alavên teknîkî digehijin gund û şiklê xanîyên gund û nava wan jî diguhere. Şênîyên gund di nava jîyaneke bextewar de tên şayesandin. Gundî hin caran ji ber van guherînan; metelmayî mane. Televîzyon û radyo gihiştîye hemû deveran û li şûna çira lambeyên elektrîkê girtine. Gundî dibin xwedî erebe. Vegêr veguherînên jîyanê li ser xênîyên gund wiha rave dike:

Niha di gundê gund de avayîyên duqat gelek in û xanmanên wî gundîyê me êdî tek nîne. Lê çi dimîne di der heqa sur û sermaye zivistanê de, ew, hilbet, mînanî ê berê ye. Lê huner û hebûna gundîyan zêde bûye û wan çara wê yekê dîtine. Her çar heyamên salê ew qatê duduyan de derbas dikan, li dewsa sergîn û pêsarîyan, komir û gaz e. Ne dû ye ne jî tendûr e. Sobeya xwe vêdixin û li ber rûdinên. (Êdî Dereng Bû. 54).

Jîyana gund ne tenê bi xanî û naveroka wan ve diguhere; her wiha derfetên perwerdehîyê jî pêş dikevin. Dibistanên nû tên avakirin û xwendekar di gundê xwe de perwerde dibin. Vegêr vê yekê li ser rewşa berîya Şoreşê şirove dike û ji xwe di

metna çîrokê de guherîn bi hevokên “Dîwana Sovêtî teze testîq bûbû” ve tê ravekirin.

Got teze dîwana Sovêtî testîq bûbû, di gundê me de hela mekteb tune bû. Gundîyekî me pê dihesa, weku di gundê cîran de, rêya kîjanî gelekî bêfesa e û nava çîya re derbas dibe, zivistanê jî tê girtin, mekteba êlêmêntar vebûye. Her roj bi destê kurê xwe digire, dibe wê mektebê tîne. Gelek caran, îlahî zivistanê, piştî dikir, kurşa berfê diqelaşt dibir. Lê wexta dibû bager, bi hefteyan di mala dostan de dima. Hilbet, kurê wî mekteb kuta kir, bû aktîvîsteî gund î eyan... Niha di gundê me de avayîya mekteba navîn çêdikin... (Êdî Dereng Bû. 57).

Di çîroka “Rasthatin”ê de veguherîna jîyanê li ser du lehengan tê vegotin. Lehengê çîrokê jînebîyeke temenmezin e û ji doktorîyê malnişîn bûye. Jin her wiha bi tena serê xwe li bajarekî û di qata sêyan a bînayekî de rûdinê. Tenêbûn, malnişîn bûn û rûniştina li qata sisêyan bi mebestekê ve tîne vegotin. Lewra di berdewamîya çîrokê de berawirdkirina jîyana berê û ya nû li ser vê lehengê tê şênberkirin. Rojekê dengê şofêrê erebeya çopê lê tasele dibe û ev deng jê ra nas tê. Jina malnişîn bi mebesta valakirina derdanê xwedîyê wî dengê dibîne û nas dike. “Mêrekî qirînta bû, kincên xebatê lê, şixulê xwe dikir.” (Êdî Dereng Bû. 90).

Jina malnişîn piştî ku wî xebatkarê erebeya derdanê nas dike bi rêya paşveçûnê vedigere rojên zarotîya xwe û rojên berîya Şoreşa cotmehê. Vegêr van rojan wiha vedigerîne:

Şer bû, daw bû, rojêd reverevê bûn. Mala wan jî revî. Di rê de eskerên Romê lê dan bavê wê kuştin. Ew û dê tenê man. Qîzeke donzdeh-sêzdeh salî bû. Wê û dê gelekî gerîyan, gelek zelûlî û çetînayî dîtin hetanî hatin derbasî vî berê Erez bûn. Li vî derê jî stareke pak nedîtin. Her der xelayî, belengazî û zelûlî bû. Di gundekî Kurdan î dîr de binge bûn. Dewletîyê gund her tenê bi wî qewlî îzîn da ew di mereka wî yî kevn de bimînin, weku ew û dê bi teyayî di mala wî de nanozîko bixebitin. (Êdî Dereng Bû. 92).

Wek ku tê dîtîn dê û qîz di nava rewşeke giran de jîyana xwe didomînin. Rojek tî û yek birçî di merekekê de bi bermahîyên wê mala dewlemend xwe xwedî dikin. Lê dijberî vê yekê kurê dewletî bi awayekî din tê şayesandin: “Kurekî dewletî hebû. Kur nebêje agirêkî xwedê bibêje. Bavê kincên temiz lê kiribûn, destê wî di cêbê de nedixebitî, neditebitî, ji sibeyê hetanî êvarê ji xwe re digerîya. Yekî qure yî pozbilind bû. Kurê tayê tenê bû, kesekî qêmîşî wî nedikir lewma jî rûstandî mezin bûbû.” (Êdî Dereng Bû. 93)

Kurê dewletî her weku li jor jî tê dîtîn di nava hebûnê de mezin dibe û ji xwe razî û bextewar e. Çiqas kincên rind û xwarinên baş hene para wî ne. Ev rewş di şayesandinên berîya şoreşê ne. Şayesandinên piştî Şoreşê yekcar diguherin. Keçîka ku lehenga çîrokê piştî ku Sovyet tê damezrandin bi biryara dewletê xaniyê ku tê de dişuxilin; du odê tînin tayîn kirin û dibin xwedîyê avahî. Çîrok bi vî awayî jîyana mirovan ya wê serdemê weku du serdemên ji hev cihê nîşanî xwîneran dike. Yek jîyana kesîbî ya berîya şoreşa cotmehê ya din jî jîyana bextewar ya piştî avabûna Sovyetê.

Piştî avabûna Sovyetan rol û çîna mirovan jî ji hev cihê dibe. Mirovên feqîr û hejar bi saya dewleta nû dixwînin û pêş de diçin. Ji xulamtiya dewletiyên berê rizgar dibin. Yek ji van kesan jî lehenga me ya jin e ku di çîroka “Rasthatinê” de cih digire. Dema ku Sovyet tê teşkîlkirin û her derê welêt dibistan tînin vekirin; lehenga me jî ji vê yekê para xwe hildide: “Piştî kutakirina mektebê çû şêher xwend, ket înstîtûtê. Çend salan bi şûn de kuta kir, bû dixtor, di şêher de ma.” (Êdî Dereng Bû. 97).

Di çîrokê de rewşa dê û qîza wê pir nebaş tê şayesandin. Ew ne weku mirovan weku bendeyan tînin dîtîn. Lê ev rewş piranî berîya hatina Sovyetan tê şayesandin. Feqîrî, hejarî, birçîbûn û tazîbûn rewşa mirovên berîya şoreşa cotmehê ye. Ew li ber bêînsafîya dewlemendan bêkes û kesîp mane. Berîya şoreşê rewşa mirovên feqîr bi awayekî gelek tarî tînin şayesandin. Ev rewş ne tenê di çîrokên Emerîk de di heman demê de ji hêla gelek nivîskarên kevne Sovyetê ve hatiye vegotin. Di berhema Erebe Şemo de jî heman rewş tê vegotin, berîya şoreşê dîsa tarî ye. Lehengên çîrokê di nava zehmetiyeke mezin de jîyana xwe didomînin. Mekan jî heman weku vê çîrokê “merekek” bûye. Li ber destê dewletî sibê hetanî êvarî

nanoziko karê mala wan dikan. Di nava dewarên wan de dixebitin û zibilê dewaran temîz dikan. Zarok ji bo ku bikaribin xwe germ bikin sibê hetanî êvarê bi dayîka xwe re diçin gomê û bi mebesta germbûnê wê derê dimînin. Ev her çiqas weku rastîyeke serdemê jî be mebesteke nivîskaran jî ew e ku qîmeta Sovyetan bilind bikin. Vê yekê weku erkekê li ser xwe dibînin.

Ji bilî pergala nû ev tiştên bi vî awayî ne mimkun e ku pêk bihatana. Zarokek û dîya xwe ku tenê dikarin bi bermayên dewletîyan zikê xwe têr bikin bixwînin û bibin xwedî pişê. Ev jî nêzîkbûna nivîskar ya li hemberî îdealîzekirina Sovyetan e. Rol êdî hatine guherandin. Keçika piçûk ya ku dayîka wê di nava mala dewletî de bi nanoziko kar dikir dibe bijîşk, kurê dewletî yê ku bi tayê tenê û kubar dibe xebatkarê karê paqijîya bajêr. “Rojê du caran nan didan wan. Çi ku ji ber neferê malê dima, awrûyê wan didan dê û qizê.” (Êdî Dereng Bû: 93).

Rewşa serdemê bi awayekî realîst ji hêla nivîskar ve hatîye şayesandin. Mala dewletî û rewşa dê û qîza wê weku du çînên ji hev cihê hatîye vegotin. Mala dewletî, wan di asta mirovan de nabîne. Lewra cîyê wan di merek/kadîne de ye. Tu mafekî wan jî tune ye. Heqekî wan yê xebatê, yê dîyarkirî jî nîne. Ew bê pere tenê ji bona nanê rojane dixebitin.

3.1.1.3 Rexneya Bavîksalarîyê

Di nivîskarîya Emerîkê Serdar de babetek din jî rexnekirin û teşhîrkirina pergala bavîksalarîyê ye. Wek nivîskarekî ji nîşê edebîyata kurdî ya dema Sovyetê Emerîkê Serdar jî li ser rêbaza realîzma civakî nivîskarî domandîye. Wek ku tê zanîn di realîzma civakî de şayesandina jinê û wekhevbûna mêr û jinan ji aliyê nivîskaran ve tê îdealîzekirin. Jin piranî weku temsîliyeta jîyana nû û nîrxên pergala nû hatine şayesandin. Ew di enîya şer de têkoşer in, li malê dayîkeke xwenda û zana, di kar de jî mîna hevkarê mêran derketine pêş. Di nivîskarîya Emerîkê Serdar de em rexneyên zêde tûj nebînin jî ev yek dîsa weku tema di çîrokan de hatîye sêwirandin.

Di çîroka “Serhatîya Hûbekî” de nivîskar serpehatîya Keleş û Sêve vedigêre. Keleş û Sêve du evîndar in. Lê ji ber ku di navbeyna malbatên wan de dijminatî heye nikarin bi awayekî aşkera bîr cem hev û pîrî caran bi dizîka li çolê rastî hev tên.

Bavê Sêvê Qero, piştî ku pê dihesê Sêvê bi kurê Reşo re diaxive lê tê xezebê. Qero weku mirovekî paşverû tê şayesandin. Dijminatîya ku di navbeyna wan û malbata Reşo de pêk hatiye, her tim di dilê xwe de dikelîne. Ji ber ku bavê wî ji alîyê apê Reşo ve hatiye kuştin ew bi çavê neyartîyê li Reşo dinêre. “Hetanî kurê kuran jî mabe, gotî heyfa bavê min bê hildan, - Qero digot. – Mirina min û kuran ê hebe, pêvketina me tune ye.” (Destê Dê. 18).

Qero di mebesta tolhildana bavê xwe de ye. Ji bona vê yekê jî bi ehd e heta ku tola bavê xwe hilnede wê raneweste. Ne tenê der barê dijminê xwe de vê tundbûna xwe nîşan dide. Ew di mala xwe de jî li hemberî qîza xwe û jina xwe yekî neqenc û zorbe ye. Dema ku dibihîse Sêvê bi Keleş re digere û diaxive lê tê xezebê û lêdixe: “...Qero qîz kutabû û daw kiribû, weku li xwe mikur bê. Sêvê dîsa înkâr kiribû, girîyabû, xwe avêtibû ser lingên bavê û sond xwaribû, weku tiştê wisa tune ye.” (Destê Dê. 22)

Qero di seranserê çîrokê de weku mirovekî nebaş hatiye şayesandin. Ew kesekî serhişk û bê wijdan e. Dijminatîyê di dil de dikelîne û di malê de jî yekî zilmkar e. Ew dikeve navbeyna du evîndaran û naxwaze bi mirazê xwe şa bibin. Tenê li hemberî Sêvê nayê xezebê ew li hemberî jina xwe jî heman hovîtîyê dike: “Çend caran menî li jina xwe girtin û rûyê vê yekê da kuta” (Destê Dê. 23).

Di vê derê de jî em dibînin li ser jinan serdestî û hovîtîyek mêran heye. Bi çî awayî be jî dîsa jin lêdanê dixwin û heqaret li wan tê kirin. Dayîk li vê derê, ji ber qîza xwe ji destê mêrê xwe lêdana dixwe. Di çîrokê de pergala baviksalarîyê di şexsîyeta Qero de tê rexnekirin. Lewra Qero di hişmendîya nivîskar de temsîliyeta jîyana berê ya berî Şoreşa Cotmehê dike.

Di çîroka “Serxweşî Dan Kê” de jî pergala baviksalarîyê li ser bavêkî hatiye kirin. Ozman piştî jina wî dimire hîn ciwan e û xwedîyê du zarokên piçûk e. Di çîrokê de tiştê ku derdikeve pêş vê carê jî dilsojîya mêrekî ye. Ozman mirovekî gundî û feqîr e. Piştî jina wî dimire ew her du zarên xwe xweyî dike. Lê her tim kurê xwe bi ser qîza xwe de digire. “Mêla bavê diha gelekî li ser kur bû, parîyê devê xwe dibirî

dida wî, kincên rind li wî fikir. Lewma Êsê êpêceyî rûstendî mezin bû.” (Destê Dê. 56).

Ozman di çîrokê de her çiqas weku bavekî dilşewat bê şayesandin jî, lê di navbeyna kur û qîza xwe de ferqîyetekê datîne. Kevanîtiya malê di wî temenê xwe yê piçûk de dikeve stûyê Letîfeyê. Lê em di çîrokê de lê rast nayên ka Êsêyê piçûk karekî dike yan na. “Letîfa qîza wî bûbû kevanîyeke biçûk, qaranîya malê tamam ketibû stûyê wî.” (Destê Dê. 56).

Êsê ew qas bi qîymet e heta zewaca Letîfê jî bi zewaca Êsê ve gîrêdayî ye. Heta ku Êsê nezewice ne mimkune ku Letîfe bizewice. Lewra divê ew peywira xwe ya kevanîyê bîne cih. “Hetanî ez Êsê xwe nezewicînim, bûkê neyînim mala xwe, qîza ez bidim mêr tune ye, - timî Ozman ew gilî dida destê xwezgînîyan.” (Destê Dê. 56).

Êsiv rola xwe ya kurîniyê bi cî nayîne. Ev yek jî ji Ozman re gelek giran tê lê belê Ozman vê yekê nayîne zimên. Ozman rewşa xwe ya tê de nade der, lewra naxwaze der û cîran pê bihesin. Rûyekî wî yê pederşahî heye û loma jî naxwaze kurê wî yê tayê tenê di nava civakê de rûreş bibe.

Car-carinan jî Êsê bi qestîkan wisa bilind-bilind xeber dida, weku bav bibihîze. Bavê dibihîst û di xwe de dişewitî. Ketibû orta du keviran, rê ji rêyan dervedixist. Teze ne cahilek e rabe para xwe jê bistîne, cihê bibe. Ji malê jî derkeve, here, kurê wî yê tayê tenê wê di nava der û cîranan de bibe oyn û sosret. Wê nebêjin, çawa rabû bavê xwe yê kal ji malê derxist? Di vê dereceyê de jî Ozman nedixwest leke bê ser navê kurê wî. (Destê Dê. 58).

Li nav civakên pederşah kur cihekî giring digirin. Ew di texeyûla civakên pederşahî de mîsogerîya paşeroja dê û bavan in. Lê ger em vegerin ser Êsê, em vê yekê di Êsê de nabînin. Êsê ji bo bav dibe dilşikestineke mezin. Ji ber ku Ozman hemû xeyala xwe li ser Êsê ava kirîye.

Êsê di çîrokê de her tim weku Êsê derbas dibe. Di kurdi da tîpê “ê” hem weku tewang derdikeve holê û hem jî ji bo şekirandina navan jî tê bikaranîn. Di vê

derê de jî navê lehengê çîrokê her tim weku Êsê derbas dibe. Êsê kurê Ozman yê bi tayê tenê ji alîyê bavê tê şekirandin. Her çiqas Ozman xwedîyê du zaran jî be meyla Ozman piranî li ser Êsê ye. Ji metna çîrokê de jî vêbejer rasterast tîne ziman: “Mêla bavê diha gelekî li ser kur bû, parîyê devê xwe dibirî dida wî, kincên rind li wî dikir.” (Destê Dê. 55-56).

Ji vê jî dîyar dibe nazdarê malê, nazdarê Ozman, Êsê ye. Jîyana wan piranî li ser Êsê hatîye sêwirandin. Xususîyeteke din ya Êsê jî, li hemberî hevjiîna xwe yekî neqenc e. Nebaşî û neqencîyên wî ne tenê li hember Ozman e, ew timî bi hin hincetên cuda cuda li hemberî jîna xwe jî tê xezebê. “Bûk jî ketibû nava êgir: Êsê ro nedida serî, dikuta.” (Destê Dê. 58).

Eslanê Kal di çîrokê de piştî mirina Ozman derdikeve û weku wijdana civakê tev digere. Eslanê Kal li ser mexberê Ozman gotinê hildide dest û der heqa Ozman de van gilîyan tîne ziman: “Gilîyek heye, ez ê bibêjim, dibe bi hinekan xweş neyê, lê wê bi Xweda xweş bê. Rast e, bi edetên cimeta me, wextên wiha serxweşîyê didin kur, lê, bi texmîna min, îro kurê Ozman jî pê re mirîye, ûrta Ozman qelîyaye. Lewma jî ez hêvî ji cimeta dikim tena serxweşîyê bidine qîza wî û zavayê wî, pêşewitîyê wî yê dinyayê tune ne.” (Destê Dê. 67). Eslanê kal di vê derê de ne tenê wijdana civakê temsîl dike, ew heman demê de di metnê de weku gotinên nivîskar in ku bi rêya Eslan ve hatine zimên. Ji gotinên Eslan yên jorîn jî kifş dibe di nava civakê de dahatûya malbatê li ser zaroka kur tê texeyûl kirin. Lewra piştî mirina Ozman li gorî Eslanê kal “ûrta Ozman qelîyaye” lê kirinên Letîfa qîza wî her çiqas bîhîstîkirin jî “ûrta” Ozman bi zarê kurîn ve tê ravekirin.

Di çîrokê de rexnekirina pergala û kevneşopîyên civaka bavîksalarî tê rexnekirin. Lewra Ozman di çîrokê de hemû şîyana xwe ve ji Letîfê zêdetir giringîyê dide Êsêyê kur. Di dawîya çîrokê de nivîskar meyla xwe ber bi Letîfêyê ve dibe û kevneşopîya bavîksalarî ji binî ve hildiweşîne. Bi mirina Ozman ve ev helwesta Ozman jî ji binî ve ji holê radibe. Em di gotinên Eslanê kal de vê yekê bi awayekî berbiçav dibînin (Destê Dê. 67).

Reftarên Nadirî yên di çîroka “Zengilê Bêwext” ya *Dengê Dilê* de şopên pederşahîyê dihewînin. Nadir û Hinar mêr û jinên hev in. Wek ji metna çîrokê dîyar dibe herdu leheng jî li derveyî malê xwedî kar in. Her çi qas herdu derve bixebitin jî kar û barên malê bi tevahî li ser milê Hinarê tîr rêvebirin. Her çiqas di çîrokên nivîskar de jin bi awayekî berbiçav hatibe îdealîzekirin jî, di têkilîyên mêr û jinan de bi helwesteke bavîksalarî nêzîkê jinê dibe. Di çîroka “Zengilê Bêwext” de jî ev yek xwe nîşan dide. Kar û barên malê û xwedîkirina zarokan weku karê jinê hatine nîşandan. Di çîrokê de piştî ku Nadir ji kar vedigere, di malê de, em tu karekî wî nabînin, hemû kar û xebata malê Hinar rêve dibe. “Hinar radibû, ber bi aşpêxanyê ve diçû, weku şîvê hazir bike. Nadir diçû ser dîwanê pal dida...” (Dengê Dil. 38).

3.1.1.4 Jin

Temayeke giring a di çîroknûsîya Emerîkê Serdar de jî meseleya jinê ye. Em dizanin di çîrokên Emerîkê Serdar de jin weku “dê/dayik” bi giringîyeke mezin cihê xwe girtîye. Lê belê meseleya jinê, mirov nikare tenê di çarçoveya dayîkê de rave bike. Jin ji gelek alîyan ve di çîrokên nivîskar de derdikevin pêş. Ji ber vê çendê ye jinên ji hev cihê di çîrokan de hatine vegotin. Lê gava em bi hûrgilî bala xwe bidin jinên leheng ên çîrokê Emerîkê Serdar, em jineke cîyawaz nabînin. Emerîkê Serdar jinê zêdetir di kesayetîya dayîktîyê de derdixe pêş. Ji ber vê çendê; ji bilî dayîkan em jineke cîyawaz di çîrokan de nabînin. Her çiqas nivîskar di bin bandora realîzma civakî de berhemên xwe avakiribin jî, ev weku taybetmendîyeke nivîskar derdikeve pêş. Li gorî nivîskarên serdema xwe, di çîroknûsîya Emerîkê Serdar de lehengeke jin a bihêz tune ye. Ew piranî jinên ji rêzê ne di warê jîyanê de bi hevîrûbûn û wekhevîya li gel mêran de jî paş ve dimînin. Ew di malê de, weku kevanî yan jî evîndarekî bêmîraz tîr şayesandî. Jin di çîrokên nivîskar de xwedîyê vînekî azad nînin. Nivîskar jinê di nava jîyana kurdan ya rojane de dide bicihkirin. Taybetmendîyeke cîyawaz di vegotina jinê de nayê derbirîn. Di çîrokan de ji bilî jina kurd hema bibêje em rastî jineke ji neteweyeke din nayên. Jin di bin zordestîya mêran de hatine vegêran.

Di çîroka “Name”yê de yek ji van jinan jî, Çîlê ye. Çîlê û vegêrê çîrokê her çiqas nehatibe ziman jî; ji hevdu hez dikin. Lê bavê Çîlê dema ku xwazgînîyê wê tîr

wê bêyî daxwaza wê dide mêr. Nerazîbûna Çîlê di çîrokê de wiha tê vegotin: “-Belkî Xwedê wî mirazî reş û heş bike, -Çîlê got, kesereke kûr rahişt, dîsa li çavên min nêrî.” (Destê Dê. 13).

Wek ku tê dîtîn biryara zewicandina Çîlê ne bi dilê wê ye. Lê ew nikare li ber vê yekê bisekine û li ber xwe bide. Çîlê mîna keseke xwenda û zîrek nehatîye şayesandin. Ew weku jineke jirêzê hatîye vegotin.

Di çîroka “Serhatîya Hûbekî” de jî em dîsa rastî evîndareke bêvîn tên. Sêvê û Keleş evînadarên hev in. Lê ji ber ku bavên wan dijminê hev in nikarin bigihêjin hevdu. Sêvê ji ber ku ji Keleş hez dike gelek caran ji alîyê bavê ve lêdanê dixwe. Lê li hemberî kirinên bavê xwe em rastî bertekeke Sêvê nayên. Ne tenê Sêvê dayîka Sêvê jî gelek caran ji alîyê mêrê xwe ve rastî lêdanê tê. Di çîrokê de ev yek wiha hatîye honandin: “Piştî vê cabê Qero qîz kutabû û daw kiribû, weku li xwe mikur bê. Sêvê dîsa înkâr kiribû, girîyabû, xwe avêtibû ser lingên bavê û sond xwaribû, weku tiştê wisa tune ye.” (Destê Dê. 22).

Sevê di vê derê de weku kesayetîyeke bêvîn tê şayesadnin. Tîrsa bavê di dil de ye û nikare vê tîrsê ji dilê xwe der bike. Ew, ji ber guvaşên bav û civakê nikare bi aşkera evîna xwe xwedî derbikeve.

Di çîroka “Dê” de Belga Êso her çiqas di dawîya çîrokê de weku jinxwasekê hatibe pênasekirin jî; ew jî di nava civakê de hatîye tepeserkirin. Zalim Paşa mirovekî nebaş û bi zilma xwe ve tirseke mezin dide derdora xwe. Belga Êso ji Mêrgesora Kurdistanê ye û Zalim Paşa çav berdayê û ji gundîyan daxwaza Belgayê dike. Gundî her çend ji vê yekê qayîl nebin jî bêçare dimînin. Lê di gotinên wan de hişmendîyeke paşverûtîyê jî tê dîtîn. Der heqê Belga Êso de, di dawîyê de wiha biryar didin: “Lê mêrêd gund î sere li ser fikreke mayîn bûn. Ewana rûniştin, bi hev şewirîn, dîtîn weku nabe seba qîzekê gundekî xerab bikin, gotin bila here, hilbet yazîya wê jî wisa bûye...” (Destê Dê. 43).

Li vir jî xuya dibe, gundîyên Mêrgesorê bi çavekî qurbanî li Belga Êso dinêrin. Li hemberî Zalim Paşa tu bertekekê nîşan nadin û vê yekê weku qedera Belga Êso pênase dikin. Gotina “seba qîzekê gundekî xerab bikin” gotineke pir tahl

e. Lewra di vir de qîz ne weku mirovekî weku amûrekî ji rêzê hatîye pênasikirin. Ev yek jî paşverûtiya civakê dide der. Belga jî li hember vê yekê di nava helwesteke êrenî û berxwedêr de nîne. Ew jî xwe dike qurbana gundîyan û bi peşnîyaza gundîyan qebûl dike. Belga qedera xwe, bi devê xwe wiha tîne ziman: “-Eger ji bo cimeta me, ji bo gundîyen me lazim be, ez ê şerbikê jarê jî veçînim. Bila ji bo min, gidîno, talî û tengî neyê serê cimetê, mêr neyên kuştin, zaro êtîm nemînin... Bila ez heta hetayê bizêrim, her tenê wê yekê li ber çavên xwe nebînim...” (Destê Dê. 43).

Belga Êso di vegotina nivîskar de her çiqas di rêya gundîyên xwe de weku jinxwasekê derkevê pêş jî di rastîyê de ew qurban e û tu rêyeke din ya xilasbûna wê jî ne dîyar e. Lewra Zalim Paşa, bi darê zorê dixwaze bibe mêrê wê. Ev jî bê vîna wê pêk tê. Belga her wisa çarenûsa gundîyan jê re tayîn kirî qebûl dike û di wê rêya tarî de dimeşe. Ev yek di nava civakên pederşahî û paşverû de tê dîtin.

Çîroka “Serxweşî Dane Kê?” de vegêr jîyana malbata Ozman vedibêje. Letîfe qîza Ozman e piştî mirina diya wê giranîya malê tim dikeve li ser milê wê û di temenkî piçûk de Letîfe dibe kevanîya malê. Kurekî Ozman jî heye; lê meyla bavê tim li ser kurê wî Êsê ye. “Letîfa qîza wî bûbû kevanîyeke biçûk, qaranîya mala tamam ketibû stûyê wî.” (Destê Dê. 56). Wek ku tê dîtin qedera Letîfê dîsa kevanîti ye. Ew di temenê xwe yê piçûk de li dewsa jineke temên mezin derdikeve pêş. Em dikarin bibêjin Letîfe ji alîyekî de jî qurbana Êsê ye. Lewra zewaca wê jî, bi ya Êsê ve girêdayî ye. Dema ku xwazgîniyê Letîfayê tîne bavê wê dibêje: “Hetanî ez Êsê xwe nezewicînim, bûkê neyînim mala xwe, qîza ez bidim mêr tune ye...” (Destê Dê. 56).

Xaleke giring ya çîrokê jî mirov dikare rewşa “bûk”ê ve rave bike. Lewra di çîrokê de bûka Ozman bê nav e. Ew tenê rola xwe ya bûkîniyê ve heye. Weku gelek jinên leheng yê çîrokên nivîskar bê nav e. Di derbarê wê de tu şayesandike taybet jî nîne.

Di çîrokên Emerîkê Serdar de jineke ku berbiçav û serleheng hema bibêje qet nayê dîyar. Ew di nava civakeke baviksalar de piranî li ser rola wan ya dayîkbûnê yan jî kevanîtiyê tîne pênasikirin. Wesfên wan bi kevanîtiyeke baş ve hatine

şayesandin. Jin, ji kesayetîya xwe ya zayendî dûr ketine û dayîkbûn tekane pêwendîya wan ya civakê ye. Jin di çîrokan de di temsîliyeta mexdûrîyeta şer de derdikevine pêş. Çavên wan tim li rê ne û hebûna wan li ser mêr yan jî li ser zarokên wan tê dîyarkirin. Jin bi kedkarîya xwe ya di malê de derdikevin pêş.

Yek ji van jinan jî di çîroka “Êdî Dereng Bû”yê de derdikeve pêş. Çîrok weku serpêhatîya nivîskar, dayîka nivîskar hatîye şayesandin. Dayîka ku mêrê wê beşdarî şer dibe hemû giranîya malê dikeve li ser milê wê. Tekanê pêwendî û hêvîya wê ya jîyanê li ser kurê wê hatîye şênberkirin. Ew di malê de kevanî û li derve jî malxwê mala xwe ye. Dayîka vegêr di heman demê de, li kolxozê jî weku karkerekê kar dike. Dayîk, di nava jîyaneke zor û zehmet de tê şayesandin. Wek di gelek çîrokan de hatîye dîyarkirin di vê çîrokê de jî navekî wê tune ye. Ew di çîrokê de bênav e û weku dayîka vegêr derdikeve pêşberî xwînêran.

Wek li jor jî hatîye dîyarkirin di çîroknûsîya Emerîkê Serdar de jin bi kesayetîya xwe ya zayendî qet nayên kifşê. Ew di çîrokan de weku “kulfet” yan jî weku “kevanî” tên şayesandin. Di çîrokên “Xerîbo” de Bekir dema qala hevjinê xwe dike; wê weku “kulfet” dide nîşan: “Bekîr got, - dibe kulfeta min tiştêkî mayîn bibe dilê xwe.” (Êdî Dereng Bû. 31).

Di çîroka “Dawet Nîvcî Ma” de qala dawetekê tê kirin. Di çîrokê de navê zava weku Keleş derbas dibe. Lê di çîrokê de navê jinê nayê hildan û ew tenê weku “bûk” tê wesifkirin. “Bûka rûbixêlî di ber perdeyê de tenê ma.” (Êdî Dereng Bû. 37).

Di çîroka “Zînê”de jî kulfetbûna jinê berdewam e. Di vê çîrokê de jî vegêr hevjinê xwe weku “kulfet” dide nasandin. Ev yek jî bi me dide nîşandan ku Emerîkê Serdar weku mêrekî kurd bi hişmendîyekî baviksalarî tevdigere. “Min got kulfeta xwe, weku ji me re qawê hazir bike.” (Êdî Dereng Bû. 62).

Di çîrokê de em rastî çarenûsa Zînê ya tehl tên. Zînê piştî ku hezkirîyê wê diçe leşkerîyê bi yekî din re dizewice. Mêrê wê yekî neqenc e û ji ber vê yekê jî tê û di mala bavê xwe de cih dibe. Lê bav her tim te’deyê lê dike û car bi caran jî lê dixê. “Û xaltîya min got, weku mêrê wê hemîn yekî quldir e, naxebite, bûye curm ketîyê

stûyê bavê xwe, hela bi ser de jî Zînê dikute, dizêrîne. Zînê di dest de rojek xweş nedîtîye.” (Êdî Dereng Bû. 65).

Di çîroka “Tirsê” ya *Dengê Dil* de jî şayesandinên nivîskar bi derdora mêran diçe û tê. Çîrok bi rengekî mêrane dest pê dike. Hawirdor hawirdoreke mêrane ye. Hevoka pêşîn ku dibêje: “Di odeya Apê Cîmşîd de mêr tijî bûbûn” (*Dengê Dil*. 9). Valabûna cihê jinê di civatên kurdan de bi aşkerayî nîşan dide. Bêguman di malê de jin jî hebûne. Lê her çawa ku mirov di berdewamîya çîrokê de pê dihesê, piranî jin li qada jêr, li odeyên taybet an jî li pêjgehê kom dibûn û guh didan civatê. Di berdewamîya vê çîrokê de jî mirov carekê navê jinê an jinan nabihîse.

Di çîrokên nivîskar yê vegotina piştî Şoreşê Cotmehê de jî rola jinê naguhêre. Ew her çiqas xwenda û di derve de xebatkar bin jî; dîsa di malê de di şiklê kevanîtîyê de derdikevin pêşberî me. Di çîroka “Zengilê Bêwext” de Hinar û Nadirî mêr û jinên hev in û herdu jî li derve xebatkar in. Lê di malê de revebirina malê piranî li ser Hinarê tê vegotin. Nadirî piştî ku ji kar vedigere karekî nake û vedizele. Ev yek di çîrokê de ji alîyê vegêr ve wiha tê vegotin: “Hinar radîbû, ber bi aşpêjxaneyê ve diçû, weku şîvê hazir bike. Nadir diçû ser dîwanê pal dida...” (*Dengê Dil*. 38).

Di çîrokan de ne tenê navê jinan hi caran dengê wan jî nayê dîtin. Jinan di nava jîyanekê baviksalar de dengê xwe jî wenda kirine. Nivîskar rewşa jinê li gorî jîyana serdema xwe di çîrokan de derdibire. Ev yek di çîroka “Neheqî Erdê Nema” ya Gundê Me de li ser jîyanekê bûkî tê derbirîn. Zaroka bûka nûciwan ji alîyê dizan ve hatiye kuştin û bûk di vî halî de jî nikare dengê xwe bilind bike yan jî bersivê bide. Nivîskar vê yekê jî di çîrokê de aşkera vedibêje: “Bûka belengaz bû pepûk. Ne pakî girî pê dibû, nê jî dikaribû dengê bilind bibêje û xwe, derd-kulara bilûbîne. (Bûka salekê bû, îzna wê û xeberdanê tunebû)” (*Gundê Me*. 26).

Wek ku tê zanîn bi Şoreşa Sovyetê ve jin destkeftîyên mezin bi dest dixin. Jin di dibistanan de dibin xwendekar û her wiha jî pêşengîya civakê dikin. Di jîyanekê hevpar de bi mêran re dijîn. Wek nivîskarekî serdema Sovyetê Emerîkê Serdar di

meseleya jinê de ji rêgezên realîzma civakî dûr sekinîye û lehengên xwe yên jin, ji jîyana kurdan ya wê serdemê bijartine.

3.1.1.5 Feqîrî

Emerîkê Serdar weku kesayet di malbatekî feqîr de hatîye dinyayê. Zarokatîya nivîskar rastî şerê cîhanê yê duyemîn tê û şer bi awayekî neyînî bandor li malbata wî jî dike. Di sala 1941ê de bav û apê nivîskar bi tevayî diçin şer û malbat bê xweyî dimîne. Piştî ku bavê nivîskar û apê wî dibin şer malbat nikare tevdîra xwe ya zivistana pêk bîne. Malbat di vê demê de xwedîyê 20-30 pezî ye. Ji ber ku tevdîra zivistanê nedîtine gundî qîrar didin weku pezê gund ber bi deştê ve bişînin da ku zivistanê bikaribin li wir xwedî bikin. Lê biharê ji deştê tenê 5-6 pez vedigerin ber deriyê malbata nivîskar. Pezê wan gişk qir dibe. Ev yek jî neyînîyeke din li ser nivîskar dike (Serdar, 2018a: 68-69). Ne tenê malbata nivîskar li derdorê feqîrîyek mezin heye. Ji ber nebûna xwarinê gundîyên Sovyetê yên belengaz gîhayê (pincar) çolê berhev dikin û bi vê yekê ve birçîbûna xwe dişkênin. Ev hema bibêje di seranserê bîranînên nivîskar da xwe dide der. “Digotin, derbiharê, wexta nancûcîk şîn dibû, gundîyan berhev dikir, hebek şîr an jî di nava avê da dikelandin, weku bixwin.” (Serdar, 2018a: 91).

Feqîrî hem di jîyana nivîskar de hem jî di çîrokên nivîskar de bi awayekî berbiçav tê dîtîn. Şer û bandora wî di vê feqîrîyê de mîna hokara herî sereke derdikeve pêş. Şopên jîyana feqîrîyê di hemû berhemên nivîskar de xwe didin der. Feqîrî di çîrokan de, li ser şiklê xaniyan, kincên zarokan û hebûna malê de derdikeve pêşberî xwîneran.

Di çîroka “Em Çûne Aş” de vegêr bi awayekî îronîk rewşa paltoyê Aqoyê Xalid wiha dide der: “Bi rastî jî potê wisa tune bû, te têlke jê bikişanda, wê hezar pîne jê biketana.” (Destê Dê: 70). Aqoyê Xalid her çend demekê fenanî brîgadirê kolxozê bê nîşandan jî, pir feqîr e. Paltoyê wî hemû bi pîneyan ve hatine ciwandin.

Di çîroka “Êdî Dereng Bû” de nivîskar feqîrîyê li ser rewşa zarokan derdibire. Vegêrê çîrokê zarokek e û rewşa xwe û ya hevalên xwe berawird dike. Lewra di lingên hevalên wî de sol in; lê ew bi çarixan ve digere. “Li min dinêrî, weku kincên

min ne mînanî kincên hevalê min rind in, ew kaloşan û solan pê dikin, lê di lingên min de çarix in. Ê ez li ber xwe diketim, di xwe de dişewitîm.” (Êdî Dereng Bû. 39).

Feqîrî ne tenê li ser kincên lehengê piçûk her wiha di malê de jî xwe dide der. Pez mezê wan tune ne û ji ber vê yekê jî sotina xwe ya zivistanê jî li çolê berhev dikin. “...Heywanên me tune bûn. De, di gundê çîyê de heywane kê tune be, ardûyê wan jî tune ye. (di gundê me de wê çaxê ardû her tenê sergîn bû). Ez û diya xwe diçûn, me li çolê pêsarî top dikirin.” (Êdî Dereng Bû. 39). Feqîrî, li ser şiklê xaniyan jî xwe dide nîşandan. Xanî mîna xirbeyan in. Bê pencere û tarî ne. “ malên gundê me binerd î biçûk bûn. Dîwarên wan bi kevirên gicûce bûn. Ronkayî di kulekê re diketê... Êvarê çiraya neftê vêdixistin. Hetanî sibêyê dûyê wê di hindur de dibû telp û gava neferên malê sibeyê radibûn, serçavê wan di tenîyê de dima.” (Êdî Dereng Bû. 50).

Rewşa gundîyan ew qasî giran e ku di gund de dizîya sergînan jî tê kirin. “Her tim kelb li ber qelaxan girê didan, weku neyêne dizîya sergînen wan.” (Êdî Dereng Bû. 50).

Di çîroka “Rasthatin”ê de jî feqîrî li ser dayîk û qîza wê tê vegotin. Feqîrî hemû çetiniya xwe ve di vê çîrokê de jî dide der. Dê û qîz di nava şert û mercên zor û zehmet de jîyana xwe didomînin. Xwarina wan a heyî jî bermahîyên li ber dev û destên dewletîyê wan e. Ew ne di rewşa feqîrîyê de di rewşeke birçîbûnê de tên şayesandin. Destxistina xwarin û vexwarinê jî bi zehmet e:

Carên wiha li malê ew birçî dima hetanî hatina dê. Çavên wê her tim li rê bû, çi ka dê wê kîngê vegere û gelo tiştekî bi xwe re bîne an na. Wexta xwarin hindik bûya, dê nedixwar didayê, ew dixapand, weku giva li wê derê xariye, lewma têr e, nikare bixwe. Wê çend caran dît, wexta êvarê dê piştî xwe vedikir, kevir ji ber piştê diketin. (Êdî Dereng Bû. 93).

Wek ku ji metnê jî dîyar dibe ew di nava rewşeke pir trajîk de tên şayesandin. Xwarin her tenê ew e ku dayîk êvarê bi xwe ra tîne û têra herduyan jî nake. Dê û qîz xwedîyê tiştekî nînin. Ne xaniyekî wan heye û ne jî raxistina nava xênî. Em dibînin ku dê û qîz di merekekê (kadîn) de dimînin. Ne xwedîyê kincekî germ in ne jî

xwedîyê nivînekî ne. “Merek e vikevala bû. Bi pakî nivînên wan jî tune bûn. Jina dewletî du cilikên kevn dabûn. Êvarê yek li bin xwe radixistin, yek jî diavêtin ser xwe, dê qîz dida ber sînga xwe, hev du germ dikirin û radizan.”(Êdî Dereng Bû.93).

Di çîroka “Guman” de feqîrî bi devê zarokeke piçûk ve tê vegêran. Feqîrî di vê çîrokê de bi bandora şer ve tê girêdan. Nivîskar bi çavê zarokê feqîrî û hejarîya malbatê û derdora wan dişayesîne. Di çîrokên Emerîkê Serdar de tiştêkî balkêş jî ew e ku gundî pirî caran ji bona dabînkirina aborîya xwe diçin bajêr û weku karker dixebitin. Ev bajêr jî piranî Tbîlîs (Tiflîs) e. Di çîroka “Guman”ê de jî apê vegeêrê çîrokê piştî ku kar û barên gund diqede rê dikeve û diçe bajarê Tiflîsê kar dike. Gundî piranî havînan li gund, zivistanan jî di bajêr de dixebitin. “Apê min serpayîzê diçû Tbîlîsîyê, çend mehan dixebitî, ji malê re hebek tişt-mişt dikirîn, dihat” (Dengê Dil. 21).

Di çîrokê de em dibînin dişa li şûna solan zarokê piçûk çarixan pê dike. Di rojî girtinê de jî em rastî xwarineke taybet nayên her tenê xwarina wan mast û qeysî ne. “Di rojîyê de paşîva me ew mast bu, ku diya min payîzê girtibû, rûn helandibû, berî ser devê dîzê dabû û hildabû ji bo rojîyê. Şîva me jî qeysî bûn. Wê payîzê qeysî anibûn gund bi ceh re guherîbûn. Diya min du elb ceh dabûn hebek qeysî kirîbû veşartîbû ji bo rojîyê.” (Dengê Dil. 21-22).

Zarok bi çavekî hisret rêya apê xwe raçav dike. Raçavkirina zarok ne ku ji ber hisreta apê wî ye ew li benda hin xwarinên cuda ye. Çîrok bi şayesandinên feqîrîyê ve hatîye honandin. “Wan salan nangiranî bû, arvan î kêr bû. Lewma jî kevanîyan dianîn bi beroşan kartol dikelandin, spî dikirin, dikirin dogeçik, rind dikutan, hûr dikirin û dikirin nava hevîr ji bo ar kêr here, lê nan gelek be..” (Dengê Dil. 22-23).

Feqîrî li ser jîyana mirovan neyînîyekî mezin ava dike. Di çîrokê de jî li ser vegeêrê çîrokê ev hêsanî tê dîtin. Dema ku apê vegêr ji bajêr vedigere, ji malê re hin hûr mûran tîne û ji ber ku giran in hinekî ji wan di rê de dihele. Dema vegêr digihîje wan tiştan nikare hilde bibe. Li ber wan disekine. Dema ku rêwî tîrsek li cem vegêr peyda dibe; ew ditirse dê tiştên wî jê bistînin. Vegêrê piçûk mirina xwe dide ber çavên xwe lê ji dest dayîna tiştên xwe hîç di aqilê xwe de derbas nake.

Ez tirsîyam, weku wê bên, pişto ji min bistînin. Lewma min pişto kaş kir, bir pişt zinêr li ber rûniştim. Min çend kevir jî girtine destê xwe, weku wexta bi ser min de bên, ez wan bidim ber keviran. Min qirar kiribû; an gotî kuştina min be, an jî gereke pişto nedim wan. Ancax ebûrek ketîye destê me, rabim wisa ji destê xwe berdim? Xuşûşî di dilê min de ez di taldeya zinêr de mam hetanî ewana çûn di nepenîyê de winda bûn, qe li alîyê min û pişto jî nenêrîn. (Dengê Dil. 25).

Di çîroka “Zewaca Elo” de, feqîrî li ser lehengê çîrokê Elo tê şayesandin. Elo û malbata xwe di nava feqîrîyekî nedîtî de dijîn. Ji xwe Elo jî tu karekî nake. Tenê karê wî ew e dema pez tê nava gund diçe çend bizinên xwe tîne li derdora xanî girê dide. Ji ber tirêqbûna Elo derdor dîsa qîmetê didê û xêr mêrên xwe didin Elo. Elo û dayîka xwe kincên mirîyan li xwe dikin ji bîlî wê lixwekireneke wan tune ye. Ji ber feqîrîya wan heqê bizinên wan yê şivantîyê jî ji wan nayê stendin. Şewata mala wan bi sergînan pêk tê. Xanîyê Elo dîsa xanîyekî xirbe û binerd e. Tu dirûvên xanî lê nakevin. “Xanîyê wan binerd bû, diha rast ji sê alîyan de dîwar nedihatî kîvşê, ew û erdê li dorê weku hev bûn. Loma jî wexta Elo an Şênî hildikişîyan ser xênî, tu pêpelîng ne lazim bûn.” (Hisreta Emir. 104).

3.1.1.6 Dîn

Emerîkê Serdar nivîskarekî kurd û êzîdî ye. Di gundekî êzîdîyan de hatîye dinyayê û ev yek di çîroknûsîya wî de jî xwe dide der. Di çîrokên nivîskar de her çiqas serdestîyek ji vegotina dîne êzîdîtîyê neyê dîtin jî; di hin metnên çîrokan de em şopên bawerîya êzîdîyê dibînin. Ev yek di hin rojên taybet de, rîtûelên veşartina mirîyan û her wiha hin şîn û şahîyan de derdikeve pêş.

Di çîroka “Serhatîya Hubekî” de qala şêxekî êzîdîyan tê kirin. Sêvê ku ji xewê şîyar nebûye û li gorî malbat û gundîyan mirîye, li ser şînek hatîye girêdan. Di vê derê de Şêx dest bi axaftinê dike û dixwaze dilê malbatê hêsa bike. “Mirîdê min, sebra xwe bîne, li serê kuran,, bira û pismaman binêre-şêx bi ber dilê bavê de dihat. – Xwedayê min ji we zaftir jê hez kir, mirina wiha cinetî ye.” (Destê Dê.27).

Piştî mirina lehenga çîrokê Sêvê, şêx di ber dilê bavê wê de diçe. Dîn di vê çîrokê de bi kesayetîya şêxê êzîdî de, bi awayekî baş hatîye nîşandan. Di çîrokê de

şêx, şêxê êzîdîyan e. Piranî di edebîyata Sovyetan de weku ku em dibînin oldarî ji ber fikra sosyalîzmê zêde nayê pejirandin û gelek caran jî bi awayekî neyînî tê de cih digire. Lê di vê çîrokê de bereksê vê helwestê li dijberîya dîn û dîndarîyê; helwesteke nivîskar ya neyînî em nabînin. Şêx mirovên derdora xwe bi peyva “mirîdê min” ve pêname dike. Di çîrokê de bersiva mirovên derdorê jî weku şêxê min e. Û em di çîrokê de dibînin ku gundî bi rêzdarî li ber şêx disekinin. Hin şayesandinên ku nivîskar di çîrokê de dide pêş jî şopên dîne êzîdîyê dide nîşandan. Nivîskar dema behsa hilatîna rojê û destpêka sibê dike vê yekê wiha dişayesîne: “Bi nedîrdayîna Şems re behsa der heqa mirîna Sêvê di temamîya gund de belav bû...” (Destê Dê. 27). Ji vê hevoka jêgirtî jî kifş dibe ku nivîskar hilatîna rojê bi awayekî rîtûelî vedibêje û tîpa ewil a “Şems”ê jî bi mezin dinivîse.²³ Ev yek jî di dîne êzîdîyê de giringîya rojê dide pêş. Lewra Êzîdî, weku ku tê zanîn li hemberî rojê bi rêzdarî tevdigerin.

Em di çîroka “Namebir” de rastî rîtûeleke serjêkirina qurbanê tên. Dema ku kurê Xezalê Şamil, ji leşkerîyê nameyê dişîne. Dîya wî Xezalê jê re qurbanekî serjê dike. Lê serjêkirina qurbanê li gorî dîne êzîdîyan pêk tê. Lewra di serjêkirina qurbanê de serê qurbanê ber bi rojê ve dîkin. Ev yek di çîrokê de wiha hatîye şayesandin: “Wî û Xezalê ancax mozîk avêtin erdê, berê wê bi rojê de kirin.. Xezalê bi lingên wê girtin, Temo kêr da ser stû. Bû fişîna xwînê, avet. Xezalê lingên mozîkê berdan, bilez çû hindur malê, şiklê kur ji jor de anî, derxist derve, destê xwe di xwînê de kir û li enîya şiklê Şamil xist. Qurbana Şamil li heft malan belav kir...” (Destê Dê. 12).

Di çîroka “Guman”ê de jî bawerîya rojîya êzîdîyê tê vegotin. Vegêrê çîrokê bi bawerî û rêzdarî qala van rojan dike. Di van rojan de ji bona xêra mirîyên xwe ji malê tiştên xwarin û vexwarinê tên derxistin û belavkirin. “Wê salê jî apê min çû şêher. Her tim hetanî Rojîya Êzdî dihat, wekî, çawa diya min digot, di wan rojên ezîz de tiştek hebe bi xêra mirîyan derxin. Lê vê salê apê min di Rojîya Êzdî de nehat. Cab kiribû, weku tiştêkî pak neketîye dêst, lewma nikare bê.” (Dengê Dil. 21).

²³ Li cem Êzîdîyan Şems (Roj) tiştêkî pîroz e. Lewra Êzîdî rojê weku qubleta xwe dibînin. Ji ber vê yekê Şems ji aliyê Êzîdîyan ve tê hebandin û Êzîdî li ser Şemsê sond dixwin. Di dema dua kirinê da Êzîdî berê xwe ber bi rojê ve vedigerînin û bi wî awayî duayên xwe dîkin. Êzîdî mirîyên xwe jî li gorî rojê vedişêrin. Di dema veşartina mirîyan da berê wan didin rojhilat. (bnr. Tosîne Reşîd, **Ezîdîyatî Oleke Hê Jî Nenaskirî**, Lîs, Dîyarbakir, 2010: 47)

Wek ku tê dîtî Rojîya Êzîdî, di nava êzîdîyan de weku rojên “ezîz” tên pênasekirin. Mirovên wan yên derveyî malê jî, bi taybetî ji bo van rojan li wan vedigerin û rojîyên xwe bi hev re diborînin. Amedekarîyên vê rojîyê di nava civakê de, ji berê de tên kirin di metna çîrokê de jî vegêr amadekarîyên diya xwe wiha vedigerîne:

Di rojîyê de paşîva me ew mast bû, ku diya min payîzê girtibû, rûn helandibû, berî ser devê dîzê dabû û hildabû ji bo rojîyê. Şîva me jî qeysî bûn. Wê payîzê qeysî anîbûn gund û bi ceh re guherîbûn. Diya min du elb ceh dabû hebek qeysî kirîbû, veşartibû ji bo rojîyê. Di her sê rojên rojîyê de nanê mirîyên me qeysî bûn. Her carekî diya min nanê mirîyan dibire malekê. Cîranan jî nanê mirîyan dianîne mala me. (Dengê Dil. 22).

Wek ku ji metna çîrokê jî dîyar dibe rîtuêlên dînê êzîdîtîyê bi awayekî zindî di nava civakê da tên jîyîn. Vegêr jî bi awayekî hûrgilî qala van rojîyan dike. Nanê mirîyan ji malekî ber bi malekî ve di nava gund da digere. Rojîya Êzîdî weku sê roj hatine dîyarkirin.²⁴

Di çîroka “Dengê Dil” de şopa dînê êzîdîtîyê di duayekê de xwe dide der. Dema ku Gulê di trêne de êşên welidîne tênê û wê rêdixin ji bo nexweşxaneyê; jineke temenmezin destê xwe dide ser milê Gulê û jê re duayan dike: “De, here, qîza min, bila Xatûna Ferxan bi hewara te bê.” (Dengê Dil. 110). Xatûna Ferxan jî yek ji bawerîyên dînê êzîdîtîyê ye. Li gorî bawerîyê Xatûna Ferxan dema ku zarok dibin wan ji nebaşîyan diparêze. Zarok heta dibine çil rojî Xatûna Ferxan wan diparêze.

Şopên bawerîya dînê êzîdîtîyê di çîroka “Zewaca Elo” de jî tên dîtî. Elo di vê çîrokê de weku “tirêq”ê êzîdîyan tê pênasekirin. Di gund de malbata Elo weku “ocax” tê naskirin û qedirkirin. Di çîrokê de her wiha tirêq²⁵, ocax,²⁶ û rojîya

²⁴ Rojîya Êzîdî di nava êzîdîyan da ne mînanî hev e. Hin deveran diguhere. Di nava êzîdîyên sovyetê da Rojîya Êzîdî weku rojên sêşem, çarşem û pêncşemê tê girtin û roja îne jî weku cejn tê pîrozkirin. (Eskerê Boyik, **Êzîdî û Bawerîya Wan**, Sîtav, Van, 2021.

²⁵ Peyva “tirêq” di nava êzîdîyên Ermenistanê de ji bona Şêx û Pîran tê bikaranîn. Tirêq weku mirovên ruhanî tên dîtî.

²⁶ Di nava êzîdîyan da malên şêx û pîran weku “ocax” tên binavkirin û ji ber vê çendê jî ev mal bi pîrozîya xwe ve ji malê gund cihê dibin. (bnr. Tosinê Reşîd, **Ezdiyatî Oleke Hê Jî Nenaskirî**, Lîs, Dîyarbakir, 2010: 47)

Xidirnebî²⁷ weku şopên bawerîyên dînê êzîdîye ne ku di çîrokê da cih girtine. Elo ku piştî bavê wî dimire ew û dayîka xwe û seyê wan Rindê bi hev re dijîn. Elo ne di malê de ne jî di gund de karekî nake ji bilî mijulahîya çend bizinan. Elo piranî aborîya mala xwe ji nava mirîdên xwe top dike û bi wê jîyana xwe bi rê ve dibe. Di çîrokê de Rojîya Xidirnebî bi van rîtûelan vê tê pênasekirin: “Wexta rojîya Xidirnebî wan li ser stûna nêzîkî tendûrê bi ar şiklê pêz û şivanan lê dikirin...” (Hisreta Emir. 103).

Rojîya Xidirnebî jî di nava civaka êzîdîyan de xwedîyê taybetmendîyekê ye. Şiklê pez û şivanan ji bona bereketa salê tîrê çêkirin. Malbata Elo di nava gund de weku “ocax” tê naskirin. Ji ber vê çendê jî ji alîyê gundîyan ve tê qedirandin. Elo ji ber ku ji ocaxê ye dema ku gundî mirîyên xwe dispêrin axê Elo wê merasîmê pêk tîne. Lê Elo her çiqas tirêq be jî, qewl û beytên dînê êzîdîyê nizane.

Bawerîyek din jî ya ku di çîrokê de derdikeve pêş nexwarina keleman e. Ji metna çîrokê de em dibînin gundîyên jirêzê ji bona zivistana xwe keleman dikirin; lê Elo ji ber ku tirêq e nikare keleman bikire lewra xwarina keleman jê re qedexe ye. Ev yek bi devê vegêr di çîrokê de wiha tê vegêran: “Payîza dereng Elo bi çend cîranan re tevayî bi erebeyê diçû gundêd ermenîyan ên cîran. Wan kelem dikirîn, lê Elo, çawa tirêq, îzîna wî tune bû keleman bixwe, tivirê reş û gizêr dikirîn...” (Hisreta Emir. 105-106).

Taybetmendîyek din jî ew e ku dema mirîyekî êzîdîyan çêdibe ew tekez divê çend pezan serjê bikin û ji bona xêra mirîyê xwe belav bikin. Elo jî piştî dayîka wî dimire wan çend bizinên xwe serjê dike û di nava gund de belav dike. Dîsa di çîrokê de em dibînin ku dema Êzîdî dua dikin berê xwe vedigerînin rojê û bi wî awayî dua dikin. Roj dema ku di pêwendîya dînî de bê bikaranîn weku “Şems” tê binavkirin. Di

²⁷ Rojîya Xidirnebî yan jî eyda Xidirnebî ji hêla êzîdîyên Ermenistanê ve rojên pîroz tîrê pênasekirin. Êzîdî rojên sêşem, çarşem û pêncşemê rojîya Xidirnebî digirin û roja îne jî eyda Xidirnebî ye. Ev rojî li ser hemû êzîdîyan ferz nînin. Tenê yê navê wan Xidir û Îlyas in ferz e. Hinek taybetmendîyên van rojan hene. Di van rojan da Êzîdî sabûn, şe û derzîyê bikar mayînin. Lewra li gorî bawerîya wan ger sabûn bê bikaranîn wê li ser rêya hespê Xidirnebî cemed çêbibe û hespê Xidirnebî ser bişemite. Şe ji dê li ser rêya Xidirnebî daristan şîn be û derzî jî wê li ser rêya Xidirnebî sitirîyan şîn bike. (Bnr. Eskerê Boyik, **Êzîdî û Bawerîya Wan**, Van, Sîtav 2021-83-84)

rêwîtiyekî Elo de ev yek wiha tê vegêran: “Berê xwe bi Şems de kir, dua li rêya xwe kir û berjêr bû...” (Hisreta Emir. 117).

Di çîrokê de bawerîyek din jî ew e ku mirov li dinya dinê ji alîyê Mîr ve tên darizandin. Mirîd, ji ber kirinên xwe yên vê dinyayê berpirsîyar e. Em vê yekê jî di çîrokê de, ji devê jineke temenmezin dibihîsin: “Bê guneh nîn e, tu wisa tîni serî, mêrikê belengaz talan dikî. Tu yê li wê dinyayê çawa caba mîrê xwe bidî. – Jineke pîr got.” (Hisreta Emir. 115).

Di bawerîya êzîdîyan de mirovên êzîdî tev mirîd in. Lê Pîr, Şêx û Mîr weku mirovên ruhanî ne him di vê dinyayê de him jî piştî mirinê li ser mirîdên xwe xwedî maf in. Helwesta nivîskar ya der heqê dîn û pêşengên dînê de bêalî ye. Lê di hin cihan de jî wan di rewşeke îronîk de vedibêje. Nivîskar di çîroka “Awazê Gundê Me” de rewşa qewalên êzîdîyan wiha rave dike: “Got wexta qewal dihatin, nediçûn malên şêx û pîran, lê dibûn mêvanê xwedîyê wan her du otaxan. (Qewal jî zanin bibin mêvanên kê!).” (Êdî Dereng Bû: 52).

Di çîrokê de behsa du otaxan tê kirin ku ev otax bi şiklê xwe ve ji xênîyên din xweşiktir û paqijtir in. Ev otax bi pencere ne û nava wan jî tim ronahî bûye. Ji ber vê paqijî û bedewîya xwe qewalan jî xwe li wê malê girtine û li wan xanîyan bûne mêvan.

3.2 TEMAYÊN POLÎTÎK

3.2.1 Şer

Vegotina şer û karîgerîya wê ya li ser civakê ji heyamên berê heta niha her tim mijareke popûler bûye. Mijara şer di berhemên edebî yên devkî û hunerî de jî ji alîyê nivîskaran ve weku babet hatîye hilbijartin. Şer, di serdemeke dirêj de di çarçoveya serfirazî û lehengîyê de hatîye vegotin. Şer, her wiha bûye mijara destanan jî. Di edebîyata cîhanê de Îlyada û Odysseia yek ji van berheman e, ku ji alîyê Homeros ve bi awayekî helbestî li ser şerê Truvayê hatine honandin (Alexander: 2014: 21). Di destanan de; zimanekî epîk hatîye bikaranîn û bûyer rasterast ji qada şer hatine vegêran. Şer di van vegêranan de piranî bi çavê lehengên şer yan jî bi çavê serdestan hatîye veguhaztin. Gelek mînakên destanan di edebîyata kurdî de jî hene.

Mirov dikare destana Kerr û Kulik, Dewreşê Evdî²⁸ di edebîyata kurdî de weku mînakên vegotina şer bide nîşandan. Şer, di edebîyata kurdî de, di tradîsyona dengbêjîyê de jî gelek mînanan dihevine. Di tradîsyona dengbêjîyê de şerê Filîtê Quto, Bişarê Çeto û Ferzende Beg²⁹ jî van mînanan in. Lê piştî wextan ev yek guherîne û şer bi hemû karesata xwe ve di nava edebîyatê de hatîye honandin. Yek ji sedema vê guherînê jî, guherînên teknîkî yên şerî ne. Lewra di şer de êdî enîyên şer jî guherîne û ne tenê mirovên leşker mirovên li pişt enîya şer, yên sîvîl jî bi şer re, bi karîgerîya şerî re rûbirû dimînin. Piştî vê yekê jî di edebîyata de vegotina şer bi awayên mijarên xwe ve, ji alîyê nivîskar û lêkolanan ve hatîye dabeşkirin. Ev yek di edebîyatê de jî weku “edebîyata şerî” hatîye pênasekirin. M. Kayahan Özgül li gorî nasnameya nivîskar û mijara metnê; babetê li ser çar beşan dabeş dike. Li gorî Özgül, babeta şer di edebîyatê de mirov dikare weku “Edebîyata Leşkerî”, “Edebîyata Enîyê”, “Edebîyata Paşenîyê” û “Edebîyata Piştî Şer” pênase bike. (Özgül, 2013: 5-6)

Ger li gorî tesnîfa Kayahan Özgül em binêrin çîrokên Emerîkê Serdar jî mirov dikare dibin “Edebîyata Paşenîyê” û “Edebîyata Piştî Şer” de binirxîne. Lewra di çîrokên Emerîkê Serdar de temaya herî sereke vegotina şer e. Emerîkê Serdar weku ku tê zanîn li Ermenîstana Sovyetê jî dayîk bûye. Sovyet jî di şerê cîhanê yê duyemîn de li hemberî Almaniyayê beşdarî şer bûye. Şop û karesatên şer di hemû waran de li Sovyetan xwe dide pêş. Her wiha di edebîyata Sovyetê de jî şer dibe temayeke sereke.

Em şopên Şerê Cîhanê yê Duyemîn di edebîyata kurdî de jî dibînin. Emerîkê Serdar jî yek ji van nivîskaran e ku di berhemên xwe de bi hûrgilî qala vî şerî dike. Emerîkê Serdar bi çavekî derveyî li vî şerê nanêre. Ew, bixwe mexdûr û şahidê vî şerî ye. Bavê nivîskar Derwêşê Serdar di nava refên artêşa sor de tev li şerê cîhanê bûye û di şer de jî şehîd dibe (Serdar, 2018a: 66) Di heman demê de Apê nivîskar Hemîd jî diçe leşkerîyê û malbat bi dê û zarokekî heft salî û pîre dayîkekê ve bê xweyî dimîne. Emerîkê piçûk vê yekê rasterast bi çavê zarokekî dibîne. Piştî çûyîna

²⁸ Bnr. Şerefhan Cizîrî, *Edebîyata Devkî û Şer*, Weşanên Lîs, Dîyarbakır: 2020.

²⁹ Bnr. Salih Kevirbirî, *Filîtê Qotu: yirmi olay yirmi kılam*, çev. Mazlum Doğan, (2. Baskı) Evrensel Basın Yayın, İstanbul, 2013.

bav malbat di nava xemgînîyeke mezin de dimîne. Feqîrî, tunebûn û hisreta bav di van salan de dibe çarenûsa nivîskar.

Şerê Cîhanê yê Duyemîn di Berhemên Emerîkê Serdar, ên bi navê *Destê Dê, Êdî Dereng Bû, Dengê Dil û Hisreta Emir* de weku babeteke sereke derdikeve pêş. Zarokên sêwî, jinên bî û dayîkên çavên wan li rêya kurên wan weku lehengên sereke hatine şayesandin. Şerî her tişt nivco hiştîye. Gund di nava bêdengîyeke mezin de mane. Dawet nîvco mane û dengê def û zurneyê ji gund û bajaran yekcar hatîye birîn. Di şûna dengê def û zurneyê dengê gule û bombeyan girtîye. Bûkên ciwan di malê de çavên wan li rêya dergistîyan sal borandine. Şer evîndaran, bav û kuran, jin û mêran ji hev vediqetîne. Şer bi birînên xedar ve xwe di nava civakê de dide der. Di çîrokan de em şerê diqewime; carinan bi devê zarokekî û carinan jî bi çavê dayîkekê dibînin û dibihîsin.

Nivîskar di çîrokan de sehneyên li enîya şer kêr caran dide pêş. Nivîskar piranî sehneyên pişt enîya şer dide nîşandan. Şer li deverêke dûr diqewime lê bandora xwe ya herî giran li pişt enîya şer dide nîşandan. Şer, bi karîgerîya xwe ve li ser dêrûnî û bedena mirovan şopên xwe dihêle. Leşkerên jî enîyê seqet vegeyîyayî û dayîkên çavên wan li rêya çûyîyên wan in, di van çîrokan de hatine şayesandin.

Şer di çîrokên Emerîkê Serdar de ne tenê Şerê Cîhanê yê Duyemîn e. Ew di çîrokên xwe de bi her awayî jîyana kurdan ya sedsala bîstan radixe ber çavan. Ji bilî Şerê Cîhanê yê Duyemîn, rev û qirkirina kurdên êzîdî jî di çîrokan de hatine vegêran. Pevçûnên navbeyna dewleta Osmanî û ermenîyan de jî di çîrokan de cihê xwe girtîye. Li gorî nivîskarên wê serdemê di çîroknûsîya Emerîkê Serdar de temayeke din jî şerê Pêşmergeyan e. Nivîskar di hin çîrokên xwe de şerê kurdên başûr û dewleta Iraqê jî weku babet kirîye mijara çîrokên xwe. Şerên navbeyna eşîrên kurdan jî dîsa weku tema di nava çîroknûsîya Emerîkê Serdar de hatine sêwirandin.

Em ê di çîrokên Emerîkê Serdar de, nexasim di çarçoveya temaya şer de li ser trajediyên li pişt enîya şer rawestin. Emerîkê Serdar jî weku şexsîyet li pişt enîya şer jîyaye û bi çavekî realist; êş û trajediyên şer di çîroknûsîya wî de xwe dane der. Çîroknûsî jî alîyekî ve jî derbîrîna van fikr û ramanên nivîskar in ku bi çavê zarokekî

şahidîya wan kirîye. Ji ber vê yekê jî em ê di serî de li ser jîyana mirovên sîvîl yên pişt enîya şer rawestin.

Di çîroka “Çavê Dê Li Rêya Kur Bûn” de temaya sereke şer e. Em di çîrokê de rastî şer nayên û ji enîya şer dûmenan nabînin. Tenê em ji pişt enîya şer haydar in ka gelo yên ku li pişt mane çawan in. Çîrok li derdora dayîka Henê hatîye honandin. Di çîrokê de tiştê ku derdikeve pêş psîkolojîya şer e. Kesên ku zarokên wan li enîya şer in her tim çavê wan li rê ye. Vê bendewarîyê, nivîskar di çîrokê de wiha vedigêre: “Rê li gund dinêre. Gund li rê dinêre. Rê çavên gund e.” (Destê Dê. 32).

Di vê derê de raçavkirina rê, raçavkirina dayîkan e. Dayîk ji ber ku bendewarîya nameyekê yan jî xebereke baş tim li rê dinêrin. Hêvîya wan ya tekane êdî bûye rêya gund. Ji ber şer êdî di gund de şayî kêr bûne. Şûna şayîyan şîrî girtî ye. Neyînîyeke şer ya din jî êdî zarok nawelidin. Dawet nayên kirin. “Wan salan di gund de şayî dawet nedibûn. Zaro zef kêr dixulîqîn. Şabûn kêr bû, lê şîr û girî bi para gund ketibû. Rêya gund jî dirêj dikişand. Çavên dayîkan li wê rê yê diqerimîn.” (Destê Dê. 32).

Lê di çîrokê de ne dijmin dîyar e ne jî ji nava şer tiştek heye. Tenê tiştê herî derdikeve pêş bêrîkirin û hêvî ye. Rê di vê çîrokê de wateyeke nû werdigire. Rê ji bo niştecihên wî gundî hem hêvîyek e û hem jî tirsek e. Ji ber ku ji wê rêyê hêvî geş dibe. Çûyîyên wan vedigerin. Ji heman rêyê jî dîsa xeberên nexweş ji wan re tên. Di çîrokê de şer bi rûyê xwe yê sar û reş ve dîyar dibe. Şer kêf û şahîya di nava civatê de ji holê radike û di şûna wê de êşeke giran datîne. Çavên mirovan tim li rê ne. Rê di di çîrokê de dibe lehengekeke sereke. Pêwendîya niştecihên gund tenê bi vê rêyê re çêdibe. Rê di çîrokê de hem amraz û miraz e û hem jî hêvî ye. Rê êdî ne weku heybereke şênber weku heybereke razber li pêşîya xwendevanan disekine. Çîrok piranî trajedîya şer ya li ser civakê vedibêje. Behsa gundekî tê kirin lê em pê agahdar nînin ka gelo ev gund li ku ye. Mîna kesên di şer de serencamekî meçhûl mekana çîrokê jî her wiha meçhûl e. Nenas e. Tiştê ku gund derdixe pêş tenê trajedîya wî gundî ye. Çîrok çarenûsa gelekî vedibêje. Vê yekê jî li ser dayîkekê dide der. Êş û trajedîya dayîka Henê dibe sembola hemû dayîkan. Dayîk di vê derê de ne tenê temsîlîyeta jinekê her wiha temsîlîyeta welatekî jî dike. Ev welat her tim çavê wê li

rêya çûyîyên wê ye. Trajedîya şer û bendewarîya mirovan bi devê dayîka Henê hatîye vegotin. “Dilê min diêşe, - dayîkê got. – Ezîzê min bihata, ez ê rabûma. Wekî li dinyayê tişt bi min ne lazim e. Her tenê min dixwest, weku we ev derîyê me hiljenda, ji tûşa kerevata min re derîyê teze vekira. Bila derî bi şevê jî li ser piştê be, lempe vexistî be, weku di nava cîyan de di dêrî re çavên min li hatina Ezîzê min be.” (Destê Dê.33). Dayîka Henê di ber ber mirinê de jî tenê xwesteka wê ew e ku bikaribe rêya Ezîzê xwe raçav bike. Di çîrokê de rê û derî tim vekirî ne, li benda çûyîyên ber şer in.

Vegêrê çîroka “Namebir” jî dîsa sehneyên li pişt enîya şer dide nîşandan. Emerîkê Serdar hin caran bi şokekê dest bi çîrokên xwe dike. Di çîroka “Namebir” de em bi hevoka ewil pê dihesin ku milekî lehengê çîrokê Temo di şer de hatîye birîn. Temo êdî yekî astengdar e. Ji ber astengdarbûna xwe Temo êdî nikare di kolxozê de bixebite, loma jî, bi pêşnîyara sedrê kolxozê Temo dibe Namebir. Temo di navbeyna gund û nahîyeyê de weku namebir dixebite. Çîrok li ser dêrûnîya Temo hatîye honandin.

Şer bi hemû awayan ve civak û jîyana rojane dorpeç kirîye û pencên xwe yên tûj li ser jîyana mirovên pişt enîya şer daye nîşandan. Şerekî giran e û hema bibêje hemû mêr çûyîne ber şer. Jin û zarok ji bo aborîya rojane barekî mezin hilgirtine ser xwe. Lehengê çîrokê Temo ji ber astengdarbûna xwe dema ji şer vedigere rewşeke giran dibîne. Lewra hemû xebat ketîye stûyê jin û zarokan. Di vê çîrokê de jî bandora şer dîsa li ser kêmbûna mêran ve hatîye vegotin. Mêrên gund hema bibêje tevahî çûyîne enîya şer. Giranîya jîyanê hemû ketîye stûyê jinan. Ne tenê jin, zarok jî di karên gund de dixebitin. “Di gund de mêr kêmbûn, çûbûn ber şer, xebat ketibû stûyê jinan û zaran... - Ez zanim, Temo, xîreta te temûl nake, dixwezî li dewsa lawikan bixebitî, - sedrê kolxozê gotê.” (Êdî Dereng Bû. 7).

Temo her çiqas ji karê xwe razî jî be dizane ku ketîye bin barekî giran. Lewra ew ne tenê weku namebir her wiha ragihînerê xeberên nexweş e jî. Gelek caran li ser vê yekê difikire.

Destnivîsara li ser gişkan nas dikir û gava nameyeke bi destnivîsara merivên xerîb nivîsî didît, şik diket dil û timî ew kutasîya gişkan digihand xwedîyê wê. ‘Dibe “kaxeza reş be’, - Temo difikirî. Dibe birîndar e, nikarîbûye binivîse, hevalan jê ra nivîsîye. Ez çima gorî wê bêbextîyê zû bigihînim mala wan? Ji destê min nayê nameyên şabûna ji wan re bînim, lê qe na ji destê min tê bahsa bêbextîyê hebekî dereng bigihînim wan. (Êdî Dereng Bû. 8).

“Kaxeza reş” di vê çîrokê de weku semboleke şer tê şayesandin. Kaxeza reş sembola mirinê bi xwe ye. Leşkerên ku di pêşenîya şer de ne; dema ku bîr kuştin, ji malbatên wan re nameya reş tê hinartin. Tîrsa Temo jî her tim kaxeza reş e.

Temo milekî xwe di şer de dide, lê dîsa jî ji karesatên şer xelas nabe. Şer vê carê jî li ser dêrûnîya wî karîger e. Nameyên ku ji enîya şer tîr her wiha bandoreke mezin li Temo dîkin. Dema ku Temo pê bihese ku nameyeke nebixêr anîye dil nake ku nava gund belav bike. Bi destê kurê xwe ku navê wî Êsiv e dide belavkirin. Lê dengên qêrîn û zarîna xwedîyê nameyê tesîr li Temo dikir û êş li birînê wî dixist. Ji ber vê çendê ye birînen Temo qet kew nagire. Temo her çiqas jî şer xelas bibe jî şer bi hemû heyîna xwe ve li pey Temo bernade û her qewimînek dîsa jî birîna wî ya ji şer xwîn dike. Temo bi vê yekê carna dikeve nava nivînan û nexweş û bêhal dikeve: “Diqewimî piştî bahsa nebixêrîyê ew bi rastî nexweş diket, birînêd wî diêşîyan, çend rojan diket nava cîyan.” (Êdî Dereng Bû. 8).

Şer her çiqas dûr be jî bandora wê digihîje her derê. Nameyên enîya şer tîr her çiqas dilxweşîyek jî be gelek caran ev name dibin dengê azar û şînê. Nivîskar bi rêya van nameyan, êş û azara şer nîşanê xwîneran dide. Di vê çîrokê de ji alîyê vegêr ve her çiqas qala şerekî bê kirin jî em weku xwînêr pê nizanin gelo ev şer li hemberî kî ye û li kîjan deverê şer e. Lewra mekanê şer di çîrokê de xuya nabe. Tenê em bi ragihandinên vegêr pê dizanin şerek diqewime û gundê ku vegêr lê dijî jî gelek kes beşdarî vî şerî bûne. Şer bi xwe tune lê bi şopên xwe ve di jîyana mirovan dike jehr. Çavên dayîkan di vî şerî de tim li rê ne. Di çîroka “Namebir” de hatina postê ya gund bi vî şiklî deng dide: “Guhên wî li ser dangan bû, çi ka wê rojê şîn û girî yê bikevine kîjan mala gund.” (Êdî Dereng Bû. 8).

Temo karê xwe bi dil û can dike. Lê di vî karî de xwe jî weku sûcdarekî dibîne. Gihandina xebera nexweş derengî dihêle. Ew bi kêfxweşîyên gundîyan ve kêfxweş e û bi xema wan ve jî xemgîn e şabûna lehengê çîrokê bi nameyan ve girêdayî ye. Ger name pir bin lehengê me şa dibe û dilezîne ku zûtir bigihîje gund: “Û wiha mal bi mal digeriya, hetanî çeltayê wî vala dibû, paşê ber bi mala xwe ve diçû. Bieşq bû, laqirdî dikirin, neferên malê pê re-pê re tê derdixistin û digotinê: - Nebî îro name gelek bûne lewma kêfa te wisa li cî ye?” (Êdî Dereng Bû. 9).

Şerê ku diqewime em bi rêya nameyan, bi birîndarên ber şer vegehiyayî û bandora wê ya li ser civakê hay jê dibin. Şer di heman demê de li ser Temo bandorekî neyînî dike: “Wê rojê birînen wî diha gelek êşîyan. Êşa wan û caba kuştina Şamil ruhê wî vejendin.” (Êdî Dereng Bû. 14).

Di çîrokê de Xezal jî yek ji wan dayîkan e ku kurê wê Şamil di enîya şer de ye. Bi tena serê xwe dimîne. Çavên wê tim li rê û li dû Temo digere. Roj tê nameyên Şamil yekcar qut dibin. Û di dawîyê de kaxeza reş bi ser Xezalê de jî tê. Lê Temo nikare vê nameyê ji bo Xezalê aşkera bike. Caba kuştina kurê wê jê re nabêje û dixapîne ku kurê wê sax e. Temo li ser navê Şamil çend nameyan dinivîse û dide Xezalê û bi vê yekê dixwaze caba mirinê derengî bike. “Û Xezalê çend nameyên wisa standin, şika wê hê mezin bû, lê tirsê berî wê şikberîyê dida. Wan nameyan jî komek nêdan Xezalê û çîqas çû, halê wê giran bû. Rojekê derbiharê, gava şilope dibarîn, Xezal çû rehetê.” (Êdî Dereng Bû. 15).

Xezal bi çavên zindî mizgînîya hatina kurê xwe nabîne û bêmiraz ji vê dinyayê bar dike. Wek ku tê dîtin di vê çîrokê de jî bandora şer ya pişt enîyê hatiye vegotin. Nivîskar karesata şer li ser dayîkan bi awayekî trajîk radixîne holê.

Di çîroka “Xerîbo” de em dîsa rastî şerekî tên ku lehengê çîrokê Bekir jina xwe ya ciwan û kurê xwe yê bi tayê tenê hiştîye û çûye şer. Şer li ser derûnîya Bekirî hatiye vegotin. Di çîrokê de vê carê jî em dibin şahidê serencama leşkerekî. Bekir ku di şer de birîndar dibe û dîl dikeve êdî hew dikare li zar û jina xwe û welatê xwe vegere. Hêsirî, xerîbî û bîyanîti û tenêtiya Bekir, di vê çîrokê de bûye honaka metnê. Jixwe çîrokê jî navê xwe ji xerîbbûna lehengê çîrokê wergirtiye. Şer mirov û

malbatan ji hev vediqetîne. Ji alîyekî ve nameyek digîhîje ber destê malbata wî ku li gorî nameyê serencama Bekir dîyar nîne. “Şer kuta bû. Kî sax mabû, bi ser mala xwe de vegeîya. Jinê tenê kaxezek stand, weku mêrê wê; Bekirê Teyo di şer de bê ser û berate winda bûye.” (Êdî Dereng Bû. 18).

Li alîyê din di heman demê de Bekir ku di şer de birîndar dibe û dîl dikeve û êdî bi tîrsa nefîkirinê nikare vegere welatê xwe. “Ew çend sal bûn hay ji mala xwe tune bû, nizanibû diya wî, jina wî, kurê wî hene an na. Gelek name şandin lê nameyên wî gişk bê cab man.” (Êdî Dereng Bû: 19).

Bekir di welatê ku lê dimînê de dibe bîyanîyek. Bîyanîbûneke zor dibe para lehengê çîrokê. Navê wî yê rasteqîn bi hinceta zehmetbûna telefûza wê diguhere û dibe “Bagos”. Jina wî ya nû û derdor wî, her tim weku Bagos bang dikin. Lê vegêr wî tu caran weku Bagos nav nake. Ew her tim weku Bekir di vegotina vegêr de derbas dibe. Veger bî vî awayî nasnameya wî rasteqînê her tim bibîr tîne û meyla vegêr jî dikeve ser “Bekir”. “Bekir êdî lap tewqê xwe jî mala xwe birî. Zewicî. Sal derbas bûn. Du qîz pê ketin. Bi zimanê cimeta wî nikaribûn navê Bekir rast hildin. Lewma navê wî jî guhastin. Jê re digotin Bagos. Bes nîn bû, weku ji weten merûm kirin, mal, jin û zarên wî yî di weten de jê standin, navê wî jî guhastin. Bekirê me bû Bagosê wan.” (Êdî Dereng Bû. 20).

Şer bi vî awayî Bekir hem ji malbata wî dûr dixê û hem jî navê wî diguherîne. Di vê çîrokê de bandora şerî, ji alîyê kesayetîya mirovekê ve tê şayesandin. Şer her wiha bi hemû heyîna xwe ve di jîyana mirovan de birînen xedar hiştine. Ev yek di kesayetîya Bekir de jî tê dîtin. Şer wî hem ji welat û malbata wî qut dike hem jî navê wî diguherîne.

Temaya şer di çîroka “Dawet Nîvcî Ma” de jî temaya sereke ye. Daweta ku gund berdewam e ji nişkê gava xebera şer digîhîje gund nivco dimîne. Zava diçe şer zurne bêdeng dimîne. Şer dîsa li pêy xwe windahîyên mezin dihêle: “Daweta, ku çend salan bi pêş de dest pê bûbû, teze kuta bû. Dawet bi zavê dest pê bû, lê bêtî zavê kuta bû.” (Êdî Dereng Bû. 37).

Şer li ser jîyana mirovan tesîreke neyînî ya mezin dihêle. Li paş xwe di gund û navçeyan de bêdengîyek mezin derdixe holê. Dengê heyî jî tenê dengê şînê ye. “Meh dersbas bûn dengê zurneyê di gund de nehat. Sal derbas bûn, dengê zurneyê di gund de nehat. Wede wisa bû, weku di gund de dawet nedibûn, li dewsa wan şîn gelek bûn.” (Êdî Dereng Bû. 37).

Di çîroka “Êdî Dereng Bû” de jî şer li ser rewşa zarokan tê raçandin û şayesandin. Di çîrokê de em rastî rewşa zarokên bavên wan li şer in, tên. Bermahîyên şer û bandora şer bi awayekî realîst di çîrokê de raberî xwîneran tê kirin. Zarokên sêwîmayî ji alîyê nivîskar ve bi hostatî hatîne vegotin. Di çîrokê de zimanekî hestiyar hatîye bikaranîn. Çîrok bîranînek e û vegêr ji me re qala serpêhatîya zarokatîya xwe dike.

Te hew dinêrî hevalekî me radibû û digot: ‘Niha bavê min hatîye, ez ê herim malê.’ û em cî de dihiştin, ber bi malê ve çiqas dikir. Wexta yekî kincekî teze li xwe dikir, dihat nava me û di ber xwe re diçû. ‘Bavê min anîye’, - digot û ji jor de li kincê xwe yî teze dinêrî. Me gelek bi çavnebarî li wan dinêrî û serê xwe dikir ber xwe. Bavê me ne li wir bûn, çûbûn ber şêr. Şêr destê me û bavê me ji hev qetandibû. Dayîkên me hişk bi destê me girtibûn. (Êdî Dereng Bû. 38).

Mijara çîroka “Ji Eskerê Neeyan Re” piştî kutabûna Şer e. Lehengê çîrokê bavê xwe di şer de wenda kirîye û ne mexberê wî dizane û ne jî bavê xwe ji bîr dike. Çîrok vegotina trajedîya piştî şer radixîne ber çavan. “Tu cahil bûyî û heta hetayê tu cahil mayî. ...Niha ew kurê te êdî ji te mezintir e” (Dengê Dil.60).

Bav kur di landikê de hiştî ye û çûye tev li şer bûye. Bûyer jî li ser vê karesata tehl hatîye honandin. Kur xemgîn e ku di şer de li pişt bavê xwe nesekinîye. Lê di alîyekî de jî bextewar e ku bavê wî mîna lehengekî li hemberî dijmin şer kirîye. Lê vegêr heyfa xwe, li xwe tîne û dibêje: “Tu yê bibexşînî, weku kurê te êdî ji te mezintir e, lê heta roja îroyîn cîyê mexberê te nizane.” (Dengê Dil. 60).

Çîroka “Dengê Dil” vegotina serhatîya du evîndaran ya Gulê û Ezîz vedibêje. Gulê û Ezîz di dibistanekê de xwendekar in. Ji hev hez dikin û bi nîyet in di sala

xwendekarîyê ya dawîyê de bizewicin. Lê ev yêk pêk nayê; lewra Şerê Wetenîyê yê Mezin dest pê dibe û Ezîz dibin leşkerî ye. Di vê navê de Gulê ducanî ye. Zêde dem derbas nabe xebera nebixêrê belav dibe ku Ezîz di şêr de şehîd bûye. Gulê piştî hin hewildanan zaroka xwe di nexweşxaneyekê de diwelidîne û ji ber edetên civakê ku dê nikaribe di nava civakê de serbilindî tev bigere û terka kurê xwe dike. Piştî wextan kur mezin dibe bi navê Eslan di nexweşxaneyekê de weku dixtor kar dike. Rojekê nexweşek jin tê nexweşxaneyê da ku emeliyat bibe. Şiklê wê pir bi Eslan re nas tê û Eslan bi hezkirin wê jinê dixê şiklê dîya xwe de. Gulê, bi xala li enîya wî û tilîyên wî yên çepê ve tê digihîje ev Eslanê dixtor, kurê wê bi xwe ye. Lê vê yekê nade der. Piştî ku ji nexweşxaneyê derdikeve hin wext derbas dibin û di ber mirina xwe de nameyekê bê nav û nîşan ji Eslan re dişîne û nasnameya wî ya rastî bi vî şiklî dîyar dike; lê navê xwe qet nabêje. Dema ku Eslan wê namê distîne û dixwîne şiklê Gulê ji nû ve li ber çavan şênber dibe. Çîrokek ji trajedîya vegotina şerê wetenîyê yê mezin e. Di çîrokê de du bûyer tên vegotin. Bûyereka hatina Gulê ya nexweşxaneyê ya din jî Gulê ji me re bi rêya paşveçûnê, pêwendîya navbeyna xwe Ezîz û terkirina kurê xwe vedibêje: “Eslan gelek hewl dide da ku dê û bavê xwe peyda bike lê dawîyê da digihîje wê qinaetê ku dê bavê wî dibe ku ji ber şer wenda bibin. ‘De, salêd şer bûn, kî zane çi hatîye serê wan, - difikirî dibe bavê min çûye ber şêr, diya min jî tiştê hatibe serî’” (Dengê Dil. 73).

Eslan dizane ku navê wî ne Eslan bûye lewra ev nav di nexweşxaneyê de lê hatîye kirin. Şer karîgerîyekî zor li ser civakê hiştî ye. Destên hezkirîyan ji hev qut kirîye û hezkirinên wan û xwestek û hêvîyên mirovan nîvco hiştî ye, zarokan bê bav û bê dê hiştî ye. “Belkî ocaxa sebebê şêr li ser ocaxan belav bibe, ûrta wan biqele, çawa destê min û wî ji hev kirin. Zulmekî çi qasî giran e...” (Dengê Dil. 94).

Gulê, hêrsa xwe salên şer tîne û nifiran li sebeba vê yekê dike. “Şer çi bibêjî nekir, ev jî birîneke wî şerî ye, weku gihiştîye me û tu caran qencbûna wê tune ye. Em di piştê de bûn, lê birîneke wisa gihişt me, weku ji birîna pêşenîyê xerabtir e.” (Dengê Dil. 95).

Di şer de ne tenê leşker zirarê dibînin; her wiha yên pişt enîya şer jî ji ber şer mexdûr dibin. Jixwe di piranîya çîrokên nivîskar de em rastî kesayetên pişt enîya şer

tên. Bûyer di nava wan de diqewime. Di kêr çîrokên wî de, vegotin der bsrê enîya şer de ne. “Roja gihiştine gund, wê rojê jî dest bi şerê wetenîyê yî mezin bû. Şer hat û mînanî hûtekî binê bahrê ev şabûn, planêd pêşerojê hûfî xwe kirin. Ezîz birine eskerîyê.” (Dengê Dil. 100).

Di enîya şer her roj xeberên tehl tên bihîstin. Şer perwerdeya xwendekaran jî nivco dihêle. Ji ber şer xwendîgehê tê girtin û xwendekar di kolxoz û sovxozan de dixebitin. “Xwendekarên mane, ku hîmlî qîz bûn, gotî herin di şixulnû berevkirina ekînê malhebûna gundîtiyê de komekê bidine kolxoz û sovxozan.” (Dengê Dil. 107).

Qedera Gulê bi Şerê Wetenîyê yê Mezin ve girêdayî bûye. Lewra piştî terka kurê xwe dide û li gundê vedigere, di xebatê de rastî Cemal tê û pê re dizewice. Cemal jî di şer de birîndar bûye û bi birînda rêya xwe ve vegerîyaye.

Temaya şer di pirtûka nivîskar ya *Hisreta Emir (2018)* de jî cih girtîye. Di çîroka “Hetanî Kîngê?” de şer li ser kesayetîya zarokê û malbata wî ve hatîye honandin. Çîrok bi devê vî lehengê piçûk tê vegêran. Vegêr her wiha çûyîna bavê xwe ya leşkerî û nehatina wî weku mirin bi nav nake. Bi çavekî zarokane rewşa tê de vedigêre. Haja wî ji bayê dinyayê nîne û xemgînîya li ser rûyê dayîka xwe ve pê dihesa ku tiştekî nebaş pêk tê. “Wê serê xwe berjêr kiribû, û bi pêşa şalika xwe hêsiyên çavên xwe temîz dikirin.” (Hisreta Emir. 13).

Vegêr tu wateyeke nade çûyîna bavê xwe û gotinên wî. Bi awayekî metelmayî difikire lê tiştekî jê dernaxe.

- Ji bîr nekî, - bavê min digote diya min, wan pereyên me ji cem Qasim hildî. Bi wan pereyan ar bikire dayne. Bila nanê we kêr nebe, kî zane...

Nanê me yê çima kem bibe, ez difikirîm. Çend çewal arê me di koxê de danîne ser hev, ez li ber disekinim, destê min nagihêje serê wan. Ka me ew ar xwerîye, wekî arê teze jî bikin? Na, tê kîvşê bavê min naxwaze zû bê, loma temîyan li diya min dike. (Hisreta Emir. 14).

Nivîskar di vê çîroke de xedarîya şer û bandorên xirab yê şerî li ser qurbanî û mexdûrên şerî dide nasandin. Nivîskar bi zimanê lehengê çîrokê nêrîna xwe der barê şerî de wiha tîne ziman: “Min êdî di çavên pîrika xwe de, li ser bengzê dayîka xwe texmîn kiribû, wekî şer çi ye. Min zanîbû, weku ew ne mînanî şerê qebîlêd gundê me ye, lê zulmeke giran e, tiştê ewqasî nepak î neqenc e, wekî nehêle bavê min bê. ... Min bere bere zulma şer texmîn dikir.” (Hisreta Emir. 18).

Çîrok piranî li ser rewş û helwesta zarokan ve hatîye honandin. Şer û xeberên ku şer tîne ji bona zarokan mîna lîstîkekê ye. Zarok bi dilekî safî li bûyerên şer dinêrin. Lê dîsa bi stûxwarî li benda bavên xwe ne. Di derdorê birînên şer her ku diçe zêde dibe. Hin kes ji enîya şer birîndar bûne û di halekî seqet de vegeîyane. Xebera kutabûna şer jî dilên piçûk rehet nake, lewra yê ku li bendê ne hîn li wan venegerîyane. Ev yek bi devê vegêr wiha tê vegotin:

Wê çaxê cîranekî me, ku di şer de seqet bûbû, vegeîyabû, bi dîmekî şa hat mala me.-Ka diya te, pîrika te? – wî ji min pirsî. Min gotê, wekî diya min hela li ser xebatê ye, lê pîrika min nizamî bu ku de çûye.

-Mizgînîya min ji we re, gelî zaran, şikir şer kuta bûye, -wî bi dîmekî şa gote me. Sifte em her du jî ji cî nelebitîn, me nizanibû çi bikira. Gedeyê hevalê min ji nişkê ve ji cî banz da, ber bi dêrî çû, lê di cîye xwe de sekinî.

- Ez herim mizgînîyê bidim mala me. Lê kartolan nexwî, ez ê va bêm, - got û di dêrî re çilqas kir. Ez hela di cîyê xwe de se-kinîbûm û min nizanibû çi bikira. Qe nizamî çawa, bêhemdî xwe min ji wî cîranê me pirsî:
- Wekî wisa ye, bavê min ê zûtîrekê bê, ne? –wî serê xwe kir ber xwe, nexwest li çavê min binêre, di ber xwe de got:

- Lê çawa wê bê. (Hisreta Emir. 22).

Wek ku tê dîtin mizgînîya kutabûna şer jî dilê zarokan safî nake. Vegêr li pêy pirsê bavê xwe ye. Ji ber ku çend sal in li bende mizgînî û hatina bavê xwe ye. Şer her wiha bi lepên xwe yê xwînî ji wan gelek tiştan dibe û li şûna xwe şîneke giran dihêle. Ken bi rûyê wan nakeve. Li derdorê qêrînîyek bilind dibe hindî ku deng

bilind dibe; vegêr di tenêtîya dilê xwe de li dûv soza bavê xwe digere, lewra bavê jê ra gotibû; wê zû vegere. Sal jî, veger jî û hatina bav jî dirêj dibin. Di dewsa wî de tenê kaxezek reş li wan vedigere. Nivîskar piştî kaxeza reş li ser dêrûnîya vegêr zûr dibe û wê serencamê wiha vedibêje:

Nizanim çima jê re digotin ‘kaxeza reş’, gava di wê nameyê de her tenê kaxezek spî hebû. Di mala me de şîneke giran bû... Diya min, pîrika min, serçavê xwe vedirûtin... Û meh dihatin derbas dibûn, min ji wê xebera bavê xwe bawer dikir. Lê ew nehat. Sal dihatin derbas dibûn, min ji xebera bavê xwe bawer dikir û çavên min li rêya wî bû, lê ew nehat. (Hisreta Emir. 23).

Di çîroknûsîya Emerîke Serdar de, weku ku di metnên çîrokên jorîn de jî tê dîtin, şer bi gelemperî li ser malbat, dayik û zarokên li pişt şer mane tê vegotin. Ev helwest, bi taybetî ji alîyê nivîskar ve ji bo ravekirina trajedîya şer hatîye hîlbijartin. Di vegotina çîrokan de helwesteke realîst derdikeve pêş. Mirov dikarê vê yekê bi jînenîgarîya nivîskar ve rave bike. Ji ber ku bavê nivîskar bi xwe jî beşdarî şer bûye û venegerîya ye. Loma jî di çîrokên Emerîkê Serdar de vegêrana trajedîya şer hewce ye mirov weku bûyerên rast û realîst lê binêre.

Şerê Cîhanê yê Duyemîn û nemaze pişt eniya şer di çîroknûsîya Emerîkê Serdar de tên vegêran. Dîmenek yan jî wêneyekî şerî em nabînin. Di çîrokên Emerîkê Serdar de mijareke balkêş jî şerê navbeyna hêzên Iraq û Pêşmergêyên Kurdistanê ye. Emerîkê Serdar di serdema Şoreşa Îlonê de rewşa kurdên Iraqê ji nêz ve şopandîye û di çîrokên xwe de jî cih daye vê babetê.

Şer mijara çîroka “Wê Şevê” ye jî. Vegêran qala şerê gelê xwe dike û xwe jî, ji dûrî vî şerî ye. Şer bi hemû awayan didome. Em şerî di vê çîrokê de bi rêya radyoyê dibihîzin. Şerê ku diqewime vegêr aciz dike. Lewra di nûçeyên ku ji radyoyê dibihîse her tenê dengê serkeftina dijmin e. “Dilê min temûl nekir. Min radyo temirand. Dengê zurneya dijmin hela li ber guhên min bû û yazîya milletê min î derî zêrandî tebatî nedida min.” (Êdî Dereng Bû. 144).

Nivîskar di çîroka “Dudu Bûn” de li ser têkoşîna pêşmergeyên Kurdistanê radiweste. Çîrok vegêrana du pêşmergeyan e. Di çîrokê de, dîrok weku sala 1963an tê dîyar kirin û nivîskar her wiha radigîhîne ku li Kurdistana Iraqê kurdan li hemberî dagirkeran serî hildane û di nava têkoşîneke bêhempa de ne. Nivîskar bi şayesandîna xwezaya Kurdistanê û lehengîya pêşmergeyan dest bi vegêranê dike. Lehengî û wêrekîya kurdan jî li ser du pêşmergeyan şênber dike. Di çîrokê de tê vegêran ku hêzek ji leşkerên Iraqê ber bi koma pêşmergeyan ve tê û pêşmerge jî bi biryar in ku wan bidin sekinandin. Her wisa şer diqewime û nivîyê zêdetir leşker tên kuştin. Her du pêşmerge jî bi tevgereke canfîda şer dikin û di dawîyê de jî şehîd dikevin. Nivîskar di çîrokê de zimanekî propagandîst bi kar anîye û di helwesta xwe de jî bi layengirî tevdigere. “Sala 1963an bû. Kurdistana Iraqê sincirîbû, ji erd û ezmên agir dibarîya. Hukûmet li cimeta Kurdan hatibû xezabê û Kurd jî mecbûr bûbûn çekê hildin, erdê xwe, nav û namûsa xwe, azayîya xwe xweyî bikin. Şer bû, şerekî giran. Biçûk û mezinên Kurdistanê bûbûne pêşmerge, berê xwe dabûne mirinê û pê re dikirin şer. Şerê man û nemanê bû.” (Dengê Dil. 124).

Vegêr bi vî awayî di destpêka şer de hêzên Iraqê sûcdar dike û helwesta kurdan jî di dijberîya vê yekê de weku şerê xwe parastinê dide pêş. Çîrok li ser dijberîyekê hatiye sazîkirin. Leşkerên Iraqî her awayî nebaş hatine nîşandan û dijberî vê yekê, pêşmerge bi hemû awayan ve weku lehengên êrenî hatine şayesandin. “Her du qerewîl cahil bûn, şer nehiştibû ew bizewîcin. Wan dê û bav di mal de hiştibûn, çek hildabûn û li dijî zulm û zulmkarîyê dikirin şer. Wexta bûn pêşmerge, lap xortinê cahil î tûnsiz bûn.” (Dengê Dil. 126).

Pêşmerge bi vî awayî têne şayesandin û qedirêkirin lê dijberî vê yekê leşkerên Iraqî dişibînin ajalan û bi awayekî kirêt tên şayesandin. “Xêlekê bi şûnde eskerên bi peya jî hat, gihişt tankan. Wî eskerî jî, mînanî, pezê tî, xwe xirûşî ser kanîyê kir, dor nedidane hev du, ê bi kulman, ê bi li ser zik vedizelîya, devê xwe yî heram dikirin ava wê kanîya zîyaretî vedixwarin. Têr vexwarin, mînanî pezê bikeve korîyê bi ser hev de nixilîn.” (Dengê Dil: 128).

Ne tenê pêşmerge her wiha ava kanîyên Kurdistanê jî weku avên zîyaretî û pîroz hatine şayesandin. Leşkerên Iraqê yên ku ji van kanîyan av vedixwin weku

“devheram” hatine pênasekirin. “Paşê bi wê ava cewahîr serçavê xwe yê kirêt ji qirêjê temiz kirin. ...devê xwe yî heram dikirin ava wê kanîya zîyaretî vedixwarin...”(Dengê Dil: 128).

Di çîrokê de xalek din jî li ser helwesta hêzên şer e. Hêzên pêşmerge weku lehengên canfida û cangorîyên welatê xwe hatine pêşkêşkirin: “Lazim e ji me du meriv xwe bi debaban re bigihînin, debaban ji wan bistînin.Gişkan li sînga xwe xistin, gotin weku hazir in herin. Her du xort jî di nava wan de bûn...”(Dengê Dil. 129).

Pêşmerge leheng in û bi rizadilî xwe didin pêş û canfidayên welatê xwe ne. Lê hêzên Iraqê ne weku pêşmergeyan in. Her çiqas weku hêzeke dagirker bîn şayesandin jî ew şer naxwazin. Mirovên tiral û xapînok in. Armanca wan tenê dem derbaskirin e: “Çi karê min bi wan pêşmergeyên beyanî ketîye, -ew fikirî. – niha qumandarîyê çawa zanibe, me kirîye şer an na. Wexta ew gelekî şêr dixwezin, mêr in, bila bîn, bi xwe têkine şer.” (Dengê Dil. 29).

Di çîrokên Emerîke Serdar de bûyer ne di qada şer de piranî pişt enîya şer diqewime. Karîgerîya şer ya pişt enîyê tê vegotin. Trajedîyên şer yên li ser mirovên sîvîl dibin babeta çîrokên nivîskar. Lê di vê çîrokê de bûyer rasterast di qada şer de diqewime. Şerê ku diqewime em rasterast bi çavên lehengên şer dibînin em bi wan re şahidîya bûyerê dikin. Ev taybetmendîyeke din a vê çîrokê ye.

Temaya şer di çîrokên Emerîkê Serdar de piranî li derdora Şerê Cîhanê yê Duyemîn e ku ji alîyê nivîskar ve weku şerê wetenîyê yê mezin tê pênasekirin. Lê em dibînin temaya şer ne tenê Şerê Cîhanê ye. Wek ku tê zanîn malbata Emerîkê Serdar ji Kurdistanê koçberî Sovyetan bûne. Ji bilî malbata nivîskar koçkirina ji welêt ber bi Sovyetan ve di gelek berhemana de û di nava gel de jî hatîye vegotin. Emerîkê Serdar jî ji vê yekê nemaye û koçkirina kurd û ermenîyan ya destpêka sedsala bîstemîn jî di çîrokên xwe de bi cih kiriye. Di van çîrokan de dostanîya Kurd û Ermenan derdikeve pêş û çîrok li ser vê babetê hatine honandin.

Pirtûka *Hisreta Emir*, di çîroka “Sitar Kir” de jî tema qirkirin û talankirina ermenîyan e. Di çîrokê de esker hêman û nîşaneyên xirabîye ye. Ew hîn di destpêka

çîroka xwe de bi hevokekê nerîna xwe der barê eskerê nizamê tîne ziman û wiha dibêje: “Heta niha neqewimîbû, weku esker ji bo pakîyê bê. Çi gawa bihata, ese xirabî fikir, pêqê ji gund derdiket, diçû.” (Hisreta Emir. 34).

Di berdewamîyê de nivîskar wan eskeran dişibîne kelbên avî û wesfa xedarîya wan dike: “... kî bi ber wan diket, didan ber qamçîyan” (Hisreta Emir: 35).

Her ku mirov bi çîrokê de diçe sedema hatina eskeran ji bo nava gund jî dîyar dibe. Ew li kesekî digerin. Nivîskar di vê çîrokê de balê dikşîne ser qirkirina ermenîyan. Eskeran bi ser gundekî ermenîyan de girtîye, ji bilî lawekê hemû qir kirine û ji bo ku koka yê dawî jî derxînin û wî bikujin dane pey wî. Ew jî neçar dimîne ku xwe bavêje ber bextê Hesoyî. Di nav axaftinên xortê ermenî de mirov rastî hevokeke dilêş tê. Ew wiha dibêje: “Ne diz im, ne qaçax im, ne mêrkuj im. Gunehê min her tenê ew e, weku ermenî me û Rom li me hatîye xezebê, koka me ji bin ve tîne.” (Hisreta Emir. 36).

Bi vê gotina wî tawana hemû ermenîyên qirkirî dîyar dibe. Ew tenê ji ber ku ermenî ne hatine qirkirin. Bêguman armanca nivîskar ya sereke ew e ku dengê xirabîya kurdan li ermenîyan di heyama qirkirina wan de red bike û balê bikşîne ser wan fedakarîyan, yên ku kurdan derheqê ermenîyan de pêk anîne.

Çîrokeke din jî ku li ser dostanîya kurd ermenan de hatîye honandin, çîroka “Di Rihîna Biratîyê De” ye. Çîrok serpêhatîya bûyerekê ya di dema qirkirina ermenîyan vedibêje. Li nêzîkê sînorê Ermenistanê gundekî li bin etara çîya mekanê çîrokê ye. Temir Beg di vî gundî de weku serwerê êla xwe ya kurdan e. Her wiha berpirsîyarîya gundê ermenîyan jî dike. Dema ku pêjna qirkirina ermenîyan dibe, peywirdarê Romê, xwe bi Temir Beg re radigîhinin û qirkirina cîran jê dixwazin. Temir Beg dijberî qirkirina wan e û di vê derê de xwesteka dewleta Romê bi cih nayîne. Leşkerên Romê li ser gundê wan digirin û kurd û ermen bi hev re şerê wan dikin û bera wan didin. Lê piştî vê bûyerê ermen ji Temir Begê destûr dixwazin û koçî Ermenistanê dibin. Ji bona parastin û rêberîya koçê, Temir Beg kurê xwe yê bi tayê tenê bi ermenan re rêwî datîne. Di rê de, di pevçûnekî di nevbeyna leşkerê Rom

û êla koçkirî de, Qolîxanê kurê Temir Beg tê kuştin. Temir Beg bi vî awayî ermenan ji qirkirinê diparêze. Lê di vê rê de kurê xwe jî dide kuştin.

Dema pêjna qirkirina ermenîyan tê Temir Beg naxwaze tev li vî karî bibe û li hemberî ve yekê radiweste. Gundî di destê romê de tên xezebê û wezîfedarên romê her tim ji van gundan bacê werdigirin. Di çîrokê de Rom her tim bi awayekî nebaş tên pêşkêşkirin û weku xayîn tên navkirin. Rom, weku Roma reş, Roma rûtik, Roma delkebaz tê vegotin. Bi qewîmandinên derdorê hatin û çûyîna wezîfedarê Romê ve Temir Beg tê digîhîje ku Rom bi qesta qirkirina ermenên derdora wan e jî: “Niha Roma reş li wê cimeta am û tam hatîye xezebê, qir dike. Çend beg û axayê me yî aqilsivik jî bûne defçiyên Romê. ...dijminê me jî, ê Ermenîyan jî her tenê hikumeta Romê ye...” (Hisreta Emir. 65).

Temir Beg di meseleya qirkirina ermenîyan de hem li hemberî wezîfedarên Romê dertê û hem jî vê yekê de hişyarîyê jî dide kurdên derdora xwe: “Ez ku bibihîzim, weku kurdekî weku misqalekê xirabîya ermenîyan kir, ez ê bi van destan wî bikujîm. ...Temir Beg, tê kivşê tu naxwazî destê xwe bidî wan kafiran, ew ê ku bûne casûsê Êrîsan û dixwazin dîwana Alî Osman wergerînin...” (Hisreta Emir. 65-66).

Wezîfedarê Romê vê daxwazê ji Temir Beg dike û jê alîkarîyê dixwaze û di vê rê de jî sozê didê ku ger ev yek pêk were wê Temir beg ji hêla Romê ve bê xelat kirin û rutbeya eskerîyê jê ra bê dayîn. Lê Temir Beg di vê yekê de yekî zana ye û naxwaze tev li vê yekê bibe û ser da jî dixwaze ermenîyan biparêze. Bûyerên berê bibîr tîne: “Ermenî kirin nav meclîsa xwe? Lê îro jî li cimeta am û tam hatîye xezebê...” (Hisreta Emir. 69)

Temir Beg yekî pêşbîn e. “Rom bi qestîkan menîyan li wan digire, şer û şiltaxan diavêje wan, dixweze wan ji kokê ve qir bike. Îro Ermenîyan qir dike, sibeyê wê rabe me...” (Hisreta Emir. 69)

Di çîrokê de qala qirkirina ermenîyan jî tê kirin: “Çi qas diçû, bahsêd nebixêrîyan zêde dibûn. Digotin, weku di deştê de, di şêheran de çi qas Ermenî

kuştine, ên mayîn jî top kirine, dane pêşîya xwe û kes nizane bi ku de birine...” (Hisreta Emir. 73).

Wek encam em dikarin bibêjin di çîrokên Emerîkê Serdar de şer bi gelek alîyan ve hatîye nirxandin. Temaya şer di edebîyata kurdî ya Sovyetê de gelek caran derketîye pêş. Nivîskar Emerîkê Serdar jî li ser vê rêbazê berhemên xwe sêwirandine. Lê li cem nivîskarên wê serdemê şer bi zimanekî propagandîst hatîye nivîsîn. Lehengên serdemê îdealîzekirî û têkoşer in. Ev yek her çiqas di nivîskarîya Emerîkê Serdar de jî xwe bide pêş; Emerîkê Serdar ji yên serdema xwe vediqete û rêyeke cîyawaz dide pêşîya xwe. Lehengên nivîskar mirovên ji rêzê ne, her çiqas bi rizadilî beşdarî şer bibin jî şerî îdealîze nakin û xwemgînîya xwe didin der. Lehengên wî û çîrokên wî jî piranî ji zimanê propagandayê dîr in. Bandora şer ya li ser mirovan û takekesîya wan tê vegotin. Hema bibêje li tu cihê em rastî îdealîzekirina şer nayên. Ji îdealîzekirinê wêdetir dîyarkirina travmayê şer serdest e.

Taybetmendîyeke Emerîkê Serdar jî ew e ku; bavê xwe di Şerê Cîhanê yê Duyemîn de winda dike. Jiber vê çendê xwe jî mexdûrekî vî şerî ye. Vegotina Şerê Cîhanê yê Duyemîn her wiha ji bo nivîskar weku meseleyeke şexsî derdikeve holê. Ji ber vê çendê jî mijarên şer ne di enîya şer de li pişt enîya şer diqewimin. Lewra nivîskar bi xwe şahidîya van bûyeran kirîye.

3.2.2 Netewperwerî

Di nivîskarîya Emerîkê Serdar de temayeke sereke jî temaya welatperwerîye ye. Ew hem di çîrokên xwe de hem jî di jîyana xwe de giringîyeke mezin dide nasnameya xwe û her wiha kurdûna xwe. Nasname û zimanê wî ji nivîskar re weku du amrazên sereke ne, ku xwe di nivîskarîya wî de jî dide der. Di nivîskarîya Emerîkê Serdar de gelek caran dema ku welat tê şayesandin mirov tê dernaxe gelo kîjan welat e û ji wê zêdetir jî welat bê sînore e. Sînoreke dîyarkirî ku nivîskar rave bike nîne. Lê belê hin caran em pê dihesin ku ji qesta welat ne ew welat e ku nivîskar lê dijî. Welatê ku nivîskar qala wê dike û dide nîşandan welatekî din e. Ji ber hin sedeman jî malbata wî ji vî welatî derketiye.

“Ez ê li cîyekî mayîn bi hûrgilî binivîsim, weku çima mala me ji welêt revîye, hatîye tenê di na va wa meşeyê da maye.” (Serdar, 2018a: 33).

Welatê ku nivîskar qal dike cîyê revê ye. Pêşîyên nivîskar ji vî welatî revîyane. Ev rewş di gelek berhemên nivîskarên Sovyetê de jî derbas dibe. Mijareke giring ya naveroka berheman ev rev e. *Hewarîya* Hecîyê Cindî, *Morof’a* Elîyê Evdîlrehman ji van berheman in ku heman şeweyî behsa vê yekê dikin.

Emerîkê Serdar ji hêla netewperwerîyê ve mirovekî hişyar e. Emerîkê Serdar di bîranînên xwe de dîyar dike ku; dema dixwaze pasaporta xwe biguherîne di pasaporta wî de li şûna neteweya wî weku êzîdî hatîye nivîsîn. Emerîk vê yekê qebûl nake û bertek nîşan dide û dibêje:

Min pasaport xwend, dît, li ber navê mîletîyê nivîsîne “Êzdî”. Min ji serekê textê pasaportan re got weku pasaporta min şaş e. Got:

-Çi şaş e?

Min got:

-Mîletîya min şaş nivîsîne.

Got:

-Lê tu çi mîlet î?

Min got:

-Ez Kurd im.(Serdar, 2018a: 107).

Emerîkê Serdar neteweperwerîya xwe di warê edebîyatê de jî derdixe pêş. Li gorî Emerîkê Serdar di nava kurdên Sovyetê de, di belavbûyîna fikr û ramana neteweperwerîyê de keda Qaçaxê Mirad pir zêde bûye. Bi helbestên xwe ve Qaçaxê Mirad di helbesta Sovyetê de helwestê neteweperwerîyê dide destpêkirin. Li gorî nivîskar helbesta ku ji hêla nivîskarên weku Qaçaxê Mirad, Fêrîkê Êsiv û Şikoyê Hesên ve hatîyî nivîsîn ji helbesta salên 1930’î çêtir e û vê helbestê jî helbesta berîya xwe netewîtir û bihêztir dibîne (Serdar, 2018a: 139).

Emerîkê Serdar nivîskarên berîya xwe rexne dike û wan li dûrê rihê mîllî pênase dike. Li gorî nivîskar; “di salên 1930î hetanî salên 1960î berhemên kurdî di bin şewaza realîzma civakî de hatine afirandin. Ev mecbûrîyek bû li ser nivîskaran. Ev berhem kurdî bûn lê ji ruhê netewîtiyê dûr hatibûne afirandin.” (Brêteque, 2017: 105-106). Nivîskar sedema vê yekê jî polîtîkayên Sovyetê dide pêş. Lewra li gorî nivîskar di vê navbeynê de, di metnên edebî da qalkirina peyva ‘Kurdistanê’ hatibû qedexekirin.

Nivîskar ne tenê di warê edebîyatê de her wiha di jîyana rojane de jî neteweperwerekî hişyar e. Ne tenê li Sovyetan, bala nivîskar li ser rûdanên li Kurdistanê diqewimin jî bûye. Nivîskar bi helwesteke neteweperwerane li hemberî van yekan bertek nîşan daye û ji bona vê yekê têkoşaye. Bi rewşenbîr û nivîskarên kurd re bi telgrafan raya giştî dane hişyarîkirin. Di sala 1963an de dema rejîma Iraqê li hemberî kurdan dest bi şer dike; Emerîkê Serdar û Şehîdê Îbo, Simoyê Şemo û Mîroyê Cangîr bi sernavê rewşenbîrên Ermenistanê telgrafên protestoyê dişînin. Van telgrafan hem ji bo Komîteya Sovyetîyê yî Xweyîkirina Aştîyê û hem jî ji bo Sazîya Neteweyên Yekbûyî dişînin. “Xeberdana me hîmlî derheqa wê zulmê de bû, ku li Iraqê dianîn serê cimeta me. Dilê me gelekî diêşîya, lê tiştek ji destê me nedihat.” (Serdar, 2018a: 199).

Emerîkê Serdar di sala 2006an de jî ji bona serokkomarê Amerîkayê nameyekê dinivîse û di nameya xwe de hem ji ber kirinên Amerîkayîyan, wan weku dostê gelê kurd binav dike û hem jî di hin meseleyên ku di wê serdemê de başûrê Kurdsitanê de diqewimin alîkarî jê dixwaze.

Wek ku tê dîtin Emerîkê Serdar ne tenê di nivîskarîya xwe de her wiha di jîyana xwe ya takekesî de li pey fikr û ramanên xwe yên netewî têkoşaye. Di berhemên nivîskar de jî ev tema weku temayeke sereke cîyê xwe girtîye. Di çîrokan de, peyvên weku kurd, pêşmerge, Barzanî û Kurdistan gelek caran tên bikaranîn.

Di çîroka “Dê” ya *Destê Dê* (2015) de vegêr qala gundê Mêrgesorê dike. Vegêr dîyar dike ku ev gund, li “Kurdistanê” ye. Wek ji vê çîrokê jî dîyar dibe ku nivîskar di çîrokên xwe de vî navî bi hişmendîyeke neteweyî bi kar tîne.

Di çîroka “Xerîbo” de temayek jî netewperwerî ye. Nivîskar di vê çîrokê de hestên netewperwerîyê li ser xerîbbûna lehengê çîrokê saz dike. Bekirê Teyo di şer de birîndar dibe pişt re jî dîl dikeve. Lê piştî kutabûna şer jî nikare vegere welatê xwe. Lewra li gorî agahîyên ku derdorê belavbûyî kesên ku vedigerin ji alîyê diwana Sovyetê ve ber bi Sibîrê tên nefîkirin. Bekir jî naçar dimîne û nikare vegere. Welatê ku lê dimîne dizewice. Di malê de ne jin, ne jî qîzên Bekir pê ra zimanê wî naaxivin. Ew hem di malê de hem jî di bajêr de weku bîyanîyekî bi tena serê xwe dimîne. Di vê bîyanîbûnê de Bekir her tim xwe dispêre zimanê xwe. Ew di derva bi tena serê xwe bi saetan xwe bi xwe zimanê xwe diaxive. Rojekê dibîhîse ku li Sovyetan radyoyekî kurdî hatîye vekirin û bi zimanê kurdî weşana xwe dike. Êdî ev radyo dibe tekane pêwendîya wî ya jîyanê. Ev yek di çîrokê de ji alîyê nivîskar ve wiha hatîye vegotin: “Tenê digerîya û xwe bi xwe bi xwe re Kurdî xeber dida. Ew qasî xeber dida hetanî dilê wî rehet dibû.” (Êdî Dereng Bû. 20).

Bekir, di çîrokê de di halê bîyanîbûn û xerîb bûnê de xwe her tim dispêre zimanê xwe. Zimanê wî di vê rewşê de jê re dibe stargehek. Bekir ku pê dihesa radyoyekî kurdî ji welatê wî bi kurdî weşana xwe dike demildest dikeve pê vê radyoyê dema ku dengê wê dibîhîse bi awayekî hestiyar tê ziman: “Ax, ez heyrana wî zimanî me, - bû zarîna Bekir bi Kurdî got.” (Êdî Dereng Bû. 21).

Guhdarîkirina radyoya kurdî ji bo Bekir ji hemû tiştan wêdetir e. Pêwendîyên xwe bi malbat û derdorê re yekcar qut dike û bi radyoyê ve mijûl dibe. Radyo û zimanê kurdî di bîyanîbûna wî de dibin du rêheval. “Qe nan jî nedixwar, dida transîstora xwe û diçû heywangê. Hetanî xebardana bi zimanê Kurdî xelas nebûya, ji radyoyê dûr nediket... Radyoyê ew bi welatê wî re dida girêdan, bi zimanê wî xeber dida.” (Êdî Dereng Bû. 21).

Welatê ku Bekir lê dimîne navê wî diguherînin û dikin Bagos. Derdora wî û malbata wî ya nû wî tim weku Bagos bang lê dikin. Lê vegêr tu caran wî weku Bagos nav nake. Ew her tim weku Bekir qala wî dike û dide nasîn. Ev yek jî di metna çîrokê de weku berteka nivîskar derdikeve pêş. Bekir di xerîbîyê de dimire. Lê gotina wî ya dawî jî dîsa bi zimanê wî ye: “- Şikir... Avasê... min heye... Ê, bi qurbana kurê xwe me, Bekir bi Kurdî got û careke mayîn çavên wî qulipîn.” (Êdî Dereng Bû. 34).

Di çîroka “Çîyayan Mizginî Dan Çîyayan” de jî nivîskar şerê kurdan yê li hemberî dagirkeran kirîye mijara çîroka xwe. Bi zimanekî hestiyar mirina şervanê kurd hatîye îdealîzekirin. Mekan di çîrokê de dîsa weku “Kurdistan” derbas dibe. “Li cîyê neheq guleyek agir kirin. Şerkarekî Kurd jî serê xwe danî ax û berên sar. Bi xwîna wî jî rojeke azabûna Kurdistana min nêzîk bû. Du hesîr ji çavên dayîka Kurd sekinîn. Çemên hêsîran pêla azabûnê hê gur dibû. Dengê şerê li erdan gihişt erşan.” (Destê D. 78).

Nivîskar amaje bi şerê azadiya Kurdistanê dike. Xwe jî dikeve nava metna çîrokê û hestên xwe dide der. Di peyva “ azabûna Kurdistana min” de em dikarin helwesta nivîskar ya netewî şirove bikin. Nivîskar di berdewamîya çîrokê de jî azadiya Kurdistanê dişibîne zarokekî nûbûyî. Şerê azadiyê dibe zarokekî nû ji maka xwe diwelide. “...dengê zara tezebûyî ket guhê min. Wê şevê ta sibeyê ji şabûnan xew neket çavên min.” (Destê Dê: 78)

Emerîkê Serdar di çîrokên xwe de çand û zimanê xwe dike haveynê honaka çîrokê. Ew di çîrokan de carna tev li gotinê dibe û bi rêya hin minasebetan vê yekê tîne ziman. Di çîroka “Hunera Sazbendîyê” de, dema ku dengê zurneyê bilind dibe mişk ji qula xwe dertê û direqise. Nivîskar vê yekê bi çanda xwe ve girê dide û bi vê yekê ve jî gazindên xwe rêz dike. “- Ev wehşê kurê wehşan weku vî mişkî jî nabin. Zurneya me hikumî ser mişk jî kir, lê xweş hat. Lê ev wehşên han naxwazin fam bikin, weku em cimeteke başqe ne, xwedîyê sazbandîyeke han e û extîyarîya me heye serbest bijîn... hetanî ev sazbandîya me hebe mirina cimeta me tune ye.”(Êdî Dereng Bû. 122).

Em di çîrokê de lê rast nayên ka gelo yê ku zordariyê li çand û zimanê nivîskar dike kî ye. Lê sazbandîyê ji bona çanda xwe û ji bona heyîna gelê xwe weku heyberekî nemir pêname dike.

Di çîrokên nivîskar de Şoreşa Îlonê jî weku mijar derdikeve pêş. Ev tema zêdetir jî di çîrokên wî yên piştî salên 70î de derdikevin pêş. Lewra em dizanin di van salan de li Kurdistana Başûr di navbeyna hêzên Iraq û Pêşmerge de şer diqewime vê yekê jî tesîr li çîrokên nivîskar kirîye. Navenda çîrokên wî êdî cih bi cih diguhere.

Di çîroka “Wê Şevê” de vêger qala şerekî dike ku ji radyoyê dibîhîze. Dengê şer wî aciz dike lewra ya ku ji radyoyê bihîstî ew e ku civaka ku lehengê çîrokê jî xwe ji parçeyekî wê dibîne; li hemberî dijmin têk diçe. Ev yek jî neyînîyekî xurt li ser ruhê leheng saz dike. “Di radyoyê de dengê zurneya dijmin, dengê altindarîya wî dengê azabûna cimeta min dixeniqand. Dijmin altindarîya xwe dida kivşê.” (Êdî Dereng Bû. 144).

Di berdewamîya çîrokê de nivîskar ji nûçeyên radyoyê aciz dibe û nikare rakeve. Rûdanên li Kurdistanê pêk hatî nivîskar xwemgîn û nerehet dike. Di nava vê heyteholê de ji telefonê stranekî dibîhîse û vê stranê weku aramîya ruhê xwe pênase dike. Lewra li wî alîyê telefonê dengê Eyşe Şanê bilind dibe. Nivîskar hestên xwe yê wê keliyê wiha anîne ziman: “Kilama Kurdî, dengê Eyşe Şanê bûne colanga mejîyê min î westîyayî, ez wê şevê wisa rehet razam, çawa di zarotîyê de şevên biharan bêxem radizam û sibeyê dayîka min dikir û nedikir ez ji xewê hişîyar nedibûm.” (Êdî Dereng Bû. 146).

Wek ku tê dîtin nivîskar kengî bêhn teng bibe xwe dispêre zimanê xwe û çanda xwe. Di vê çîrokê de jî dengê Eyşe Şanê jê ra weku terapîyekê tê û bi dengê wê aramîyê dibîne.

Di çîroka “Dudu Bûn” de nivîskar dîsa Şoreşa Îlonê dike mijara çîrokê. Çîrok li ser şerê nevbeyna Iraq û hêzên pêşmergeyan hatîye honandin. Bêguman di çîroknûsîya Emerîkê Serdar de ‘şer’ weku temayeke sereke cih girtîye, lê di çîrokên wî de şer piranî bi karesata xwe ya pişt enîya şer vê tê şayesandin û vegotin. Lê di vê çîrokê de nivîskar rasterast qada şer kirîye navenda çîroka xwe. Ev çîrok tekane çîroka nivîskar e ku ji qada şer vedibêje. Di çîrokê de lehengî û mîrxasîya pêşmerge derdikeve pêş. Pêşmerge bi canfida li hemberî hêzên dagirker têdikoşin. Nivîskar di çîrokê de bi awayekî aşkera helwesta xwe dide der. Nêrîna nivîskar li hemberî artêşa Iraqê neyînî ye. Wan dişibîne ajalan: “mînanî pezê tî”, “devê xwe yî heram û hwd” şibandînen vegêr yê der barê leşkerê Iraqî ne. Li beramberî vê yekê jî pêşmerge bêtirs û canfida hatine şayesandin. Ne tenê pêşmerge her wiha kanî û axa Kurdistanê jî bi pîrozîya xwe ve tê şayesandin. “Devê xwe yî heram dikirin ava kanîya zîyaretî û vedixwarin.” (Dengê Dil. 128).

Di çîroka “Ji Bo Xatirê Azadiye” de vê carê Mistefa Barzanî weku lehengê çîrokê derdikeve pêş. Di vê çîrokê de ku bêhtir dişibe serborîyekê nivîskar Mela Mistefa Barzanî weku kesayetîyê sereke derbasî çîrokê dike. Ev jî vedigere bawerîya xurt ya Emerîkê Serdar û kurdên Ermenistanê der barê Barzanî de. Bêguman têkçûna Komara Kurdistanê û koça Barzanî û pêşmergeyên xwe bo Sovyetê bandoreke mezin li ser hizr, raman û xwebawerîya wan kurdan dike ku di nav sînorên Sovyetê de dijîyan. Di çavkanîyan de tê dîyarkirin ku Barzanî di sala 1956an de, li gorî hin çavkanîyan jî di sala 1958an de diçe Ermenistanê. Li vê derê gundê kurdan digere û paşê jî Radyoya Erîvanê û rojnameya *Rêya Teze* zîyaret dike. Sertêdana Barzanî di nava kurdên Ermenistanê de dibe bextewariyek. Piştê vê yekê jî em dibînin di warê edebîyat û çanda kurdî de, bandoreke Mela Mustafa Barzanî çêdibe (Bedirxan, 2019: 9). Emerîk jî yek ji wan kesan e ku gelek dibin bandora pêşmergeyan de dimîne û di çîrokên wî de gelek caran pêşmerge lehengên sereke ye. Di vê çîrokê de navê pêşmerge di heman hevoka yekem de cih digire, lêbelê lehengê çîrokê jî pêşeng û rêberekî navdar yê kurdan e.

Nivîskar di hîlbijartina sernavên çîrokên xwe de gelek hestiyar tev digere û hewl dide ku nav û naveroka çîrokên wî hev bigirin. Lê bêguman armanceke din ya nivîskar jî heye. Nivîskar dixwaze bi navê çîrokê bala xwîner jî bikêşe. Jixwe têgiha “azadiyê” bala her kesî û nemaze bala kurdan dikêşe. Îcar bi hîlbijartina navê “*Ji bo xatirê Azadiyê*” ji bo çîrokekê ku bêtifaqî, lihevhatin, pêşeng, pêşmerge, çîya, têkoşan û bexşandin têda hene gelek baş nav û naverokê bi hev ve girê dide û digihe armanca xwe ya duyemîn jî ku balkişandin e.

Xuya ye ku di navbera lehengên çîrokê de dijminîyeke xurt heye. Kesê ku tê bal Barzanî bi hevokekê balê dikşîne ser mijara tolhildanê ku di nav kurdan de weku rêzîkekî jîyana eşîrtîyê tê nasîn û nivîskar jî di gelek çîrokên xwe de amajê pê dike. Dijminê Mela Mistefa dibêje: “Mele, tu dizanî em dijminê hev in, ji zû de li pê hev digerin, weku heyfa xwe ji hev hilînin.” (Hisreta Emir. 151).

Xwîndarîya nevbeyna kurdan yek ji sedemên sereke yên têkçûna bizav û tevgerên kurdan bûye. Lewra jî hewla tolhildanê kosp û astengîya herî mezin li pêşîya serkeftinên kurdan çêkirîye. Lê nivîskar li pey rêçareyekê digere. Rêçareyek

ku qet nebe heta serkeftinê mayinde bibe. Dijminê Mela Mistefa dema ku armanca şerkirina wî ya rastîn fam dike: “Tu ji bo temamiya cimeta kurdan dikî şer” (Hisreta Emir. 151).

Rêya lihevhatin û tifaqê pêşniyaz dike. Li gorî çîrokê bersiva Mela Mistefa jî erênî ye. Tevî ku ev tifaq demkî ye û bi serkeftina kurdan bi dawî tê, lê lihevhatinek wiha xeyala nivîskar û hemû kurdan e ku mirov dikare demarên wê bi zelalî di vê çîrokê da bibîne.

Her weku ku me berê jî amaje pê kir, sernavê çîrokê “Çîroka Ji bo Xatirê Azadîyê” ye. Nivîskar di vê çîrokê de dixwaze balê bikêşîne ser giringîya azadîyê ji bo gelê kurd û nemaze rêber û têkoşerên wan. Xuya ye ku lehengên çîrokê tevî dijmindariya xwe ya bêsînor hewl didin ku ji bo bigihîjin azadîyê tifaqekê ava bikin. Îcar gelo azadî çiqas ji bo lehengên çîrokê giring e?! bersiva vê pirsê di hevoka çîrokê de xuya dibe. Mela Mistefa jî dijaminê xwe ra wiha dibêje: “..., kîjan rojê cimeta kurdan ghişt azadîya xwe, bi vê qirmeyê li min xe, min bikuje.” (Hisreta Emir: 152).

Lewra jî lehengên çîrokê tenê ji bo ghiştina armancekê ku ev jî azadî ye têkoşînê dikin û amade ne piştî ghiştinê vê armancê canê xwe jî bidin.

3.2.3 Têkilîyên Kurd û Ermenan

Kurd û ermen weku du neteweyên cîran di erdnîgarîyeke hevpar de jîyana xwe domandine. Pêwendîyên di navbera kurd û ermenîyan de digihije sedsalên 5 û 6an (Kutlay, 2012: 218). Lê di mijara pêwendîya kurd û ermenan de lêkoler piranî balê dikişînin li ser dewra Împaratoriya Osmanîyan. Lewra kurd û ermen, sedsalan di bin desthilatdariya Osmanîyan de mayîne. Di dewra Osmanîyan de zêdetir jî di dawîya sedsala 19an û di destpêka sedsala 20an de fikrên netewî di nava kurd û ermenan de pêş dikeve û di hêla berjewendîyan de kurd û ermen ji gelek alîyan de li hev nekirine (Kan, 2019: 32-33). Di nava kurdan de civaka Êzîdî herî zêde bi ermenan ve têkildarî jîyana xwe domandine. Ev yek xwe di koçkirina wan de jî dide nîşandan. Dema ku kurdên Êzîdî ji ber zextên dewleta Osmanîyan koçber dibin û berê xwe didin Rûsya û Ermenistanê. Koçkirina Êzîdîyan ya ji bajarên wek Wan,

Qers, Îdîrê vedigere derdora salên 1830an. Koçberbûna kurdên Êzîdî herwiha piştê jî didome. Di derdora Şerê Cîhanê yê Yekemîn ve pevçûnên navbera dewleta Osmanî û ermenîyan her diçe zêdetir dibe. Kurdên Êzîdî di vê serdemê de jî li rastî êrîş û tepeserkirinê dibin û di encamê de: bi awayeke girseyî bi tevî ermenan koçî Ermenistanê dibin (Qadir, 2023: 11). Kurdên Êzîdî ji bona ku ola xwe biguherin hem ji alîyê xaçperestan ve û hem jî ji alîyê misilmanan ve bi awayekî sistematîk her tim hatine tepeserkirin. Ev yek wek li jor jî hate destnîşankirin di dewra Osmanîyan de piştî sedsala 17 û 18an digihîje asteke bilind. Di vê serdemê de kurdên Êzîdî da ku ji van zextan xwe biparêzin warguhêzê Ermenistanê dibin (Izady, 2013: 280). Kurdên ku warguhêzê Ermenistan û Rusyayê dibin her wiha piranîya wan kurdên Êzîdî bûn. Ji ber ku kurdên Êzîdî xwe pitir nêzîkê ermenan dibînin piranî li welatê Ermenistanê niştecih dibin. Herwiha jî di Ermenistanê de civakeke Êzîdî pêk tê. Kurdên ku li Ermenistanê niştecih dibin û piştî Şoreşa Cotmehê mafê xwendinê dest dixin û bi alîkarî û pêşengîya hin ermenan di warê edebîyata kurdî de berhemên diafirînin (Xelîl, 2014: 18). Ev pêwendîya kurd û ermenîyan di berhemên serdemê yê kurdî de jî xwe dide der. Îmaja ermenîyan di berhemên serdemê de îmajeke erênî ye (Alan, 2014: 53). Di vê serdemê de nivîskar Emerîkê Serdar jî yek ji van nivîskaran e ku di berhemên xwe de cih daye pêwendîya kurd û ermenîyan.

Emerîkê Serdar di gundekî kurdan ku dikeve nav sînorê Ermenistanê ji dayîk bûye. Ji ber vê çendê jî ermenî ji nêz ve nas kirine û kirinên wan ji bona kurdan jî di gelek caran bi pesindarî qal kirîye. Lê hin caran di bîranînên xwe de bereksê vê yekê qala ermenîyan kirîye. Di bîranînên nivîskar de her çiqas ermenî weku dost bên şayesandin jî hin caran dijberî vê yekê qala wan tê kirin. Nivîskar mamosteyê xwe yê dibistanê bi awayekî neyînî bi bîr tîne. Her çî qas pêwendîyên kurd û ermenan di Sovyetan de bi awayekî pak bên îdealîzekirin jî em ji bîranînên Emerîkê tê digihîjin ku ev tiştêkî gelemperî nebûye. Hin caran neteweperîya ermenan bi pêş de bûye û Emerîkê Serdar jî bi vê yekê re rûbirû maye.

Tu dixwezî ez xeysetên milletê te bidim rêzê?

Xwendekarên hevalên min gişk Ermenî bûn, ez tenê Kurd bûm,
xwînê li qafê min xist. Min gotê:

-Xên ji xeysetê qenc tu nikarî tişteki xirab derheqa milletê min de bibêjî.

Ew hêrs ket, got:

-Ji dersamin derê! Hûn, xwendekarên Kurd, bi pakî hîn nabin lê em we xweyî dikin. (Serdar, 2018a: 102).

Dema ku Emerîkê Serdar û mamosteyê wî li ser meseleyekî di polê de li hev dikevin. Mamosteyê wî yê ermenî bertekeke tund nîşan dide û xeysetê nivîskar bi kurdûna wî ve girê dide. Bi ser de jî kurdan weku bar li ser piştê ermenan dibîne. Li gorî wî xwedîkirina kurdan li ser piştê wan weku barekî ye. Dîsa mamosteyekî wî kuştina ermanîyan ya li Tirkîyê dide ber çavên Emerîk. “Kurdan dê û bavê min kuştine, Kurdan jî ez xilas kirime.” (Serdar, 2018a: 104).

Lê dijberî bîranînên nivîskar di çîrokan de portreya ermenîyan bi dostî û hevaltîyê hatiye şayesandin. Di çîrokên wî de temayeke sereke jî dostaniya navbeyna her du gelan e.

Temaya çîroka “Star Kir”ê pêwendîya kurd û ermenan e. Xortekî ermenî ji bo ku xwe ji destê eskerên roma reş rizgar bike xwe digihîne gundekî kurdan û li ber derîyê mala Heso rastî wî tê. Leşkerên tirk her ku diçe nêzîkî gund û mala Heso dibin. Xort xwe davêje ber bextê Heso ku wî rizgar bike. Lê Heso li encama wî karî dinêre û dizane ku eger esker wî xortê ermen di mala wî da bibîne dê koka wî jî qir bikin. Dawîya dawî dema ku dengê simên hespan nêzîk dibin Heso rê dide xortê ermenî ku biçe mala wî û xwe veşêre. Hîn pirsgirêk çareser nebûye. Di odayê de bûka nûhatî hîn di nav cihan de ye. Divê ku xortê ermenî ji bo xilasbûnê biçe û xwe bixe nava nivînên wê de. Qumandarê tirk bi eskerên xwe ve xwe digihînin mala Heso. Esker diçin xanî, kox û tewleyê û qumandar jî diçe odayê. Di vir de xwîner jî mîna Heso tengav dibe. Lê dawîyê de qumandar tê îqnakirin ku ew bûk û kurê wî ne ku di nav cihan de razane û tu kes bîyanî di mala Heso de nîne. Bi wî awayî jî xortê ermenî ji destê eskerên Romê rizgar dike û şeva paştir bi alîkarîya Heso bi temamî ji gund derdikeve û xwe ji mirinê difilite.

Vegêrê çîrokê dîsa jî nivîskar bixwe ye, esker hêman û nîşaneyê xirabîye ye. Ew hîn di destpêka çîroka xwe de bi hevokekê nêrîna xwe der barê eskerê nizamê tîne ziman û wiha dibêje: “Heta niha neqewimîbû, wekî esker ji bo pakîyê bê. Çi gawa bihata, ese xirabî fikir, paşê ji gund derdiket, diçû.” (Hisreta Emir: 34).

Di berdewamîyê de nivîskar wan eskeran dişibîne kelbên avî û wesfa xedarîya wan dike: “... kî bi ber wan diket, didan ber qamçîyan” (Hisreta Emir: 35).

Fedakarîya kurdan di çîrokê da bi rêya Heso hatîye şayesandin. Ev demeke kurt e ku Heso ji bo kurê xwe bûkek anîye. Rewşeke wisa hatîye pêş ku divê fedakarîyeke mezin bike. Ew bi tu awayan nikare qebûl bike ku xortê ermen were kuştin. Lewra jî wî xortî xwe avêtîye ber bextê wî û jê xwastîye ku wî star bike. Heso li ser encamên vê starkirinê difikire û baş dizane ku heger esker wî xortî li mala wî bibînin dê koka wî qir bikin. Dîsa jî hewl dide tenê rêçareya heyî bikar bîne û xortê ermen dişîne nav cihên bûka xwe de. Bêguman namûs di nav kurdan de tiştêkî pir pîroz e. Lê Heso di vir de bi fedakarîya xwe xortê ermen weku kurê xwe dide nîşan, wî dixê nav cihên bûkê û bi wî awayî jî wî ji mirinê rizgar dike.

Temaya pêwendîya kurd û ermenîyan di çîroka “Di Rihîna Biratîyê De” de jî hatîye îdealîzekirin. Çîrok li ser dostanîya kurd û ermenîyan hatîye honandin. Vegêrê çîrokê kesê sêyemîn e û bi rêya vegêr em tev li bûyerê dibin. Her wiha çîrok bi şayesandina têkilîyên kurd û ermenan dest pê dike. Dostanîya kurd û ermenan di her qada jîyanê de tê pesinandin. “Ermenî û kurdêd wan gundan dost û kirîbên hev bûn, timî çûyîn û hatina wan li hev hebû. Wexta merivek li gundê Ermenîyan dimir, Kurd diçûn hewarîyê. Ermenî jî wisa bûn, her tim diçûn ser şîn û şayîyên Kurdan...” (Hisreta Emir. 57).

Bi vî awayî dostanîya nava van her du qewman de tê vegotin. Ew di şîn û şayîyên hev de bihevre ne. Ji alîyê kurdan ve ermenî weku kirîv tîne naskirin. Ne tenê di şîn û şayîyan de her wiha di rojên xeternak de jî bi hev re ne. Ev dostanîya wan di çîrokê de weku “şûrê dudêv” tê şibandin û bi vî havî li piştê hev radiwestin. Li ser hev mîrên xwe dayîne kuştinê. Temir Beg di çîrokê da weku mirovekî xwende û dinyadîtî tê qal kirin. Ew serekê êla xwe ye.

Stenbolê, li temamîya Romê gerîyabû...Çend salan çûbû medreseyê..." (Hisreta Emir. 58).

Di çîrokê da qedera van her du gelan bi hev ve tê girêdan. Lê ev qeder piranî bi rûye xwe yê neyînî ve tê şayesandin. Lewra di çîrokên Emerîkê Serdar de kurd û ermen weku du gelên bêguneh û tepeserkirî hatine şayesandin.

Wekî yazîya wan her du cimetan mînanî hev e..." (Hisreta Emir. 59).

Kurd û ermen weku du milletên biçûk û bindest tîn dîyarkirin. Bi rexneyên tûj ve axa û beg tîn tawanbarkirin. Her çi qas Temir Beg jî begekî kurdan û misilman jî be, ew naşibe beg û axayên din. "Ew beg û axayê me yî evsene ne ku tenê dijminê Ermenîyan e, lê wisa jî dijminê cimeta me bi xwe ne. Ew avê dîkin ser aşê dijmin. Dutîretîyê dîkin orta Kurdan û Ermenîyan..."(Hisreta Emir. 60).

Di çîrokê de tê vegotin ku di welatê Romê de dostê kurdan yê rast ermenî ne. Kurd û ermenî di vî gundî de bi hev re şerê leşkerên Romê dîkin û destûrê nadin ku bikevine gundê wan. Mirovên ermenî li ser vê yekê û kirinên kurdan dipesînin. "Hetanî kurê kuran em kirina Kurdêd dost ji bîr nakin..." (Hisreta Emir. 76).

Kurd di qirkirina ermenîyan de bi tifaq û bi biryar in. Lewra wan cîranên xwe yê sedsala dibînin. Kurd bi mîrxasî li wan xwedî derdikevin. Nivîskar her carê bi mijarên cihêreng ve mîrxasî û dilêrîya kurdan tîne ziman. "Em ne ku tenê gotî tevî wê qetlê nebin, lê gerekê bi her teherî Ermenîyan xweyî bikin, alîkarîyê bidin wan..." (Hisreta Emir. 65).

Bi vî awayî em dikarin bêjin çîrok bi naverok û peyamên xwe ve biratîya du gelên ji hev cihê derdixe pêş. Her çiqas ev her du qewm dînê wan ji hev cihê jî be; ev yek di têkilîyên wan de ji wan re nabe astengî û arîşeyek. Her wiha Emerîkê Serdar weku nivîskarekî hêla Sovyetê, çîroka xwe li ser nîrxên realîzma civakî honandîye. Di çîrokên nivîskar de ermenî û kurd di çarenûseke hevpar de tîne şayesandin. Qirkirin, rev û koç bûye para wan. Tirk jî weku di çîrokan de tê behskirin Roma reş

dijminekî hevpar yê her du neteweyan e. Nivîskar di vê çîrokê de balê dikşîne ser komkujîya ermenîyan ya destpêka sedsala 20î.

Di çîroka “Zewaca Elo” de jî em dibînin dema Elo ji gundê xwe rê dikeve ku biçe nehîyeyê, vegêr qala dostê wî yê ermenî dike. “Di binetara gêlî de, di rastê de gundekî Ermenîyan bû. Mala dostê wî li perê wî gundî bû. Fikirî weku wê şevê li mala dostê xwe bimîne...” (Hisreta Emir: 117)

Ev yek di hin çîrokên din de jî tê şayesandin. Di nêzîkê gundê kurdan tekez gundekî ermenîyan heye û kurd di wî gundî de xwedîyê dostekî ermenî ne. Nivîskar bi vê minasebetê jî dixwaze dîyar bike ku di navbeyna van her du gelan de têkilîyên germ hene. Ew dost û kirîvên hev tînin şayesandin.

Di çîroka “Du Qewimandin Ji Emrê Mektebê” de jî mijar heman awayî pêwendîya kurd û ermenîyan e. Di vê çîrokê de jî em dibînin ermenî bi awayekî êrenî hatine şayesandin. vegêr dema qala mamosteyê xwe yê ermenî dike dibêje

“Wexta dîsa wî bi me re her tenê Ermenî xeber dida, lê di navdersan de bi me re Kurmancî xeber dida.” (Hisreta Emir. 130).

Em dibînin mamosteyên wan yê zimanê di heman demê de zimanê kurdî jî dizane û ji bilî dersan bi xwendekaran re bi zimanê wan diaxive. Ev yek jî di çîrokên nivîskar de xaleke sereke ye. Ermenî dostê kurdan in û wan û zimanê wan diparêzin. Lê em dibînin ku di navbeyna bîranîn û metnên çîrokan de cîyawazîyek heye. Lewra di çîrokan de, di navbeyna kurd û ermenîyan de têkilîyekî pir dostane hatîye rave kirin. Lê di bîranînên nivîskar de portreyekî baş ya ermenîyan nîne.

3.2.4 Kolxoz

Kolxoz (kollektivnoye hozyaystvo/çandinîya kolektîf) di hêla Sovyetan de di warê cotkarîyê da weku çewlîgên kolektîf hatine damezrandin. Pergala kolxozê li gorî rêgezên sosyalîzmê û bi mebesta pêşxistina aborîya gundîyan tînin avakirin. Zevîyên gundîyan ji alîyê dewletê ve tînin desteserkirin û piştî jî ev qadên çandinîyê bi destê dewletê ve weku navendên hilberînê karên xwe bi rê ve dibin. Li çewlîgên kolxozan hemû karûbar ji alîyê gundîyan ve tînin meşandin. Hinek dahata berhemên

kolxozan ji bona mesrefên çewlîgê dihate bikaranîn. Dahata mayîn jî weku fonekî kedê dihate cuda kirin. Stalîn di plansazîya pênc salane ya nû (1933-1937) de pergala kolxozvanîyê weku polîtîkayeke giştî dide sependin. Bi vî awayî jî di têkçûyîna aborîyê de; pergala kolxozvanîyê weku çareyekî derketîye holê (Karabulut, 2019: 62).

Di kolxozan da ji şanzdeh salîyê mezintir her kes dikare bibe endamê kolxozê û di kolxozê da bixebite. Pergala Kolxozvanîyê ne tenê ji bona çandinîyê hatîye damezrandin. Di kolxozan de heman demê da pez û dewar jî dihatin xwedîkirin. (Erşem: 1930: 1-12)

Bi mebesta jîyana kolkîf de, kolxozan kar û barên cotkarîyê rêve dibirin. Pergala kolxozê di nava edebîyata kurdên YKSS de jî weku babet hatîye nivîsîn. Di van berhemana de kolxoz zêdetir bi rûyê xwe yê îdealîzekirî ve derketîyê pêş. Di kolxozan de jin û mêr bi awayekî kolektîf tev li xebatê dibin. Emerîkê Serdar jî weku nivîskarekî serdema Sovyetê di bîranîn û çîrokên xwe de cih daye mijara kolxozê. Emerîkê Serdar di nêrîn û nirxandina pergala kolxozê de bi çavekî îdealîzekirî lê nanêre. Ew bi awayekî realîst tevdigere; şahidî û serpêhatîyên xwe di rewşeke objektîf de tîne ziman. Di bîranîn û çîrokên Emerîkê Serdar de kolxozvan di şiklê axa û begên feodal de derdikevine pêş. Lewra pergala axa û began ji holê rabûye û di şûna wan de kolxozvanan civak tepeser kirîye. Di çîrokên Emerîkê Serdar de kolxozvan yan jî rayedarên kolxozê, mirov dikare weku bûrokrasîya wê serdemê rave bike. Ne tenê weku bûrokrasîyê belkî weku desthilatdarîyê bîr ravekerin. Kolxozvan hin caran bi kirinên xwe yê neyînî ve jî cî digirin. Her çiqas di serdema Sovyetê de bi hişmendîyeke gelparêzîyê ev pergal û dezgeh hatibin damezrandin jî di çîrokan de em rastî hin wêneyên dijî vê yekê jî tên. Îmaja kolxoz û kolxozvanan li cem Emerîkê Serdar piranî neyînî ye. Bîranînên nivîskar de kolxoz piranî bi zordestî û zilma xwe ve tên nîşandan.

Cîranekî me jî çûbû bajêr dixebitî. Êdî dest bi gîhadirûnê bûbû. Zevîyan keke girtibûn, lê ew hela nehatibû. Zevîya li ber derîyê wan jî rind şîn bûbû. Zevî jî zevîya ceh bû. Çavê neferên malê li wê zevîyê bû, ebûra wan li ser wê bû. Rojekê jî dadxwazê (prokûrorê) nehîyeya Elegezê A.X. hat

û gava pê hesîya, wekî hela ew cîrana me ji bajêr nehatîye û dest bi xebata sîloshazirkirinê bûye, sedrê kolxozê da pê xwe, li ber derîyê wê mala cîranê me sekinî û dawa malxuyê mala kir. Diya wî got, wekî hela ji bajêr nehatîye, lê wê zûtirekê bê. Dadxwaz vegeîya ser sedrê serwertîya kolxozê û bi hêrs gotê;

-De wekî nehatîye, gazi çend kelendîkêşan bike, bila bîn, zevîya wî ya şîn bidirûn, bibin bikin sîlos, weku zanibe, çawa neyê di kolxozê de nexebite. (Serdar. 2018a: 45-46).

Gundî, xebata kolxozê piranî bêperetî û bi darê zorê dikan. Ji ber tirsê nefîkirina Sîbîrê jî qet nikarin dengê xwe bikin. Kolxozvan bi keyfî li wan tîrî xezibê. Kolxoz di çîrokan de ne weku cihê jîyana kolektîf piranî di nava hin çîrokan de yan bi kirinên rêvebirên wê ve yan jî tenê weku nav derbas dibe. Di nava jîyana rojane de kar û barên xebata kolxozê karekî ji rêzê ye. Keç û xortêd gund di kolxozan de dixebitin. Lê di çîrokên nivîskar de em rastî îdealîzekirina kolxozan hema bibêje qet nayên.

Di çîroka “Name”yê de kolxoz ji bo ciwanên evîndar cihê hevdiîtinê ye. Lê di çîrokê de der heqê kolxozê de em rastî tu helwesteke yan jî şayesandineke nivîskar nayên. “Wexta em; qîz û xortêd gund, bi tevayî diçûn xebata kolxozê, lingên min erd nedigirt. Ne axir ew ê ji sibeyê hetanî êvarê li ber çavên min be, dengê ken û xebirdana wê li ber guhên min be.” (Destê Dê. 8).

Wek ji metnê jî tê kifşê bi kar anîna peyva kolxozê di vê derê de ne ji bo wê yekê ye da ku nivîskar erka kolxozê bide der. Ew di jîyana rojane de, cihê kombûn û hevdiîtinê hatiye şayesandin.

Di çîroka “Namebir” de Temo piştî şer vedigere di kolxozê de dixebite. Lê ji ber astengbûna xwe nikare karê kolxozê de bixebite û bi pêşniyara sedrê kolxozê dibe namebir. Em dibînin rayedarên kolxozê di nava civakê de weku rêvebir tîrî diîtin. Lewra bi spartina sedrê kolxozê Temo dest bi karê namebirîyê dike.

Kolxoz, di çîrokên Emerîkê Serdar de weku li jorî jî me gotî piranî bi rûyê xwe yê neyînî ve tîrî şayesandin. Di xebata kolxozê de gundî bêpere karê kolxozê

rêve dibin. Piştî karê kolxozê diqede gundî ji nû ve berê xwe didin bajêr û li bajêr dixebitin. Di çîrokê de jî apê vegêr piştî ku xebata kolxozê diqede ji bona xebatê berê xwe dide bajêr. Ev yek di çîroka “Guman” de wiha tê vegêran: “Xebata kolxozê gund tu tiştek nedida, çend pezên me hebûn, lê dewar tune bûn. Lewma jî wexta xebata deştê kuta dibû, apê min serpayîzê diçû Tbilîsîyê, çend mehan dixebitû, ji malê re hebek tişt-mişt dikirîn, dihat.” (Dengê Dil. 21)

Wek ku ji metnê jî dîyar dibe kolxoz tu sudekî nade gundîyan û li ser de jî li ser piştê wan dibe barekî giran û ji ber kar û xebata kolxozê belengazbûna gundîyan her ku diçe girantir dibe.

Nivîskar di çîroka “Vê Carê Jî” de têkilîyên gundî û kolxozê dike honaka çîroka xwe. Di çîrokê de em rastî xebata kolxozê jî tên. Gundî di kolxozê de dixebitin. Lê di çîrokê de em li ser gotinên nivîskar dibînin ku berpirsiyarê kolxozê yekî nebaş e. Li ser gundîyên belengaz zordestîya kolxozvanan heye. Vegêrê çîrokê vê yekê wiha radigihîne:

Wê êvarê min bîrkir, çarixê xwe nekire avê. Ez ku sibê nava cya rabûm, kete bîra min, wekî min çarixê xwe nekirme avê. Teze min çarix kirne avê. Gizîrê gund ber dêrî sekinî, gazî min kir, wekî herme horîkê. Min gotê, wekî çarixê min hişk bûne, teze kirye avê, bira îro jî yek dewsa min here horîkê bajo. Gizîr çû, lê xêlekê şûnda dîsa paşda vegerya.

-Sedir gotye, bira pakî rabe, bê, — ewî got, — yanê na ezê bêm ç’evê wî derxim.

Ya ç’evderxistinê, hilbet, derew kiribû, lê ya îsafê rastî jî merîkî gelekî bêîsaf bû. Îlahî bona wan merya xurt bû, ku xweyê wan tunebûn. Ya min jî... “Mêrê” mala me ez tenê bûm, ku wî çaxî ancax 10-12 salî bûm. Qewm-pismamê me jî gund da tunebûn. Ê, sedrê min û çî min vekîşya?” (Gundê Me. 11).

Wek ku di jêgirtinên çîrokê de jî xuya dibe kolxozvan li ser gundîyan zordariyekî dimeşînin. Vegêrê çîrokê jî ji ber ku kesekî wî di gund de tune ye bi vê yekê re zêdetir rûbirû dimîne. Di piranî edebîyata kurdî ya Sovyetê de kolxoz û

kolxozvan bi hişmendîyekî îdeolojîk hatine îdealîzekirin. Lê helwesta nivîskar Emerîkê Serdar piranî rexnekirin e. Di çîrokên nivîskar de kolxoz temsîlyeta axa û begên berîya şoreşa cotmehê dikan. Axa û beg piştî şoreşê ji holê rabûne û di dewsa wan jî kolxozvanan dagirtî ye û zordestîya ser civakê vê carê jî bi destê kolxozvanan tê meşandin. Kolxozvan bi hincetên cihê cihê ve zilmê li civakê dikan. Di çîrokê de jî em dibînin ku vegêrê çîrokê rastî zilma kolxozvanan tê û kolxozvan destûrê nadin da ku here dibistanê. Wî bi darê zorê di kolxozê de didin xebatê, vegêrê yekê wiha radigihîne:

Paşwextîda jî usa bû: gava min koma hevta gundê meda kuta kir û gundê cînarda, li ku mekteba orte hebû, çûme koma heyşta, ewî dîsa neheqî min dikir. Wexta kolxozvan nêzîkî wê rê dixebitîn, bi kîjanê ez diçûme mektebê, ese dihat pêşya min digirt, çelte ji destê min digirt, alîkîda kewkî dikir, nedihîşt ez herme mektebê, zorê dibirim, didame xebatê. Lema jî, wexta min zanibû, wekî wê rojê xebatçî nêzîkî rê wê bixebitin, ez îdî wê rêra nediçûm. Lê diketime ç'emê nêzîkî rê, ku havînê dimiç'iqî, xwe kûz dikir, wekî yek min nebîne, diçûm, gelekî ji xebatçya dûr diketim, paşê ji ç'em derdiketim, dida serê rê û diçûme mektebê. Wextê vegerandinê jî min usa dikir. A, ewî usa min kiribû eynat û bi her teherî neheqî min dikir. (Gundê Me. 12).

Wek ku di çîrokê de jî tê dîtin kolxozvan gundîyan bi darê zorê be jî didin xebatê. Kolxoz her wiha di çîrokê de ne weku navendeke civakê, weku cihê zilmê tîne şayesandin. Ev cîwayazîyeke nivîskar Emerîkê Serdar e ku gelek caran xwe ji rêbaza realîzma civakî dûr digire. Pergala kolxozvanîyê bi awayekî realîst radixe ber çavan.

3.3 TEMAYÊN TAKEKESÎ

3.3.1 Dayîk

Temaya bingeîn a çîroknûsîya Emerîkê Serdar temaya “dayîk”ê ye. Dayîk di çîrokên wî de bi gelek awayan ve tîne şayesandin û îdealîzekirin. Ev yek ji ber jîyan û jînenîgarîya nivîskar e. Lewra nivîskar bavê xwe di şerê wetenîyê yê mezin de wenda dike û bi dayîka xwe ve tenê û sêwî dimîne. Dê, ji her alîyê ve li ber xwe dide û da ku

hîssîyata nebûna bav bi kurê xwe yê tayê tenê nede dîyarkirin. Emerîkê Serdar di bîranînên xwe de sedema nivîskarîya xwe, diya xwe dide nîşan. Ew her wiha dîyar dike ku îlhama xwe ya nivîskarîyê ji dîya xwe wergirtî ye: “Nivîsên min ên ewil li ser bîranîna dayîka min bûn. Min ji bona wê, da ku qala wê bikim dest bi nivîsandinê kir.” (Brèteque, 2017: 106). Ji ber vê yekê ye ku di çîrokên Emerîkê Serdar de dê, her tim weku babetekî sereke derketîye pêş. Dê, bi xemxurî û dilnizmîya xwe ve di çîrokan de cihekî berfireh digire. Ji ber vê çendê ye Emerîkê Serdar yekemîn pirtûka xwe ya çîrokan bi sernavê *Destê Dê* daye weşandin. Pirtûk bi wêneyê jineke temen mezin ve derçûye. Ev wêne ne tesadûfî li ser berga pirtûkê hatîye bicihkirin. Li ser vê yekê Emerîkê Serdar di bîranînên xwe de serpêhatîya vê wêneyê, dema pirtûkê dixwaze çap bike wiha dîyar dike:

Şikilkêş B. Mazmanyar ji min pirsî pirtûk der heqa çi de ye. Gava pê hesîya têmatîka pirtûkê çi ye, wî bi hûrgilî derheqa wan afirandinan de pirsî, ku bi temaya dê hatine nivîsarê. Û gava sala 1974'an pirtûk neşir bû, ez ecêbmayî mam, wekî şikilê li rûyê pirtûkê yî pêşîn çi qasî mînanî şikilê dayîka min e. Hetanî niha jî ez nikarim şirove bikim, wekî çawa mîna hevûna wisa karibû biqewimîya, gava şikilkêş tu wextî ne dayîka min, ne jî şikilê wê dîtibû... (Serdar, 2018a: 366-367).

Babeta dê ne weku tema her wiha gelek çîrokên Emerîkê Serdar jî bi sernavê dê hatine nivîsîn. “Çavên Dê Li Rêya Kur Bûn”, “Dê”, *Destê Dê*, “Dayîkê Bar Kir”, “Dayîk Li Hêvîyê ye”, “Dayîk Hat Derda Xwedê Rabû Berda”, “Li Ber Çavên Dê”, “Dêmarî”, “Dayîka Te Li Rex Te ye” û “Şikilê Dê” ji van çîrokan in ku di serenavên wan de peyva dê derbas dibe.

Temaya dayîkê di çîroknûsîya Emerîkê Serdar de bi awayekî giring cih digire. Di pirtûkên Emerîkê Serdar yê *Destê Dê*, *Edî Dereng Bû*, *Dengê Dil*, *Hisreta Emir û Gundê Me* de bi awayekî berbiçav temaya dê tê dîtin. Wek li jor jî hatîye ravekirin. Di çîroknûsîya Emerîkê Serdar de dayîk, paşxaneya xwe ji jînenîgarîya nivîskar û ramanên wî yê li hemberî dayîka wî pêk tên. Wek ku tê zanîn Emerîkê Serdar sêwî mezin bûye. Ji ber vê çendê jî nêrîna dayîkê li cem Emerîkê Serdar gelek giring e û dayîk û dayîkbûn cihekî berfireh digire. Temaya dayîkê di pêwendîya dê û

kur de hatîye vegotin. Ev yek jî bi jîyana nivîskar ve têkildar e. Lewra bêyî ku mirov jîyana nivîskar têbigihe ne mimkun e ku mirov vê yeke şirove bike û biwesfîne. Di çîrokên nivîskar de temaya dê, mirov dikare li ser dayîkbûna jinekê rave bike. Lê ev dê bingeha xwe ji dayîka kurd wergirtîye. Çawa ku em ê di mînakên li jêr de jî bibînin temaya dayîkê di çîrokan de jîyana nivîskar jî radixe ber çavan.

Mijara çîroka “Çavên Dê Li Rêya Kur Bûn” li derdora dayîka Henê û kurê wê hatîye honandin. Dayîka Henê kurê xwe yê bi tayê tenê, şandîye leşkerîyê û çavê wê her tim li rê ye. Lê bi miraza xwe şa nabe û bi çavên vekirî ji vê dinyayê bar dike.

Dayîka Henê jî kur verê kir şêr û vegerîya malê. Tu yê bibêjî dîwarên malê hûyî wê dikirin, nikaribû di malê da rûništa. Ji kerban derdiket derve, li ber dîwar rûdinişt an hildikişîya ser xênî û zûr dibû li wê rêyê dinêrî, ku rojekê Ezîzê kurê wê bir û paş de neanî. Dinêrî, dinêrî û caran qeretûyê Ezîzê wê ji dûr ve dihat ber çavan... (Destê Dê. 32).

Wek ku tê dîtin Henê piştî çûyîna kur tebatî pê nakeve û her tim bi çavênîya rêya kur dike. Ne tişteki hindik e jî, kurê wê bi rêyeke zehmet de çûye dibe ku venegere. Henê di nava tenetî û bêkesîyê de çavê wê tim li rê dişopîne. Her tişt ber çavan weku Ezîzê wê tê pêş. Di malê de li hêvîya kur e. Ji ber vê yekê jî, şevê jî dema ku tarî dibe lambeya xwe tim vêketî dihêle. “Ji nişkê ve Ezîzê min bê, bila nebêje çima mala min vêsîyaye.” (Destê Dê. 32-33)

Lê Henê bi mirazê xwe şa nabe û nexweşî lê zor dikin û dimire. Lê di çîrokê de em hay ji serpêhatîya Ezîz nabin. Dema Henê dimire çavên wê vekirî bi hesreta kurê xwe bar dike. “Çavên wê li rêya kur mane, - ji haziran yekî got. – Bila yek destê xwe bide ser çavên wê û bibêje: ‘Ev destê Ezîzê te ye.’ wê çavên wê bikevin hev. Wisa jî kirin. Çavên dayîkê ketin hev. Çavên dê li rêya hatina kur bûn.” (Destê Dê. 33) Di çîrokê de şayesandinek nehatîye kirin. Henê tenê weku dayîk hatîye binavkirin û nivîskar zêdetir li ser dêrûnîya wê rawestayîye.

Di çîroka “Destê Dê” de navê dayîkê nehatîye dîyarkirin. Nivîskar wê tenê weku “Dayîka zarêd hûr tal nexweş bû...” (Destê Dê. 53) dide nîşandan. Em ji metnê tê digihijin ku jineke bi temen piçûk e. Bi hemû heyîna xwe ve piştî mirina xwe jî

çavê wê li ser zarokên wê ye. Çîrok bi awayekî hestiyar hatîye afirandin. Jixwe ev çîrok heman demê de bûye navê pirtûkê jî. Destê dê weku metafor hatîye bikaranîn. Dayîk di ber mirinê de, ji mêrê xwe hêvî dike ku piştî mirina wê bizewice. Lê daxwazekê jî jê dike:

Na, ezîzê min. Rabûna min tune ye, tu destê xwe ji min bişo. Ji niha de di der heqa xwe û zaran de bifikire. Tu temî û weysetên min tune ne, -bi dengekî wisa jinê got ku ji te tirê ew deng ji binê bîra kûr tê. – Tu ji min rindtir zanî, wekî çi bikî û çawa bikî. Ez zanim, wekî tu yê piştî min bizewicî. Tu nikarî nezewicî, zarokên te hûr in. Lê her tenê hêvîkirina min ji te ew e, wekî tu piştî mirinê destê min di ber zendê re bibirî û bidî dêmarîya zarên min... Wexta ew zarên min dikute, bila bi destê min li wan xe, destê dê sivik e, wê neêşin û neçilmisin. (Destê Dê. 54).

Çîrok li ser xemxurîya dayîkê hatîye vegotin. Dayîk li ber mirina xwe nakeve û dilê wê her tim li ser zarokên wê ye. Taybetmendîyeke vê çîrokê jî ew e ku temaya dêmarîyê tê vegotin. Dema dê behsa dêmarîyê dike dibêje bila bi destê min li zarokên min bide. Sembola dêmarîyê di tradîsyona kurdî de weku neyînîyekê tê bikaranîn. Lewra dêmarî piranî bi rûyê xwe yê neyînî ve tê vegotin.

Di çîroka “Dayîkê Bar Kir” de babet dîsa dayîkek e. Kurê xwe di şer de wenda kirîye. Kurê wê di welatekî dûr de hatîye kuştin û dayîk nikare sebir bike û bar dike û diçe li ser menzelê kurê xwe kon vedide û her roj menzelê kurê xwe av dike. Dayîk, menzelî mîna kurê xwe xwedî dike. Dema jê dixwazin ku bar neke bersiva dayîkê bi hestiyarî ye: “-Pî, dayîka wî kor be, di welatê xerîb de tenê maye...” (Destê Dê. 84).

Di çîroka “Dayîk Li Hevîyê Ye” de jî babet dîsa şer û bendewarîya dê ye. Dê ku kurê wê beşdarî şer bûye venegerîyaye, guhê tim li ser şer e. Dê qet qebûl nake ku şer qedîyaye. “Na xêr! Ji bo dayîkê hela hê şer e, hela kurê wê di deşta şer de dike şer, lewma hetanî niha nehatîye, lê wê ese bê, çavên dayîkê li rê nahêle, bi dê re bêbextîyeke wisa nake.” (Destê Dê. 85). Nivîskar bi vî awayî çavênê û hisreta dayîkan bi zimanekî hestiyar ve tîne ziman. Dayîk dawîbûna şer jî napejirîne lewra

hîn kurê wê ji şer venegerîyaye. Ger qebûl bike ku şer qedîyaye wê çaxê hewce ye mirina kurê xwe jî qebûl bike. Tu wextan naxwazin hêvîya xwe winda bikin.

Nivîskar di çîroka “Namebir” de dîsa li ser hestên dayîkekê zûr bûye. Di vê çîrokê de jî mîna hin çîrokên din çavê dê li rêya kur e. Ev helwesta nivîskar piranî çîrokên li ser şer hatine honandin de weku babet derdikeve pêş. Kurê Xezalê Şamil, di enîya şer de ye û gelek caran nameyên wî derengî dibin. Şer dîsa di vê çîrokê de jî bi rûyê xwe yê sar nîşan dide û kur û dayîkê ji hev qut dike. Şerê ku diqewime êşeke giran li paş xwe hiştîye. Xezal keseke gundî û nexwendîye. Dema name ji kurê wê tîkare wana bixwîne û jê re bersivekî binivîse. Di şûna wê de Temoyê Namebir nameyan dixwîne û dinivîse. “Çêlek qurbana Şamil e, bila bê bi destê xwe serjê bike. Lê îro tu gotî vê mozîkê serjê bikî. Ez ê qurbanê belav bikim, weku Şamilê min sax e.” (Êdî Dereng Bû. 12).

Dayîka Xezal, tim dilsojê kurê xwe ye ku leşker e. Çavê dayîkê dîsa di vê çîrokê de jî li rê dişopîne. Wek tê dîtîn şer û trajedîya şer di çîrokên Emerîkê Serdar de piranî li ser dayîkan hatîye ravekirin. Dê, piranî çavên wan li rê ne û gelek caran jî bi mirazê xwe şa nabin û dimirin. Di çîroka “Namebir” de dayîka Şamil Xezal jî, yek ji van dayîkan e. “Jinan li ser Xezalê dinivatin, kilam diavêtin ser rêya Şamile dûr, xerîbê xwe û digirîyan.” (Êdî Dereng Bû. 15).

Di çîroka “Êdî Dereng Bû” de vegêr hestên xwe yê li hemberî dayîka xwe tîne ziman. Çîrok li ser têkilîya kur û dayîkekê hatîye honandin. Di çîrokê de em ne navê dê dibihîzin ne jî navê vegêrê çîrokê. Bavê leheng beşdarî şer bûye û venegerîyaye. Loma jî vegêr bi dayîka xwe ve tenê maye. Nebûna bav, vegêr çetir bi dayîkê ve girê dide. Dê di çîrokê de ne tenê dê ye; ew heman demê de di peywira bav jî de derdikeve pêş. “Bavê me ne li wir bûn, çûbûn ber şêr. Şêr destê me û bavê me hi hev qetandibû. Dayîkên me diha hişk bi destê me girtibûn.” (Êdî Dereng Bû. 38). Di peyva “destê me diha hişk girtibûn” hem xwedî lê derketina zarokan e û hem jî kerba li hemberî şer tê vegotin. Vegêr têkilîya xwe û dayîka xwe bi awayekî realîst dide der. “Diya min ji bo min her tiştî fikir, kincên min û çarixên min didirût.” (Êdî Dereng Bû. 39).

Dayîk di çîrokê de nehatîye şayesandin tenê em wê bi tevgerên wê ve nasdikin. Dilê dayîkê tijî kul û xem in. Lê di bin vî barê giran de namîne û kurê xwe hindî ku ji destê wê tê, lê xwedî derdikeve. Vegêr pir bi pesindarî qala wê dike. “Û ez bêbav mezin bûm. Diya min him ji min re bav bû, him jî dê” (Êdî Dereng Bû. 39).

Vegêr bi çavekî nostalgîk bi dilekî hisret rojên zarokatîyê û tevgerên dayîka xwe bi bîr tîne. Jixwe navê çîrokê jî “Êdî Dereng Bû” ye. Derengbûn êdî nostalgî û bîrewerî û hisreta rojên borîye. Dema qala serpêhatîyeke xwe û dayîka xwe dike vê derengbûnê çêtir rave dike.

Carekê jî em çûn çîyê pêsarîyan, dîsa çewalê pêsarîyan piştî diya min bû, ez jî li pêşîya wê dihatim. Wexta em ji çîyê peya bûn, çawa qewimî, lingê imm şimitî, ez li erdê ketim, tulol bûm. Eger hebekî jî tulol bûma, ez ê ji kendêl de biketama. Hetanî niha jî ez nikarim texmîn bikim, wekî dîya min bi çi lêzê, bi çi zorayîyê çewalê piştî xwe avêt, xwe bi min gihand û ez girtim... Êpêceyî girîya. Hey digirîya, hey li min dinêrî. Di çavên wê da sawa windakirin û şabûna dîtina min tevî hev bûbû. Wê çaxê min nizanibû, wê çaxê ez î nezan bûm. (Êdî Dereng Bû. 40).

Dayîk ji alîyê veger ve bi zimanekî hestiyar hatîye şayesandin. Dayîka ku mêrê xwe ji dest daye tim bi tirs e û li ser kurê xwe diricife. Dê, di mezinkirin û perwerdekirina kurê xwe de kedeke mezin dide. Piştî wextan dema ku vegêr ji bona xwendinê ji diya xwe qut dibe; dayîk şa ye ku kurê xwe daye xwendin û bi xem e jî; lewra kurê wê, wê jê dûr bikeve. Bala dê tim li ser kur e. Vê yekê jî vegêr bi nameyên ji hev re şandî de dide der. “Bûm xwendekar. Name dihatin diçûn. Lê nameyên wê diha gelek bûn. ‘bîna te jî nameyên te tê, lawo.’ Timî wiha dinivisî. Ez cahil bûm, ez î bêxem bûm.” (Êdî Dereng Bû. 41).

Dê li hemberî kurê xwe dilsoj e. Lê kur li gorî dîya xwe ew qas jî bi dilsoj nîne. Vegêr vê yekê bi ciwantîya xwe ve girê dide. Mezinkirina kur ji dayîkê re serfirazî û kubarîyeke mezin e. Vê yekê vegêr wiha vedibêje: “Rojtira mayîn kincên xwe yî bûktîyê li xwe dikir, bi rex min diket û em diçûn mala xalê min. Çiqas şa bû, çiqas kubar bû. ...: Hûn dibînin xortekî çawa ji kurê min î tayê tenê derketîye? Niha bi rex dê ketîye, diçe mala xalê!...” (Êdî Dereng Bû. 42).

Kur êdî tekane pêwendîya dê ya jîyanê ye. Kêfxweşîya dê ya jîyanê hebûna kurê wê ye. Ew jê re ne tenê weku kur; mêrê malê ye jî. Dahatûya paşeroja wê ye. Mijûlahîyên dê tenê ne ku mezinkirina kur e. Kar û barên malê jî hemû li ser milê wê ne. Ew hem dayîk e û hem jî weku malxweyê mala xwe ye. Di nava hemû zor û zehmetî feqîrîyê de mala xwe jî rêve dibe. "...Heywanê me tune bûn. De, di gundê çîyê de hewyanê kê tune be, ardûya wan jî tune ye. ... Ez û diya xwe dîçûn, me li çolê pesarî top dikirin. Wê şalikekê mezin dida ber xwe, em bi bestê diketin û me pêsarî berhev dikirin." (Êdî Dereng Bû. 39).

Dayîk di çîrokên nivîskar de bi dilşewat û xemxurîya xwe ve derdikevin pêş. Di çîroka "Zînê" de jî em rastî dayîkeke xemxur tên. Zîn û Xetîf du Evîndar in. Dema ku Xetîf diçe leşkerîyê Zînê dizewicînin. Lê ji ber ku mêrê wê gelek tahdêyê lê dike, Zînê bi qîza xwe ve li mala bavê xwe vedigere. Piştî ku vedigere ew û Xetîf dîsa bi hev re diaxivin. Xetîf di têkilîya wan de qîza Zînê weku hincet dibîne. "- Ne wexta keçik li cem te be, em nikarin bên te bixwezin. -Qelpîyê neke, wisa nîne, - wê bi bawerî gote min. - Ji te tirê ez nizanim te wê belengazê kirîye eynat? Nizanim çima. Wê nanê para te xwerîye çi ye?" (Êdî Dereng Bû. 69).

Zînê her çiqas evîndarê xwe Xetîf hez kiribe jî lê destê wê ji qîza wê nabe. Lê di vê derê de dayîkbûn, ji evîntîyê xurtir derdikeve û Zînê ji vê yekê qayîl nabe û ji şûna hezkirîyê xwe qîza xwe tercîh dike. Dayîkbûn hemû hest û ramanên wê yên evîntîyê wêdetir e.

Ez berê ewilin ji bo qîza xwe diçim. Ew bi şev û roj li ber çavên min e, ez nikarim wê ji bîr bikim. Bêyî wê emrê min bi kapêkekî nehêja ye. Rastîyê bibêjim, min nizanibû, wekî hezkirina ewled ew qasî bê hed û bê hesab e û pê re jî şîpûkeke ew qasî mezin e. Ez nikarim bêyî qîza xwe bijîm û gotî herim bigihêjimê. ... Bi fikra min, tu texmîn dikî, wekî ez ji te hez dikim. Lê dilê dê diha zor e, ne ku dilê bengî... (Êdî Dereng Bû. 87).

Ji gotinên Zînê jî em têdigihijin ku di çîrokê de hestên dayîkbûnê ji hestên evîntîyê serdestir e. Dayîk li şûna hezkirîyê xwe; li qîza xwe vedigere. Terka evîndarê xwe dike lê terka qîza xwe nikare bike. Ev jî xisûsiyetekî çîrokên nivîskar e.

Lewra nivîskar bi hemû awayan ve dayîkê derdixê pêş û hestên wê yên dayîkbûnê bi awayekî berbiçav îdealîze dike.

Di çîroka “Rasthatin”ê de em dîsa rastî dayîkeke xemxur tên. Dayîka xwedîyê qîzeke piçûk ku ji ber şer revîyaye û mêrê wê di rê de ji alîya leşkerên Romê ve hatîye kuştin bi hemû hêza xwe ve dixwaze qîza xwe biparêze. Lewra ji bona vê yekê di nava malekî dewlemend de dixebite da ku bikaribe qîza xwe xwedî bike. Xwe birçî dihêlê û naxwe û parîyê devê xwe dide qîza xwe. Ev yek di çîrokê de bi awayekî trajîk tê vegotin: “Wexta xwarin hindik bûya, dê nedixwar didayê, ew dixapand, weku giva li wê derê xwarîye, lewma têr e, nikare bixwe. Wê çend caran dît, wexta êvarê dê piştî xwe vedikir, kevir ji ber piştê diketin.” (Êdî Dereng Bû. 93).

Wek ku di vê çîrokê de jî tê dîtin dayîkên ku çîrokên nivîskar dê tên şayesandin ne mirovên ji rêzê ne. Ew bi hemû alîyan ve weku mirovên pîroz hatine şayesandin. Mezinkirin û xwedî lê derketina zaran tekane mebesta wan e. Jîyana xwe bi tevayî ji bona zarokên xwe terxan kirine. Dê, di çîrokên Emerîkê Serdar de bi her alî ve hatîye îdealîzekirin. Hestên dayîkbûnê li ser hemû hestan de ye. Dayîk bi reftarên xwe û bi hestên xwe ve di çîrokan de di lûtkeyekî bilind de hatine bicihkirin. Di civakê de helwesta hemberî dêmarîyê piranî neyînî tê vegotin. Lê di çîroknûsîya Emerîkê Serdar de ev yek jî vediguhere. Dêmarî jî di şiklê dayîkeke şîr helal de hatine sêwirandin.

Di çîroka “Dêmarî” yê de beramberî helwesta gelemperî, dêmarî bi çavekî baş tê şayesandin. Ev yek li ser lehengê çîrokê Kamil tê vegotin. Kamil ku piştî jina wî dimire xwedîkirina sê zarên biçûk dikeve stûyê wî. Ji bo zewaceke nû dudil e lewra ji fikra dêmarîyê di serê wî da bi neyînî cih kirîye. Lê piştî wextan ku mecbûr dimîne bizewice dibîne ku dêmarîya zarên wî Gulperî yeke pir qenc e. Her çiqas di çîrokê de dîsa jî dêmarî bi rûyekî nebaş bê nîşandan Kamil dijî vê yekê radibe û fikra gelemperî napesînîne. Helwesta xwe ya der barê Gulperîyê de bi vî şiklî tine ziman û qedreke zêde dide Gulperîyê. “Meriv a xwedê bibêje Gulperîyê jî ew mînanî ronayîya çavên xwe xwedî dikirin.” (Êdî Dereng Bû. 140).

Di çîrokê de di kesayetîya Gulperîyê de helwesta li hemberî dêmarîyê berevajî dibe. Ji ber kirinên Gulperîyê û helwesta wê ya li hember nevisîyên xwe, mirovan heyirî dihêle. “Û em ecêbmayî man, gava pê hesîyan, wekî ew dêmarî ye.” (Êdî Dereng Bû. 143).

Temaya dê di pirtûka nivîskar ya *Dengê Dil* de jî weku temayeke sereke ye. Di çîroka “Şikilê Dê” de vegêr mirovekî dide nasîn ku di odeya xwe de bi wêneyê dîya xwe ve dijî. Çîrok bi awayekî hestiyarî hatîye honandin. Di vê çîrokê de wêneyê dê bi dîwar ve daleqandî ye. Vegêr radigîhîne ku ew kesê tenê, her tim şikilê dîya xwe temaşe dike. Şikilê dayîkê di dîwarê oda wî ve daliqandî ye: “Tenê bû. Ne jin bû, ne jî zaro. Ji zû de tenê mabû. Her tenê ew bû û şikilê diya wî bû, ku di nava xetadora (ramka) reş de bû û fêza serê wî de, li ser xalîçeyê bidardekirî bû. Hebûna wî, ruhê li ber wî şikilê dê bû.” (Dengê Dil. 64).

Her wiha ji çîrokê jî tê dîtin lehengê çîrokê wêneyê dîya xwe di şûna dîya xwe de datîne û bi dêrûnîyeke xemgîn xwe dispêre wêneyê dayîka xwe. Dê di çîrokê de her çiqas tune be jî bi wêneyê xwe ve li ser kesayetîya kurê xwe bibandor e. Mîna remzeke veşartî di odeyê de li ser ruhê kure xwe bi tesîr e. Kur heçku dîya wî pê re dijî tevdigere. Vê yekê di reftarên xwe yên rojane de jî dide pêş. “Sibêyê şeveqê, wexta radibû, berê ewilîn dîna xwe dida şikilê dê û silaveke şîrîn didayê. Li ber çavan şikil ji cî dihejîya, bengzê dê hê xweş dibû û ji wî tirê dengê dê lê tesele bûbû: ‘di ser çavê min re hatî, ezîzê min.’ Ev dengê dê ji zû de di guhê wî de mabû û bûbû deremek ruhê wî.” (Dengê Dil. 64).

Wek ku tê dîtin dê, piştî mirina xwe ve jî di dêrûnîya kur de bi awayekî zindî dijî. Kur, hisreta dîya xwe û gotinên wê yên şîrîn di bîranînên xwe de zindî hiştîye. Ev jî di jîyana kur de bûye wateya jîyana wî. Çîrok bi bûyereke dîlîzî diqede. Piştî kur koçî dinya dinê dibe û cîran li ser kom dibin, wêneya bi dîwêr ve daleqandî dikeve xarê. Cîran jî wêneyê dayîkê didanin ser sînga kur û wî bi wêneyê dîya vî ve dispêrin axê.

Di çîroka “Dengê Dil” de dîsa em rastî temaya dê tên. Çîrok vegotina trajedîyekî ye. Eslan di nexweşxaneyekê de dixor e. Di sêwîxaneyekê de bê dê û bav

û di hisreta wan de, çavê wî tim di rêya wan de mezin bûye. Rojekê nexweşek navê wê ku Gulê bûye tê nexweşxaneyê. Eslanê dixtor wê emelîyat dike û her wiha pê re mîjûl dibe; da ku zûtirekî baş bibe. Her ku diçe, di dilê Eslan de li hemberî Gulê hestên cuda vedijenin. Lewra Eslan, di sifetê vê jina nexweş de hestên dayîkbûnê hîs dike. Heman hest, di dilê Gulê de jî derbas dibin. Piştî pirs pirsîyaran Gulê pê dihesa ku Eslan sêwî ye û di sêwîxaneyekî de mezin bûye. Ev yek şikekî mezin dixe dilê Gulê. Paşê xala enîya wî û şûna birînekî di destê wî yê çepê de dibîne û êdî tu gumana wê namîne ku Eslanê dixtor kurê wê ye. Vegêr di vê derê de, bi rêya paşveçûnê [flasback] vedigere rojên Gulê yên xwendekarîyê. Gulê û Ezîz du evîndarên hev in û biryar dayîne ku piştî kutabûna dibistanê bizewicin. Lê nagihijîn miraza xwe, şer dest pê dike û Ezîz beşdarî şer dibe û di şer de jî tê kuştin. Gulê di vê navê de ducanî ye û piştî çûyîna Ezîz ji ber guvaşên civakê mecbur dimîne di nexweşxaneyekî de diwelide û pişt re bi rêyekê terka zaroka xwe dike, rêya xwe digire diçe mala bavê xwe. Tenê der heqa zaroka xwe de wê yekê dizane ku; di enîya wî de xalek heye û destê wî yê çepê jî şeş tilî bûye. Bi vî awayî Eslan bi hisreta dê û bav, Gulê jî bi hisreta kurê xwe yê ku terka wî kirî salan derbas dikan.

Piştî Gulê tê nexweşxanê Eslan dikeve nava gumanan. Lewra tişteki derasayî pêk tê û Eslan wê gelekî nêzîkî xwe dibîne. Germahîyek di dilê wî de li hemberî Gulê pêk tê:

Tu yê bibêjî di sifetê wê de tişteki nas hebû. Porê wê êdî êpêceyî spî bûbûn, pozê wê gir bû. Hinarên sûretê wê sor bûn. Çakûç û qelemên wê li cî bûn. Çavên wê girtî bûn, bijangên wê dirêj bûn. Kulfeteke qemer bû û ji ser dêmên wê dihat kifşê, wekî ew qasî jî emrekî pak derbas nekirîye. Qerçomek êdî ketibûne sifetê wê. Eslan jî nizanîbû ji bo çi sifetê wê kulfetê bi wî xweş dihat û bi dilekî baristan lê dinêrî, ji te tirê dixweze li ser sifetê wê tişteki bixwîne. (Dengê Dil. 76).

Gulê, di dilê Eslan de hestên nebinavkirî dide der, ew êdî tim li Gulê difikire. Her çiqas li xwe mikur neyê û nede der jî ew hestên sêwîbûnê di suretê Gulê de dibîne. Ev hîssîyat û eleqeya Eslan bandorê li Gulê jî dike:

Gulê jî zûr bûbû lê dinêrî. Ji nişkê ve çavên wê bi xala enîya Eslan ket. Çavên wê tev hev bûn, demekê lêvên wê lerizîn... ew qasî mînanî hev? Tiştê wisa nikare biqewîme... nikare biqewîme...' Wê çend caran wisa wekiland û tu yê bibêjî ji tiştê tirsîya, çavên xwe venekirin. Li ser temamîya sifetê dixor tenê ew xal dihate ber çavan. (Dengê dil. 81).

Gulê her wiha der heqê Eslan de dikeve gumanan lewra hem dilgermî û dîlnizmîya Eslan û hem jî xala ser enîya wî rabirdûyê tîne bîra wê. Rabirdûyekî wisa tehl ku qe naxwaze kes pê bihese û bihîze. Eslan jî li ser vê yekê li xwe mikur tê û hestên xwe yên li hemberî Gulê wiha şirove dike:

Carinan Eslan ew qasî dirêj rûdinişt, ku wede ji bîr dîkir û te hew dinêrî xwîşka doxtorîyê derî vekir û gazi kirê. 'Ew, bê mene, dewsa diya min tê. Çima ew qasî dilê min li ser wê kulfetê şewitîye? Ne diya min e, ne xwîşka min e, ne qewm û pismamê min e, ez qe nas jî nakim, lê çima ez ew qasî der heqa wê de difikirim û ji roja ew hatîye nexweşxaneyê heta niha rehetîya ruhê min tune ye? Di sifetê wê de çi tiştê batinî heye, wekî ew qasî nêzîkî dilê min e?..' (Dengê Dil. 84).

Wek ku tê dîtin Eslan ramanên xwe yê di der barê Gulê de, bi xwe jî nikare şirove bike. Lê tiştê pêwendîyek di navbeyna wan de heye ku her diçe Eslanî ber bi Gulê ve dikêşe. Eslan, xwezîya xwe ya dê; di kesayetîya Gulê de dide der. Lê ev derbirîna Eslanî jê re bê wate tê. Lewra li gorî wî, Gulê yekî bîyanî ye û çawa çêdibe ku ewqasî girêdayîyê wê bûye. Ev pirs tim di dêrûnîya Eslan de digere lê bêbersiv dimîne. Gulê di vê çîrokê de her çiqas li gorî lehengên çîrokên nivîskar yên din dayîkeke xemxur û dilsojê zaroka xwe neyê şayesandin jî helwesta nivîskar dîsa jî li ber wê êrenî ye.

Gulê ji ber ku kurê xwe terk kirîye û carek din jî li pêy neketîye şerî sûcdar dibîne. Şer û guvaşên civakê weku du sedemên terkkirina kurê xwe dide pêş. Ev weku helwesta nivîskar derdikeve holê. Lewra nivîskar jî, şer û edetên civakê weku du sedemên terkkirina Eslan dide pêş. Vê yekê jî nivîskar bi devê Gulê dide der: "Belkî xwedê mala sebebê şer wêran bike. Ew gişk di rûyê şer de ne... Û serhatî dikete bîrê" (Dengê Dil. 85).

Gulê her wiha hem şerî sedem dibîne û hem jî xwe dike şîrîkê vê bûyerê. Lê dîsa her çiqas xwe mikur bê jî di aşkerekirina vê meselê de, di nava helwesteke giran de ye. Lewra naxwaze vê yekê dîyar bike. Di terkkirina kurê xwe de jî hin caran li xwe mikur tê û xwe suçdarê vî karî dibîne: “Rast e Şer bû, daw bû, pîrsa erf û edet, gilî û gotinên mayîn hene, lê wexta pîrsa gunekarkirinê bê, her tenê ez im gunekar. Û ez gunekarim ne li ber dinyayê, lê her tenê li ber wî û ber îsafa xwe.” (Dengê Dil. 95).

Nivîskar di hêla Gulê de bê alî namîne û alîgirê Gulê ye. Loma jî bi her alî de her çiqas Gulê xwe mikur bê jî nivîskar bi helwesta xwe ve Gulê weku dayîkeke bêguneh dide nîşandan. Sedema vê yekê jî şer û guvaşên civakê dide pêş. Lê qet qala wê yekê nake, ka gelo Gulê pişt wextan li pêy kurê xwe çima neketiye. Heta dawîya emrê xwe de jî Gulê, naxwaze vê remza xwe aşkera bike. Nivîskar da ku Gulê derexê temîzîyê di dawîya emrê wê de nameyeke bê nav û nîşan dide nivîsandin: “Menîya bêbextîya min û te şer bû. Belkî aykê me ji şerûdaran nemîne. Ew birîna şer e ku piştî ewqas salan min digihîne devê gorê...” (Dengê Dil. 122).

Wek encam em dikarin bibêjin dayîka ku di çîrokên Emerîkê Serdar de weku tema derdikevin pêş temsîliyeta dayîka Emerîkê Serdar dike. Emerîkê Serdar dayîk, di kesayetîya dayîka xwe de îdealîze kirine û vegêrane. Di çîrokan de dayîk weku bingeha malbatê hatîye vegotin û dê di dewsa malê digire. Di *Destê Dê* çîroka “Na nikarim Herim” de nivîskar pêwendîya mala xwe û dayîka xwe wiha dide der:

Gundîyên me her tim ji min re dibêjin: ‘Tu çima ji gund kuvî bûyî, nayeyî gundê xwe? Dibe tu xeyîdîyî?’

De tu yê çawa herî gundê xwe? Gava li ser rêya mala te şenkayî bejneke şîn bûye, gava bêşîka te yî zarotîyê, xem û xîyalên te yî cahiltîyê bûye kelefek û di fêza gund de qincilîye ser hev, tu yî bibêjî pîneyekî kevn e anîne kirase teze xistine. Xeyd li ortê tune ye, eger hebe jî ‘xeyda min ji dayîka min heye, wekî derîyê mala me li ber min dadaye, kilît kirîye ber piştî xwe û bêwext ji vê dinyayê çûye...Na, herî gundê xwe, lê neçî mala xwe nabe, qet nabe!... (Destê Dê. 96).

Di *Hisreta Emir* di çîroka “Ewled” de nivîskar dîsa temaya dê derxistîye pêş. Nîkolay ku diya xwe di şeş mehîya xwe de ji dest daye di sêwîxaneyan de mezin bûye û qet şiklê diya xwe jî nedîtîye. Her tenê şiklê diya xwe bi gotinên derdora xwe ve di hişê xwe de diafirîne. Piştî mezin dibe û beşdarî şerê wetenîyê dibe. Di şer de şevêkî dema di xewê de ye tiştekî derasayî pêk tê û diya Nîkolay di xewê de bang li Nîkolay dike: “‘Kolya’ rabe...’, ‘Kolya lawo rabe...’” (*Hisreta Emir*. 148-149).

Nîkolay, bi vî awayî ji xewê hişyar dibe û dibîne ku leşkerên dijmin derdora wan girtîye. Di dawîyê de bi saya xewna Nîkolay hevalên wî ji mirinê difilitin. Dê her wiha piştî mirina xwe jî di xewnê de kurê xwe ji talûkeyê diparêze. Bi vî awayî jî nivîskar hezkirina dê îdealîze dike. Wê bi awayekî mîstîk tîne ziman. Li gorî vegêr dê her çi qasî mirî jî be ew di nava ruhê mirov de dijî. Li ser vê yekê jî vegêr bi devê Nîkolay van hestên wî rêz dike: “Xwezîla min bi wî merivî, weku qe na weku misqalekê qaribe ji bin borcê dê, dilê dê derê. Bi texmîna min, merivên wisa bextewarê lap î mezin e.” (*Hisreta Emir*. 150).

Di çîrokên nivîskar de dayîk piranî bi hestên wan yên dayîkbûnê ve hatine îdealîzekirin. Li hemberî şer helwesteke wan êrenî yan neyînî nayê dîtin. Tiştên ku dixwazin vegera çûyîyên wan ne. Lê ev helwest di hin çîrokan de berevajî dibe.

3.3.2 Bav

Di çîroknûsîya Emerîkê Serdar de temayeke sereke jî bawî ye. Bavê nivîskar di şerê wetenîyê de tê kuştin û ev yek jî li ser dêrûnîya nivîskar di çîrok û bîranînên wî de, xwe dide der. Emerîkê Serdar her çiqas weku temayek sereke li ser hestên dayîkbûne rawestabe jî temaya bav jî di çîrokan de tê vegotin. Tiştekî pir balkêş e ku Emerîkê Serdar li tu cihî nade der ku bavê wî mirî ye. Peyva “mirî” ne di çîrokên wî de ne jî di bîranînên wî de derbas nabe. Ew, di dewsa peyva mirîne, ji bona mirina bavê xwe van peyvên hanê bi kar tîne “venegerîya”, “çû û nehat”, “bavê min çû” û “şehîd”. Li hemberî vê yekê nivîskar ji bona dê û pîra xwe peyva “mirî” bi kar tîne. “Gava min got, weku we çima elameîya mirina pîrika min nedaye min” (Serdar, 2018: 106). Helwesta nivîskar di mirina diya wî de jî bi heman awayî ye. Di pirtûka bîranînên xwe *Mikûrîyê* de, li ser vê bûyerê nivîsek bi navê “Mirina Diya Min” nivîsîye û qala mirina diya xwe dike.

Dilsojîya nivîskar ya li hemeberî bavî di çîrokan de jî xwe dide der. Di *Destê Dê*, di çîroka “Em Çûne Aş” de nivîskar mirina bavê xwe nayîne ziman. Li şûna wê nivîskar, bi rêya vegêr peyveke meçhûl bi kar tîne. Lewra di vê çîrokê de nivîskar bi çavê zarokekî van hestan dide der. Ger mirov bi çav û dêrûnîya zarokekê bifikire; wê helwesta nivîskar çêtir bê deşîfrekirin. Lewra zarok bûyerên pêkhatî tam tê nagehiye. Tenê tiştê ku vegêr li ser zûr dibe çûyîn û nehatina bavê wî ye. Nehatin yan jî venegerîyan ji bo vegêr hem hêvî ye hem jî qebûl nekirine. “Mala me jî talîya şerî dîtîbû; bavê min çûbû şêr nehatibû...” (*Destê Dê*. 68). Ev cure pênasekirin di çîroka “Bavê Min Çû” de jî bi heman awayî cih digire. Lê vê carê ne bi çavê zarokekî bi çavê lehengekî temenmezin ve hatîye vegotin. Loma jî vegêr çûyîn û nehatina bavê xwe bi mebestekî ve girê dide û payeyekî bilind dide nehatina bavê xwe. Li gorî vegêr bavê wî; ji bona ku aramî û xweşî pêk were têkoşaye: “..Bavê nin çû, nehat, weku li dewsê edlayî bê.” (*Destê Dê*. 87).

Nivîskar dilsozîya bavê xwe tîne ziman û bi serbilindî qala wî dike. Emerîkê Serdar di bîranînên xwe de jî helwesta bavê xwe ya li hemberî şer bi mêrxwasî dide pêş.

Paşê bavê min birin pêşenîyê, di Bakûrê Kavkazê de tevî şêr bû, birîndar bû, anîn hospîtalê Tbilîsîyê. Diya min bi ser de çû, jê re got, wekî çend pezên me mane, ez ê wan bifiroşim, pereyan bidim doxtiran, te xilas bikim. Lê bavê min qayîl nabe û dîbêje:

-Eger ez, ê azakirinê me, wê min aza bikin, şê eger ez dikarim piştî qencbûna birînê herim ber şêr, têkim şer, ez ê herim, ez ji qelpîyê hez nakim. (Serdar, 2018a: 65).

Çûyîn û nehatina bavê nivîskar; di dilê nivîskar de bandoreke mezin hiştîye. Vê yekê di heman demê de bandor li nivîskarîya wî jî kirîye. Nebûna bav di gelek çîrokan de temayeke serdest e.

Bêbavî di çîroka “Êdî Dereng Bû”yê de karîgerîyekî mezin li vegêrê çîrokê dike. Vegêrê çîrokê ji ber ku bavê wî beşdarê şer bûye xwe di nava hevalan de

bexweyî dibîne. Ew her tim stûxar e. Di dil de xemeke giran heye. Vê helwesta xwe jî ji ser zarokên derdora xwe ve tîne ziman:

Te hew dinêrî hevalekî me radibû, û digot: ‘Niha Bavê min hatîye, ez ê herim malê,’ û em cî dihiştin, ber bi malê çiqas dikir. Wexta yekî kincekî teze li xwe dikir, dihat nava me û di ber xwe re diçû. ‘Bavê min aniye,’ – digot û ji jor de kincê xwe yê teze dinêrî. Me gelek bi çavnebarî li wan dinêrî û serê xwe dikir ber xwe. Bavê me ne li wîr bûn, çûbûn ber şêr. Şêr destê me û bavê me ji hev qetandîbû. Dayîkên me diha hişk bi destê me girtibûn. (Êdî Dereng Bû.38).

Şêr destê bav û zaran ji hev qetandîye û vê yekê jî li ser ruhê vegêrê çîrokê trajedîyeke mezin ava kirîye. Vegêr bêyî bav, xwe di nava hevalan de kêmbû. Di malê de bavek nêne ku li bendê be. Nebûna bav hem li ser ruhê vegêr hem jî li ser rapêça vegêr bi bandor e.

Diya min ji bo min her tişt dikir, kincên min û çarixên min didirût. Li min dinêrî, wekî kincên min ne mînanî kincên hevalên min rind in. Ew kaloşan û solan pê dikan, lê di lingên min de çarix in. Û ez li ber xwe diketim, di xwe de dişewitîm.

-Tişt nake, kurê min, bi silameti zûtîrekê bavê te yê bê û kincên teze li kurê xwe bike, diya min bi ber dilê min de dihat. Lê ew zûtîrek nedihat. Çar sal derbas bûn, lê ew nehat. Şêr jî kuta bû, lê li dewsa bavê min kaxezeke ‘reş’ hat. (Êdî Dereng Bû. 38-39).

Nêrîna vegêr ya li hemberî bav xwestek û hêvîyên zarokane ne. Ew bi çavê zarokekî bavê xwe dişayesîne. Lewra hebûna bav wê li ser wî bibe kincekî teze, wê bibe soleke nû û bikeve pîyên wî. Bav di çîrokê de ne tenê ev e; ew heman demê de bi hebûna xwe ve, wê di nava hevalan de bibe serbilindîya kurê xwe jî. Lê ev xwesteka vegêr pêk naye, stûxwarî û bêkesîya wî berdewam dike. Di dawîyê de her çiqas vegêr, bendewarê hatina bav jî be ev yek pêk naye û vegêr li xwe mikûr tê û dibêje; “Û ez bêbav mezin bûm.” (Êdî Dereng Bû. 39).

Nivîskar tu caran bavê xwe weku mirîyekê ji rêzê nade pêş û peyva mirinê jî bikar nayîne. Bav di fikr û ramanên wî de cihekî giring digire. Ev yek di pirtûka *Dengê Dil*, di çîroka “Ji Eskerê Neeyan Re” de jî tê vegotin. Çûyîna bav ji alîyê vegêrê çîrokê ve wiha hatîye vegêran. “Te kur di bêşikê de hişt, tu çûyî ber şêr û venegerîyayî.” (Dengê Dil. 60).

Peyva “venegerîya” tim di dewsa mirinê de tê bikaranîn. Lewra nivîskar mirina bavê xwe tu caran qayîl nabe. Tişteke din jî nivîskar mirina bavê xwe bi çavên xwe nedîtîye. Li gorî nivîskar bavê wî ji bona rojên azadîyê canê xwe daye. Ji ber canfidabûna wan ew îro di rojên xweş de dijîn. Vegêr bi hestiyarî qala bavê xwe dike. Bav bê nav e. Ew leşkerekî canfida ye. Lê bi kirinên bavê xwe re bextewar e. Ji alîyekî de jî xemgînîya xwe dide der; lewra di kêlîya dawîyê de li rex bavê xwe ne bûye. Çîrok ji serpêhatîyekê wêdetir di şiklê nameyekê de hatîye nivîsîn. Bav di temenê xwe yê ciwantîyê de çûye û hew vegeyîyaye.

Tu yê bibexşînî, wekî kurê te êdî ji te mezintir e, lê heta roja îroyîn cîyê mexberê te nizane, nehatîye li ber temene nebûye, kevirê kêlika te paç nekirîye. Tu yê bibexşînî. Ne gunekar e. Gelekî gerîyaye, gelekî pirs û pirsîyar kirine, lê negihîştîye tu tiştêkî. Ev kederekî mezin e, kuleke wisa ye ku heta mirinê jî dil dernayê... (Dengê Dil. 60-61).

Di çîroka “Dengê Dil” de lehengê çîrokê Eslan di sêwîxaneyekî de mezin bûye. Ew tim di nava lêgerînekê de bûye. Her tim bêkesbûna xwe difikirê. “Êvarê diket nava cîyan û difikirî, weku qe çima carekê diya wî qewm û pismamekî wî bi ser de nayê. Ne dê dihat bîrê ne bav. Ew nedîtibûn, çavên xwe vekiribûn-venekiribûn, êtîmxane, terbiyetdar dîtibûn.” (Dengê Dil. 72-73).

Eslan di dawîyê de digihijê wê bawerîyê ku dibe bavê wî di şer de miribe. Lê dîsa di vê çîrokê de jî vegêr serencama bavê xwe meçhûl dihêle. Em di çîrokê de lê rast nayên ka gelo bavê ku Eslan qala wî dike çi pê hatîye. Di nava xumama şer de weneya bavê wî jî bi xumam e. “Dibe bavê min çûye ber şêr...” (Dengê Dil. 73).

Di pirtûka *Hisreta Emir* di çîroka “Hetanî Kîngê?” de, lehengê çîrokê di nava pirs û pirsîyaran de ye. Bavê leheng dîsa di vê çîrokê de jî di enîya şer de ye û çavê

lehengê çîrokê, ku zarokekî piçûk e tim li rê ye. Lehengê çîrokê li ser pîrsa qîza xwe “Bavo, tu yê kîngê beyî?” (Hisreta Emir. 12) vedigere salên zarokatîya xwe. Bi çavekî nostaljik û bi bîrewerîyekî xemgîn wan salan tîne bîra xwe. Di çîrokê de sala 1941ê hatîye dîyar kirin û ev beşdarbûna bavê leheng ya li şer e. Vegêr wan rojan bi kul û keser bi bîr tîne û li ser pîrsa qîza xwe, vedigere li pêy pîrsên xwe yên wê serdemê. Bi çavên vegêr, roja bavê wî beşdarê şer bûyî tê vegotin.

...Sala 1941'ê bû. (Helbet, ez paşê bi vê yeê hesîyam). Havîn bû, germê diqijiland. Li heyata komîsarîyata nehîyeyê yî eskerîyê tijî meriv bûn. Xên ji mêran, wisa jî gelek jin û zaro hebûn. Kom kom bûbûn û xeber didan. Ez î wê çaxê heft salî bûm û min hela bi pakî tê dernedixist, wekî çi qewimîye, çima diya min û pîrika min digirîn, lê bavê min melûl melûl li dûr dinêre. Em li ser hêşinayîya heyata komîsarîyeta eskerîyê rûniştibûn. Bavê min ez danîbûm ser çoka xwe, serê min dabû ber sînga xwe, û destê xwe li nava porê min digerland. (Hisreta Emir. 12-13).

Vegêr piştî çûyîna bavê xwe di nava xemgînîyekê de ye û ji xwe pîrsan dike. Çûyîna bavê xwe tê nagihije û tu wateyeke nadê. Lewra vegêr vê çûyînê jî mîna çûyînên berê dibîne. Lê di xatirxwestina bavê xwe de dikeve gumanan. “Wekî wisa ye bavê min dibe hetanî berf bikeve jî neyê. Wê ewqas wext çi bike, çima ewqasî bi derengî keve? Berê, wexta diçû şêher (her tim payîzan diçû), hetanî rojîyan vedigerîya dihat. Dibe bavê min gelekî dûr diçe, loma jî wê dereng bê?” (Hisreta Emir. 13).

Vegêr çûyîna bavê xwe weku sehneya fîlmekê yek bi yek bibîr tîne. Ji hev qutbûna xwe û bavê xwe bi awayekî trajîk vedibêje.

Bavê min kûz bû, ez hilbirîm, dam ber sînga xwe û her du sûretên min paç kirin, zûr bû li min nêrî. Çavên wî şêlû bûbûn, gulpîkên çavên wî zû zû dihatin girtin û vekirin. Xêlekê wisa zûr bû li min nêrî, paşê ez qayîm bi sînga xwe ve guvaştim, vegerîya ser diya min:

-De ma bi xatirê te, miqatî diya min û gede be, - gotê û ezî wisa li ber sîngê, totbeyê wî li piştê ber bi wî merivî çû, ku nav û femîla merivan dixwendin... (Hisreta Emir. 15).

Vegêr her wiha piştî çûyîna bavê xwe jî di nava gumanan de ye her tim jî dîsa pîrsa xwe dubare dike. Dema dest bi dibistanê dike vedigere ser diya xwe dîsa pîrsa xwe dubare dike; “-Lê ez herim mektebê bavê min nayê?” (Hisreta Emir. 16).

Çavê vegêr tim li rê maye û bi bendewariya bavê xwe dike. Bi çavekî û bi gotineke zarokane vegêr dide pêy pîrsê xwe. “Dibe bavê min neyê?” (Hisreta Emir. 17). Çûyîna bav û nehatina wî di dilê leheng de dibe barekî giran. Bi derûnîyeke xemgîn her tim raçavîya bavê xwe dike.

3.3.3 Evîn

Di çîrokên Emerîkê Serdar de evîn jî weku tema cihê xwe girtîye. Evîn bi gelek alîyan ve hatîye şayesandin. Evînen zarokatîyê û evînen bêmiraz û nîvcomayî weku tema derdikevin pêş. Di çîrokan de hin caran bavê qîzê weku astengîyekê ketîye navbeyna du evîndaran. Caran guvaşên civakê rê nedaye ku evîndar bigihîjin hev û caran jî şer destê evîndaran ji hev qut kirîyê û miraz û mexseda evîndaran di dil de hiştî ye.

Vegêr-leheng di çîroka “Name”yê de qala evîna xwe ya rojên zarokatîyê dike. Di çîrokê de navê vegêr nehatîye dîyarkirin lê belê navê evîndara wî weku Çîlê dersbas dibe. Çîrok vegotina evîneke bêmiraz e. Lewra vegêr di wan salan de, hîn xwendekar e û remza dilê xwe de jî ji hezkirîyê xwe re nabêje. Lê her du jî bi nêrîn û tevgerên hev fehm dikin ku li ser hev bengî ne. Lê miraza wan pêk nayê û Çîlê didin mêr. Piştî salan Çîlê ji hezkirîyê xwe re nameyekê dinivîse û di vê nameyê de hem hezkirina xwe aşkera dike û hem jî gilî û gotninên xwe, ji hezkirîyê xwe re dide gihandin:

Min zanîbû, tu jî min hez dikî. Tu jî mîna min ji dûr ve di xwe de dişewitî. Ji te tirê min ji bîr kirîye, çawa çavên te li derîyê mala me bû, wekî ez derkevim, min ji dûr ve bibînî?.. Ez gav û sehet li hêvîyê bûm, wekî tu yê der vebî, gilîyekî ji min re bibêjî. Lê dilê te kevir bû, deng jê nedihat, ji şerman devê te diket tev. De ez jî qîz bûm, nedîbû min pêşîyê di der heqa huba xwe de ji te re bigota. Malxerab, çi qas caran min gilî di ber te re diavêtin, lê tu bi ser hisehisan nediketî... (Destê Dê. 14).

Di çîrokê de her wiha em rastî mikurîyên Çîlê tên. Çîlê di evîndarî ya wan de hezkirîyê xwe tawanbar dike. Lewra hezkirîyê wê dilê xwe ji ber Çîlê venekirîye û hezkirina xwe pê re nedaye dîyarkirin. Çîlê ji vegêr bihêztir dixuyê. Lewra piştî çend salan jî be ew li evîna xwe mikur tê. Lê li cem hezkirîyê wê em vê yekê qet nabînin.

Di çîroka “Serhatîya Hubekî” de jî em rastî evîna Keleş û Sêvê tên. Keleş û Sêvê du evînadarên hev in. Lê ji ber ku malbatên wan dijminê hev in nikarin bi hêsanî hev bibînin. Hevdîtina wan, piranî li çolê pêk tê. Her çi qas bi awayekî xef hev bibînin jî; hezkirina wan di nava gund de deng dide û malbatê wan pê dihesin. Ji ber vê çendê jî Sêvê di malê de rastî zordestîya bavê xwe tê. Ne Sêvê ne jî Keleş nikarin remza dilê xwe dîyar bikin. Mircana hevala wan, di navbeyna wan de weku qasid derdikeve pêş. Li gund anegorî kevneşopîyên berê hezkirina du ciwanan weku eyb tê dîtin. Li ser de jî, du malbatên dijmin li pêşîya wan, astengîya herî mezin e. Lê her du evîndar jî bi dilêrî tevdiagerin û ji evîna xwe venagerin. Sêvê bi bawerîyeke xurt evîna xwe wiha dîyar dike: “Lê dibêje bimirim ji erdê re me, bimînim ji Keleş re me.” (Destê Dê. 21).

Sêvê weku nîşaneya evîna xwe destmala xwe ji Keleş re dişîne. Destmal di navbera wan de dibe remza evînê. Lê gotegotên derdorê û dijminatîya navbeyna her du malbatan û gefên bavê Sêvê, wan bêmecal dihêlê. Şevêkî di nava van fikr û raman û gefan de, Sêvê dikeve xeweke giran û şevêkê jî hew şîyar dibe. Li ser meytê Sêvê şîneke mezin dikin û bi qesta veşartinê wê dibin ser menzêl. Keleş bawerî bi mirina wê nayîne û derdora menzel diçe û tê lê ji ber ku dijminê hev in kesên derdorê nahêlin ku bê li ser meytê Sêvê. Paşê hin kes dikevin ber dilê bavê Sêvê û wî didin razîkirin da ku cara dawî be jî bila Keleş bê Sêvê bi çavên xwe bibîne û pê bawer bike ku Sêvê mirî ye. Dema Keleş tê û Sêvê dibîne û dike qêrîn û ji nişkê tiştêkî derasayî pêk tê û Sêvê ruh pê dikeve û radibe ser xwe. Her kes bi metelmayî dimîne û ji bavê Seve Qero re hêvî dikin nebe sebaba mirazê wan. Qero û derdor vê yekê weku bûyereke îlahî dibînin û bi vê yekê jî Sêvê û Keleş digihînin mirazê xwe.

Vegêr di çîroka “Zînê” de qala serpêhatîya du evîndarên bêmiraz dike. Zînê û Xetîf du evîndarê hev in. Piştî wextan Xetîf diçe leşkerîyê û di vê navê de jî Zînê didin mêr. Dema ku Xetîf ji leşkerîyê vedigere Zînê jî ji ber tahde û lêdanên mêrê

xwe vedigere mala bavê xwe. Dîsa di gund de hev dibînin. Lê vê carê jî, qîza Zînê weku astengîyekê derdikeve pêşîya wan. Xetîf keçîka piçûk weku astengî dibîne û dikeve hincetan; lê Zînê her çiqas Xetîf hezkiribe jî, terka qîza xwe nake û Xetîf venagere. Ev jî weku evîneke bêmiraz dimîne dilê wan her du bengîyan de.

Di çîroka “Rasthatin”ê de jî em rastî evîneke yekalî tên. Di vê çîrokê de em rastî evîneke zarokatîyê tên. Lehenga sereke ya jin, di çîrokê de li ser erebeya çopê rastî hevalekî xwe yê zarokatîyê tê. Bi rastî mirov nikare wan weku du hevalan bibîne. Lewra di berê de keçîk di mala bavê lawîkî de bi dayîka xwe ve weku navmalî bi nanozîko xebitîye. Piştî wextan weku bîranînekê vegêr qala wê serpêhatîya wan rojan dike.

Di çîroka “Guman” ya *Dengê Dil* de temaya evînê em bi çavê zarokêkî piçûk dibînin. Dawet ji bona hevdîtina bengîyan e. Di çîrokê de jî vegêrê çîrokê her çiqas piçûk jî be, ji qîzekê hez dike û li rasthatina wî û hezkirîya wî jî tenê dawet in. “Qîzek di gundê me da hebû. Bi hezkirina zarotîyê yî temîz, ji dûr ve li ser wê bengî bûbûm û min gelek dixwest wê şevê di dawetê de carekê jî çavê min bi çavê wê keve.” (Dengê Dil. 27).

Di çîroka “Dengê Dil” ya *Dengê Dil* de em rastî evîneke trajedîk tên. Evîna du ciwanan di çîrokê de hatîye vegotin. Gulê û Ezîz du leheng in ku ji hevdu hez dikin. Evîna wan; evîneke trajedîk e lê di çîrokê de du trajedî derdikevîn pêş. Yek çûyîn û şehîdbûna Ezîz, ya din jî ji hev qutbûna dê û kur. Piştî re jî, rasthatina wan vê trajedîya jibîrkirî carekî din ji nû ve zindî dike.

Xalekî seyr jî di vê çîrokê de şayesandina pevşabûna Gulê û Ezîz e. Ev yek di nava şêwaza nivîskar de ji bilî vê çîrokê qet nayê dîtîn. Li gorî Zülküf Ergün “Di edebîyata kurdî ya Sovyetê de cara pêşî di vê çîrokê de sehneke pevşabûna jin û mêrekî tê nîşandan” (Ergün, 2022: 158).

Evîneke bêmiraz jî di çîroka “Şer Bû” ya *Hisreta Emir* de hatîye vegotin. Du evîndar soz didin ku piştî leşkerîya lawîk bizewicin. Lê dema ku lawîk li leşkerîyê ye keçîk dizewice. Ev yek pir dilê lawîkî diêşîne û biryar dide ku heyfa xwe jê hilîne. Lê dike û nake wê peyda nake û di dawîyê de biryar dide wê bi alîyekî din ve

biêşîne. Vegêrê çîrokê vê yekê wiha vediguhêze: “Qîrar kir hîn bibe, xwendina bilind bi dest bîne, bibe merivekî eyan. Bila wê çaxê nav û dengê min bibihîze û di xwe de bişewite.” (Hisreta Emir. 27). Lê di dawîyê de dema ku rastî hev tên vê carê jî dîsa şer dest pê dike û lawik diçe leşkerîyê û dîsa jî ji hev qut dibin.

Wek ku tê dîtin di çîroknûsîya Emerîkê Serdar de temaya evînê ji gelek alîyan ve cih girtîye. Nivîskar hestên mirovan carna bi çavên zarokekî caran jî bi çavê evîndarekî tîne ziman. Lê di piranîya çîrokên nivîskar de temaya sereke evînên bêmiraz in. Bêmirazbûn bûye qedera bengîyan. Şer, guvaşên civakî û malbatî astengîyên li pêşîya evîndaran in. Di çîrokên nivîskar de evîn bi awayekî resen xwe dide der.

Di çîroka “Dibûrî” de em bi rêya nameyekê rastî evîneke dilşewat tên. Çîrok bi tenêtiya lehengê çîrokê an ku Dibûrîyî dest pê dike. Ev tenêti ne mîna tenêtiyeke asayî ye. Dibûrî naxwaze ji vê tenêtiyê derkeve. Tevî ku vegêrê çîrokê û hevalên din hewl didin vê tenêtiyê bişikînin jî, lehengê çîrokê mîna ku nirxekî biparêze hewl dide ku tenêtiya xwe berdewam bike û xwe ji wan dûr dixê. Ew li cihên dîyar rûdinê. Ev jî yek ji taybetmendîyên wî ye. Lê ne tenêtiya wî ji kesayetiyeke dîr civakê tê ne jî bêbingeh li cihên taybet rûdinê. Ew kesekî civakî bûye. Di vê tenêtiya xwe de jî ji kesekê digere. Ew li evîneke kûr û dûr û dirêj digere.

Nivîskar li destpêkê balê dikşîne ser taybetmendîyeke lehengê çîrokê ku tenêti û tenêhezîya wî ye. Ev taybetmendî dibe sedemê gelek nîqaşan. Heval û derdûra Dibûrî wî gelek rexne dîkin. Pêşdawerîyên wan yên şaş çêdibin. Lê sedemeke wê tenêtihezîya Dibûrî jî heye. Nivîskar berdewamîya çîrokê de sedemê wê tenêtiyê gelek bi zelalî aşkera dike û balê dikşîne ser evîneke bêsînor ya ku di dilê Dibûrî de piştî wefata hevîna wî gur bûye. Her cihê ku Dibûrî lê rûdinê an pê re derbas dibe kanîya birewerîyên wî yên şîrîn e. Ew bi saetan li ser kevîrekî rûdinê û di nava hizir û xeyalan da dijî: “Ez ku hatime vî cîyê me yî nas, ji min tirê tu yê li her cîyan bî, li ser rûniştika me yî nas, li devê çem, di nava mêşeyê de ez ê rastî te bêm. Ji min tirê... Li her derê li te digirim, lê qe li cîyekî te nabînim... Birîna dilê min hê diêşe...” (Hisreta Emir. 101).

Dibûrî dema ku dixwaze wî cihî bihêle û biçe, nameyekê li pey xwe dihêle. Bi xwendina nameya wî her kes bi kûrahîya evîna wî dihesê. Her kes dizane ku vê evîna sînornenas çi qasî bandoreke xurt li ser Dibûrî kirîye ku piştî wefata hevjinê xwe li her derê li pey wî gerîyaye. Bi xwendina nameyê re her kes pê dihesê ku ew di tenêtiya xwe de hertim li bîrewerîyên xwe gerîyaye û hêvî û daxwaza wî dîtina hevjinê wî bûye.

Di çîroka “Ewlêd” ya *Hisreta Emir* de jî nivîskar li ser evîna mirovekî temenmezin zûr dibe. Di vê çîrokê de dema ku nivîskar balê dikêşîne ser têkilîya di navbera Îvan û hevjinê wî de, qala hevjinîyeke temendirêj ya pêncî salî dike. Di heyama wan pêncî salan ew du kes wisa li hev hatine ku bi nerînekê ji rastîya dilê hevdu fam dikin. Tevî ku mirov dikare evîn û hezkirinê di hevjinê Îvanî de bibîne, Îvan bixwe jî nimûneyekî evîndarîyekî rast û dirust e. Lewra dema ku dîktor jê re dibêjin divê were emelîyatkirin, tenê tiştê ku wî di nava hizr û xeyalan de berze dike, çarenûsa hevjinê wî yê nexweş e: “Ez gelek li ber xwe ketim ne ewqasî ji bo emrê xwe, çi qasî ji bo wê yekê, weku ez ê jina xwe yî bêsehet çawa tenê bihêlim...” (Hisreta Emir. 143).

ENCAM

Di xebata me de derkete holê ku ji bo çîroka kurdî arîşeyeke pênasekirinê heye. Ji metna ewil a çîroka kurdî û heta roja îro sed sal zêdetir wext derbas bûye. Lê ji hêla pênasekirinê ve hîn jî hevparîyeke giştî pêk nehatîye. Lewra her nivîskar, lêkoler û weşanxane li gorî xwe navekî lê dike. Ev yek jî di geşedana çîrokê de weku arîşeyekê ye û hewce ye di maweyekê nêz de li ser termînolojîya çîroka kurdî hevparîyek çêbe. Ne tenê pênasekirin û her wiha heta niha jî bi awayekî rêkûpêk çîroka kurdî nehatîye hilsegandin. Me jî di vê xebata xwe de weku peyveke cihgirtî peyva “çîrok”ê bi kar anî.

Di serdema Sovyetê de di warê çîroknûsîyê de nivîskarê herî çalak Emerîkê Serdar e. Emerîkê Serdar hem di serdema Sovyetê de û hem jî piştî hilweşîna Sovyetê dest bi nivîsandina çîrokan bernedaye û çîroknûsîya xwe bi awayekî serkeftî domandîye. Wek ku hat dîtin; çîrokên nivîskar wergerê zimanê rûsî bûne û di çîrokên xwe de babetên curbicur weku hilbijartine. Ji ber ku zarokatîya Emerîkê Serdar rastî Şerê Cîhanê yê Duyemîn tê malbata nivîskar jî taliya şer ji nêz ve dibîne, bavê nivîskar di şer de dimire ev yek jî li ser jîyan û nivîskarîya wî tesîreke mezin dihêlin.

Me di vê xebata xwe da bi mebesta nirxandina çîroknûsîya Emerîkê Serdar ji van pênc pirtûkên nivîskar yên navborî sûd wergirt. Di xebata xwe de li gorî kronolojîya weşana pirtûkan me analîzên wan kirin. Ji berhema ewil ya nivîskar heta berhema dawî ya nivîskar, di babet û şewaza nivîskar de cîyawazîyek tune bû. Ji ber vê sedemê jî me di analîzkirina wan de li gorî dîroka weşana wan ji wan îstîfade kir. Pirtûkên nivîskar yên berîya Şoreşa Cotmehê û piştî Şoreşa Cotmehê hatine nivîsîn babet hema bibêje bi yekrengî ne.

Me di xebata xwe de çîrokên Emerîkê Serdar li gorî hêmanên teknîkî jî nirxandin. Ji hêla teknîkî de jî çîrok; li gorî ziman, leheng, mekan û demê ve hatin nirxandin. Her wiha Emerîkê Serdar, em dikarin bibêjin di çîrokên xwe de zimanekî herikbar bi kar anîye û cih bi cih jî di çîrokên nivîskar de tama zimanekî helbestî jî peyda dibe. Nivîskar her çiqas di Sovyeta Ermenistanê de jîyabe jî bandora zimanê rûsî û ermenî nayê dîyar. Tenê mirov dikare bibêje di hin berhemên wî de hin peyvên

zimanê tirkî derbas dibin. Di çîrokên Emerîkê Serdar de mekan jî piranî gund in. Gundê nivîskar û mekanên derdora jîyana nivîskar ya takekesî weku mekanên sereke derdikevine pêş. Lê li ser vê yekê mirov dikare taybetmendî û cîyawazîyeke nivîskar jî dîyar bike. Nivîskar piranîya jîyana xwe li Erîvanê borandîy lê di çîroknûsîya nivîskar de Erîvan weku nav di tu çîrokên wî de derbas nabe. Ne ku tenê Erîvan hema bibêje piranîya mekanên çîrokên nivîskar nehatina binavkirin. Ne tenê mekan di çîrokên nivîskar de leheng jî piranî mirovên derdora nivîskar in. Lehengên çîrokên nivîskar piranî ji çanda û jîyana kurdan ya rojane hatine hilbijartin. Di kêma çîrokan de kesayetên navdar yê dîroka kurdî jî weku leheng hatine sêwirandin. Ji hêla demê ve jî tê dîtin ku nivîskar di vegêrandinê de du deman bi kar tîne. Yek ji van, dema vegêrandinê ye û ya din jî dema çîrokê ye. Nivîskar di çîrokên xwe de hin caran demê bi dîrokên kifşkirî ve vedibêje û hin caran jî di çîrokan de demeke dîyarkirî tune ye. Her wiha tê dîtin ku Emerîkê Serdar li gorî rê û rêbaza çîroknûsîyê hemanên teknîkî bi awayekî serkeftî bi kar anîye.

Di çîroknûsîya Emerîkê Serdar de xalekî giring jî vegotina jîyana nivîskar ya takekesî ye. Nivîskar di çîrokên xwe de bi awayekî zelal jîyana xwe bi awayê otobîyografîk rabe xwîneran dike. Jîyana nivîskar ya zarokatîyê, salên xwendekarîyê û xebatê di çîrokan de weku babet hatine sêwirandin. Her wiha nivîskar bi dîmenên zindî ve rabirdûya xwe di metnên çîrokan de weku babet hilbijartîye û honandîye. Lewra jî mirov dikare bibêje çîrokên nivîskar vegotina jîyana wî ya takekesî ye.

Me di xebata xwe de berhemên nivîskar yê çîrokî, li gorî temayên sereke analîz kirin. Di çîrokên nivîskar de li gorî tespîten me sê temayên sereke derketin holê. Me jî li gorî vê yekê çîrokên nivîskar bi temayên civakî, polîtîk û takekesî ve li ser sê xalan dabeş kirin. Piştî vê dabeşkirinê jî; me li gorî babetan, metnên çîrokan bi binbeşên cuda ve di binê van temayan de dane bicihkirin. Di temayên civakî de nivîskar, hejarî û feqîrîya kurdan ya serdema xwe bi awayekî realîst radixe ber çavan. Ne tenê feqîrî di vê çarçoveyê de çand û jîyana kurdan ya rojane jî tê vegotin. Têkilîyên gundîyan yê civakî, dab û nêrîten kurdan di çîrokan de hatine vegotin. Ji bilî van nivîskar, di çîrokên xwe de bi armanca derbirîna fikrên sosyalîstî, jîyana

berîya Şoreşa Cotmehê û piştî şoreşê berawirdî hev dike. Bi vê armancê jî lehengên xwe saz dike. Di vê babetê de bi berawirkirina jîyanê ve namîne û tekilîya kurd û ermenîyan jî bi vê perspektîfê ve tîne ziman. Nivîskar di çîrokên xwe de kurd û ermen weku du neteweyên hevpar pêşkêş kirine û şopên dînê êzîdîtiyê jî di çîrokan de tên dîtin. Di temayên civakî de babetek jî vegotina jinê ye. Jin di çîrokên nivîskar de piranî di çarçoveya dayîkbûnê de hatine vegotin. Ji bilî vê yekê jin an weku evîndareke jirêzê yan jî di rola kevanîya malê de derdikeve pêş. Di gelek çîrokan de jî navekî jinê tune ye û ew weku kulfet hatîye pênasikirin.

Di çîroknûsîya Emerîkê Serdar de temaya herî sereke jî mirov dikare weku temayên polîtîk bide nîşandan. Hema bibêje di hemû berhemên nivîskar de temayên polîtîk tên dîtin. Di van temayan de jî şer cîyekî cîyawaz digire. Di çîrokan de şer bi gelek alîyan ve hatîye vegotin. Şer û karesata şer ya li ser civakê bi awayekî realîst di çîrokan de hatîye sêwirandin. Temaya şer piranî di derdora Şerê Cîhanê yê Duyemîn de ye. Nivîskar vî şerî weku Şerê Wetenîyê yê Mezin nîşan dide. Bandora şer piranî li ser dêrûnîya jin û zarokan ve hatîye nirxandin. Her wiha nivîskar şerî ne di enîya şer de di paşenîya şer de vedibêje. Ji xwe nivîskar bi xwe jî mexdûr û şahidê vî şerî ye. Di çîrokan de temaya şer tenê di çarçoveya şerê cîhanê de nayê vegotin, di çîrokan de reva êzîdîyan, şerê navbeyna dewleta Osmanî û ermenîyan jî tê vegotin. Nivîskar di vê babetê de Şoreşa Îlonê û şerê Pêşmergeyan jî vedibêje.

Di çîrokên Emerîkê Serdar de pergala kolxozvanîyê jî cih digire. Lê pergala kolxozvanîyê ne bi çavekî îdealîzekirî bi çavekî rexneyî ve di çîrokan de hatîye behskirin. Nivîskar pergala kolxozvanîyê bi bandora wê ya neyînî ve sêwirandîye. Taybetmendîyeke sereke ya Emerîkê Serdar jî neteweperîya wî ye. Şopên vê yekê hem di çîrokên nivîskar de û hem jî di jîyana wî ya takekesî de xwe didin der. Di vî warî de Emerîkê Serdar di serdema xwe de yekî pêşeng e.

Di temayên takekesî de jî li gorî tespîtên me temaya dê, temaya bav û evîn weku sê babetên sereke ne. Di nava van de jî herî zêde di çîrokan de temaya dê hatîye honandin. Ev yek jî dîsa bi jîyana nivîskar ya şexsî ve girêdayîye. Lewra nivîskar piştî bavê wî di şerê cîhanê de dimire xwedîkirina wî dikeve ser milê dayîka wî. Dayîka wî her wiha di jîyana nivîskar de rola bavê jî hilgirtîye ser xwe. Ji xwe

nivîskar di hevpeyvîneke xwe de dîyar dike ku ji bo ku dayîka xwe bîne ziman dest bi nivîsandinê kirîye. Di çîrokan de dayîk piranî di şiklê dayîka nivîskar de derdikevine pêş. Nivîskar karesat û bobelatên şer jî bi çavê dayîkan tîne ziman û her wiha bandora şer li ser dayîkan li ber çavê xwîneran zindî dike. Dayîk di çîrokan de jî şiklê gîyanewerekê wêdetir bi awayekî mîstîk hatine sêwirandin. Temaya dê di hemû bethemên nivîskar weku temayeke giring cih girtîye. Lê herî zêde di pirtûka *Destê Dê* de derdikeve pêş. Jixwe ev berhem hem bi sernavê *Destê Dê* hem jî li ser bergê pirtûkê bi weneyê dayîkekê ve hatîye weşandin.

Di temaya bavê de jî nivîskar, bi dêrûnîyeke kûr ve bi bîrewîrîya bavê xwe ve çîrokên xwe honandine. Di vê temayê de jî mirov dikare şopên jîyana nivîskar bibîne. Lewra nebûna bav di çîrokan de piranî bi çavê zarokekî ve hatîye vegêran. Di van çîrokan de nivîskar piranî li ser hestên zarokan zûr dibe. Lewra bi çavê zarokekî hatine vegotin; nêrîn û xwestekên lehengan jî li gorî zarokan in. Ji ber vê yekê ye lehengên çîrokên nivîskar tu caran bavê xwe weku mirî nadin nîşandan. Ew di şûna vê yekê peyvên weku “çû ber şer”, “venegerîya” û yan jî bi peyva “nehat”ê ve pêname dikin.

Di çîrokên nivîskar de temayek jî; temaya evînê ye. Evîn di gelek çîrokên nivîskar de hatîye qalkirin. Lê di çîrokên nivîskar de evîn piranî evînen bêmiraz in û evîndar jî ber hin sedemên cîyawaz nikarin bigihîjin hev. Ev sedem caran weku bavekî nezan û caran jî şer e ku nehiştîyê evîndar bi mirazê xwe şa bin. Hin caran jî guvaşên civakê, dab û nêrîten civakê li pêşîya evîndaran weku astengîyekê derdikeve pêş.

Wek encam em dikarin bibêjin Emerîkê Serdar di serdema xwe de di warê çîroknûsîyê de xwedîyê şewazeke cuda ye. Çîrokên nivîskar di ravekirina jîyana kurdan ya serdemekê de daneyên giranbiha dihewînin. Nivîskar her çi qas di hêla Sovyetê de jîyana xwe borandibe jî zêde di bin bandora realîzma civakî de nemaye û babetên çîrokên xwe piranî jî jîyana kurdan ya wê serdemê wergirtîye. Emerîkê Serdar ne tenê di qada edebîyatê de di qada rojnamegerîya kurdî de jî kedeke mezin daye. Emerîkê Serdar her wiha hem di çîrokên xwe de û hem jî di jîyana xwe ya

takekesî de neteweperwerekî kurd yê pêş e. Bi tema, hêmanên teknîkî û vegotinên nûjen ve jî di dîroka edebîyata kurdî de xwedîyê cihekî taybet e.



ÇAVKANÎ

- Ahmedzade, Haşim. (2004). **Ulus ve Roman Fars ve Kürt Anlatısal Söylemi Üzerine Bir Çalışma**. (wer. Azad Zana Gündoğan). İstanbul: Perî.
- Akbal, Oktay. (1996), “Bir Öykü Evreni Yazarın Evreninden Bir Parçadır”, **Adam Öykü**.
- Akbaş, Mehmet. (11.01.2023) “**KÜRTLER**”, TDV İslam Ansiklopedisi, <https://islamansiklopedisi.org.tr/kurtler#1-tarih>.
- Akman, İlyas. (2018). **Modern Zaza Hikâyeciliği I**. Ankara: Gece Kitaplığı.
- Alakom, Rohat. (2023). **Rêya Teze** (1930). İstanbul: Avesta.
- Alan, Remezan. (2019). **Keşkûl**. İstanbul: Peywend.
- Alan, Remezan. (2022). “Çend Gotin Li Ser Du Adaptasyonên Nîfşê Hawarê”. **Kurde Çîrok**. (H: 4, hr. 25-36).
- Alan, Remezan., Öpengin Ergin. (2014). **Tîr û Armanc, gotarên rexneyî li ser edebîyata kurdî ya modern**. Stenbol: Peywend.
- Alexander, Caroline. (2014). **Akhilleus’u Öldüren Savaş: İlyada’nın Gerçek Hikâyesi**, (wer. Semih Lim). İstanbul: İletişim.
- Andaç, Feridun. (2008). **Öykü Yazmak Öyküyü Düşünmek**, İstanbul: Doruk.
- Arif, Huseyn. (2011). **Çîrokî Hunerî Kurdî (1920-1960)**. Hewlêr: Aras.
- Ay, Serdar. (2021). “Kovar: Der, Derdor, Tor”, **Kovara Wêje û Rexne**. H: 12, r. 6-11.
- Aydoğan, İbrahim Seydo. (2014). **Guman 2: Wêjeya Kurdi û Romana Kurdi**. İstanbul: Rûpel.
- Bates, Herbert Ernes. (2013). **Kısa Öykü: Yazınsal Bir Tür Olarak**. (çev. Gökçen Ezber). İstanbul: Bilge Kültür Sanat Yayınları.
- Bedirxan, Ezîzê Zîyo. (2019). **M. Mustafa Barzanî Li Yekitîya Sovyet**. İstanbul: Doz.
- Bilge, Evin. (2013). **Ji Hêla Naverokê ve Dahûrîna Mela Mehmûdê Bazîdî**. Mardin Artuklu Üniversitesi. Teza Lîsansa Bilind.
- Birîndar, M. (1980). “Engîştê Kejê”. **Tîrêj**. h. 2, r. 32-36

- Bois, Thomas. (1966). **The Kurds**. Beirut: Khayats.
- Bonnard, Andre. (2001). **Sovyet Edebiyatı Üzerine**. İstanbul: Evrensel Basım Yayın.
- Boyîk, Eskerê. (2012). **Çanda Kurdên Sovêtê**. İstanbul: Deng.
- Boyik, Eskerê. (2021). **Êzdî û Bawerîyên Wan**. Van: Sîtav.
- Boynukara, Hasan. (2000). “Hikâye ve Hikâye Kavramları”. **Hece Dergisi** (Türk Öykücülüğü Özel Sayısı) Ankara: Hece. (h. 46/47, r.131-146).
- Bozan, Emin. (2019). **Çîroka Kurmancî Ya Modern Di Kovara Hawarê Da**. Teza Lîsansa Bilind, Mardin Artuklu Üniversitesi: Mardin.
- Bréteque, Estelle Amy de la. (2017). “Yine de Umut Var: Emerik Serdar ile Röportaj”, **Kürt Edebîyatı**. (Editorial). (çev.) Heval Bucak İstanbul: Avesta, r. 103-120.
- Can, Hüseyin. (2017). **Kürtler ve Stalin** (çapa II.). İstanbul: Ceylan Yayınları.
- Cewerî, Fırat. (1993). “Kovar û Rojnameyên Kurdî”. **Nûdem**, Sweden: Weşanên Nûdem. (H: 7, r. 3-7).
- Cewerî, Fırat. (1994). “Dîwar”. **Nûdem**. H.9, r. 78-91.
- Cewerî, Fırat. (1996). **Kultur, Huner û Edebîyat**. Stockholm: Weşanên Nûdem.
- Cewerî, Fırat. (2018). **Antolojîya Çîrokên Kurdî**, Cîld I, İstanbul: Weşanên Avesta.
- Chandler, Daniel. (2018), “**Tür Kuramı Giriş**” Edebiyatta, Sinemada, Televizyonda Tür Kuramı Temel Metinler. (ed. Jale Özata DİRLİKYAPAN). Ankara: Doğu Batı Yayınları.
- Çeçen, Remezan. (2017). “Qonaxa Stenbolê di Edebîyata Kurdî ya Modern de”, **Nûbihar Akademî**, İstanbul: Nubihar Yayinlari. H: 8, r. 41-63
- Çıkla, Selçuk. - Konyalı, Bekir Şakir. (2022). **Metin Tahlilinde Yeni Yaklaşımlar - II**. Ankara: Çolpan Yayınları.
- Çıkla, Selçuk. – Kuran, Şeyma Büyükkavas. (2021). **Metin Tahlilinde Yeni Yaklaşımlar - I**. Ankara: Çolpan Yayınları.
- Delikaya, Ömer. (2014). “Çîrokeke Nîvcomayî: Şewêş”. **Wêje û Rexne**. (H: 1. r. 24-27).
- Deniz Servet. (2013), “Kovargerî yan Kovarkujî”, **Kovara W**. (Adar-Avrêl 2013).

- Duhoki, Xelîl. (2011). **Antolojiya Çîrokên Kurmancên Başûr**. İstanbul: Weşanên Avesta.
- Duskî, M. E. (2008). **Ferhengî Sipîrêz**. Duhok: Dezgeha Sipîrêz ya Çap û Weşanê.
- Eagleton, Terry. (2016). **Edebiyat Nasıl Okunur**. (çev. Elif Ersavcı). (3. Baskı). İstanbul: İletişim Yayınları.
- Emerîkê, Serdar. (03.03.2022). Tebyet Nava Lîteratûra Kurda Ye Sovêtîêda, <http://kurd.amarikesardar.com/?p=852> / <http://kurd.amarikesardar.com/>
- Emerîkê, Serdar. (erîşîm tarîhî). Nema Vekirî Şayîr Qaçaxê Miradra, amarikesardar.com / <http://amarikesardar.com/?p=651>
- Emerîkê, Serdar. (03.03.2022). Çend Gilê Derheqa Tercma Bedewetîêda. <http://kurd.amarikesardar.com/?p=852> / <http://kurd.amarikesardar.com/>
- Emerîkê, Serdar. (03.03.2022). Jîyannîgarya Emerîkê Serdar, http://kurd.amarikesardar.com/?page_id=15 / <http://kurd.amarikesardar.com/>
- Emerîkê, Serdar. (03.03.2022). Min Çira Dest Şayîrtîê Kişand, <http://kurd.amarikesardar.com/?p=852> / <http://kurd.amarikesardar.com/>
- Emerîkê, Serdar. (2006). **Gundê Me...**
- Emerîkê, Serdar. (2015). **Dengê Dil**. Diyarbakır: Weşanên Lîs.
- Emerîkê, Serdar. (2015). **Destê Dê**. Diyarbakır: Weşanên Lîs.
- Emerîkê, Serdar. (2015). **Êdî Dereng Bû**. Diyarbakır: Weşanên Lîs.
- Emerîkê, Serdar. (2017). “Pêşdaçûyîna Lîteratûra Kurdaye Sovêtîê”. **Wêje û Rexne**. (H: 9-10, r. 6-22)
- Emerîkê, Serdar. (2018). **Hisreta Emir**. Diyarbakır: Weşanên Lîs.
- Emerîkê, Serdar. (2018). **Mikûrî**. Diyarbakır: Weşanên Lîs.
- Emir, Sabahat. (1970). **Fikir Yazıları Nasıl Yazılır**. İstanbul: Emir Yayınları.
- Erdoğan, Ali Necip. (2000). “Öykünün Bilinci”. **Hece Dergisi** (Türk Öykücülüğü Özel Sayısı). Ankara: Hece Yayınları. (H. 46/47, R. 350-354).
- Eroğlu, İnan. (2016). “Sirûşt û Fêrîkê Êsiv”, **Wêje û Rexne**. H: 8, r. 141-160.
- Ertekin, Zahir. Yıldırımçakar, Mehmet. (2020). **Destpêka Romana Kurdî: Gotarên Li Ser Êwra Kavkazê**. Van: Weşanên Peywend.
- Eşo, Wezîrê. (1998). “Rya Teze”. **Nûdem**. (H: 28, r. 6-14).

- Eşo, Wezîrê. (1999). “Ronesansa çanda kurdî li Sovyeta berê”. **Nûdem**. H. 32, r.46-55.
- Eşo, Wezîrê. (2018). **Kilam û Pênûs: Kurdên Kafkasyaya Başûr**. Diyarbakır: Weşanên Lîs.
- Farqînî, Zana. (2013). **Ferhenga Kurdî Tirkî**. Stenbol, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.
- Gariboğlu, Kemal. (1983). **Örnekli Kompozisyon Bilgileri**. İstanbul: Serhat Yayınları.
- Genette, Gerard. (2011). **Anlatının Söylemi - Yöntem Hakkında Bir Deneme**. (çev. Ferit Burak Aydar). İstanbul: Boğaziçi Üniversitesi Yayınları.
- Geverî, Ayhan. (2010-2011). “Kürt Öykücülüğü”. **Hece Dergisi**, Ankara: Hece Yayınları. (H: 42, r. 62-64).
- Geverî, Ayhan. (2012). **Antolojîya Çîrokên Nûbiharê**, Çapa 2. İstanbul: Weşanên Nûbihar.
- Gültekin, Nihat. (2016). “Emerîkê Serdar: Min 48 Salên Xwe da Rojnamevanî û Edebîyata Kurdî”. **Nûbihar**. (H: 136. r. 56-61).
- Gültekin, Nihat. (2017). “Tosinê Reşîd: Bêtirî Gotarên Min li Ser Pirsên Çand û Wejeya Kurdî ne”. **Nûbihar**. (H: 138. r. 72-79).
- Gültekin, Nihat. (2019). “84 Salîya Kurdolog Celîlê Celîl.” **Nûbihar**. (H: 149, r. 4-11)
- Gümüş, Semih. (2003). **Öykünün Bahçesi**. Çapa 2. İstanbul: Adam Yayınları.
- Gümüş, Semih. (2006). Yeni Kürt Edebîyatının Atardamarı: Öykü, **Radikal –Kitap**. (erişim tarihi: 13:02.2019).
- Gürsoy, Yasemin. (2018). **Sovyet Dönemi Rus Edebiyatı (1953-1991)**. Ankara: İksad Yayınları.
- Hasanpour, Amir. (2003). “Kürt Medya Kültürünün Yaratılması”, **Kürt Kimliği ve Kültürü**, Philip Kreyenger, Christine Allison, (çev. Ümit Aydoğmuş). İstanbul: Avesta Yayınları.
- Hassanpour, Amir. (2005). **Kürdistanda Dil ve Milliyetçilik 1918-1985**. (wer. İbrahim Bingöl, Cemil Gündoğan). İstanbul: Weşanên Avesta.
- Hîzanî, Nûrî. (2020). **Şewqa Sibê**. Diyarbakır: Weşanên Lîs.
- Izady, Mehrdad. (2013). **Kürtler – Bir El Kitabı**. İstanbul: Doz.

- Kahraman, Alim. (2015) **Modern Türk Hikâyesi**. İstanbul: Büyüyenay Yayınları.
- Kalkan, Şenay. (1982). “Dergilerimizin Edebiyatımıza Katkısı”. **Varlık Dergisi**. (s: 895, r. 33-35).
- Kan, Güneş. (2019). **Îmaja Ermenî Di Romanên Kurdî Yên Sovyetê De**. İstanbul: Peywend.
- Karabulut, Ferhat. (2019). “Cengiz Dağcı’nın ve Cengiz Aytmatov’un Romanlarında Kolhozlar ve Kolhoz Sisteminin Ruslaştırmadaki Rolü”. **Türük**. (s. 16, ss. 56-77).
- Karaman, Emine Rezzan. (2012). “Kürtlüğü İnşa Etmek: Yüzyıl Dönümünde Dergiler ve Aydınlar”. **Kürt Tarihi Dergisi**. (H: 1, r. 41-45).
- Karataş, Turan. (2004), **Ansiklopedik Edebiyat Terimleri Sözlüğü**. Çapa 2. Ankara: Akçağ Yayınları.
- Kaya, Hasan. (2005). **Kürt Öykü Antolojisi**. İstanbul: Evrensel Basım Yayın.
- Kevirbirî, Salihê, (2013). **Filîte Qotu: Yirmi Olay Yirmi Kılâm**. (çev. Mazlum Doğan). İstanbul: Evrensel Basım Yayın.
- Kılavuz, İdil Tunçer. (2017). Sovyetler Birliği’nde Rus Milliyetçiliği ve Rus Milli Kimliğinin Gelişimi. **SİYASAL: Journal of Political Sciences**, 26(2): 79–110.
- Kızılkaya, Muhsin. (2004). **Sürgün Göç ve Ölüm: Çağdaş Kürt Edebiyatından Seçme Hikâyeler**. İstanbul: İletişim Yayınları.
- Kolcu, Ali İhsan. (2015). **Öykü Sanatı**. 2. Baskı . Erzurum: Salkımsöğüt Yayınevi.
- Korkmaz, Ramazan. (2016). **Sabahattin Ali İnsan ve Eser**. İstanbul: Kesit Yayınları.
- Kudret, Cevdet. (1980). **Örneklerle Edebiyat Bilgileri**. C.II. İstanbul İnkılap ve Aka Kitabevi.
- Kurdo, Qanatê. (1983). **Tarîxa Edebyeta Kurdî I**. Stokholm: Weşanên Roja Nû.
- Kutlay, Naci. (2012). “Kafkas Halkları-Kürt Edebi İlişkileri”, **İnatçı Bir Bahar: Kürtçe ve Kürtçe Edebiyat**, (amd. Vecdi Erbay). İstanbul: Sanat ve Kuram Yayınları, (r. 213-231).
- Laleş, Lal. (2012). “Türkiyede Kürtçe Edebiyat”, **İnatçı Bir Bahar: Kürtçe ve Kürtçe Edebiyat**, (amd. Vecdi Erbay). İstanbul: Sanat ve Kuram Yayınları. (ss. 368-373).

- Metê, Hesenê. (22.03.2022). Hesenê Metê: Ez di dogehê de dijîm, http://www.nefel.com/kolumnists/kolumnist_detail.asp?MemberNr=28&RubricNr=24&ArticleNr=2251
- Morkoç, Ayvaz. (2022). Azerbaycan Edebiyatında Hikaye. İstanbul: Dün Bugün Yarın Yayınları.
- Mustefa, Celal. (2004). **Bîyavê Xwandinê: Çend Vekolînek der barey Çîroka Kurdî**. Duhok: Weşanên Hawar.
- Nadirî, Wezîrê. (2016). **Nûbar: Yekemîn Hikayeyên Kurmancî Yên Modern**. (Wer. Mehmed Emîn Hêvîdar). İstanbul: Weşanên Nûbihar.
- Nado, Kenanê .(2013). “Di Kovargerîya Ciwanan da Kovareka Xwendekarên Zanîngehan a Zanistî wêjeyî û hunerî ‘pênGAV’”, **Kovara W.** (Adar-Avrêl 2013).
- Öner, Sakin. (1982). **Örneklerle Kompozisyon Düzenli Yazma ve Konuşma Sanatı**. İstanbul: Yuva Yayınları.
- Özdemir, Emin. (1999), **Yazınsal Türler**. Ankara: Bilgi Yayınevi.
- Özgül, Metin Kayahan. (2014). "Harp Edebiyatına Harbî Bir Bakış", **Türk Harp Edebîyatı Konulu I. Uluslararası Türkîyat Sempozyumu** (1-3 Kasım 2013 / Çankırı) – Bildiriler Kitabı, (edt. Ömer Çakır) Ankara: Berikan Yayınevi. (r.3-17).
- Öztaş, Özkan. (2016). **Sovyetler Birliğinde Kürt Sanatı**. İstanbul: Yazılama Yayınları.
- ÖZYER, Nuran. (1993). “Edebi Bir Tür Olarak Otobiyografi ve İki Örnek”. **Hacettepe Üniversitesi Edebiyat Fakültesi Dergisi** (Cilt 10 , H. 1, r.73-85).
- Pariltı, Abidin., & Galip, Özlem. (2010). **Kürt Romanı**. İstanbul: Sel Yayıncılık.
- Pîrbal, Ferhad. (1994). “Bîbliografya û Çîrokên Hawar, Ronahî û Roja Nû”. **Nûdem**. (H: 11, r. 100-108).
- Pîrbal, Ferhad. (2001). “Çîroka Kurdî”. **Kovara War**. (H: 10-11, r. 58-63)..
- Poe, Edgar Allan. (2009). “Nesir Diliyle Yazılmış Hikâyede Bir Etki Yaratmanın Önemi Üzerine”. **Hikâye Sanatı Üstüne Yazılar**. (çev. Fatma İdin). İstanbul: Pan Yayıncılık.
- Poloço, Dr. (1992). “Cihekî Paqij û Rohnî”. **Nûdem**. H.1, r. 52-54.
- Qadir, Aslika. (2023). **Jîyan û Bîranîn-Welatê Me Kurdistan e**. İstanbul: Avesta.

- Quiroga, Horacio. (2018). **Aşk Delilik ve Ölüm Öyküleri**. (çev. Bülent Kale). İstanbul: Notos Kitap Yayınları.
- Reşid, Sabir. (2005). **Çîrokî Kurdî: Rexne û Lêkolînewe**, Hewlêr: Weşanên Kitêbî Gîrfan.
- Reşid, Tosinê. (2010). **Êzdîyatî: Oleke Hê Jî Nenaskirî**. Diyarbakır: Weşanên Lîs.
- Reşît, Tosinê. (1996). “Dême Her Edebîyatê Bi Pexşana Wê Xuya Dibe”. **Nûdem**. (H. 10, r. 6-10)
- Reşît, Tosinê. (2012). “Sovyetler Birliği’nde Kürt Edebîyatı”, **Înatçı Bir Bahar: Kürtçe ve Kürtçe Edebîyat**. (amd. Vecdi Erbay), İstanbul: Sanat ve Kuram Yayınları, (r. 202-212.)
- Roj, Cihan. (2023). **Edebiyata Modern a Kurdî**. Van: Peywend
- Salih, Xalid. (2010). **Kurteçîroka Kurdî Li Devera Behdînan: 1960-2005z**. Dihok: Weşanên Yêkitîya Nivîserên Kurd.
- Serfiraz, Mesûd. (2015). **Kurd Kiteb û Çapxane: Weşangerîya Kitêbên Kurdî di Dewra Osmanîyan de (1844-1923)**. İstanbul: Peywend.
- Sezer, Muslih, (2020). “Destpêka Romana Kurdî: Panoramaya Romana Êwra Kavkazê”, **Destpêka Romana Kurdî Gotarên li ser Romana Êwra Kafkazê**, (edt. M. Zahir Ertekin, Mehmet Yildirimçakar). Van: Peywend.
- Shakely, Ferhad. (1998). **Modern Kürt Öykü Sanatı**. (wer. Rohat Alakom). İstanbul: Avesta Yayınları.
- Siras, (2012). **Letîfe**. Diyarbakır: Lîs.
- Siras, (2012). **Memê û Eysê**. İstanbul: Evrensel Çocuk Kitaplığı.
- Storr, Will. (2020). **Hikâye Anlatıcılığının Bilimi**. (çev. Esmâ Fethiye Güçlü). İstanbul: Timaş Yayınları.
- Subaşı, Kenan. (2019). **Tîpolojîya Vegêrana Çîrvanokên Kurdî/Kurmancî**. Dicle Üniversitesi. Doktora Tezi.
- Şakar, Cemal. (2018). **40 Soruda Türk Öyküsü**. İstanbul: Ketebe.
- Şamil, Hejarê. (2005). **Diaspora Kürtleri: “Sovyet Kürtleri” Hakkında Tarihi Ve Güncel İnceleme**. İstanbul: Peri Yayınları.
- Taels, Herman. (2001). **Eski Sovyetler Birliğinde Kürtler (1927-1994)**. İstanbul: Peri Yayınları.

- Taylor, J. Chesley. (2009). **Bir Edebiyat Türü Olarak Hikâye. Hikâye Sanatı Üstüne Yazılar**, (çev. Seyhan Bozkurt-Aysun Gamze Yüksel). İstanbul: Pan Yayıncılık.
- Tekin, Mehmet. (2006). **Roman Sanatı (Romanın Unsurları) 1**, İstanbul: Ötüken Yay.
- Tilermenî, Yaqob. (2015). **Lemiştâ Çîrokên Kurdî: Salnameya Çîroka Kurdî ya 2012-2013-2014'an**. İzmir: Weşanên Na.
- Tilermenî, Yaqob. (2021). "Çîrokbuhêrk/Kurteçîrok: Çima Ne Çîroka Nûjen". **Destar**. (H. 1, r. 104-106)
- Tilermenî, Yaqob. (2022). "Di Kurdî De Ji Çîrokê Re Çi Tê Gotin". **Destar**. Amed: Weşanên Enstîtûya Kurdî Ya Amedê. (H: 3, hr. 96-100).
- Tosinê Reşîd. (2010). **Ezdîyatî Oleke Hê Jî Nenaskirî**, İstanbul: Lîs,
- Tosun, Necip. (2018). **Modern Öykü Kuramı**. Ankara: Hece Yayınları.
- Tosun, Necip. (2020). **Edebiyat Atlası**. İstanbul: Dedalus Yayınları.
- Tosun, Necip. (2023). **Öykü Terimleri Sözlüğü**. İstanbul: Ketebe Yayınları.
- Ulugana, Sedat. (2017). "Kurdolojîya Sovyetê û Kronolojîya Edebîyata Wê ya Kurdî (1922-1991)." **Wêje û Rexne**. (H: 9-10, r. 36-56)
- Uzun, Mehmed. (1993). **Hez û Bedewîya Pênûsê**. Stokholm: Weşanên Nûdem.
- Uzun, Mehmed. (2010). **Kürt Edebiyatına Giriş**. İstanbul: İthaki Yayınları.
- Veroj, Seîd. (2021). **Rojnamegerî û Kovargerîya Kurdî (1898-1932)**. Diyarbakır: Weşanên Dara.
- Xelîlê, Têmûr. (2014). **Antologîya 35 Helbestvan û Nivîskarên Kurd Ên Sovyeta Berê**. İzmir: Weşanên Na.
- Xeznedar, Maruf. (2001). **Mêjûyî Edebî Kurdî**. (Wer. Zîya Avcı). Hewlêr: Weşanên Aras.
- Yakın Y, A. (2003). "Otobiyografi". **Doğu Batı**. (H.22, r.131-138).
- Yalçın, C. (1989). **Edebiyat Terimleri Sözlüğü**. İstanbul: Yalçın Emel Yayınları.
- Yazıcı, N. (2006). "Türk Edebiyatında Otobiyografi". **Türkbilig**, (H.11, r. 189-217).
- Yıldız, Ayhan. (2018). **Hunera Vegotina Bedew A Devkî û Nivîskî –II**. İstanbul: Weşanên Lorya.

Zeraq, Dilaver. (2012). “Çağdaş Kürt Öykücülüğünün Nabzı”, **İnatçı Bir Bahar: Kürtçe ve Kürtçe Edebiyat.** (amd.Vecdi Erbay). İstanbul: Sanat ve Kuram Yayınları. (r. 481-490).

Zeraq, Dilaver. (2020). **Ruhê Xwebûnê.** Diyarbakır: Weşanên Lîs.

Zeraq, Dilaver. (2021). “Nifşa Ciwan ya Xweavakirî: Nifşa Rewşenê”. **Kürt Araştırmaları Dergisi.** (H. 6. r. 87-100).

Ergün, Zülküf. (2014). **Bajar-Edebîyat û Cizîra Botan.** İstanbul: Weşanên Nûbihar.


Ergün, Zülküf. (2018). “Taybetîyên Vegêrana Edebîyata Kurdî ya Sovyetê”. **Mukkadime.** (cild, 9, h.1, r. 133-150)

Ergün, Zülküf. (2022). “Emerîkê Serdar: Di Edebîyata Kurdî ya Sovyetê da”. **Mukkadime.** (cild: 13, h.1, r. 147-169).

PÊVEK


Bergên pirtûkan yên çapên ewil.

DESTÊ DÊ



Ev wêne, bergê yekem pirtûka Emerîkê Serdar ya *Destê Dê* ye. Ev berhem di sala 1974an de li Erîvanê bi vê bergê ve çap bûye. Çapa duyê li Tirkîyeyê di sala 2015an de ji aliyê weşanxwaneya Lîsê ve çap bûye.

ÊDÎ DERENG BÛ




Ev berhem di sala 1979an de li Erîvanê bi vê bergê çap bûye. Berhem bi sernavê *Êdî Dereng Bû* derçûye. Çapa duyê li Tirkîyeyê di sala 2015an de ji alîyê weşanxwaneya Lîsê ve çap bûye.

DENGÊ DIL




Ev berhem di sala 1985an de li Erîvanê bi vê bergê ve çap bûye. Berhem bi sernavê *Dengê Dil* derçûye. Çapa duyan li Tirkîyeyê di sala 2015an de ji alîyê weşanxwaneya Lîsê ve çap bûye.

GUNDÊ ME



Ev berhem di sala 2006an de li Erîvanê bi vê bergê ve çap bûye. Berhem bi sernavê *Gundê Me* derçûye. Çapa wê li ber destan tune ye û li Tirkîyeyê jî çap nebûye.

HISRETA EMIR



Ev berhem di sala 2008an de li Erîvanê bi vê bergê ve çap bûye. Berhem bi sernavê *Hisreta Emir* derçûye. Çapa duyan li Tirkîyeyê di sala 2018an de ji alîyê weşanxwaneya Lîsê ve çap bûye.

GENİŞLETİLMİŞ TÜRKÇE ÖZET

KÜRT EDEBİYATINDA EMERÎKÊ SERDAR'IN ÖYKÜCÜLÜĞÜ

İÇİNDEKİLER

GİRİŞ

Araştırmanın Konusu ve Sınırlar

Çalışmanın Amacı ve Çalışmanın Önemi

Metodoloji

Genel Çerçeve

BİRİNCİ BÖLÜM

1.1. Sovyet Sahası Kürt Edebiyatı

1.2. Sovyet Ermenistan'ında Kürtçe Eğitim

1.3. Sovyet Sahası Kürt Edebiyatının Başlıca Dönemleri

İKİNCİ BÖLÜM

2.1. Emerîkê Serdar ve Öykücülüğü

2.3. Öykülerdeki Teknik Unsurlar

ÜÇÜNCÜ BÖLÜM

3.1. Emerîkê Serdar'ın Öykülerinde Tematik Unsurlar

3.2. Toplumsal Temalar

3.3. Politik Temalar

3.4. Bireysel Temalar

SONUÇ

ÖNSÖZ

Hikâyeleştirme, öyküleştirme ya da anlatı kavramı insanoğlunun yaşam serüveni sonucu ortaya çıkmıştır. İnsanlar yaşanmışlıklarını duygu ve düşüncelerini sonraki nesillere anlatmak amacıyla anlatıya başvurmuşlardır. Zamanla bu anlatı giderek yagınlaşmış sözlü olmaktan çıkıp yazılı hale bürünmüştür. Yazıyla beraber anlatı da edebi bir yönde evrilmiş ve bunun sonucunda da edebi metinlere dönüşmüştür. Öykü türü de kaynağını insanoğlunun bu yaşanmışlıklarından, insanoğlunun anlatma ihtiyacından doğmuş ve zamanla edebiyatta bir ara tür olmaktan çıkıp kendi başına bir tür haline gelmiştir.

Öykü türü bu yönüyle hemen hemen tüm dünya edebiyatlarında çokça yazılan bir tür olarak varlığını sürdürmektedir. Diğer dünya edebiyatlarına kıyasla Kürt edebiyatında öykü türü geç bir dönemde, yirminci yüzyılın başında ilk örneklerini vermiştir. Kürt edebiyatında öykünün birbirinden farkı coğrafyalarda yazılmış, dönem dönem çeşitli sebeplerden dolayı bazı aksamalara yaşamışsa bile devam edegelmiştir. Bu çalışmamızda bir bütün halinde Kürt edebiyatında öykü türünün ortaya çıkışı problemleri ve ilk yazar ve eserleri incelenmiştir. Bu kapsamda kürt edebiyatında önemli sahalardan biri olan Sovyet sahası Kürt öykücülüğü de incelenmiş ve dönemin önemli öykücülerinden olan Emerîkê Serdar'ın yazarlığı ve öykücülüğü kapsamlı olarak incelenmiştir.

GİRİŞ

Kurmaca edebi bir tür olarak öykü, ortaya çıktığı günden beri çeşitli tanımlama sorunlarıyla yüzyüze kalmıştır. Türle ilgili olarak her ne kadar bütünlüklü ve kapsayıcı bir tanımlama söz konusu değilse bile; türün belli başlı özellikleri belirlenmiştir. Edgar Alan Poe gibi yazarlara göre öykü türünün bir okunuşta ve yarım saat veya bir iki saatte okunabilecek kısalıkta olması gerektiğinden söz etmektedir. Aynı zamanda öykünün okurda tek bir etki uyandırması ve fazlalıklardan arınmış olması gerektiğini söyleyerek; türün belli başlı özelliklerini ortaya koymuştur (Poe, 2009: 15-17).

Öykü türünün tanımlama sorunuyla beraber öykünün tarihsel serüveni de araştırmacılar arasında tartışma konusu olmuştur. Her yazar ya da araştırmacı kendi edebi görüşüyle türe yaklaşmış ve türü bu yönde tanımlamıştır. Kimi araştırmacılara göre öykü son yüzyılın ürünüdür. Kimilerine göre ise öykü türünün tarihi insanlık tarihi ile eşdeğerdir (Bates, 2013: 7).

Öykü türünün tanımlanmasında bir başka yöntem de roman ile olan münasebetidir. Öykü ve roman nesir ve kurmaca iki tür olarak birbiri ile yakın bir ilişki içerisinde. Olay örgüsü, zaman, mekan ve şahıs kadrosu açısından benzerlikler azır etmektedir. Fakat öykü tür olarak romana göre daha kısa bir yapıya sahiptir. Bu benzerliklerine rağmen öykü ve roman bazı yönlerden de birbirinden ayrılmaktadır. Romanda birden fazla olay örgüsü vardır. Olay örgüsünün yanında öykü metinlerinde şahıs kadrosu ve mekan da daha dar bir kapsama sahiptir. Öyküde mekan tasvirleri daha yüzeyseldir.

Öykü türünün ilk örneği olarak Boccaccio'nun *Decameron* adlı eseri kabul edilmektedir. Boccaccio'dan sonra Margaret de Navarre'nin *Heptameron* ve Chaucer'in *Canterbury Tales* adlı eserleri bu türün ilk metinleri olarak gösterilmektedir. Yine *Binbir Gece Masalları* da bu türden eserler arasında sayılmaktadır (Boynukara, 2000: 189).

Dünya edebiyatında Maupassant ve Çehov gibi yazarlar hem öyküye yön vermiş hem de bu türün yayılmasına öncülük etmişlerdir. Maupassant tarzı

öykücülük dünya edebiyatında “klasik öykü” ya da bir diğer deyişle “olay öyküsü” olarak ün yapmıştır. Buna karşılık Çehov tarzı öykü anlayışı ise “durum öyküsü” olarak adlandırılmıştır.

ARAŞTIRMANIN KONUSU VE SINIRLAR

Bu çalışmanın konusu “Kürt Edebiyatında Emerîkê Serdar’ın Öykücülüğü”dür. Bu kapsamda Kürt Edebiyatında öykü türünün tarihsel serüveni de bu kapsamda ele alınmıştır. Çalışmada Emerîkê Serdar’ın yaşamı ve öykücü kimliği ele alınmış ve öyküleri teknik ve tematik unsurlar açısından incelenmiştir. Çalışma bu yönüyle Emerîkê Serdar’ın öykücülüğü ve Kürt edebiyatında öykü türünün kısa bir tarihçesi ile sınırlandırılmıştır.

ÇALIŞMANIN AMACI VE ÇALIŞMANIN ÖNEMİ

Bu çalışmanın en başat amacı kurmaca bir tür olarak Kürt edebiyatında öykü türünün ortaya çıkışındaki temel parametreleri belirlemek ve bu alanda ortaya konulmuş olan türün ilk ürünlerini değerlendirmektedir. Bu kapsamda Kürt edebiyatında öykü türünün isimlendirme sorununa da değinilmiş ve konu ile ilgili süregelen tartışma ve isimlendirme sorununa da açıklık getirilmiştir. Bunun yanında Sovyet sahasının önemli ve üretken bir öykü yazarı olarak Emerîkê Serdar’ın öykücü kimliğinin belirlenmesi ve Kürt edebiyatındaki yerinin tespit edilmesi amaçlanmıştır. Emerîkê Serdar öyküleriyle bulunduğu dönemin edebi anlayışından sıyrılarak kendine has bir üslupla yaşadığı dönemdeki Kürtlerin yaşamını, kültürünü adet ve geleneklerini başarılı bir şekilde işlemiştir. Bu yönüyle Emerîkê Serdar Kürt öykücülüğünde önemli bir sima olarak ortaya çıkmaktadır.

METODOLOJİ

Çalışmamızda metin analizi yöntemi kullanılmış ve bunun için de Emerîkê Serdar’ın öykü metinlerinden istifade edilmiştir. Çalışmada Emerîkê Serdar’ın öyküleri teknik ve tematik unsurlar bakımından incelenmiştir. Bu kapsamda Kürt edebiyatında öykü terimi, Kürt öykücülüğü, Sovyet sahası öyküleri ve yazarın öyküleri ile yaşamı bir bütünlük halinde değerlendirilmeye tabi tutulmuştur. Öykü metinlerin değerlendirilmesi noktasında özellikle yazarın yaşamı ve öyküleri

parallelinde deęerlendirmeler yapılmıřtır. Bundan dolayı öykü metinleri deęerlendirirken tarihsel, sosyolojik ve psikolojik veriler ıřıęında incelemeler yapılmıř olup bu yönüyle de alıřmamız bir nevi disiplinlerarası bir alıřma olarak da görülebilir.



BİRİNCİ BÖLÜM

1.1. Sovyet Sahası Kürt Edebiyatı

Sovyet sahasında Kürt edebiyatının ortaya çıkışındaki temel faktör olarak 1917 yılındaki Ekim Devrimi gösterilebilir. Ekim Devrimi ile beraber Sovyetlerde tüm halklar kendi ana dillerinde okuma yazma imkanına kavuşmuşlardır. Bu halklardan biri olarak Kürtler de bundan nasiplenmiş ve özellikle Sovyet Ermenistan’ında kendi ana dillerinde eğitim alma fırsatına kavuşmuşlardır. Kürtlerin bulunduğu köylerde Sovyetlerin himayesinde okullar açılmış sonrasında ise okur yazar bir Kürt nesli ortaya çıkmıştır. Bu da zaman içerisinde Kürt edebiyatının Sovyet sahasında serpilmesine ve gelişmesine kaynaklık teşkil etmiştir.

Sovyet sahası Kürt edebiyatı bazı ilklere de sahne olmuştur. İlk Kürtçe roman burada Erebe Şemo tarafından kaleme alınmıştır. Edebiyatın hemen her türünde eserler ortaya konulmuştur. Bu dönemde yazılan eserler genelde tüm Sovyet sahasında olduğu gibi Toplumcu Gerçekçi edebi anlayışın etkisi altında kaleme alınmıştır. Fakat Sovyetlerin ve Sovyet yöneticilerinin politik tavırları zaman zaman Sovyet sahası Kürt edebiyatında aksamalara neden olmuştur.

Sovyet sahasında ortaya konulan ve Ekim Devrimi ile başlayıp 1991 Sovyetlerin yıkılışına kadar olan dönem; Kürt edebiyatında “Êwra Kavkazê” olarak adlandırılmaktadır.

1.2. Sovyet Ermenistan’ında Kürtçe Eğitim

Sovyet sahası Kürt edebiyatından söz edilirken öncelikle bunun arka planına değinmek gerekir. Çünkü Sovyetler döneminde Ermenistan’da ortaya çıkan ve Kürt Edebiyatında daha çok Sovyetler Dönemi Kürt Edebiyatı olarak adlandırdığımız bu dönemin ortaya çıkmasında Ekim Devrimi’nin büyük katkısı olmuştur. Bolşeviklerin iktidarından sonra Sovyet Ermenistan’ında görece bir özgürlük ortamı oluşmuştur. Sovyetler Birliğinin kuruluşu ile beraber eğitim tüm ülkede zorunlu hale getirilmiş ve 30 farklı dilde eğitim okulları açılmaya başlanmıştır. Kürtler de bu durumdan

faaydalanmıř, Krtlerin yoęun olarak yařadığı blgelerde Krte eęitim veren okullar aılmaya bařlanmıřtır.

2.1. Sovyet Sahası Krt Edebiyatı

Sovyet sahası Krt edebiyatı genel olarak 1920-1991 tarihleri arasında Sovyetler Birlięi'nde ortaya konulmuřtur. Bu tarih Ekim devrimi ile bařlayıp Sovyet Sosyalist Birlięi'nin yıkılıřına kadar olan sreyi kapsamaktadır. Sovyetlerin yıkılıřından sonra varlıęını devam ettirmiřse bile eski retkenlięini yitirmiř ve zayıflamıřtır. Sovyet sahası Krt edebiyatı genel anlamda Sovyetlere baęlı Azerbaycan, Ermenistan ve Grcistan da ortaya ıkmıřtır. Ermenistan bu dnemde Sovyet sahası Krt edebiyatı iin nemli bir merkezdir. Bu dnem ierisinde 1928 yılında Erebe řemo ve řsahak Marogolov tarafından latin harflerine dayalı ilk Krte alfabe hazırlanmıřtır. Krte eęitim veren okullardaki eęitim kitapları bu alfabe ile hazırlanmıřtır. Tabi bunlar Krt okuryazarlarından ziyade bir Sovyet politikası olarak geliřmiřtir. Yine bu dnemde 1930 yılında Rya Teze (Yeni Yol) gazetesi yayın hayatına bařlamıřtır. Rya Teze gazetesinin yayın hayatına bařlaması ile beraber Krte eserlerin yayınlanmasında artıř meydana gelmiřtir.

Sovyet sahası Krt edebiyatı ilk Krte romanın yazıldığı saha olarak bilinmektedir. Sadece roman deęil yk, řiir ve tiyatro alanında nemli eserler ortaya konulmuřtur. Erebe řemo, Casim Celil, Hecy Cind, Ahmed Miraz, Eliy Evdilrehman, řma Semend, Wezr Eřo, Emerk Serdar, Ferk siv vb. dnemin nemli yazarları olarak n plana ıkmıřtır.

Sovyet sahası Krt edebiyatı olarak adlandırılan dnem, kendi ierisinde  dnem olarak incelenmektedir. Bunlardan 1920 ile 1937 yılları arasındaki dnem bařlangı/emekleme dnemi olarak adlandırılmaktadır. Bu dnemde nemli derleme alıřmaları yapılmıřtır. Bu dnem Stalin'in Sovyetlerde ynetimi devralması ile beraber kesintiye uęramıřtır.

Sovyet sahası Krt edebiyatının ikinci dnemi de duraklama dnemi olarak adlandırılmakta ve 1937-1955 yılları arasında tarihlendirilmektedir. Bu dnemde Krte yayınlanan Rya Teze gazetesi kapatılmıřtır. Krt yazarlarından bazıları tutuklanmıř; Erebe řemo ise Sibirya'ya srgne gnderilmiřtir. Bu dnemde Krte edebi eserlerin yayınlanması ciddi bir řekilde gerilemiřtir. Bu dnemde Krt

tiyatrosu diğ er edebi t rlere nazaran daha fazla  n plana  ıkmıřtır. 1937 yılında Elegez Devlet Tiyatosu'nun a ılması bu alana bir canlılık getirmiřtir. Klasik K rt eserlerinden, Ermeni ve Rus yazarların eserlerinden  ok a oyun sahnede yer almıřtır. Elegez Devlet Tiyatosunun kurulması biraz da İkinci D nya Savařı ile yakından iliřkilidir.   nk  bu d nemde Almanya'ya karřı savařta olan Rusya'nın halk arasındaki propaganda ayađını da bu tiyatrolar oluřturmaktadır. Sonrasında 1946 yılında bu tiyatronun kapatılması da bir nevi Sovyetlerin amacını da ortaya koymaktadır.

Sovyet sahasındaki bir diğ er d nem ise 1955-1991 yılları arasını kapsamaktadır. Stalin'in  l m nden sonra K rt e R ya Teze gazetesi yeniden yayın hayatına bařlamıřtır. Bu d nem, K rt edebiyatının bu sahadaki altın d nemi bir diğ er deyiřle en  retken d nemidir. Bu d nemde edebiyatın hemen her t r nden  ok  nemli eserler ortaya konulmuřtur. D nemin en  nemli geliřmelerinden biri de Erivan Radyosu'nun yayın hayatına bařlamasıdır. Erivan Radyosu b nyesinde K rt e m zik bir nevi kendine bir mekan bulmuřtur. Bu d nem Sovyet K rtlleri tarafından K rt R nesansı olarak tanımlanmaktadır (Eřo, 1991: 46)

İKİNCİ BÖLÜM

2.1 Emerîkê Serdar ve Öykücülüğü

Çalışmanın bu bölümünde Emerîkê Serdar'ın yaşamı, öykücülüğü ve öykülerindeki temalar metin analizi yöntemiyle incelenmiştir. Emerîkê Serdar'ın beş öykü kitabı *Destê Dê*, *Êdî Dereng Bû*, *Dengê Dil*, *Gundê Me* ve *Hisreta Emir* bu kapsamda incelemeye tabi tutulmuştur. Bu inceleme kapsamında yazarın öykülerindeki otobiyografik unsurlar da bu bölümde incelenmiştir. Bunun yanında Emerîkê Serdar'ın öykülerindeki tematik unsurlar üç başlık altında incelenmiştir.

2.2. Öykülerdeki Teknik Unsurlar

Çalışmanın bu bölümünde Emerîkê Serdar'ın öyküleri teknik unsurlar açısından incelenmiştir. Emerîkê Serdar modern öykünün tüm unsurlarını öykü metinlerinde başarılı bir şekilde kullanmıştır. Yazarın öykülerinde zaman iki şekilde ortaya çıkmaktadır. Bunlardan biri anlatı zamanı, diğeri ise hikaye zamanıdır. Yazarın öykülerinde belli bir tarihi bildiren zaman kavramları olduğu gibi bazı öykülerinde ise zaman kavramı meçhuldür. Kimi öykülerinde hikaye zamanı günleri, ayları, mevsimleri hatta yılları kapsamaktadır.

Yazarın öykülerinde mekan tasviri çok ön planda değildir ve genel olarak öykülerindeki mekan; açık mekanlardır. Çocukluğunun geçtiği köy ortamı öykülerindeki temel mekanlardandır. Yazar öykülerinde mekanı kimi zaman Sovyet öncesi ve Sovyet sonrası yaşamı gözler önüne sermek için betimlemektedir. Mekan bu anlamda genelde toplumun yoksulluk hallerinin betimlenmesi amacıyla kullanılmıştır.

Emerîkê Serdar'ın öykülerindeki teknik unsurlardan biri de şahıs kadrosudur. Yazar öykü kahramanlarını genellikle Kürt toplumundan seçmiştir. Yazarın öykü kahramanları genel olarak bulundukları sosyal tabakaların iyi birer yansıtıcısı olmuşlardır. Yazarın öykülerindeki kahramanlar idealize edilmiş tiplerden ziyade sıradan insanlardır. Bu yönüyle de Emerîkê Serdar Sovyetler döneminin diğer Kürt

yazarlarından ayrılmaktadır. Çünkü Emerîkê Serdar öykü metinlerinde; öykü kahramanlarını idealize etmeden onları var oldukları gibi sunmaya çalışmaktadır.



ÜÇÜNCÜ BÖLÜM

3.1. Emerîkê Serdar'ın Öykülerinde Tematik Unsurlar

Emerîkê Serdar'ın öykü metinlerinde birbirinden farklı temalar göze çarpmaktadır. Kendi yaşam serüveninden de yola çıkan yazar içinde bulunduğu toplumun sorunlarını, toplumsal özelliklerini kendi fikir dünyası içerisinde harmanlayarak öykü metinlerine yansıtmıştır. Çalışmamızda bu temaları üç başlık altında; toplumsal, politik ve bireysel tema şeklinde inceledik. Söz konusu temaları da kendi alt başlıklarına göre öykü metinlerini analiz ederek farklı başlıklara ayırdık.

3.2. Toplumsal Temalar

Emerîkê Serdar öykü metinlerinde kendi döneminin günlük yaşamını, kültürünü, inançlarını ve toplumdaki kadın-erkek rollerini işlemiştir. Bunun yanında yaşadığı dönemdeki insanların yoksulluklarına da ayna tutmuş ve bunu tüm çıplaklığıyla öykü metinlerine aksettirmiştir. Öykü metinlerinde özellikle Kürtlerin kültür ve yaşamından örnekler sunmuştur. Bunun yanı sıra yazarın metinlerinde ataerkilliğin eleştirisi, kadının toplumdaki rolü, eski yaşam ile yeni yaşamın mukayesesi başat temalar olarak ön plana çıkmaktadır.

3.3. Politik Temalar

Emerîkê Serdar'ın çocukluk dönemi İkinci Dünya Savaşı'na denk gelmiştir. Babası Kızıl Ordu saflarında İkinci Dünya Savaşı'na katılmıştır. Dolayısıyla savaşa ve savaştan kaynaklı trajedilere yakından bizzat şahitlik etmiştir. Bu yönüyle öykü metinleri de bundan payını almıştır. Öykülerinde ön plana çıkan en başat temalardan biri bundan dolayı savaş temasıdır.

Yazar öykü metinlerinde savaşın daha çok cephe gerisindeki etkileri üzerinde durmuştur. Savaşın gerisindeki sivil yaşamların trajedileri üzerinde durmuştur. Savaş temasının yanında yine Sovyetlerdeki kolhoz sisteminin eleştirisi de tema olarak öykü metinlerinde yer almıştır. Öykü metinlerinde Kürt halkının Ermeni halkı ile olan ilişkileri de yer yer ön plana çıkmaktadır.

3.4. Bireysel Temalar

Emerîkê Serdar'ın öykü metinlerinde en yoğun işlediği tema “anne” teması olduğu göze çarpmaktadır. Bunda da yine kendi yaşam serüvenin izleri görülmektedir. Zira yazarın babasının İkinci Dünya Savaşı'na katılması ve savaş sırasında hayatını kaybetmesinden dolayı; yazar tüm yaşamını annesi ile geçirmiştir. Annesinin yaşamı üzerinde derin bir tesiri vardır. Bundan dolayıdır ki yazarın öykü metinlerinde anne hem tema hem de konu olarak yer almıştır. Yazar bir röportajında ilk yazılarının annesine olan özlemini dile getirdiğini ve yazarlığa da annesini dile getirmek onu anmak için başladığını dile getirmiştir (Brêteque, 2017: 106). Anne ve annelik sadece öykülerin temalarına değil, yazarın kitaplarına ve öykü başlıklarına da isim olmuştur. Yazar bu yönüyle ilk öykü kitabını da *Destê Dê* (Anne Eli) olarak yayınlamıştır. Yazarın öykü metinlerinde belki de idealize edilip kutsallaştırılan tek kahraman annedir.

Yazarın öykü metinlerindeki temalardan biri de baba temasıdır. Babasını savaşta kaybeden yazar bunun eksikliğini öykü metinlerinde de dile getirmektedir. Öykü metinlerine yansıyan çocukların ve evlerin betimlemelerinde kendini gösteren yoksulluk halleri de babanın olmayışından kaynaklıdır. Yazar savaşın yoksulluk ve yoksunluğunu babasız çocuklar üzerinden işlemektedir. Bunun yanı sıra yazarın öykülerinde aşk da tema olarak karşımıza çıkmaktadır. Fakat savaş ve anlayışsız babaların varlığı ve toplumsal gelenekler aşıkların önüne bir engel olarak çıkmıştır.

SONUÇ

Öykü, edebiyatta kendine has özellikleriyle başat bir türdür. Kurmaca bir tür olarak romandan daha kısa ve roman türüne göre daha az detaya sahiptir. Dünya edebiyatında çokça yazılan bir tür olan öykü, Kürt edebiyatında da ilk örneklerini yirminci yüzyılın başında vermiştir. Kürt öykücülüğü birbirinden uzak coğrafyalarda kimi zaman kimi engellerle karşılaşarak günümüze kadar yazıla gelmiş ve bu alanda önemli yazar ve eserler ortaya çıkmıştır. Kürt öykücülüğündeki en büyük sorunsallardan biri de kendine bir merkez bulamamasından ileri gelmektedir.

Kürt edebiyatında öykü türünün ortaya çıkmasında süreli yayınların büyük etkisi olmuştur. İlk Kürtçe öykü metni de İstanbul'da *Rojî Kurd* adlı bir dergide yayınlanmıştır. Bu alanda ilk olarak *Hawar*, *Ronahi*, *Roja Nû*, *Gelawêj* ve *Rêya Teze* gibi dergi ve gazeteler sonrasında ise *Nûdem* ve *Nûbihar* gibi dergiler Kürt öykücülüğünün gelişmesine büyük katkılar sağlamışlardır.

Kürt öykücülüğünde önemli merkezlerden biri de Sovyet sahasıdır. Sovyet sahasında 1917 Ekim Devrimi sonrası oluşan imkanlardan yararlanan Kürtler nesir alanında önemli eserler ortaya koymuşlardır. Bu dönemde öykü türünde en üretken yazarlardan biri de Emerîkê Serdar'dır. Emerîkê Serdar öyküleri, kendi döneminin edebi anlayışından içerik, konu, tema ve üslup olarak farklılık göstermektedir. Bunda yazarın edebi okumalarının ve edebi eleştirmenliğinin de payı yadsınamaz. Emerîkê Serdar bu yönleriyle dönemin Kürt öykücülüğünden ayrılarak kendine has bir edebi anlayışı ortaya koymuştur. Öykülerinde bu dönemdeki Kürtlerin yaşamlarını bütünlüklü bir yaklaşımla ve realist bir tarzda yansıtmıştır.

Emerîkê Serdar'ın en belirgin özelliklerinden biri de öykülerindeki otobiyografik izlerdir. Öykülerinin konularını daha çok kendi yaşamından ve şahit olduğu olay ve durumlardan almıştır. İkinci dünya savaşına denk gelen çocukluğu ile beraber savaşın etkilerini kendi gözleriyle görmüş ve bunları öykülerine de yansıtmıştır. Öykülerinde savaş, anne, yoksulluk aşk gibi temalar ön plana çıkmaktadır. Bu yönleriyle de çalışmanın amacı Kürt edebiyatında özellikle Kürt öykücülüğünde Emerîkê Serdar'ın yerinin ve öneminin saptanmasıdır.